Zeynelabidîn Zinar

# XWENÇE

CILD I

Gotinên Pêşiyan, Kilam-Dîlok û Çîrok

WEŞANXANA ÇANDA KURDÎ

STOCKHOLM 1989

Zeynelabidîn Zinar

# XWENÇE

## CILD I

## Gotinên Pêşîyan, Kilam-Dilok û Çîrok

Ji kek Kendal re
12/4-90
Zeynel

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

WEŞANXANA ÇANDA KURDİ

STOCKHOLM 1987

Kurdiska Kulturförlaget
Weşanxana Çanda Kurdî
BOX 161 39, 103 23 Stockholm/SWEDEN

© Z. Abidin
Xwençe 1989 Stockholm
Tryckt av Bohusläningens Boktryckeri AB,
Uddevalla 1989

ISBN 91 86146 30 5

**Ji bo şadîya heval û hogirên min ên îşkencexwarî...**

**Zeynel**

**«Eger Kurd hebûna, wê zimanê wan nivîsî bûna**
**Madem ku zarnivîs tune, ev dewletçêkirin çi ye?»**

**(Peyva îşkenceciyan)**

«Gelî Kurdan!
Eger hûn naxwazin ji hev taromar û winda bibin, berî hertiştî zimanê xwe bixwînin bidin xwendin.
Lê eger dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hezkirin, û bi hevaltî û dostanîya miletên din repêş ve herin, û rûmet û bi rûmet û serbilindî bijîn, dîsa zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin.»

(Dr.Nûredîn Zaza)

# AGAHDARÎ!

Sedemê çîroknivîsandina min ev e, ku di her girtineka min de, ji bil îşkenceyên hov û kesnedîtî ku dijminan li min û li peyrewên dozê dikirin, bi deh caran çêr û pêçarî û tan û niçên îşkencekirên Cunta Faşîst a Tirkiyê dihatin rûyê min; ku tiştekî nivîsî yên kurda tune , û ne ew kes in ku doza dewletçêkirinê bikin! Tim û tim ji me re wisa digotin. Bê guman ew peyvên şor û piçûkxistinî li min gelekî tesîr kirin. Ji ber van sedemana, min ev pirtûk nivîsî. Bes ev ew tişt in ku di nav xelkê kurd de, bi zargotinî têne gotin. Piştî ku ez ji ber zordestî û kotekiyên dijmin ji welêt revim, hin bi hin talih û fersenda min çê bû, ez hinek bi xwe ve hatim û li der û dora li nik kurdên kal û pîr gerîyam, wana gotin û min jî, hin nivîsîn û hin ji girtin şirîtê piçtre min wan jî nivîsîn

Ji ber qedexekirina zar û nivîsara kurdî ji alîyê dijminan ve, Gotinên Pêşîyan, çîrok û metelok û leqemok û dîrok û serpêhatîyên gelê me bes bi zargotinî têne gotin, û ji nefşê werdigerin nefşê û didomin. Mixabin di rêça nivîsarê de pir hindik in û kêm in. Her çiqas li gelek welatan li ser rewş û jîyana kurd û Kurdîstanê, nivîsandin û wêne çêbûbin jî, lê belê bi zar û qelema biyanî bûne û em ji wan bê par mane.

Ew mîras û qencîyên bav û kalan ku li paş xwe ji me re hiştine, bi taybetî li hawîdorê Kurdîstanê belav bûne û biyaniyan jî, nemaze xwînmijên Kurdîstanê li wan xweyî derdikevin û ji xwe re dikin serwet. Pêwîst e ku her kurdek di vî warî de tiştên ku jê tê bike û li malên xwe xweyî derkeve, wan berev bike û ji zargotinî bifilitîne. Wê gavê ji bilî çand û edebiyata me ku pê dewlemendtir dibin, gelek bûyerên tarîxî hene ku, bi zargotinî têne gotin, wê li wan ruhnayî jî vebe ûdîyar bibin. Ya herî girîng ev e: Ku di çîrokan de rewşa jîyana kurdan a kevnare û tab û ezîyet

û kotekîyên ku ji destê qata serdest û koledaran dîtine, têne ber çav û beyan dibin! Mesela di yekê de dibêje, ku axakî bageran daye pişta xulamekî xwe û wî şandîye nik axakî din, û ewê din dîsa wî bi bageran şûnde vegerandîye. Ew çûye, hatîye, heta ku ketîye.

Ev pirtûk ji sê pişkan hatîye holê:

## BEŞ 1- GOTINÊN PÊŞIYAN:

Ev gotinên pêşîyan bi piranî ne kifşe ne, ku ji devê kî yan çi kesî hatine gotin. Tevê wan malê gel in, û di Kurdistanê de belav bûne. Çewa ku ji wan tê zanîn, ew her yek li ser tiştekî girîng hatine gotin. Gava ku meriv li ser wan kûr difikire, çi ji alê nebaşî û pîsîtîyê ve û çi jî, ji alê qencî û xweşîyê ve, gelek tiştên rewa di wan de têne xwîyakirin û şevereş û ritaman ji hev cuda dikin. Lê belê gelek ji van, li hin herêmên Kurdistanê cuda cuda, ne wek hev têne gotin. Bes evên di pirtûkê de ku me nivîsîn, bi piranî li navça Kurdistana Bakûr têne gotin. Û me li gor gotina devê xelkê nivîsîn. Hejmara wan di vir deli dor 615 heba ne.Piştî van hinek "xweşbêj" jî hene.

## BEŞ 2- KILAM:

Kilamên di pirtûkê de, tevê wan ên gelêrî ne, ku di nav xelkê me de têne gotin. Di nav xelkê de, «Dîlok, Lawi, Bacî» bi çar awayan têne navdarkirin. Piranîya wan li ser evînê û evîndara ne. Gelekî wan ji devê sê hozanên gelê kurd hatine gotin û ji şirîtê hatine wergerandin. Ew hersê jî ev in: a) Hozan Miradoyê Kerboranî, b) Hozan H, c) Hozan X. Ji wan hersêkan Mirado tenê çûyedilovanîya xwe û yên din dijîn.

Miradoyê bê mirad, çewa ku bi navê «Zengilê Kurdistanê» hatibû navdarkirin, bi miradê xwe şa ne bû û di ciwanîya xwe de ji îşkencan nexweşî girt û pê çû ser heqîya xwe. Ew ji ber denbêjîya xwe ya ku bi zarê kurdî digot, di sala 1981 de, ji alê Cunta Faşîst a Tirkîyê ve hate girtin û li îşkencexaneyên bajarê Sêrtê (Siirt) gelek cûreyên îşkencan yên hov dîtin û nexweşîneke bê eman girt, heta ku pê çû. Hejmara wan di vir de li dor 70 heba ne.

## BEŞ 3- ÇÎROK

Pişka sisîya gelekî wan çîrok in. Hinek ji wan bûyerên tarîxî ne, hinek metelok in, leqemok in, serpêhatî ne û hinek jî pêkenok in. Çewa ku me li pêş jî got, ji ber qedexekirina zar û nivîsarê bi kurdî û cewr û kotekî û xwînmijîya li ser kurd û Kurdistanê, her wiha ew li ser zar û çand û lêteratûra kurdî jî bêhempa bûne û dibin. Ji ber hindê, ew di nav xelkê me

de bes bi devan têne gotin. Xelkê kurd wan nefş bi nefş dispêrin hev û din, û heta îro jî parastina. Hejmara wan di vir de 181 heb in.

Xasma çewa ku ji van nimûne û belge û desîsan jî tê zanîn, nemaze çîrok û metelokên kurdî, dewlemendîya çandeyî, folklorî û dîroka Kurdistanê pêk tînin. Bi taybetî tiştên ku di pirtûkêde ne, ji bilî du-sêkan, tev mal û mirasa kurd û Kurdistanê ne. Lê belê li herêmên cuda yên Kurdistanê, dibe ku bi awayên cure cure bêtne gotin. Û ew yek jî, dewlemendîya çanda me dide xwîyakirin.

Bê guman çîrok û wekî din ên kurdî bi hezaran hene. Bes di herêma ku me gotî de, tiştên ku me ji devê xelkê bihîstibûn, hinek ji bi şirîtê me ji devan girt, ev ji wan pareka hindik bû ku di XWENÇE-1 de haitne nivîsandin. Mixabin wan kesan destûrê nedan ku navê wan beyan bikim. Ez ji wan kesan re û ji wan ên ku emekê wan bi pirtûkê de çêbûne sipasîyên biratî pêşkêş dikim. Qeydekî resmî li nivîsa pirtûkê tune.

Ji ber ku pir devokên cuda tê de hene. Her weha ji alîyê gramatikê û rastnîvîsê ve jî, tê de kêmasî hene. Lê bi umîda ku bibim alîkar ji ziman û çanda kurdî re, min ew nivîsî.

Ez bi umîdim ku wê ev karê mi ê bi kêmukas bi hindki be jî, feydê bide çanda kurdî. Her weha pirtûkxana kurdistanê jî pê dwelemend dibe. 20.08.1987

**Zeynelabidîn Zinar (KAYA)**

# BEŞ I

## GOTINÊN PÊŞIYA
## J tîpê A Heta bi tîpa Z

### - A -

1- Adar e dew li dar e
2- Adarê berf tê gulîyê darê, namine danê êvarê
3- Agirê işqê germ e, dikeve nav hestî û çerm e. Ne dibê fedîye û ne jî şerm e.
4- Agir ku bi dehlê keve, ter û hişk tev dişewite
5- Alimek bi alemekê ye
6- Aqil taca zêrîn e, li serê hemû kesî nîne
7- Aqilê sivik barê giran
8- Aqilê jina di serê nikulê tûtika de ye
9- Av di cîyê nizm re diçe.
10- Av ku di golê de bimîne genî dibe
11- Ava pir, lîçê diteqîne
12- Ava qûna cêr e
13- Ava her kanîyê nayê vexwarin (Qey ava her kanîyê tê vexwarin?)
14- Aşvanî kumê xwe timî bi ar e
15- Aş çirot e
16- Aşê dîna bê av digere
17- Aş çûye hê li, pey çeqçeqokê ketîye
18- Aferîn ji bo wî mêrê baş, ku ne dide pêş û ne jî paş
19- Azana bê wext e
20- Avê ku di ser meriv de avêt,ha bostek ha qamek?
21- Av diçe avayîyan

### - B -

1- Baran tê, xêr û bêr jî pê re
2- Barûd peyda bû, mêranî kuta bû
3- Barê ketî li xwedî ye
4- Bavê kuştîye, ji bo ku bi serê wî sond bixwo
5- Bavê kura ye, lê kurdûnda ye
6- Bavê te siwara kuşt yan peya? Kuştin!
7- Bav bû, lê bû zirbav
8- Bav ji aşê tê, kur qise dike
9- Bayê werzeba, çêtir e ji bav û bira
10- Bazar bazara ewil e

11- Bazar bazara berê, qûş qûşa makerê
12- Bazara ker têde
13- Bese ji derewê te, wê biweşe pûrta laşê te
14- Bertîl kevira nerm dike
15- Berû ji darê daketîye, darê nedîtîye
16- Berxê nêr ji bona kêr
17- Berxê teslîmî gurê kirine
18- Berf tê ku pê bicemide
19- Beza pisîkê, heta kadînê
20- Bez beza hespî ye, siwar dipesine
21- Berxê çê kifş e li ber makê
22- Bereket li ba herekerê ye
23- Bê nan û xwê ye
24- Bêbextî ne karê camêra ye
25- Biçizî niçizî qincilizî
26- Birayê piçûk xulamê malê ye
27- Birîna şûra sax dibe, bira xebera sax nabe
28- Bila bira bî, bila ji gura bî
29- Bi avê re leyiztik nabe
30- Bi xwezîya kes ranayîje baqê kezîya
31- Birîndar bi birîna xwe dizane, hekim çi jê dizane?
32- Bi minê minê, meriv xilas nabe ji destê jinê
33- Bi kerê nikare, dibeze ser kurtan
34- Bihar, bi gulekê nayê (Qey bihar bi gulekê tê?)
35- Bihar e ji kera re
36- Bihar hat qivar çê bûn
37- Bi xeberdanê pez da gura
38- Bi xebera xweşmar ji qulê tê der
39- Bi xêra lawo, xwar helawo
40- Bike kala, bixwe mala
41. Bila bejn bi tît be, bila mal bi çîrt be.
42- Binê zimanê te şil e
43- Bira biratî ye, bazar beyanî ye
44- Bihna dêya tê ji xala
45- Bi roj nalenale, bi şev hespê fal e
46- Bila ew gur bûya, bila ewil kera min bixwara
47- Bila qet neyê qîyamet, ku hat bi xêr û silamet
48- Bila dil bi dil be, bila tûrikê parsê li nava mil be.
49- Bila meriv birçî be, bila namûsa meriv li ci be
50- Bila dilê meriv rihet be, bila xwarina meriv xwelî be

51-Bila meriv ne biçûkê bira be, bila meriv têjikê gura be
52- Bila qûna meriv derkeve, bila navê meriv dernekeve
53- Bila mêrê min law be, bila kirasê min caw be
54- Bila jina mêra be, bila li ber berf û bera be
55. Bila meriv dîkê rojekê be ne mirîşka salekê be
56- Bilind firî nizm daket
57 Biratîya hirçê û rovî ye
58- Bistirê bistirê dengxweşê
59- Bona xatirê gulê, meriv dirîyê têxe paşilê
60- Buhor ku buhor be, bila qe jî kûr be
61- Bûkê ne zar e ne ziman e, xwesîyê ne dîn e, ne îman e
62- Bûk siwarê hespê ye, kes nizane qismetê kê ye
61- Bûye cil ketîye mil
62- Bûk bi dilê zavê ye, çi kula xelkê ye
63- Bû daweta diduwa, agir kete hemûya

## -C-

1- Cewrê dêla tirek nabin e gurêx
2- Cenga cîhan xirav dike mekan
3- Cuwanmêrî karê mêra ye
4- Ciyê ku agir lê neyê dadan, dû ji wir hilnakişe
5- Ciye bav û kala şêrîntir e ji hemî bajara

## -Ç-

1- Çavê li derîya xwelî li serîya
2- Çav xismê xwe dinase
3- Çav ji çavan şerm dike
4- Çavê zer di binê berikê de
5. Çavsorî ji gayê cot re namîne
6- Çewa saq e, gore lîyaq e
7- Çêlekeka rêxoke navê garana gundekî xirav dike
8- Çêleka zer e, şîr dide û gadoşê dirêje
9- Çiqa serî diçe hewa, hewqas dibîne ecêba
10. Çiqa serî dimînê, qûn ecêba dibînê
10- Çi petêxeke xweş heye, di devê kîso (kêsû) de ye
11- Çivîk avê vedixwe, li Xwedê dinihêre
12- Çivîkê gotîye: Ez gepek im, lê beramberî pezek im
12- Çîçika jîr di hêkê de kifş e
13- Çû seferê hat ji seferê hê dîsa kerê berê
14. Çiya diçe ser çiya, xwîyê însan jê nabe cuda

## -D-

1- Dar hê ku ter e dibe gopal
2- Dara belkî, ber nagire
3- Dar bê gêle nabe
4- Dara hişk belg nade
5- Darê tirsê ji cinetê hatîye
6- Dawet firikî berbûrî hetikîn
7- Derba mêra yek e
8- Derew dudilî û bêbawerî ye
9- Derew dijminê xwedê ne
10- Dermanê bixwekirîyan tune ye
11- Derba xalan sahilî ye
13- Derba li hevala, tîra li kendala
12- Dermanê dil sebre
16- Destê ku neyê gezkirin, tê ramûsan
17- Desthilanîn fereca xêrê ye
18- Destê xwarinê dirêj e
19. Destê têr li ser zikê birçî
20. Destê vala deng jê nayê
21. Destîyê bivir ne ji darê be, darê nabire
22. Deng ji erdê tê
23. Dengê defê ji dûr ve xweş e.
24. Dengnekirin zêr e
25. Devê rovî nedigiha tirî, digot tehl e
26. Devê ku ji şîr şewitî be, pifê dew dike
27. Devê lîçê ku vekirî be, av tê de namîne
28. Devê xwar ken lê nayê
29., Devê te tije xwîn be, li ber kesek merêje
30. Devî zû dibine dar, xwelî li merivê bê war
31. Deve ji hophopê hatîye xwar, ew ji hophopê nayê xwar
32. De were vî kerî di vî buhorî re derbas ke
33. Dewlet li serê paşê, tune arvan li aşê
35. Dewxwestin û kodik li pişt qûnê çênabe.
35.Dewê meriv ê ceribandî, çêtir e ji mastê xelkê yê neceri bandî
36. Dê bû, lê bû dêmarî
37. Dê bû damarî, bav bû filê Kavarê
38.- Dêl mexeldayî ye, cewrik dereyîn
39. Dêl ku bi ba be, seg ji Bexdayê tên
40. Dinya bi dor e, rojek tê dora gayê bor e

41. Dinya bi dor e, geh li jêr e, geh li jor e.
42. Dinya dem e, geh petêx e, geh lem e.
43. Dinya ava ye, her kes bi aqilê xwe tê de şa ye
44. Dinya dîtî savar-îdî
45. Dinya me salek e û ne carek e
46. Dilê şikestî nacebirî
47 Dil, miqabilê dil e
48- Dilê tirsoke singa gewre nabîne
49. Dilêşan dil dêşê, xerîban qûn dêşê
50. Dijminê bav û kalan nabin dostê keç û lawan
51. Dijminê lavan, nabe dostê lavan
52. Di firehîyê de her kes kurê bavê xwe ye
53. Di dilê te de tirşikek heye
54. Di ava şilo de masî nayêne girtin
55. Di kur de zirav e, di wir de diqete
56. Di binê berfê de gû nayê veşartin
57. Dijminê çê, çîtir e ji birayê neçê
58- Dinê bi dinê ve, Kaso bi jinê ve
59.- Diz û quz?
60. Diz xwedîyê malê girt!
61. Diz ku ji malê be, ga di kulekê re derdixe
62. Diza ji diza dizî, erd û asîman lerizî
63. Dizê bostana derdikevin zivistana
64. Dixwim nan û avê hilnaynim mineta bavê
65. Dibêje lê napêje
66. Dîtin ez im, nedîtin diz im.
67. Dîtina çavan qinyata dilan
68- Dîwar bi guh in
69 Dost li serîya, dijmin li pîya dinêrin
70. Dolab behs e, teşî reqs e, nexş hewes e
71. Dostê kevin nabe dijmin
72.Dosta kevin wek hespa nînkirîye
73 Du zebeş bi destekî nayên girtin
74. Dudiyan xwe ji Xwedê kir, serê yekî jê kir
75 Dunya pehn e, di rojek de ava nebûye
76. Dûro, binûr o,
77. Dû ji malan ve hildikişe

## -E-

1- Ecel ku hat mecalê nade

2- Ecelê bizinê tê, nanê şivên dixwe
3- Ecelê mûrîyê tê, perê wê çêdibin
4- Elçî bêzewal e
5- Eger zana bibînî, jê re xizmetkari be
6- Eger ketî lepê min, dê tu bibînî hinerê min
7- Eger kolos û çarox nû bin, ji yê din re xem tune
8- Elametê baranê ba ye. Elametê mirinê ta ye
9- (Elametê mirinê ta ye, elametê baranê ba ye)
10- Elîzirto malî ne ava
11- Erda hişk e û ezmanê bilind e
12- Erê me got «Qal û bela» lê ne hewqas bela
13- Erê sinet sinet, lê ne hewqas di bin re?
14- Ev lêlê ye, hê lolo ji pareye
15- Ev çi kevir û kuç li me barîn?
16- Ev hevîr wê hê pir av hilîne
17- Ev genim naserîde
18- Eynik û Eyndar, Bêkend û Minnar, xweştir in ji textê xwedkar
19- Ew çi ye tu diçînî? Ku şîn bû tu yê bibînî!
20- Ewrê sor ê sibê, cot bavê sifê
21- Ewrê sor ê êvarê, cot bavê beyarê
22- Ez bi te, tu bi min, em herdu bi hev
(Ez bi te, tu bi min, em herdu bi Xwedê)

## -Ê-

1- Ê berojkê germ e
2- Ê cêra çêdike, çembilan jî pê ve dike
3- Ê ne ke, naxwe
4- Ê ku dest dike, dê û bav nake
5- Ê kin şeytan in, ê dirêj heywan in
6- Ê ku li duvê xwe nenêre, serê xwe nabîne
7- Ê ku deva xweyî dike, sivdera wî bilind e
8- Ê te can e, qey ê min balican e?
9- Ê gepa hazir e
10- Ê serçiravê sekinîye, ê ser avê nasekine
11- Ê serî dûzan bi ke, li ber tûncikê nakeve
12- Ê sîr û pîvaz nexwe, bîn ji devê wî nayê
13- Ê neke cad, nagihê mirad
14. Ê neke hisêba we bibîne ecêba
15- Ê ji êş tê, kurtanê kerê wî bi ar e

16- Ê xwe bilind ke, wê bikeve (Ê bilind bifire, wê nizm dakeve)
17. Êvarê qûçe, sibe pûçe

## -G-

1- Ga dikeve kêr pir dibin
2- Ga dike qey ga dixwo?
3- Garan ber bi mal bû, bûka malê hê nû şuxulkar bû
4- Gava ku xirab tê, meriv ji yarê dê re dibêje bavo
5- Gayê xweş bi alifê çirot tişt pê nayê
6- Gereke bûk bi dilê zavê be
7- Gereke meriv xwe li hêvîya nanê dawetan û mewlûdan birçi mehêle
8- Gepa mezin devçirên e
9- Gepa mezin xwedîyê xwe dixenêqe
10- Gerîyayî dirîyayî
11- Gelac venaxwin avruwa masî
(Şilqat venaxwin avruwa masî)
12- Girmeqes ku sûk be gaz hê piçûk e
13- Girar bi kevir e
14- Girara pira nekelî ye
15- Gîya di bin keviran de namîne, şîn dibe
16- Gîya li ser koka xwe hêşîn dibe
17- Gîyayê hewşê tehl e
18- Golikê malê ji gayê malê natirse
19- Gotin: Birayê te bû axe. Got: Jina wî bû xatûn
20- Gotinê xav nepêjin li ber tavê
21- Goşt bê hestî nabe
22- Goştê her teyrî nayê xwarin
23- Golika rêxoke navê garanê xirav dike
24- Gotin: Hoste Necar razê mina her car Xwedê yek e delîl hezar
25- Gotin: Tu ji kû yî? Got: Hêj ez ne zewicî me
26- Gul bê qusûr nabe
27- Gurxenêq e
28- Gur li kur mir?
29- Gûz weşîn e tov reşîn e
30- Gûyê hişk bi meriv ve nazeliqe

## -H-

1- Hat ji newalê bû xwedîyê malê
2- Hat ji binîya mala, ket pêşîya hevala

3- Ha di ûr de, ha di tûr de?
4- Ha li Mûşê, ha li pişt dergûşê
5- Hayê bi min hayê, hevrîşim hatîye ber li bayê, dilê xwedîyê li bayê hêj li ber nayê!
6- Herçî zirtonek in, tirsonek in
7- Her pêxemberî dia li nefsa xwe kirîye
8- Her kes şivanê mala xwe ye
9- Her teyrek bi refê xwe re ye
10- Her dîk li serê sergoyê xwe bang dide
11- Her hevrazek berjêrek li ber e
12- Her ziman yek însan
13- Her tişt bi ziravî dişkê, meriv bi sitûrî dişkê
14- Herçi zane ji xwe dizane, herçî nezan e, rast e mese baqê nîskan e
15- Heta ji cîrana re çêlek nexwazî ji xwe re golik nexwaze
16- Hemd ji Xwedê re rûnekî ji axê ye
17- Hekim e, ji birînên xwe hînî hekîmtîyê bûye
18- Hemşo hat bi rewşê ve
19- Heta mirînê, çav li kirinê
20- Heta seg hestîya nekoje, tav serîya nasoje
21- Heta dilê dê nekevê, qîzê nadê
22- Heft bavê mêranîyê hene, yek jê rev e
23- Heftê têra kayê ne
24- Heft hevring li ser palasekê bi avê da çûn
25- Heft xesû xeniqandin, hê ji qulequla cêr ditirse
26- Heft bavê çê, lê şîrê dê
27- Hem zîyaret hem tîcaret
28- Henek dibine dargenek
29- Heyfa mêra li erdê namîne
30- Heyfa bizina kol, ji bizina bi qiloç re namîne
31- Hewara savarê ye
32- Hewce li elbê digere, elb hewce nagere
33- Hezar car bipîve, carekê bibre
34- Hesin ku neşixule, zergarî dibe
35- Hesp tune ye, afir çêdike,
36- Hespa çê, êmê xwe zêde dike
37- Hespa çê, şiv li xwe naxe
38- Hesp û sîlah namûs in
39- Hespê çê, bila bê nal be
40- Hespê fisqule, tirkê du rûle, seyê tûle, li wan mebe ewle!
41- Heval hevalê berê, qûş qûşa makerê

42- Hevalê xirab eger neşît sotin, reşit dike
43- Hê ji çem dûr e, dawdelingê xwe hildide
44- Hêstir bizê axirzeman e
(Hêstir ku bizê, qey axirzeman e?)
45- Hê ku dernebûye bikewîne
46- Hirç neyar e, car hêk dike car têjik dike
47- Hirç û govend?
48- Hingivê dobê ye, di eyarê segê ye
49- Hinek li mirinê, hinek li pêvekirinê
50- Hinek tirî dixwin, moz bi hineka vedidin
51- Hilindir milindir, kur ji bavê bilintir
52- Hînkira hîn meke, ku te hîn kir wan ji bîr meke

## -Î-

1- Înkar kela mêra ye
2- Însanê sereş, şîrê hîç xwarîye
(Însan şîrê xav vexwarîye)
3- Îtbara hespê, avê û jinê tune
4- Îş ker e, ku tu bajoy wê here, tu najoyî nare!
5- Îşa bike bi esas, da ku dilê te ne ke pasewas
6- Îtbara Romîyan tune

## -J-

1- Jana pêçîya da kezebê
2- Jê ketê pê ketê
3- Ji bo xatirê gulê, meriv dirî dixe paşilê
4- Ji bo xatirê xweyî, meriv kevira navêje segî
5- Ji borborê re ê wele, ji cotê re nê wile
6- Ji bo her derdî dermanek heye
7- Ji ava mista, ramûsanê dosta, merî nabe westa
8- Ji tiralan wetirê tavehîv sibe ye
9- Jina bêxwedî har dibe, mêrê mêrê bêxwedî jar dibe
10- Jin çûn hewarê, mêr ketin kewarê
11- Jina çê, mêr radike
12- Jin û mêr, tevr û bêr
13- Jina sermezin a pêbiçûk, xwezî li wê malê ku dibe bûk
14- Jina xirab, ne tê kuştin û ne tê berdan
15. Jina jin gotî, mêra mêr gotî.

16. Jin kela mêra ye
17. Jin ku bixwaze mêr ezîz jî, rezîl jî dike
18. Jin jî heye jinkok jî heye
18- Ji berfê sipîtir tişt tune, û ker û kûçik li ser dirîn
19- Ji devê hatîye xwar, ji hophopê nayêt xwar
20- Ji garanê hemî, di kera xwe niya
21- Ji hin kesa re edet e, qey ji mere qehet e?
22- Ji hineka xwîn diçe, qey ji hineka av diçe?
23- Ji ava nerm bitirse
24- Ji tira bavê xwe der e
25- Ji biçûkan xeta, ji mezinan efû
26- Ji kerê re dehşik çêbû, got: Êmê min kêm bû û barê min zêde bû.
27- Ji sifikê çûye ber tifikê.
Ji xelkê re kew gir e, ji xwe re kêşûgir e.
28- Ji xwarinê re xal û xwarzî, ji kuştinêre ap û birazî
29- Ji piran pir diçe, ji hindikan hindik diçe
30- Ji komê gorgîs hilanî
31- Ji arê garis patîle çênabe

## -K-

1- Ka ne ya te ye, lê kadîn jî ne ya te ye?
2- Kanîya ku te av jê vexwar, kevira navêjê
3- Kanîya esîl, di havînê de ava wê hênik e
4- Kalo ji bênefsî, pîrê ji bêkesî, li halê hev pirsîn
5- Kanîya mêra ye
6- Kanûn e, berf tê bi qanûn e
7- Kanûn, sibatê deyn kir, giskê di sergo werkir
8- Karê gavana, kutana kera ye
9- Ker kû tesewir ke sira di dûrebînê de
10- Kerê xwe qenc girêde, cîranê xwe diz dermexe
11- Ker ku ket, xweyi bi qisûr e
12- Ker ku bikeve, qemçik li xweyî ye
13- Kero nemire, heya qîvar çêdibin
14. Kerên guhsist tirên şidîyayî dikin.
15. Kerê reş û gayê sor, ma li berhev dibin bi dor?
16. Ker ku ker e, li ciyek dikeve, hew di wêra dihere
17. Kêr gihaşte hestî
18 Kêsûyê kendala, xwe kirin hevalê xezala
19.- Kew neyarê qewmê xwe ye

20- Kew li dar ket
21- Kew li ber kewa dixwîne
22- Kewê çê, kifş e li qefesê
23- Kesê birçî, her nan li bîr e
24- Kesê nanê meriv nexwe, nîyetxirab e
26- Kes nabêje dewê min tirş e
27- Keçel bi perê xwe helawê dixwe
28- Keçelê got: Porê qîza xatîka min digîje panîyê
29- Kenê bêara, tê ji qulê dîwara
30- Kebanî (kevanî) tim bê par e
31- Kebanî, ya melûn e yan jî mehrûm e
32- Kedkirê xwe, şêrînê dilê xelkê
33- Kedkiro jê nexwero
34- Kedkiro ji mala Qasê re
35- Kes bi xwezîya, ranayîje baqê kezîya
36- Kesadî dike fesadî
37- Kerê bi heft soberî (ajnê) dizanîya, dema giha ber çem teva jibir kir
38- Kevirê giran xweşe di ciyê xwe de
39- Kevir û kuç bi guh in
40- Kevir û kuçên havînê, bavêjine kadînê
41- Kevirê mezin elametê nelêdanê ye
42- Keviran navêjine kûçikan bo ku nereyîn
43. Kela şîr zû difûre
44. Kî şoşban e ew poşman e
45. Kî kir? kî kir? sêwîyê bê dêdû bav kir!
46. Kî bi wefa ye, ew bav û bira ye
47. Kî xwarîye savarê, bila ew here hewarê
48- Kî here masîyan wê qûna wî şil bibe
49- Kî têkeve govendê, wê qûna xwe li ba ke
50- Kî paqa dê bigire, qey ew bav e?
51- Kî ne li mal e, jina wî berdaye
52- Kî ne li şer e, şêr e
53- Kî ne di warekî, ne bi halekî
54- Kî tê, dike pirsa dê, kes nake pirsa bavê
54- Kî xeberde wê golikê bive avê
55- Kîrê ku ranebe, bi mizdanê xêr tune
56- Kîrê bavê naçe kulfika kewarê
57- Kî çi bivê wî divê
58- Kor nahs in, keçel bahs in

59. Kor korê xwedê ne, nivkor bela dinê ne
60. Konê reş warê xweş
61 Koç li mala pîrê, pir jî li mala xelkê
62. Koç li mala Fatê, Fatê jî li civatê
61- Ku agir bê dadan, wê dû hilkişe
62- Ku tu bidîyêyî wê bide te
63- Ku pîr bi desmêj be, qereçarşem pir in
64- Ku sêv li darê be, her kes çoyê xwe davêjê
65- Ku def lêkeve, govendgêr pir in
66- Ku tu xwelîyê li xwe kî qenim bila germ be
67- Kurmê darê ne ji darê be, zewala darê tune
68. Kurmê şîrî, heta pîrî
69- Kurîya kerê li ber dîya xwe dibeze
70.- Kurd xwarinê dixwun, li pêlava xwe dinêrin
71. Kund û baz qey bira ne?
72. Kur be, bila kurr be
73. Kuro bihin ke, ya par min jê kir, bi bihin bû
74- Kula pîrê pelor e
75- Ku mezin di malê de tune be, kevirekî deynine quncik
76- Kûçikê malê nareyî xwedîyê malê
77- Kûçikê pir bi reyî, bi kesî nagire
78- Kûçikê xirab, gur tîne
79- Kûçik jî goştê kûçik nexwe
80- Kûzê avê, li rîya avê dişike

## -L-

1- Law radibe darê bavê digire, qîz radibe teşîya dê digire
2. Lêv ji diranan pêşvetir in
3- Li derê kî xî, wê li yê te ke ve
4- Li dê mêzeke, hêj qîzê bigire
5- Li her bajar û gundî malek ava ke
6- Li heyfa dê gerîya, qûna bavê jî li ser danî
7- Li guharan jî, pîj bi feqîran ve diçin
8- Li me şape rabû
9- Li min jan e, li te çi sikran e?
10- Lingê xwe li gor berika bavê xwe dirêj bike
11. (Gere meriv lingê xwe li gor lehêfa xwe dirêj bike)
12. Li dinê mekan, li axretê îman
13- Li pey tengasîyan fireyî ne

14- Li pey zivistanê, bihar e
15- Lika her kesek li ser lêva wî şêrîn e.

## -M-

1- Mal neke ji kurê çê û xirab re
2. Mal e li Memika, baneyî li Şemika
3- Malxweyê min ku lolo be, wê xwarina min çilo be
4- Mala pîrê, gora pîrê
5- Mala mêra kanîya zêra
6- Mala zêra xira dibe, mala mêra xira nabe
7- Mala mirtivan bi seknê xira dibe
8- Malê axê diçe, canê xulaman dêşe
9- Malê hêvişandî ne ji xwedîyê xwe re ye
10- Mala bûkê def û zirne, mala zanê hay jê tune
11- Mala bavê ku dûr bûya, wê pesnê wan bidaya
12- Malek ji gund diçe, cî fire dibe
13- Malê reş, ji bo roja reş
14- Mam Remezan tu mayî û xeberdan
15- Mam Remezan, me ga û golik bi der dan, em mane wisan
16- Mange ku ne bi ga be, ga bi dû nakevin
17- Manîya tireka nanê ceyîn e
18- Mar bê jehrî nabe
19- Mar ji serî ve tê kuştin
20- Mar bi birîna xwe dizane
21- Mar ji pûngê aciz e, pûng di devê qula wî de hêşîn dibe
22- Mast ji şîr çêdibe
23- Masti sipartîye pisîkê
24- Masî di golan de gir dibin
25- Masî ji serî ve genî dibe
26- Masî di avê de nayê bazarkirin
27- Meriv ji çi direve, tê digere
28- Meriv pişta xwe ku ne bi destê xwe bixwurîne,
xêra xwurandina bi destê xelkê tune
29 Meriv bikute dehşika neyarê xwe jî, xweş e
30- Meriv ji yarê dê ra dibêje bavo
31- Meriv ji hespê hevalan zû peya dibe
32. Meriv diz be, şevereş pir jin.
33- Meriv diz be jî, dizekî bi însaf
34- Meriv dikuje jî, laş xirav nake

35. Meriv ku ji lingan şeqitî xwe digere, lê ku bi ziman sihitî meriv xwe nagire
36- Merivên hev, mêrxwirên hev
37- Me ji vê zîyaretê nedî tu keramet
38- Mehbûb ew e, ku dil hebandî
39- Mezin li mala, zarûk li bana
40- Meriv bêheval na be, hevalê xirab ezab e
41. Melûwa xwe bi kevir kir
42- Mêrê çê roja xirab kifş e
43. Mêrê bêxêr timî şer dixwaze
44.- Mêr mêra nas dike, kurtan kera nas dike
45 Mêr ew e qitikê tehl bixwe, yê şêrîn herkes dixwe
46- Mêrê bê kes, nazewice
47- Mêrê çê bi simbêl e
48. Mêrê çê wek çiyayê asê
49- Mêr dimire nav dimîne, ga dimire çerm dimîne
50- Mêr kanî be, jin lîç e
51- Mêr ketine kewarê, jin çûne hewarê
52- Mêşê ji nav dew dertêxe û dimisîne
53- Mêrik li jina xwe bi manîyan bû, digotê;
54. Gava hevir dikî, tu qûna xwe dihejînî
55- Mirin heye veger tune ye
56. Mirin mirin e, xir xir çi kîrê e min e
57- Mirin hebî, kalbûn tunebî
58- Mirin xweştir e ji feqîrtîyê
59- Mirî ku ne mel'ûn be, gor lê teng nabe
60- Mirî ku dimire, qûnzêrîn dibe
61- Mîr nareve, qey evdal jî nareve?
62- Mîrê min heliz borî
63- Mirîşk di xewna xwe de garis dibîne
64- Mirîşk avê vedixwe, li Xwedê dinêre
65- Mirîşk heta serê sergo difire
66- Min kirin dizê sola min
67. Min ji vî ewren bawere ku baran jê bibare
68. Mişkê qulê dîwara bî guh in
70- Mî bi lingê xwe, bizin bi lingê xwe, her kes bi kar û emelê xwe.
71- Milk û aş, alet û simtiraş, meriv nadine paş.
72- Morîya qul, bi etarokan re namîne

## -N-

1- Nan bide nanpêja bila yek zêde be
2- Nanê Îsa dixwo, selewatan li Mûsa dide
3- Nanê axê diçe, canê xulam dêşe
4- Nanê Romîyan li ser çoka wan e
5- Nanê mêra li mêra bi deyn e
6- Nanê xwe bide û serê xwe bişikêne
7- Nanê xwe ji ber dasa xwe derxe
8- Navê gur, bi bextreşî derketîye
9- Ne adar e, ne nîsan e, roja Feqîyê Teyran e
10.- Ne malê pir, ne sitûwê qalind
11- Nebînî ezîyet tu naxwî nimet
12- Ne xar e, ne kap e, ez pêşik im
13. Ne xeşû ye bikuje, ne golike lê bimije
14- Ne gur dibînim, ne «Qulhuwela» dixwînim
15. Nerêne li komê, birêne li domê
16. Ne sîr e, ne pîvaz e, qeda li dermanê germ bikeve
17. Nefs her kes, cil ne her kes
18- Nefs babet e, cil nobet e
19- Newal xalî be, rovî walî ye
20- Neyarê neyarê meriv, dostê meriv e
21- Neyartî nerm û nerm, merivatî germ û germ
22- Neyar kermêş be jî, hisabê wî heye
23- Nîv melan dîn bi der dan, nîv hekîman can bi der dan
24- Nivişta bê tişt çewa xweyîyê xwe nekuşt
25- Nikare bi kerê, bazdide ser kurtan

## -P-

1- Pesindayo lixwarmayo
2- Peyva dosta, tehl e
3- Pêxemberan jî, pêşî dia li xwe kirine
4- Pêlava ku ji meriv re ne be, merî dide hevalê xwe
5- Pênc qirûşe kûçik hebûn berfê kirî
6- Piranî, mêranîyê betal kir
7. Pirsa xwe bi teyrê kirr kir xem û xeyalê xwe pir kir
8- Pisîka malê, ji kûçikê malê natirse
9- Pisîk ku ne li mal be, navê mişk Evdirehman e
10.Pişta xwe yan bide mêrekî zexm, yan jî zinarekî asê.

-11. Pîr ku bi desmêj be, wê în were
12 Pîr bi ganekî nabe qehbik
13- Pîra pey şixrê ye
14- Pîrê bawer nedikir ku mêr ke, ku mêr kir, dawa heftek û heştekan kir
13- Pîvaz pîvaz e, çi sor e, çi sipî ye
14- Poça segê têkeve qalib, gava derê li nava mil e.

## -Q-

1- Qedrê gulê çi zanit? Kerbeş divêkerê reş! (Melê Cizîrî\0)
2- Qedrê zêr, zêrker dizane
3- Qey gavan ene însan e?
4- Qey Libûdî ne mêr in?
5- Qey Xî ne mêr in?
6- Qencî jî ya te ye, xirabî jî ya te ye
7- Qencî qencîyê dikişîne, xirabî jî xirabîyê...
8- Qereçîyê nabe xatûn
9- Qîymeta zêr, zêrker dizane
10- Qîyasa teşkê li meşkê dike
11- Qîyasa nefsê, mîzana edaletê
12- Qûna tazî, tenbûr dixwazî
13. Qûna elimî tira, rûnanê li ser tu bera

## -R-

1- Rastî, êminahî û dilrihetî ye!
2- Rast be weka mar
3- Rastî tehl e
4- Rê ku rê be, bila qe dûr be
5- Rewşa hêlik pilik e
6- Rim di têrêde nayê veşartin
7- Rih di cîyê kûr de ye
8- Ritilê te bila li gor tixtên te bin
9- Rovîya ristê ye
10- Rovî û sûk?
11- Ro bi ro xwezî bi do
12- Roja xweş ji sibê ve kifş e
13- Rovîyekî gerîyayî, çêtir e ji ûêrekî negerîyayî
14- Rovîya rê birîye, gura nav derketîye
15- Rovîyê xasûk, bi herdu lingan dikeve faqê
16- Rovî nediçû qulê, hej bi dûvê xwe ve girêda

17- Rû û simbêlan kur kir kirîye û neynik jî daye berê
18- Rû dibe bost, neyar nabe dost
19- Rû li dîk danî, hêk jê deranî

## -S-

1- Sal bi sal xwezî bi par
2- Sal xirab e, xelaya mêra ye
3- Sed şertê mêrantîyê hene, notuneh jê rev e
4- Seg nareyîne pîrekan
5- Serbirrîn nayê kirrîn
6- Serê du berana di beroşekê de nakele
7- Sêv li darê ye, her kes çav lê ye
8- Serkêşîya karwanê devan ker e
9- Serê bê ecel, naçite gorê
10- Serê ne êşe, çima wê meriv girêde
11- Ser al e, qûnbaşewal e
12- Sergirtî qûnberdayî
13- Serê kêrê û zikê zebeş
14- Seravê zane binavê çi xwarîye
15- Sêwî li dîyara diçin, darpembûk bi wan ve diçin
16- Sêzdeyê hezîranê, garisê ewilî ye
17. Sibatê kûçik xwe davêje ber siya latê
18- Sibe tê xêr pêre
19- Silav li qewetê ye
20- Silav li gepa hazir e
21- Silav li sênîya savarê ye
22- Sibat e berf tê bi gulate, nagire tu binyat e
23- Sitar navekî Xwedê ye
24- Sîr ji pîvazê gazin dike
25- Sotin nayê gotin

## -Ş-

1- Şam şekir e, lê welat şêrîntir e
2- Şam dûr e, qey mişar jî dûre?
3- Şahîno şa ye û Yaqûbo jî axa ye
4- Şadê rovî dûvê rovî
5- Şertê îslamê bûne şeş, limêj, rojî, hec zekat, kelîma şadetê û tivingeka birno tevî du rext fîşek ve.
6- Şerê gundîyan li ser kirê ratizîyan
7- Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e!
8- Şêro bi lepê xwe

9- Şêr digre, rovî dipesine
10- Şivan dil bike wê nêrî bidoşe
11- Şilî şahî ye
12- Şikestîye lewra ku xwar cibirîye
13- Şikirbûnê li gepa pêşî bike, hê ya dawî hazir bike
14- Şikestin dicebire, serşikestin nacebire
15- Şîrê şêr, di eyarê şêr, şêr tîne û dibe
16- Şîn jî ya me ye, şahî jî ye me ye
17- Şûr di destê mêra de disincire
18- Şûrê qetlê bi destê te, rehma Xwedê li dilê te
19- Şûjina çavê xwe nabîne, derzîya çavê hevalê xwe dibîne

## -T-

1- Tajîyê ku bi zor here nêçîrê, wê çi nêçîr bike?
2- Tayek bê kişandin, wê hezar pîne jê daweşin
3- Tengayî bi sermêran ve tê
4- Tev dizê qulekê ne
5- Tevdan ne baş e, lê ji helîsê re baş e
6- Teyrê goştxwir nikulkêr e
7- Tê sotin lê nayê gotin
8- Têjikên mar bê jehrî nabin
9. Têra hay ji birçîyo tune.
10- Têrgan bû, hê poşman bû
11- Tivinga vala xwedîyê xwe dikuje
12- Tir li kur, das li ku?
13- Tirs qederê betal nake
14- Timayî, gû bi xwedîyê xwe dide xwarin
15- Timayî, kîmayî ye
16- Tiştê ku çû mede dû, tiştê ku bê guh bidê
17- Tira xwe dixe nav şalê hevalê xwe
18. Tunebûn mêrê çê dixe binê erdê
19- Tu nekî hisêba, tu yê bibînî ecêba
20- Tu çi biçînî tu yê wî biçinî
21- Tovê belkî şîn nabe

## -V-

1- Vaye aş û ha veye çirika êş
2- Vaye hirç, dibê vaye rêç
3- Vireka xwe bike û şahidekî xwe bîne

## -W-

1- Wextê neçîrê guyê tajî tê
2- Weke qurqur begê ye
3- Werîs bûyawê çi deng bida

## -X-

1- Xal xwarzîya radikin, ap birazîya wenda dikin
2- Xaçê her kesî di binçenga wî de ye
3- Xebat şêr e, bi destavêtinê re dibe rovî
4. Xema salekî îşê qasekî
5- Xewa mirîyan tê, xewa birçîyan nayê
6- Xebera reş zû belav dibe
7- Xeta xwar ji gayê pîr e
8- Xezeba li ber dilê dîya te, çewa ku tu jî mayî
9- Xeberdanê êvara, dikevin qulê dîwara
10- a) Xeberdan tehl e
   b) Xeberdan şor e
   c) Xeberdan şêrîn e
11- Xêr û xweşî li xelkê barîyan, kevir û kwuçik li me barîyan
12- Xêravkirin rihet e, avakirin zehmet e
13- Xiretê avêtin ber sa, wan jî neva
14- Xwedîyê mirî kor e
15- Xwedan sinet e, xwey meslîhet e
   (Xwedan sinet, kar e)
16- Xweş xeber e lê min ne bawere
17- Xweş newroz e, ecêb pîroz e
18- Xwedîyê sebrê, melikê Misrê
19- Xwîn nabe av (Qey xwîn dibe av?)
20. Xwîna xwortan dikele
21 Xwîn bi xwînê, nayê şuştin
22. Xwedê yekî avêt cinetê, got lê mala min?
23- Xwedê çîya dibîneû berfê lê dibarîne
24- Xwedê goşt daye merivê bê diran
25- Xweyî kir bi malê xwe, kire agir û berda canê xwe
26- Xwezîya ew gur bûya, bila kera min bixwara

## -Y-

1- Yekbûn gira dixîne
2- Yek ban e, du zozan e
3- Yek mal e, diwazde malxwê ne

4. Yek bi yekî e, dido bi xwesi yo
5- Yek bi hezaro, hezar ne bi yekî yo
6. Yek bêje eferim, kêlek xwê dixwo
7. Yek yek e, dido jî zêde ne
8. Yek yek e, dido alemek e
9. Yê ku dixwaze rû yekî wî reş e, yê ku nade herdu rûyên wî reş in
10. Yê ku ji xelkê re çal bikole, ew dikevê.

## -Z-

1- Zarûk fêkîyên mala ne
2- Zarûk gula baxça ne
3- Zana jixwe dizane, yê nizane ker e, dibê Cegerxwîn kafir e
4- Zavê malê, kerê malê
5- Zahf in, bêmaf in
6- Zêr zane, xor zane? devê tivinga mor zane!
7- Zimanê xweş, mar ji qulê derdixe
8- Zimanê xwe biparêze
9- Ziman bê hestî ye
10- Zibare li her tiştî baş e, li hêkerûnê ne baş e
11- Zikê têr hay ji yê birçî tune
12- Zînê mihînê li bizinê kirîye
13- Zîyafeta quling û rovî ye
14- Zîp û zîpedar, ger bibar xweş bihar, ger nebar sermadar

## XWEŞBÊJ

Heçî bisilman man û man
Heçî êzîdî ne
Cilsipî ne
Hemû cinetî ne.

Dîwar ji nemê dikevin
Meriv ji xemê dikevin

Mîya reş û berxa reş li berê
Li nêv şûva reş, di şeva reş de
Wenda bûne, wê xwedî çewa bibîne?

Bavê te serê xwe dişikênand
Hêj ewî bêşa xwe dida!

Ma tu ne kurê wî bavî yî?
Ji pisîkê re gotin: Guyê te dermane!
Încar ewê çû guyê xwe dibin xwelîyê de veşart!

Ji kewê re gotin: Çima çîpên te sor in?
Got: Ji berfê ye! Gotinê, di reşîyê de jî me te dîye, tu wiha bûyî!

Yara kevn wek hespa zînkirî her tim hazir e

Şalê te şalwarê te, zavê mala xalê te ku were mala te
Dê tu çi bidîyê? (Ez bi xwe dîya xwe nadimê!)
Gava nan heye dew tune ye, gava dew hebe nan tune ye
gava ku herdu hebin ez ne li mal in!

Kerek li cîyekî mîz dike, yên din tev li wir dimîzin!

Eger derdê te têrxwarina tirî be, ma kuştina rezvan çi hewceye?

Xebera ku derkeve ji nav sî û sê diranan
Bê guman ew digijê heta sî û sê insanan

Dîzikê got: Binê min zêrîn e
Heskê gotê: Ma ez ji kû têm?

Dijminê te ege mêşek be jî li kutekê, tu
hisabê wî bike!
Qemçika tawê bi destê min bû
Çavê her kesî li destê min bû
Gava qemçika tawê çû ji dest
Rûmeta min çû û bûme bindest
Gava ku ez can bûm, wek melhema dilan bûm
Gava ku ez bûme pîr, min kirin notirvanê girikên hevir

Agirê ku bi serê min ketîye, xelq jî hê tê firîkên xwe tê de diqelînin

Ji beqê re gotin, tuk li rûwê te!
Beqê got: Ahah! Rûwê min ji ava behrê şilnabe, ma wê bi tûkê şil bibe?
Kêlomisaso xweyî jê xilaso!

# ŞÎRET Û NESÎHET

Ayîn (ol) amûjgarî (nesîhet) ye
Dûa çekê bawerhiner (mu'min) e

Lixwetirsîn perestin e

Hemû tan şivan in û hemû tan pirsraw in
Meriv ber pirsyarê ehlê xwe ye

Rastbêjtirînê we têgehêjtirînê we ne

Baştirînê xweperestinê nihnî ye

Baştirînê marbirînê erzanî ye

Her gunahik jê repadaştî (ceza) heye

## BEŞ 2

## CANÊ

*Canê canê canê lê kinikê bêrîvanê*
*Canê canê canê lê esmerê ji mala hanê*
*Canê canê canê lê wey canê canê canê*
*Karwanê Kûrîya lê hat karwanê Kûrîya*
*Danîn ser vî çavlika lê*
*Danîn ser vî çavlika*
*Te ez kuştim ez helandim lê*
*Kirim sêvê bibika*
*Te ez kuştim ez helandim lê*
*Kirim ardê çîkika*
*Canê canê canê lê canê canê canê*
*Canê canê canê lê wey canê canê canê*

*(Ev beşa li jor du caran tê gotin)*
*Canê canê canê lê wey canê canê canê*
*Kinikê bêrîvanê lê esmerê ji mala hanê*
*Desmala ser destanê lê*
*Desmala ser destanê*
*Xatrê kurda nizanê lê*
*Herdu çavan rijyanê*
*Canêêê canêêê lê canê canê canê*
*Canêêê canêêê wey canê canê canê*

*Canê canê canê lê kinikê bêrivanê*
*Canê canê canê lê esmerê ji mala hanê*
*Canê canê canê lê wey canê canê canê*
*Karwanê Kûrîya lê hat karwanê Kûrîya*
*Danîn ser vî çavlika lê*
*Danîn ser vî çavlika*
*Teez kuştim ez helandim lê*
*Kirim sêvê bibika*
*Te ez kuştim ez helandim lê*
*Kirim ardê tûtika*
*Canêêê canêêê lê canê canê canê*
*Canê canê canê wey canê canê canê*

*Canê canê canê wey canê canê canê*
*Kinikê bêrîvanê esmerê ji mala hanê*
*Desmala ser destanê lê*
*Desmala ser destanê*
*Xatrê kurda nizanê lê*
*Herdu çavan rijyanê*
*Canêêê canêêê lê canê canê canê*
*Canêêê canêêê wey canê canê canê*

*Hat kerwanê Kûrîya lê hat karwanê Kûrîya*
*Danîn ser vî çavlika lê*
*Danîn ser vî çavlika*
*Te ez kuştim ez helandim lê*
*Kirim sêvê bîbika*
*Te ez kuştim ez helandim lê*
*Kirim ardê vivîka*
*Canêêê canêêê way canê canê canê canê*
*Canêêê canêêê wey canê canê canê*

*Canê bimeş lê wey canê bimeş bimeş*
*Xulama wan çavê reş lê heyrana wan çavê reş*
*Xwezî bavê te bimra*
*Serê te ji min ra bima xweş*
*Xwezî bavê te bimra lê*
*Serê te ji min ra bima xweş*
*Canêêê canêêê wey canê canê canê*
*Canêêê lê caaanê wey canê canê canê*

*Dinya çerx û felek e lê dinya çerx û felek e*
*Heçî bi dil zewicî lê neh ro dizî ji felekê*
*Heçî bê dil zewicî lê ket gola gerînekê*
*Canêêê canêêê lê canê canê canê*
*Canê canê canê lê kinikê bêrîvanê*
*Canê canê canê lê esmerê jimala hanê*
*Canêêê lê canêêê wey canê canê canê*

# KUNDIRO

*He he heeeeeeeeey.....*
*Kundiro weyla kundiro*
*Kundiro weyla kundiro*
*Ji grê Qîjo pur mestiro*
*Ji grê Qîjo pur mestiro*
*Ji Dêrikê serberjêrtiro*
*Ji Dêrîkê serberjêrtiro*
*Ji kuçê Mêrdin purtengtiro*
*Wayweylê kundirê mîranî*

*Kundirê avya ewil e*
*Kundirê avya ewil e*
*Kirin qamyona û trêla*
*Kirin qamyona û trêla*
*Hingî heşaro mezin bû*
*Tekrê wan diteqandin*
*Serîli şifêra digerandin*
*Waweylê kundirê mîrnaî*

*Wan sibê kundir diçandin*
*Wan sibê kundir diçandin*
*Êvarê kundir şeqandin*
*Qareqarê xweş weşandin*
*Qareqarê wan hindik bû*
*Hevdu li mahkema gerandin*
*Waweylê kundirê mîranî*

*Kundirê avya bitenê*
*Kundirê avya bitenê*
*Şaxê kundir çûn Edenê*
*Şaxê kundir çûn Edenê*
*Mi kêrek li kundir dixist*
*Şîqîna wî çû Yemenê*
*Wayeylê kundirê mîranî*

*Kundiro weyla kundirooo*
*Kundiro weyla kundiro*
*Ji Demîrel purgurîtiro*
*Ji Ecewît malvirektiro*

*Ji Tirkeş fesadçîtiro*
*Wawelê kundrê mîranî*
*Wawelê kundirê mîranî*

*Kundiro weyla kundirooo*
*Kundiro weyla kundiro*
*Ji girê Qîjo mestiro*
*Ji girê Qîjo mestiro*
*Ji mêrdîn serberjêrtiro*
*Ji hemalê wê zengintiro*
*Ji kuçê wê purtengtiro*
*Waweylê kundirê mîranî*

# NAYÊ HA NAYÊ

*Nayêêê ha nayêêê ha nayê hema nayê*
*Nayêêê ha nayêêê ha nayê ha nayê*
*Xezala li serê çîya yê*
*Şêrîna eslê xwe vayê*
*Ji vir çû ka xwe vayê*
*Sebra min bê te nayê*
*Lê Xezal çima tu nayê?*

*Nayêêê ha nayêêê*
*Ha nayê ha nayê*
*Piçşkê Xwedê da yê*
*Delalê Xwedê da yê*
*Xezalyam çira nayê?*
*Bi vê-biçûka xwe ha yê*
*Sebra min bê te nayê*
*Lê xezal çima tu nayê?*

*Nayêêê ha nayêêê ha nayê ha nayê*
*Nayêêê ha nayêêê ha naytê kevan dayê*
*Nayê kevan dayê*
*Sedhezar qelen dayê*
*Du hezar derî dayê*
*Sî hezar xelat dayê*
*Heqê we li me nemayê*

*Heqê we li me nenayê*
*Lê Xezal çima tu nayê?*

# KA BID ME BÛKA ME

*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid meee bûka me*
*ka bid me ka bid me*
*Ka bid me dellala me*
*Ka bid me ka bid me lê*
*Ka bid me lê bûka me*
*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me kevvanya me*

*Nadim we nadim we*
*Nadim we lê bûka we*
*Nadim we nadim we*
*Nadim we lê bûka we*
*Ka bid em ka bid me*
*Ka bid me dellala me*
*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me xezala me*

*Me da we qaf û qor*
*Me ji we stend zeya kor*
*Me da we qaf û qor*
*Me ji we stend zeya kor*
*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me lê bûka me*
*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me dellala me*
*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me Xezzala me*

*Me da we arvanê salê*
*Me ji we stend kevvanya malê*
*Me da we arvanê salê*
*Me ji we stend kevvanya malê*
*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me bûka me*

*Ka bid me ka bid me*
*Ka bid me dellala me*

*Ka bid me ka bid me*
*Nadim we nadim we*
*Ka bid me ka bid me*
*Nadim we nadim we*
*Ka bid me bûka me lê*
*Nadim we bûka we*

## LÊ GIDYÊ

*Lê kinê lêêê lê mala minê way way*
*Way lê kinê lêêê lê bermalya minê way way*
*(Ev herdu tekrar dibin)*

*Ne kin im lêêê lê*
*Ne dirêj im way way*
*We ez ne kin im lê kinê*
*Ne dirêj im way way*
*Tak rihan im lêêê lê*
*Şax davêjim way way*
*Tak rihan im lêêê lê*
*Şax davêjim way way*

*Dosta lawkê lêêê kinê*
*Xwey dengvêj im way way*
*Dosta lawkê lêê salê*
*Xwey dengvêj im way way*
*Aqlê xorta digrim way*
*Û jê devêjim way way*
*Aqlê xorta lê kinê*
*Jê davêjim way way*
*Lê kinê lêêê lê*
*Mala minê way way*
*Weyla kinê lêêê lê*
*Bermalya minê way way*

*Mi kina xwe dî lêêê lê*
*Li ber bihuro way way*
*Canê dîtim lêêê lê*

*Li ber bihuro way way*
*Taqîbelek lêêê lê*
*Guhîbiro way way*
*Taqîbelek lêêê lê*
*Guhîbiro way way*
*Dilketîyê lêêê lê*
*Çavnaziro way way*
*Dilketîyê lêêê lê*
*Çevnaziro way way*

*Ne kin im lêêê lê*
*N kurtik im way way*
*W ez ne kin im lê canê*
*Ne kurtik im way way*
*Tak rihana lêêê lê*
*Berhûrik im way way*
*Aqlê xorta lê kinê*
*Sivik dikim way way*
*Lê kinê lêêê lê*
*Mala minê way way*
*Way lê kinê lêêê lê*
*Bermalya minê way way*

## EZ HELÎYAM

*Ema nama nema nema, nema nema nema nema*
*Ema nema nema nema, nema nema nema nema*
*Ema nema nema nema, nema nema nema nema*
*Ez helîyam tişt di min nema.*
*Ema nema lê Xanimê*
*Nema nema lê Xanimê*
*Ema nema lê Xanimê*
*Nema nema lê Xanimê*
*Ema nema lê Xanimê*
*Nema nema lê Xanimê*

*Xanimê ema nema*
*Wey delalê nema nema*
*Xanimê ema nema*
*Wey Xanimê nema nema*
*Aşiqê bejna te me*

*W ez aşiqê bejna te me*
*Herûkê rûkê te me*
*W ez heyrûkê rûkê te me*
*Xilxalê lingê te me*
*W ez xilxalê ling te me*
*Bazin* destê te ma*
*W ez bazinê destê te me*
*Ema nema nema nema*
*Nema nema lê Xanmê*

*Ema nema nema nema, nema nema nema nema*
*Ema nema nema nema, nema nema nema ema*
*Helîyam tişt di min nema*
*W ez helîyam tişt di min nema*
*Ema nema nema nema*
*Nema nema lê Xanimê*

## KEJÊ TU KEJ Î

*Kejê tu kej î lê, herê welle tu kej i*
*Kejê tu kej î lê, bi dîn û îman tu kej i*
*Kejê tu kej î lê, bi wî Xwedayî tu kej î*
*Çavê te reş in lê, welle bille tu kej jî*
*Çavê tu reş in lê, welle bille tu kej î*

*Kejê her wemrînê ha mirye şiwemê*
*Kejê her wemrînê ha mirye şiwemê*
*Kejê tu ke jî lê heê welle tu kej jî*
*Kejê tu kej jî lê bi dîn-îmanê tu kej î*
*Çavê te reş in lê welle bille tu kej jî*
*Kejê tu kej jî lê herê welle tu kej î*

*Kejê tu kej jî lê hijîrî çola bej jî*
*Kejê tu kej jî lê hijîra çola bej î*
*Kejê tu kejj î lê dilkê min ketî te jî*
*Kejê tu kejj î lê dilkê min ketî te jî*

## LÊ DÎNÊ

*Heyla lê dînê lê, lê dînê lê, lê dînê lê*
*Heylaaa lê dinêêê...*

*Heyla lê dînê lê, lêdînê lê, lê dînê lê*
*Weylaaa lê dînêêê...*

*Bavê te bimre lê, te bimre lê*
*Ez naaarim şînêêê...*
*Bavê te bimre lê, te bimre lê*
*Ez naarim şînêêê...*

*Heyla lê dînê lê, lê dînê lê, lê dînê lê,*
*Weyla zalim dinêêê....*
*Bavêêê te bimre lê, te bimre lê*
*Ez naaarim şînêêê...*
*Ser çav û birha lê, van birha lê, van birha lê*
*Naaakim bawe şînêêê...*
*Heyla lê dînêêê lê*
*Weyla zalim dînêêê...*

## ZEYNEBÊ

*Ay lê lê lê lêêê, way lê lê lê lêêê*
*Ay lê lê lêêê, zalim Zeynebêêê*
*Ay lê lê lêêê, zalim Zeynebêêê*
*Ay lê lê lêêê dilav şikandêêê*

*Ay lê lê lê lêêê, way lê lê lê lêêê*
*Ay lê lê lê lêêê, zalim Zeynebê*
*Ay lê lê lê lêêê, way lê lê lê lêêê*
*Ay lê lê lê lêêê, dilav şikandêêê*

## WERE GOVENDÊ

*Lê, wer lê wer lê wer lê*
*Were dîlanê esmer*
*Lê, wer lê wer lê wer lê*
*Were govendê esmer*
*Lê,wer lê wer lê wer lê*
*Were dîlanê esmer*
*Lê, wer lê wer lê wer lê*
*Were govendê esmer*

*(Ev malikên li jor, dîsa têne gotin)*

*Awirek wer li ser e*
*Wer lê wer lêwer ê*
*Awir mîna xencer e*
*Meşye dîlanî esmer*

*Lê, wer lê wer lê wer lê*
*Were dîlanê esmer*
*Lê, wer lêwer lê wer lê*
*Were govendê esmer*

*Esmera biwa nadim*
*Esmer ji gewra çêtir e*
*Çavê wan jê reştir e*
*Bejna wan ziravtir e*
*Ber dilêîm şêrîntir e*
*Were dîlanê esmer*

*Esmer bi gewra nadim*
*Wele nadim, bile nadim, tile nadim*
*Esmer ji gewra çêtir e*
*Çavê wan jê reştir e*
*Xwîya wan jê reştir e*
*Aqlê wan jê bêtir e*
*Bejna wan ziravtir e*
*Ber dilêm şêrîntir e*

*Ew kî bû li gir fitilî?*
*Dê wer lêê, wer lê, wer lê*
*Tena fîstanê minî*
*Meşye dîlanê esmer*
*Wan çavê te kilkirî*
*Wî burhê dermankirî*
*Wî rûkê te lefkirî*
*Gava ber min bihurî*
*Derdê keçkê gran bû*
*Êsir çavan kedirî*
*Agir berda vî dilî*
*Meşye dîlanê esmer*

*Lê, wer lê wer lê wer lê*
*Were dîlanî esmer*
*Lê, wer lê wer lê wer lê*
*Were govendê esmer*
*Esmeram grover e*
*Awirek wer li ser e*
*Awir mîna xencer e*
*Meşye dîlanê esmer*

*Esmera bi gewra nadim*
*Wele nadim, bile nadim, tile nadim*
*Esmer ji gewra çêtir e*
*Çavê wan jê reştir e*
*Buryê wan jê xweştir e*
*Aqlê wan jê bêtir e*
*Ber dilêm şêrîntir e*
*Meşye dîlanê esmer*

## MALA BAR KIR

*Mala bar kir lê lê çûne wara lê*
*Keçkê lê, rindê lê, bermalya min*
*Mala bar kir ê lê çûne wara lê*
*Hevalê, hogirê cînara min*

*Goştê me xwarin lê lê*
*Mêş û mara lê*
*Dînê lê, dînê lê; cinara min*

*Mala bar kir lê lê*
*Koç bi rê ket lê*
*Keçê lê rindê lê bermalya min*
*Mala bar kir lê lê*
*Koç bi rê ket lê*
*Hevalê, hogirê bermalya min*
*Dilê min vemirî lê*
*Agir pê ket lê*
*Hevalê, hogirê bermalya min*

*Dilê min vemirî lê*
*Agir pê ket lê*
*Keçê lê, rinde lê mala min*

*Mala bar kir lê lê*
*Çûn ji vira lê*
*Keçê lê, rindê lê bermalya min*
*Mala bar kir lê lê*
*Çûn ji vira lê*
*Dînê lê, dinê lê cînara min*
*Ez û tu man lê lê*
*Ber kevira lê*
*Keçê lê, rindê lê mala min*
*Ez û tu lê lê*
*Ber kevira lê*
*Hevalê hogirê cînara min*

## BIMEŞ DÎLANÊ

*Meşî meçî meçî keçka rûxetî*
*Meşî meşî meşî keçka rûxetî*
*Wexta te nabînim lê, dê qebulkayê*
*Wexta te dibînim lê, kêfa mi ji te tê*
*Wexta te dibînim lê, kêfa mi j te tê*
*Meşî meşî, meşî meşî, meşî meşî*
*Meşîîî meşî dîlanê*

*Meşî meşî meşî, a way bi rê ket*
*Meşî meşî meşî, a way bi rê ket*
*Dîsa kinik bû canê*
*Welle wa bi rê ket*
*Gava çavê min ezo*
*Li wê bejnê ket*
*Dilê min bihirî gewrê*
*Ma agir pê ket*
*Dilê min bihirî canê*
*Ma agir pê ket*
*Meşî meşî, meşî meşî, meşî meşî*
*Meşîîî meşî dîlanê*

*Meşî meşî meşî, xwe ji banê berde*
*Meşî meşî meşî, xwe ji banê berde*
*Pişta wê qesrê me j xwer xeberde*
*Pişta wê rêkê me j xwer xeberde*
*Piştî wa soz û qrara mi dev ji xwe berde*
*Piştî wa eşqa te dinê mi dev ji xwe berde*
*Emrê min wereee aaax, rihê min wereee*
*Emrê min were lê, canê min were*
*Here ku j esmera bimeşî bide min*

*Meşî yû meşî ax ji wê dihatî qurban*
*Meşî yû meşî ji wê dihatî*
*Rûkê te sor bûn sêva Xelatî*
*Rûkê te sor bûn sêva Xelatî*
*Yeka nola te nedî bû li vî bajarî*
*Li vî memleketî canê, li vî welatî*
*Emrê min were, canê min were*
*Emrê min were, rihê min were*
*Here ku esmera bimeşî bide min*

*Xirrê govendê wişt wişt zilfê birincî*
*Rûkê te sorbûn sêva narencî*
*Were j ter bêjim qubaaan*
*Tirkî w kurmancî*
*Were j ter bêjim tirkî û kurmancî*
*Emrê min were aaax, canê min were*
*Emrê min were, rihê min were*
*Here ku esmera bimeşî bide min*

*Meşî yû meşî jiwê ve hatî*
*Meşî yû meşî jiwê vehatî*
*Tu bi xêrê hatî*
*Ser çavan hatî*
*Gula min tu bi xêrê hatî*

## A WIHA HAT A WIHA ÇÛ

*A way hat û a way çû*
*Siwar hat û peya çû*
*Çavê mi li çavê reş ket*

*Aqil-sewda vêra çû*
*Çavê mi li çavê reş ket lo*
*lo, lo, looy, lo lo looy, lo lo looy*
*Loy, loy, loy, loy, loy, loy, loy, loy*

*Min dî bû li devê derî*
*Te dî bû li devê derî*
*Min dî bû li devê derî*
*Te dî bû li devê derî*
*Sê hudud li ser serî*
*Bilbil jî li ser serî*
*Xwezî mi gewrya xwe bidya*
*Mîna cara ewilî*
*Rebbî mi gewrya xwe bidya*
*Mîna cara ewilî aaay, lê lêêê*
*Lê lêêê, lê lêêê, lê, lê, lê*

*Berçem berçem diçûme*
*Benîşte xwe dicûme*
*Berçem berçem diçûme*
*Benîşte xwe dicûme*
*Fêrkî gewra xwe bûme*
*Laqî rinda xwe bûme*
*Dev kenya w ez şa bûme aaax*
*Lê, lêêê,lê, lêêê, lê lêêê*
*Lê lêê lê, lê lêê lê, lê lêê lê*
*Lêêêêêêê*

## GOVEND RANABE

*Welle govend ranabe*
*Bille govend ranabe*
*Xwelî li mê rê xirab e*
*Rûniştî ye ranabe*
*Mêrê xirab ezab e*
*Ber pişta min ranabe*
*Lê lêêê, lê lêê, lê lêêê*
*Lê lêê, lê lêê, lê lêê*
*Mêrê xirab ezab e*
*Ber pişta min ranabe*
*Ax li min lê lêêê, lê lêêê, lê lêêê*
*Lê lêê, lê lêê, lê lêê, lêêêê...*

## DIZ HAT

*Aho diz hat*
*Bavo diz hat*
*Aaaaay diz hat*
*Yadê diz hat*
..............

*Eman diz hat lê lêê bi dizîka waaax*
*Derî veke keçêêê keçêêê bi dizîka way way*
*Eman diz hat*
*Yadê diz hat*
*Bavo diz hat, delalooo*
*Keko diz hat*
*Diz hat!*
*Diz hat!*

## LO LO XOPANO

*Ha ha hooo....*
*Wer lo loo, lo loo, lo loo*
*Lo loo, lo loo, lo looo*
*Lo şewityo xopano*
................
................
*Ema nema wer xivtano*
*Malamin bi qurbano*
*Ay lo gidî milxivtano*
*Canê min qurbano*

*Xopan min diber şirika*
*Mala min biqurbano*
*Xopan min dî ber şirika*
*Mala min xevtanooo*
*Xopan min di ber şirika*
*Mala min xopano*
*Ew divê memkê keçika*
*Canê min bi heyranooo*

*Lo loo, lo loo, lo looo xopano*
*Mala min bi xivtanoo*
*Lo loo, lo loo lo, looo xopano*
*Canê min bi qurbanooo*
*Xopan termêj binsîlekê*
*Mala min xopanoo*
*Min destek dabû bin kêlekê*
*Emrê min xwpanoo*

## XEZALÊ HÊLLÎCAN

*Mi-l Mêrdîn dikan vekir*
*Xezalê hêllîcan*
*Mi-l Mêrdîn dikan vekir*
*Delalê hîllîcan*
*Bazara zêrê te kir*
*Delalê hêllîcan*
*Bazara lê zêre te kir*
*Xezalê hêllîcan*
*Mi j'bîr kir guhar nekir*
*Xezalê hêllîcan*
*Mi j'bîr kir lê guhar nekir*
*Delalê hêllîcan*
*Xezalêêêê hêllî hêllî*
*Delalê hîllîcan*
*Xezalêêê hêllî hêllî*
*Delalê hêllîcan*

## ZIRAVÊ I

*Zirav, zirav, zirav, zirav, zirav*
*Zirav, zirav, zirav takê derzî*
*Lê canê ziravêêêê*
*Pir ziravê takê derzî*
*Keçokê ziravêêê*
*Binya mala me bi derzî*
*Cana min ziravêêê*
*Min go: Aaaaaaaaaaaaaaax*
*Digo: Xweziiiiiiiiiii*
*Lê canê ziravêêêê*
*Ay zirav, zirav, zirav, zirav*

*Zirav, zirav, zirav, zirav, zirav*
*Zirav, zirav, zirav, takê derzî*
*Lê canê ziravêêê*
*Binya mala me d wê çû lê*
*Keçkokê ziravêêê*
*Min wê nedî delal çû lê*
*Ez xulam ziravêêê*
*Min di-nedî delal çû lê*
*Cana min ziravêêê*
*Ay zirav, way zirav*
*Eman neman ziravê*

*Zirav, zirav, zirav, zirav, zirav*
*Zirav, zirav, zirav takê derzî*
*Lê canê ziravêêê*
*Pir ziravê tekê derzî*
*Keçkokê ziravêêê*
*Binya mala me dibezî*
*Cana min ziravêêêê*
*Min digo: Aaaaaaaax*
*Digo: Xwezî*
*Lê canê ziravê*
*Ay zirav, zirav, zirav, zirav*

## ZIRAVÊ II

*E heeeeeeyyy....*
*De zerîyê me çûbûn avê*
*Keç me dî ziravê*
*De zeryê me çûbûn avê*
*Heyranê ziravê*

*Kolana bira da navê*
*Lê zeryam ziravê*
*Kolana bîrada navê*
*Lê zeryam ziravê*
*Çima neda bi ser mi da avê*
*Lê zeryam ziravê**
*Nekî, çima mi helal navê*

*Lê zeryam ziravê*
*Nekî şermê ha, bidî navê*
*Lê zeryam ziravê*

*Weyla zirav, zirav, zirav*
*Zirav, zirav, a min e*
*Lê zeryam ziravê*
*Ber dîwara nasakine*
*Lê zeryam ziravê*
*Hêvî Xwedê pur mezin e*
*Lê zeryamziravê*
*Qelen tune, jpere tune*
*Hey darê tembûra min e*
*Wey dînê ziravê*
*Xwe dêka zarûkê min e*
*Qurbanê ziravê*

*Weyla zirav, zirav derzî*
*Lê zeryam ziravê*
*Mi li bejnê kir pan û çûko*
*Lê zeryam ziravê*
*Wextê min bi memka girt, lerzî*
*Lê zeryam ziravê*
*Gava çavêm bi keçkê ket bû, axxx*
*Qurbana ziravê*

*Tev dengê me çûbû amê*
*Wer lê lê ziravê*
*Ziravîya min heta navê*
*Lê zeryam ziravê*
*Çûm di nav, ser mi da avê*
*Lê zeryam ziravê*
*Min heta navê dabû avê*
*Wer lê lê ziravê*

## ZIRAVÊ III

*Wa ziravê ziravêêê*
*Ziravê ziravê*
*Zalimê kefirbavêêê*
*Ziravê ziravê*
*Bûye çaxê germavêêê*
*Ziravê ziravê*
*Rabe em heme germavêêê*
*Ziravê ziravê*
*Ji bo xatirê sohrîyaaa*
*Ziravê ziravê*
*Ji şebeşê Omerîyaaa*
*Ziravê ziravê*
*Bikev ava Wehabooo*
*Ziravê ziravê*
*Di çaya Menavooo*
*Ziravê ziravê*
*Qelem e û şîşman nabeee*
*Ziravê ziravê*
*Rab bikev na wê avêêê*
*Ziravê ziravê*
*Rabe em heme ba Osmaaan*
*Ziravê ziravê*
*Şîşekî jî tirsîyayêêê*
*Ziravê ziravê*
*Wekî ji yekî dilêêê*
*Ziravê ziravê*
*Bixe nava qeşayêêê*
*Ziravê ziravê*
*Bê te xewa mi nayêêê*
*Ziravê ziravê*
*Piştî çavê tey beleee*
*Ziravê ziravê*
*Êvara xewam nayêê*
*Ziravê ziravê*
*W ezê bigrim tayêêê*
*Ziravê ziravê*
*Kar û bara xwe bike*
*Ziravê ziravê*
*Remezan abê siwar bibe*
*Ziravê ziravê*

*Bixwe ve başî ye*
*Ziravê ziravê*
*Xwe bike nav wê avêêê*
*Ziravê ziravê*
*Tama memkêj te xweş eee*
*Ziravê zirav**
*Bejna wê çî xweşik e*
*Ziravê ziravê*
*Weke kewê dîl bijî*
*Rihana derê çayêêê*
*Ziravê ziravê*
*Bi te xewa mi nayêêê*
*Ziravê ziravê*

## ÇAVXEZAL

*Çavxezal im çavxezal*
*Çavxezal im çavxezal*
*Çavxezal im çavxezal*
*Min ba kiryê hezar sal*
*Emrê min bûyî sî sal*
*Ê wêna bû bîstûçar*
*Emrê min bûyî sî saaal*
*Ê Emrê min bûyî sî saaal*
*Ê wêna bû bîstûçar*
*Ocaxê gelek xwar*
*Emrê lawa tevda xwar*

*Waaa qîza apê min!*
*Çendî roj in li bîra min*
*Waaa qîza amê min!*
*Mektûba te giha min*
*Çendî roj in li bîra min*
*Hero ti têy xwena min*
*D'xewnê de jî te j'bîr nakim*
*Wele sibê gav û rind*
*Di xewnê de jî te j'bîr nakim*
*Şexsê wê l'ber çavê min*
*Şexsê wê l'ber çavê min*
*Emrê wê ser çavê min*

*Çima xewa min zû tê*
*Ji vir heya Amûdê*
*Çima xewa min zû tê*
*Devê min li ser wî rû yî*
*Ji vir heya Bêrûdê*
*Ji vir heya Amûdê*
*Ji vir heya Amûdê*
*Ji vir heya Bêrûdê*

*Min dî çûbû ser xênî*
*Banê xênî bi xêr hanî*
*Min di çûbû ser xênî*
*Banê xênî bi xêr hanî*
*Te ez kuştim ez helandim*
*Tu helala vî canî*
*Te ez kuştim ez helandim*
*Tu helala vî canî*
*Te ez kuştim ez helandim*
*Tu helala vî canî*
*Çavxezal û çavxezal*
*Min ba kiryê hezar sal*
*Çavxezal û çavxezal*
*Min ba kiryê hezar sal*
*Emrê min bûyî sî sal*
*Ê wêna bû bîstûçar*
*Qehra wê kurdo tev xwar*
*Derdê wêna çavxezal*

## ESMERA MIN

*Hehêêêêê*
*Lê were, were, were, were*
*Lê lê were, werte, were*
*Lê were esmera min*
*Dê were, were esmera min*

*Dê were esmera min*
*Lêllê were dellala min*

*Bi şevê doşeka min*
*Bi rojê lihêfa min*
*Agir berda canê min*
*Aaaax lêê, aaaay lêê*
*Uhûûûûûûûûûûh.....*
*De were, were, were*
*Qurbana sing û ber e*
*(Li vir du rêz nehatin fêmkiriri)*

*Û hema minî tevî nû lê*
*Hema minî tevî nû*
*Qîza xalê hecî nû*
*Tu dermanê qîzê nû*
*Ew ketye bajarê nû*
*Tu hema mênî dûr?*
*Ax were, were, were*
*De were, were, were*
*Qurbana sing û ber e*

*Min dî li mehela Qişlê yo, lê*
*Te di li mehela Qişlê yo*
*Siet bû dwazdê rojê*
*Mi xwe berda pêşîyo*
*Ramûsankî bide min*
*Hema ji stûkê berêyo*
*Were canê esmer*

*Min dî li mehela Qişlê yo, lê*
*Min dî limehela Qişlê yo*
*Siet duwazdêj rojê yo*
*Xwe berda bû cadê yo*
*Bê deng çûbûm pêşê yo*
*Berê xwe da sêncê yo*
*Fena stûkê berê yo*
*Wer, wer, weer esmer*
*Wer cînarê esmerêêê*
*Wansingê tey berê*
*Aaaay lê esmera min*

*Min dî dû ser xanîka lê*

*Çû bû ser xanîka*
*Min dî bû ser xanîka*
*Çima nayê ji va xanîka?*
*Van bajara, van xanîka*
*Aaaaax lê, de were lêêê*
*Aaaaay lê, de were lê*
*Wer, wer, wer, weeer esmerê*

*Min dî bû li Misêbînê*
*Min dî bû li Misêbînê*
*Qurban wan çavê şînê*
*Ramûsankê bide min*
*Ser guhê wa balînê*
*Were, Xwedê qedim e*
*Aaaay ê, lêê esmerê*
*Aaaay lê, lêê esmerê*
*Rûniştî li ber wê pencerê*

*De hey were, were, were*
*Lê, lê were, were, were*
*Her were, were, were*
*Qurban wa sing û ber e*
*Serî sor e, lingî zer e*
*Ti d'bê: Penîr koçer e*

# KALO

*Ehêêê..........*
*Kalo kalo, kaalo*
*Bê yadê wele kal o*
*Yabo wele kal o*
*Yadê wele kal o*

*Kalo, kalo, kalo, kalo, kaloooo*
*Bi şev narim malo*
*Bi ro hespê fal o*
*Wey kalo, kalo kaalo*

*Kaaaalo, kaaalo, kaaalo, kalo*

*Kalê bi pûçik-mûçik*
*Wey kûçik nayê kûçik*
*Kûçik nayê kûçik*
*Weyy, mêrê keçkê biçûçik*
*Mêrê keçkê biçûçik*
*Yadê wele ez nakim*
*Kalo, wele ez nakim*
*Keko wele ez nakim*
*Yabo wele ez nakim*
*Yabo wele ez nakim*
*Yabo weke ez navêm*
*Li pey wî narim malo*
*Wey, bi şev hespê fal'o*

*Kalê ber jêjîîîîrê*
*Yaaabo, yaaadê*
*Kalê vê Xatûnê*
*Kalê qîz bitûnê*
*Welle yadê kal o*
*Welle yabo kal o*
*Bi ro narim malo*
*Bi şev hespê fal o*
*Kalo, kalo, kaaalo*

*Kalê min hejhijî waaaweylê*
*Kevno lo kaaalo*
*Kalê mi hejhijî, hingî xirêdaro*
*Lawikan dibêjî*
*Welle yadê nakim*
*Welle yabo kal e*
*Bi wê quranê kal e*
*Bi wê quranê kal e*
*Bi şev narim mal o*
*Weyy bi ro hespê fal o*

## DAWET

*Misêbînê bi qefle ye*
*Mêrdînê hewale ye*
*Dîyarbekir ciyê biste ye*

*Daweta min û te ye*
*Dilê mi di Rindo heye*
*De lê lêêê, de lê lêêê, de lêêêê*
*Ax lêêê, de lê lêêê, de lê lêêêê*
*Ay lêêê, lêêê, lêêêêê....*

## EYŞÊ

*Eyşê Eyşê Eyşanê lê*
*Bejin-şitla rihanê*
*Eyşê Eyşê Eyşanê lê*
*Bejin-şitla rihanê*
*Derdê mi lê nedanê lê*
*Nexweş bûm di xestxanê lê*
*Nexweş bûm di xestexanê*
*Li sixurta Batmanê!*
*Çima nayî serdanê?*
*Derdê dilêm rihanê*
*Eyşê keçka gundî ye lê*
*Kelek te li min da, çî ye?*
*Serîyekî ne, nehatîye lê*
*Bifîstanê maxsî ye*
*Eyşanê bajarî ye lê*
*Wextê keçik dîtîye*
*Tişt di canê mi nema*
*Tev canê min helîye*
*Eyşanê lê Eyşanê*
*Derdê dilê min rihanê*
*Derdê dilê min rihanê*
*Çima nayî serdanê?*

## WEYLÊ

*Wextê keçkêêê.....*
*Weylê-weylê, weylê, weylê*
*Weylê, weylê, weylê, weylê*
*Weylê, weylê, weylê, weylê*
*Weylê, weylê, weylê, weylêêê..*
*Û weylêêêê.......*
*Rihan di can dîîîî*
*Danê sibehêêêê*

*Li erdê reşandî*
*Li dora Grîmo*
*Ji xwe ra hebandî*
*Keçkê bi xêr bê*
*Wa xwe ra danî*
*Dora Adana*
*Dora Edenê*
*Dora Beyoxlû*
*Dora Entalya*
*Dora Ceylanê*
*Keg ya mineeee......*
*Weylê-weylê, weylê, weylê*
*Weylê, weylê, weylê, weylê*
*Weylê, weylê, weylêêê....*
*Dora Xetayêêê...*
*Dînê dînê min e*
*Rabe şêkirîne*
*Bê te xewa mi nayê*
*Wextê mi keçkê nedî*
*Hema sebra mi nayê*
*Çi bikim ji malê dinyayê?*
*We d'çima nayê layêêêê....*
*Weylê-weylê, weylê weylê*
*Weylê, weylê, weylê, weylê...*
*Deynê te li me çi ye?*
*Li min-li min, li min- li min, li min weylê*
*Weylêêê.....*
*Kulîlkê ma şaxikê*
*Were bikeve navîkê*
*Ramûsanek bide min*
*Xêra dê w bavê te bê*
*Deynê te li min çî ye?*
*Diloooo.........*
*Dilooooo..........*
*Diloooooooo...*
*dilo, diloooo........*

# EW JÎ JIN E?

*«Yek hate ba min go: Jina minê bêxiret e! Gla û ta û porêwê hemî li wa dera ne. Înca du-sê xebera bêje, belkî hema hebikî tana lê da, carna ha j mala xwe ma! Încar min ev xebrê han gotin«*

*Ew jî jin e?*
*Agir kette mala min e!*
*Ea jî jin e?*
*Agir kette mala min e!*
*Diştexilê ticar dorê nadî min e*
*Xeber didê ticar dorê nadî min e*
*Por bi rişk e, weke keja wa bizina*
*Lê, xweşik im!*
*Ma we ê wek min dîtine?*
*Ew jî jin e!*
*Ma ew jî jin eee?*
*Dinanê wê sipî dikin,*
*Wek ferşikê ser yepraxa.*
*Zikmezin e*
*Xwarinxwir e*
*Hemû çax e*
*Wextê êvara di razê*
*Weke tu wê merşê raxa*
*Wextê êvara di razê*
*Weke tu wê merşê raxe*
*Lê xweşik im!*
*Ma we ê wek min dîtine?*
*Ew jî jin e*
*Ma jin bi serî ne?*
*Rûqirrêêêêj e, eyn weke eyyar-gemmarê*
*Rûqirrêj e, weke eyarê gemarê*
*Firnikê wê, eyn weke qulê kewarê*
*Grrza wê, weke şirrikê biharê*
*Grriza wê, weke şirşikê biharê*
*Fişgişa wê, weke gayê di ser kisin e*
*Ew jî jin e*
*Ma jin bi serî ne?*
*Ma jin wê hene?*
*Ma ew jî jin eee?*
*Ezê bakim, e nabakim, bi mîrkuta nalebitê*
*Ezê bakim, e nabekim, bi çakûç û destîtevra nalebitê*

*Çû têr nabê ji gotin û ştexalîya, ji vêjitpitê*
*Wextê êvar «ttûûûh» dipişikê, wekê tu dana bikutê*
*Wextê êvara dikuxê, wekê tu dana bikutê*
*Heftêsal e, hê hermetê ne mezin e!*
*Ew jî jin e*
*Ma ew jî jin eeee?*
*«Mi sî jinik cihe, go: Keko! Te ev xeberê halo di buwara min de gotine! De ka, ya wî jî bêje, de qene em weke hev lêk werin!»*
*Ew jî mêr e?*
*Şixul nema li bajêr e!*
*Ew jî mêr e?*
*Şixul tine li bajê e!*
*Li mal birçî ye, li ba min têr e*
*Heqê wînaneh-deh kêr e*
*Li mal birçî ye, li ba min têr e*
*Heqê wîna neh-deh kêr e*
*Ev mêrê hanêkê jî dikê, ew jî nakê*
*Madê xwe ji jina xwe dikê*
*Jin di rabê di sermê da*
*Herdu rûwê xwe di reş dikê*
*Ji welat û ji beglera*
*Ji mêrê xwe ra parsê dikê*
*Mêrê xwe bixwer xwedî dikê*
*Li ber gundîya, li ber cînara*
*Da nehetikêêê*
*Ma ew jî mêêêraaa?.....*
*Hinkî hene bi jînê xwe ne*
*Di nav xelê de çî qure ne*
*Hin jî hene bi jinê xwe ne*
*Di nav alemê çi qure ne*
*dibê: Keçê zû bigere, tiştek nema*
*Dibê: Keçê zû b'xebite, tiştek nema*
*Heqê wî ye ewê neçê nav camîra*
*Ew jîmêr e*
*Ma ew jî mêr eeeee?*
*Ma etyajêre?*
*Ma ew jî mêêêêr eee?*

## EZ TOBEDAR IM

*Zû keçkê w em heval in*
*Awurê wê zahf xedar in*
*Ez ûwê mem heval in*
*Awurê wê zahf xedar in*
*Gava hate ba dawetê*
*Bihna lewentê em xwarin*
*Keşê wele ez tobedar im*
*Tobedarê Şêxê Kal im*
*W ezê ji va şêxa nikarim*
*Keçê wele ez tobedar im*
*Birîndar im*
*Ez nikarim*

## LÊ NAZO

*De xweşik bi derge ye*
*Diyarbekir bi derge ye*
*Diyarbekir bi dege ye*
*Nisêrbînê bi qişle ye*
*Nisêrbînê biqişle ye*
*Midyadê hewale ye*
*Midyadê hewale yeee*
*Êstrê mahkeme ye*
*Lê Nazooo, lê Nazooo*
*Mêrdînê mahkeme ye*
*Kercewsê qisabe ye*
*Kercewsê qisabe ye*
*Heskifê minare ye*
*Heskîfê minare ye*
*Batmanê refîne ye*
*Destê xwe bi xwe ê meeee*
*Ez helîma, wê yeman*
*Lê Nazê, lê Nazo*
*Wele tu naza min î*
*Lê Nazê, naza min î*
*Nazê naza min î*
*Şev û ro jîna min î*
*Şev û ro jîna min î*
*Em herin wê Mêrdînê*

## EVÎNA MIN EV E

*Ev e, ev e, ev eee*
*A ku mi go: Ev eee*
*Ev e, ev e, ev eee*
*Ya ku migo: Ev eee*
*Dilête naçe wêêê*
*Ne b'roj û ne b'şev eee*
*Evîna mi naçêêê*
*Ne b'roj û ne b'şev eeee*
*Sed keçî bidne min*
*Bi wa qayîl naaabim*
*Sed keçî bidne min*
*Bi qet ra ew naaabim*
*Derdê min çavreş eee!*
*Ez wê nabim, çimaa?*
*Derdê min esmer eee!*
*Ez wê nabim, çimaaa?*
*Ev e, ev e, ev eeee....*
*Tilyê xwe raxistî*
*Bi gul û beybûnaaa*
*Tilyê xwe raxistî*
*Bi gul û beybûnaaa*
*Keçê dinê bideee*
*Ji dil dernakeveee*
*Keçê qelbê bide*
*Ji dil dernakeveee*
*Ev e, ev e, ev eeee...*
*A ku min go: Ev eeee*
*Ev e, ev e, ev eee...*
*Ya ku min go Ev eee...*

## EV DIL BIRÎNDARÊ TE YE

*Mala me cem mala we ye*
*Dilêm gelek ser te heye*
*Mala me cem mala we ye*
*Delêm gelek ser te heye*
*Bi vî karîm bîrewerî*
*Ev dil birîndarê te ye*

*Bi vî karim keçîçemî*
*Ev dil birîndarê te ye*
*Gava ji xewê radibê*
*Krasê mexsî l ba dibê*
*Gava ji xewêra dibê*
*Krasê mexsî li ba dibê*
*Yek awurî bidî min*
*Ax li ser van dila dikevêêêê*
*Yek awurî bidî min*
*Ax li ser van dila dikê*
*Mala me cinarê we ye*
*Dilêm gelek ser te heye*
*Bi vî karîm bîrewerî*
*Ev dil birîndarê te ye*

## KES NABÊ ÇIMA

*Ez ji van gewra hez dikim lê*
*Esmerekê ezkuştimeee..*
*Ez ji van gewra hez dikim lê*
*Esmerekê ez kuştimeee...*
*Ketim derdê evînîyê,*
*Kesek nebêjê evînîyê,*
*Kesek nebêjê: Çima?*
*Ketim derdê evînîyê,*
*Ti kes nabêjê çimaaa?*
*Xwezî derbik bigota lê*
*Her evîn bû ji boy me*
*Xwezî derbik bigota lê*
*Her evîn bû ji boy me*
*Carkî tenê bigota: Lo,*
*Lawiko ez ya te me!*
*Carkî tenê bigota: Lo,*
*Lawiko ez ya te me!*
*Ez ji van gewra hez dikim lê*
*Esmerekê wez kuştime*
*Ketim derdê evînîyê*
*Kesek nabêjê: Çima?*
*Ketim derdê evînîyê*
*Kesek nabêjê: Çima?*
*Jêre bêje vî derdî lê*

*-Dil girtîye naberdêêê*
*Jêre bêje vî derdî lê*
*-Dil girtîye naberdêêê*
*Cî nas dikim van dera*
*Ji boy xatirê wê ez hatime*
*Cî nas dikim vî erdî*
*Ji boy xatirê te ez hatime*
*Ez ji gewra hez dikim lê*
*Esmerekê ez kuştimeee*
*Ketim derdê evînîyê*
*Kesek nabêjê: Çima?*
*Ketim derdêevînîyê*
*Kesek nabêjê: Çima?*
*Ez mame heta niha lê*
*Kesek mi re negihaaa*
*Ez mame heta vêga lo*
*Kesek mi re negihaaa*
*Awurê esmera har in*
*Wek derbê şûrû rimaaa*
*Awurê çevreşa har in*
*Wek derbê şûr û rimaaa*
*Ez ji van gewra hez dikim, lê*
*Esmerekê ez kuştime*
*Ez ji van gewra hez dikim, lê*
*Esmerekê ez kuştimeee*
*Derdêm derdê evînîyê*
*Kesek nabêjê: Çima?*
*Derdêm derdê evînîyê*
*Kesek nabêjê: Çima?*

## ZERÎYA MIN

*Ev çevkevan wî hate can*
*Ew çevkevan wî hate can*
*Memir dîsa ev çûê ji min can*
*Zerya min Sibhan, Sibhaaan*
*Jina mala pir delal e*
*Jina mala pir delal e*
*Zilf û bala hatî ji mala*
*Keçik delal e lê bi şemal e*
*Heyhêêêê...............*

*Zimanşîrîîîîîîn, zimanşîrîîîîîîn*
*Lê belgexwî, wê helal bêêê*
*Li wêya çavşîîîîîn........*
*Wereee, wereee, wereee......*
*Jinek keleş, tehnikî beş*
*Kennekî xweş, hêdî bimeş*
*Lê wê helal bî*
*Li wêya çavreş*
*Wereeee, wereeee, wereeee......*
*Çi gote mê, mame li bend ê*
*Ji boyî hekê lî ji boyî rindê*
*Ger maçek bidê wa xweşikê*
*Dilawezî, hey lêêê.....*
*Li pişta bendê, gava mi dî*
*Ji wir ve hat û dişemitî*
*Dilê min e, pêî şewitî*
*Mala mêrik lê tev peritî*
*Wereee, wereeee, wereeee....*

## HEYHÊ

*Heyhêêêê.........*
*Wan çavê kilkirî*
*Wê pora boyaxkirî*
*Wan dranê çêkirî*
*Ew fîstanê l'xwekirî*
*L'pişta malê digerî*
*Ew çûye oda banî*
*L'ber dolabê sekinî lo*
*D'eynê da dişêwirî*
*D'eynê da dişêwirî*
*Ew jina mêrê xwe bû*
*Agir berda vî dilî*
*Heyhêêêê..........*
*Goya mêrê xwe malî ye*
*Çavê xwe digerîne lo*
*Yeke weka wê nî ye*
*Nexweş im, ser wê vînakê*
*Hal û wextê mi nî ye*
*Nexweş im, ser wê vînakê*
*Hal û wextê mi nî ye*

*Heta Stenbolê çû bûm*
*Heta bi Enqera çûme*
*Badetê wa, dermanê wa*
*Lawiko di bextê te me*
*Tê qupça singê mi vekê lo*
*Herdu memka bivîne*
*Serê memkê mi tûj e*
*Binê wa deqdeqî ne lo*
*Wekî hêkê şamîya*
*Wek şanê hingivî ne*
*Kambaxa zahf şêrîn e lo*
*Wek petêxê Mihlî ne*
*Bide w ji xwe re bistîne,*
*Tamê tu jê hilîne*
*Ramûsanek bidme te ha*
*Bê libê şêkirîne*

## ŞÊRÎNA AV Û ŞEWAT

*Heyhêêê.........*
*Navê keçkê Heyatê*
*Şêrînê av û şewatê*
*Ser herdu çavê me hatê*
*E sond xwarim bi Quranê*
*Bi INcilê bi Tewratê*
*Heta sax bim li heyatê*
*Lê yamek ba te nadê*
*Dil ketîye govendê lê*
*Çima tu diçî civatê?*
*Şêrîn e av û şewatê*
*Te ezkuştim ez helandim*
*Mala me ji Ziravîya tê*
*Lê jiqehra çûme Midyadê*
*Mi bi kir wê keçikêêê....*
*Hêhhêêêê..............*
*Yadê weree, lê*
*Te li min berbûrê wê çikê*
*Wî fîstanê li xwe dikê*
*Lê çûme mala metikê*
*Fikrê min xira dikê*
*Memikêke qetikê*

*Memik hejîrê, findikê*
*ramûsanek bide min*
*Çûme oda banî lê*
*Keçê li ser dewşekê*
*Lê qumçikê*
*Ew jina mêrê xwe ye*
*Jinê qasê hevala lo*
*Li ber çav e wan reş dikê*

## LÊ AYSELÊ

*Lê lê lêêê Ayselê*
*De lê lê lêêê Ayselê*
*Gul barîn li mehelê*
*Gul hatine mehelê*
*Ji her kesî re dikenê*
*Lê çima li min nanêrê*
*Lê lê lêêê Ayselê*
*Were lê lê Ayselê*
*Gul hatine mehelê*
*Destê xwe bi destê i de*
*Keçê çima narûnêêê?*
*Keçê çima tu wer dikî*
*Ha ti pora xwe şe dikî*
*Memkê te pur şêrîn e*
*Weka vê Dîyarbekir*
*Me go qê şîr û şekir*
*Min li ser devê xwe kir*
*Gava ku Xwedê nekir*
*De lê lê wereee, lê lê wereee*
*Lê lê lê Ayselêêê.....*
*Lê lê lêêê Ayselê*
*De lê lê lêêê Ayselê*
*Kıbar î li mehelê*

## TE EZ KUŞTIM BI GAZINA

*Ev çi gul e li destê mine?*
*Gundîno hawar!*
*Ev çi gul e li destê min e?*

*Berxa min hawar!*
*Gul anîne j nav sosina*
*Dellalê hawar*
*Dibêjê: Tuji min hes nakê*
*Berxa min hawar*
*Ew ezîza dilê min e*
*Malîno hawar*
*Dibêjê: Tu ji min hes nakê*
*Berxa min hawar*
*Te ez kuştim bi gazina*
*Delalê hawar*
*Berçî jin madê wê kirî*
*Berxa min hawar*
*Heççî jin madê wî kirî*
*Dellalê hawar*
*Yan xeyidye ya dîgrî*
*Gundîno hawar*
*Yan xeyidye ya dîgrî*
*Berxa min hawar*
*Şîretkî limin ke*
*Axê lixwe kim*
*Berxa min hawar*
*Şîretkî li min ke*
*Axê lixwe kim*
*Berxa min hawar*
*Belkî aqil bê ser min e*
*Malîno hawar*
*Wa jimi we l'ber mêj dûr e*
*Gundîno hawar*
*Gozliklû we l'ber mêj dûr e*
*Gundîno hawar*
*Hikmê wî ye kes mamûr e*
*Berxa min hawar*
*Bi sê qûnaxa ji min dûr e*
*Gundîno hawar Şirrika wê şekê hûr e*
*Malîno hawar*
*Ew dellala dilê min e*
*Malîno hawar*
*Şirrika wê şekê hûr e*
*Dellalê hawar*

*Şev û rojê li bîra min e*
*Malîno hawar*
*Herçî gul e li destê min e*
*Gundîno hawar*
*Herçî gul e li destî min e*
*Berxa min hawar*
*Gul anîne ji nav sosina*
*Dellalî hawar*
*Dibêjê: Tu ji min hes nakê*
*Berxa min hawar*
*Ew ezîza dilê min e*
*Malîno hawar*
*Dibêjê: Tu jimin hes nakê*
*Berxa min hawar*
*Te ez kuştim bi zarîya*
*Dellalê hawar*
*Herçî jin madê wê kirî*
*Berxa min hawar*
*Herçî jin madê wê kirî*
*Dellalê hawar*
*Yan xweidye ya dîgrî*
*Gundîno hawar*
*Yan xeyidye ya dîgrî*
*Gundîno hawar*
*Yan xeyidye ya dîgrî*
*Berxa min hawar*
*Şîretkî li min ke*
*Axê lixwe kim*
*Berxa min hawar*
*Belkî aqil bê ser min e*
*Malîno hawar*
*Wa ji mi we l'ber mêj dûr e*
*Gundîno hawar*
*Gozliklû we l'ber mêj dûr e*
*Gundîno hawar*
*Hikmê wî ye kes mamûr e*
*Berxa min hawar*
*Bi sêqûnaxa ji min dûr e*
*Gundono hawar*
*Şirrika wê şekê hûr e*
*Malîno hawar*

## KALÊ XORT

*Herçî dilêm ne extîyar e*
*Çima dibê aqildar e*
*Gotin, dilêm extîyar e*
*Çima dibê aqildar e*
*Nizam ji kerbê malê dinê*
*Nizam ji derdê dost û yar e*
*Nizam ji kerbê malê dinê*
*Nizam ji derdê dost û yar e*
*Zengin çewa mal dicivînin*
*Wan qîzê ha dineqînin*
*Zengîn çewa mal dicivînin*
*Wan qîzê ha dineqînin*
*Zikmeşk in xwe naneqênin*
*Tidbê qê lingê wan dar e*
*Zikmeşk in xwe naneqênin*
*Tidbê qê lingê wan dar e*
*Zengîn pera dikin tûr de*
*Jin xweşikê pir bi nûr de*
*Zengîn pera dikin tûr de*
*Jin xweşikê pir bi nûr de*
*Waqîn ke biskê bin hûr de*
*Ew ji nêza dikê hewar e*
*Waqîn ke biskê bin hûr re*
*Ew ji nêza dikê hewar e*
*Doza Xwedê bi wan re heye*
*Malê min hemî ji wan re ye*
*Doza Xwedê bi wan re heye*
*Malê min bixwe tev ji wan re ye*
*Wan bi xwe jî îman tune ye*
*Li vê dinyayê aşîkar e*
*Wan bi xwe jî îman tune ye*
*Li vê dinyayê aşîkar e*

## SÊVA MIN WERE BA MIN

*Madê keçkê ne lê ye*
*Hemî sûcê diya wê ye*
*Madê Sêvê ne lê ye*

*Hemî sûcê diya wê ye*
*De wer-were dawetê ye*
*Meclis li qeysa wê ye*
*Ne ji bejna wê sohrê ye*
*Ji xwe re dikim keyfê ye*
*Dikim keçkê ramîsim*
*Em çi-b'kin emrê Xwedê ye*
*De Sêva min*
*De berxa min*
*Tu yî xewna min*
*Were bi min*
*Tu yî sêva min*
*Sêva mêêên*
*De Sêvê çavbelekê*
*Xewxweşa ser dewşekê*
*De Sêvê çavbelekê*
*Keça singa li duka we tê*
*Heçkî Sêvê ya wa bê*
*Sê ro dizî ji felekê*
*De sêva min*
*Were ba min*
*Hat xewna min*
*Tê bîra min*
*Were Sêva min*
*Sêva mêêên*
*Gava werim te bixwazim*
*Pera bidim serfîraz im*
*Gava werim te bixwazim*
*Pera bidim serfîraz im*
*Heçî li mi ne xayîn bê*
*Lihêf nibê di nav de razim*
*De Sêva min*
*Hat xewna min*
*Wey Sêva min*
*Sêva mêêên*

## EZ JI GUNDIYA NEWÊRIM

*Îşev şeva berfê yo*
*Dibê ez jî bêm razêm*
*Cîya deyne li odê yo*

*Dibê ez jî bi te re bêm*
*Ji boy xatrê xewê yo*
*Dibê ez ji bi te re bêm*
*Lê Eyşanê lê nayêm*
*Îşev şeva baranê*
*Dibê bêtim û razêm*
*Ciya deyne bin heywanê*
*Dibêez jî bi te re bêm*
*Ji boyxatrê razanê*
*Dibê ez jî bi te re bêm*
*Lê ez jî gundîya newêrim*

## KEÇKOKÊ BIMEŞ

*Keçkokê bimeş bimeş*
*Xulama wa çavê reş*
*Keçkokê bimeş bimeş*
*Xulama wa çavê reş*
*Ramûsanek bidê min*
*W ezê bêjim: Siet xweş*
*Mi bakir: Wa keçkokê*
*Şêrînê şemmamokê*
*Mi ba kir: Wa keçkokê*
*Şêrînê Şemmamokê*
*Fîstankurt li ser çakokê*
*De were balê ji te tê*
*Keçokê w ez gune me*
*Ez aşiqê çavê te me*
*Keçkokê w ez gune me*
*Aşiqê çavê te me*
*Aşiqê memkê te me*
*Serê memka hewce me*
*Ramûsanek bidê min lê*
*Hellîyan tahm tê nema*
*Keçkokê bimeş bimeş*
*Xulma wa çavê reş*
*Keçkokê bimeş bimeş*
*Xulama wa burhê gez*
*Wan kezyê gez*
*Ramûsanek bidê min*
*W ezê bêjim: Siet xweş*

*Sieta te xweş*
*Gava mêrê te bimrê*
*W ezê bêjim: Serê te xweş*
*Ax lê were wer lê lê*
*Were, were, were lê*
*Lê were lêêêê......*
*Keçkokê w ez gune me*
*Aşiqê memkê te me*
*Keçkokê w ez gune me*
*Serê memka hewce me*
*Zer bûme weke şima*
*Tişt di halê mi de nema*
*Hemû ji qal û derhem*
*Ramûsanek bidê min lê*
*Sibe li ser riya xwe me*

## XWEŞIKA ÇAVXEZAL

*Min dî serkej li serê wara*
*Çavê wê çavê xezala*
*Min dî serkej li serê wara*
*Çavê wê çavê xezala*
*Xweşik e lê çi delal e!*
*Kerem bike em herne male*
*Were şêrîn*
*Kanê şêrîn?*
*Waye şêrîn*
*Nêrde şêrîn?*
*Were şêrîîîn...*
*Wa keçkokê w ez gune me*
*W ez aşiqê çavê te me*
*Wa dellalê w ez gune me*
*W ez aşiqê memkê te me*
*Dîtna çava bê feyde ma*
*Serê malê l'hêvîya te ma*
*Çav qurrimî li benda te ma*
*Were şêrîn*
*Nêrde şêrîn?*
*Kanê şêrîn?*
*Tu gul şêrîn*
*Were şêrîn*

*Were şêrîîîn....*
*Wa şêrînê peya were*
*Wezê di bextê bavê te de*
*Wa delalê peya were*
*Wezê dibextî dayka te de*
*Destê rastê bi seet e*
*Tu were bi ser mala me de*
*Keçê wele çi adet e*
*De em herine bi mala me de*
*Ramûsanek tu bide min*
*L'wan kuçikê li binya me de*
*were şêrîn*
*Kanê şêrîn?*
*waye şêrîn*
*Nêrde şêrin?*
*Tu gul şêrîîîn.....*
*Wa şêrînê w ez gune me*
*W ez aşîqê çavê te me*
*Wa delalê w ez gune me*
*Serê memka w ez hewce me*
*W ez helîyam halêm nema*
*Destê xwe b'de destê mine*
*Ez aşiqê çûye w avê*
*Çavêm li hêvya te qurrimî*
*Keçikê lê, çima tu nayê?*
*Wele ezê te b'revînim*
*Te bavêjim wê Bexdayê*
*Serê zimanê min gihayê*
*Tehma wan memka xweş e*
*Êevarê zewqa te nayê*
*Bi te ra ketme çi belayê?*
*Were şêrîn*
*Kanê şêrîn?*
*Nêrde şêrîn?*
*A waye şêrîn!*
*Kanê şêrîîîn......*

# KEÇIKA AWURDAYÎ

*Ez û keçkê niha hanê*
*Awurê wê dehfe dayê*
*Ez û wêna niha hanê*
*Awurê wê dehfa dayê*
*Gava hate bo dawetê*
*Bihna qolanya mi xwayê*
*Keçê wele ez tobedar im*
*Nav ciha de w ez dinalim*
*Ez aşiqê wanê kubar im*
*were lê lê, were, were*
*Were lê lêêê*
*Wa sebavê kiça dêlê*
*were lê lê lê*
*Were lêêê lêêê*
*Îro sebt e, siba lehd e*
*Dilê mi ketye behrê de*
*Îro sebt e, siba lehd e*
*Dilê mi ketye xema de*
*Wê gula d'nava bexçe de*
*Wê dilêm girt û bada*
*Ramûsanek çi mirad e!*
*Were were, were lê lê*
*Were were, were lê lê*
*Wa sebavê keça dêlê*
*Tu wê ji mêrik newêre*
*Were lê lêêê*
*Were lê lêêê......*
*Êgir girtye dêza çilo*
*Ez şewitîm li benda rez e*
*Dinya-alem dezewicî*
*Debê keçik pir bi lez e*
*Keçkê de wer ez bi lez im*
*Ramûsanekê bide min*
*W ezê j' kerbê ez helîyam*
*Keçikê lê were bi lez e**
*Were were, were lê lêêê*
*Wa sebavê keça dêlê*
*Te xewxweş ê ser inzêlê*
*Were lê lêêê*
*Weer lê lêêê........*

## EMAN XANIM

*lê,lê,lê,lê, xanimê*
*Ema neman wer xanimê*
*Bavê te tu nadi minê*
*Çavê mi li bejna te tenê*
*lê lê lê xanimê*
*Bûka mala bavê minê*
*Serê çava dîtinê*
*Dikim-nakim nadî minê*
*Xanimê di binya me de*
*Ezi di bextê bavê te de*
*Xanimê di binya me de*
*W ezê di bextê bavê te de*
*Bişkokê te saet e*
*Rabe em heme bi mala me de*
*W ezê te birevînim*
*Keçê di bextê xwe de*
*Ema nema wer xanimê*
*Bûka mala bavê minê*
*Ezîza canê min ê*
*Li ser te tême kuştinê*
*Lê nemem lê nemam*
*Were were wa xanimê*
*Waaa xanimêêê*
*Min di bû li serê bana*
*Minê di bû l' serê bana*
*Çavê te çavxezal e*
*pa çavê te çavxezal e*
*Ramûsankê bide min*
*Piştî wan çavê tey delal e*
..........................
*Were were wa xanimê*
*Lê nema wa xanimê*
*Tu bûka mala bavê min ê*
*Lê xanimêêê*
*Waaa xanimêêê.........*

## NAZIKA NAZENÎN

*lêêê........................*

*Were keçkê Qamîşlo*
*Mala me bixwo li Nisêybînê*
*Wa nazikê nazenînê*
*Dil û navê mi dihelînê*
*Derman bike va birînê*
*Were lê nazenînê*
*Were lê,were lê lê*
*Were lê lê,were lê*
*Were lê, were lê*
*Were lê lê.*
*Mala keçikê li Batmanê*
*Wa şêrînê dilovanê*
*Tehma memkê te Xweş in lê*
*Weka sêv û pirteqan ê*
*Bi neqlîyata avê çemê*
*Sokak bi li vê Batmanê*
*Şêrînê dilovanê*
*Tu derdê dilêm dizanê?*
*Xweşikê wa rihanê*
*Were lê, were lê lê*
*Were lê, were lê*
*Were lê were lê*
*Sere lê were lê*
*Were lêêê.......*
*Mala me bi xwe li Midyadê*
*Mala keçkê li ber w avê*
*Raûf terka te wê nadê*
*Were lê tu bixêr hatê*
*Li ser çavê mi hatê*
*Were lê were lê lê*
*Were lê lê*
*Sebav ê keça dêlê*
*Were lê lê were lê*
*Were lêêê*
*Tu bixêr hatê*
*Bira me li vî berrî dî*
*Weka xwe jî min nedî*
*Ew kirasê te ringî*
*Wekê qahpik te-n nedî*
*A wiha ji vî beledî*

*Wereeee, wereee,*
*Wereee, wereee.*
*Şev û bi ro li mala we bûm*
*Radîtinê têr nebûm*
*Randima te qurrimî*
*Ramûsanek bidê min*
*Lê qahpîk weka te nedî*
*Nedîîîî*
*Nedîîîî*
*Nedîîîî*
*Çavî-m li riha te qurrimî*
*Lê qahpik weka te-n nedî*
*Nedîîîî*
*Nedîîîî*
*Nedîîîî*
*Keçkokê dinya dem e*
*Aşiqê çavê te ma*
*Madem li hêvya teeema*
*Çav li riyê qurrimî*
*Ramûsanêki bidê min*
*Lê qahq weka te nedî*
*Nedîîîîî*
*Nedîîîîî*
*Nedîîîîî*
*Ramûsanek bidê min*
*Lê qahp weka te nedî*
*Nedîîîîî*
*Nedîîîîî*
*Nedîîîîî*

## LI VAN GOTINA BIHIS

*Ema neman Hesîna*
*Ez ji kerbê te w-ez mirî ma*
*ramûsanekê bidê min*
*Wa gotina bihisîna*
*Ka Hesîna?*
*Ka Hesîna?*
*W ez ji kerbê te w-ez mirî*
*Wa Hesîna!*
*Wa Hesîna!*

*Mi çi go, te dey-nekir*
*Mi keçik dî bû li sikakê*
*Mi soz da bû bi te ra*
*Tu wê rabû yekî xwe kir*
*Tu wê rabû xayintî kir*
*Tu wê rabû xwelî li xwe kir*
*Wa Hesîna!*
*Waaa Hesîna!*
*Wa Hesîna!*
*Wa Hesîna!*
*Ji kerbê wabê (bavê) te mirî ma*
*Wa Hesînaaaaa...............*
*W ezê bi çeplê te bigrim*
*Bavêjime Diyarbekir*
*Te xwe ji mêrik safî nekir*
*Tama memkê te çi xweş bû*
*Tu wê li min loma nekê*
*Wa Hesîna*
*Lê, ji kerbê te mirî ma*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Hesîna di li sikakê*
*Çima tu wê his ji xwe nakê*
*Wa birîhên xwe qelem nakê*
*Tu xwe ji mêrik safê nafê*
*Tama memkê te çî xweş bûn*
*Çima tu xwe li min bawer nakê*
*Waaaa Hesîna*
*Waaaa Hesîna*
*Ka Hesîna?*
*Ka Hesîna?*
*Hesîna hat Reşîna*
*Mi dî li devê goyê mîya*
*Tama xweşik li cayê cayê*
*Terha we lew ejnebî ye*
*Mi yê weke te nedî ye*
*Çi xweşik e, çi spehî ye*
*Wa Hesîna û şêrîn a*
*Nazenîn a*

*Wa Hesîna!*
*Ka Hesîna?*
*Hasîna tu dey-nekê*
*Mi Hesîna dî lisikakê*
*Wan birha tu qelem nakê*
*Ramûsanekê tu bide min*
*Tu xwe ji mêrik safî nakê*
*Tu wê li min lê mehr nakê*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Bavê te e nas nakim*
*Ku tu bêje wa Hesîna*
*Tama memkê te çî xweş e*
*Weka tama hunguvîn e*
*Li zozana a anîna*
*Dilê mi re çi derman e*
*Çi berîn e!*
*Ew hat, ma ne birîne e?*
*Tu li van xebera bihisîne*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Ka Hesînaaa...........?*
*Hesîna dî li sikakê*
*Wan birîhê xwederman nakê?*
*Tu xwe ji mêrik safî nakê?*
*Rabe em herin serayê*
*Were rab em herin serayê*
*Keçikê çima tu nayê?*
*Bi te xewa van çava nayê!*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesîna*
*Wa Hesînaaa.........!*
*Hesîna hat Reşîna*
*Mi dî li devê goyê mîya*
*Tama xweşik li cayê cayê*
*Terha we lew ejnebî ye*
*Mi yê weke te nedî ye*
*Çi xweşik e, çi spehî ye*

*Wa Hesîna û şêrîna*
*Nazenîn a*
*Wa Hesîna!*
*Ka Hesîna?*

## TE NADIM MIN

***W ez jî te dixwazim, wa gulîsarê***
***Eger te nadin min, bi darê zorê***
***W ez te dixwazim, Waaa porsorê***
***Eger te nedên min, bi darê zorê***
***Çime Stenbolêêêê............***
***W ezê digeriham li serê çîya***
***W ez pe digeriham wekî eşqîya***
***W ezê digeriham li va serê çîya***
***W ezê digeriham wekî eşqiya***
***Ez te dixwazim wa gulîsorê***
***Eger te nadin min bi darê zorê***
***W ezê bi çeplê te bigrim,***
***Çime Stenbolê***
***Eger wa dera, va dera li Anedolê***
***W ezê digeriham wa ev şevreşê***
***Eger te nabînim min û bextreşê***
***W ezê digeriham di vê şevreşê***
***Eger te nabînim min û vê bextreşê***
***W ez te dixwazim wa kezîsorê***
***Eger te nadin min çime Stenbolê***
***Çime Eqseray***
***Çime Şkulkul***
***Wêde ditir kur***
***Çime Teqsîmê***
***W ezê te birevînim***
***Çime Anedolê***
***W ezê b'çeplê te bigrim***
***Bibim Stenbolê***
***W ezê digeriham li va serê çîya***
***Bejn û bala min wekî eşqîya***
***W ezê digeriham li va serê çîya***
***Bejn û bala min weka gedeyya***
***W ez te dixwazim lê***
***Waaa gulîsorê***

*Eger te nadin min bi darê zorê*
*Çime Stenbolê*
*Çime b'Anedolê*
*Çime b'Anedolê*

## ÊMÎŞÊ ÊMO

*Êmo Êmo Emooooooo lêlê lê, lêlê*
*Êêêmoooooo.........*
*Tu here w ezê bêmo*
*Lêlê lêêê Êêmo*
*Aşiqê wê bejnê mo*
*Lêlê lê Êêêêmo*
*Ez dikim bimrim nebînim*
*Lêlê lê Êêêmo*
*Hesreta mala bavê mo*
*Êmoooooooooooooo*
*Lêlê lêêê çavreşê Êêmo*
*Êmo Êmo êmîşê lêlê lê Êêêmo*
*Koçera deşta Mûşê lêlê lê Êêêmo*
*Memkê wê votin e*
*Telika wê votin e*
*Xweşikê wê votin e*
*Kudikê wê votin e*
*Unlekêr-rût firoşê*
*Lêlê lê Êêêmo*
*Êmo*
*Emo!*
*Waaa Êmo*
*Kaaa Êmo?*
*Êmo lê!*
*Lêlêlêlê çav reşê lê*
*Lêlêlê............*
*Ez yomirta dibînim*
*Lêlêlê Êêêêmo*
*Ez yomirta dibînim*
*Lêlêlêlê Êêêmo*
*Ez kim bimrim nebînim*
*Lêlêlê Êêêmo*
*Elema çarde sala lêêêê*
*Lêlêlê Êêêmo*

*Wez kim bimrim nebnin*
*Wer, wer Êêêêmo*
*Êmoooooooooo*
*Êmo!*
*Êmo lê,*
*Çavreşê lê*
*Êmo!*
*Êmo! Êmo lê!*
*Lêlêlê Êêêmoooo*

## DÎLANA BOTA

*Ax lêêê............*
*Lêlêlê, lêlêlê, lêlê,lala*
*Lêlê, lêlê,lêêêêêêêêêê*
*W ez çûm Civîrê*
*Cizîr hatibû Cizîrê*
*Cizîr liber avê*
*Cizîr li ber avê*
*Keçkê Hebabya hema*
*Xwe berdan avê*
*Kurpekî îdan lo bira*
*Li bejna ziravê*
*Min ji gewrê pêve lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêlê*
*Mi kezik navê*
*Ax lêêê...........*
*Lêlê, lêlê,lêlê, lêlê*
*Lêlê, lêlê, lêêêêêêêêê*
*Hatibûm Cizîrê*
*Cizîr wî-yalî*
*Keçikê Hebabya hema*
*Xwe berdan vî-yalî*
*Keçikê Hebexî gidyano*
*Xwe avêtin wî rexî*
*Qîzkê Omerya gidyano*
*Bazdan wî-yalî*
*Qîzkê bajarya lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêlê*
*Werin vî-yalî*
*Xevtan li gazî lo*

*Heçî gaz bi hezarî*
*Hezar bimbarik a hah*
*Li bejna çinarî*
*W ez bê aqil im lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêêêê*
*W ez bim sewdalî*
*Aqlê mi dîn girt gidyano*
*Sewda neda wî*
*Bi vî çavreşî lêlê*
*Lîlî lîlî lîlî lîlî*
*Di ez ketme vî halî*
*W ez vî aqilî lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêêêêêê*
*W ez vî sewdanî*
*W ez çûm Cizîrê lêêêê*
*Lêlê lêlê lêlê lêlê*
*Lêlê lêlê lêêêê*
*Cizîra Bota*
*Cizîr wenda bû lo bira*
*Cizîr wenda bû lo bira*
*Li dîlana Bota*
*Şewqa xizêmê a hah*
*Da bû Reşkota*
*Mi bi xwe pesinî lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêlê*
*Lêlê lêlê lêêêê*
*Heta îcota*
*Bila bihata lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêlê*
*Lêlê lêlê lêêêê*
*Mi derdê xwe bigota*
*Rabim hewar kim lêêê*
*Rabim eman kim*
*Şara eman kim*
*Şara Cizîra lo keko*
*Bi enya gewra kim*
*Fîstankî naylon a hah*
*Be ser qamêda kim*
*Zêrê reşadî lêlê*
*Lêlê lêlê lêlê lêêê*

*Bi ser singêda kim*
*Mêrkê te bimrî bê bav*
*Jinê te mar kim*
*Wele tu wele yî*
*Bile tu bile yî*
*Singa te gewr e çavreş*
*Navê te lê ye*
*Ez misilman im lêlê*
*Lêlê lêlê lêêê*
*Qîzik file ye*
*Dilê-m tê heye*

## AX LÊ NÛRÊ

*Ax lê Nûrê lê Nûrê*
*Ay lê Nûrê*
*Ax lê Nûrê lê Nûrê*
*Sebav Nûrê*
*Tu kineke bê qisûrê*
*Ay lê Nûrê*
*Kineke bê qisûrê*
*Zalim Nûrê*
*Ez çi-bikim tu ji min dûr ê*
*Bê bav Nûrê*
*Ez çi-bkim tu ji min dûr ê*
*Ay lê Nûrê*
*Ava bîra Famitê*
*Sebav Nûrê*
*Meşkê sûka Êstulê*
*Ay lê Nûrê*
*Meşkê sûka Êstilê*
*Ay lê Nûrê*
*Dimsê sûka Mizbûrê*
*Ay lê Nûrê*
*Dimsê sûka Mizbûrê*
*Ay lê Nûrê*
*Qîza mêrkê mamûrê*
*Ay lê Nûrê*
*Dostka xwedîyê tenbûrê*
*Bê qisûrê*
*Ay Nûrê te kir te kir*

*Ay lê Nûrê*
*Ma wê nûrê te kir te kir*
*Sebav Nûrê*
*Qupçê singê ji mi-r vekir*
*Ay lê Nûrê*
*Qupçê singê ji mi-r vekir*
*Sebav Nûrê*
*W ez zarû mi nedzanî*
*Ay lê Nûrê*
*Ez zarû mi nedzanî*
*Ay lê Nûrê*
*Bêdilîka mi nekir*
*Sebav Nûrê*
*Miradê dilê xwe kir*
*Yavrim Nûrê*
*Hat bû Nûra koçera*
*Ay lê Nûrê*
*Hat bûNûra koçera*
*Sebav Nûrê*
*Fîstanê l'bejnê zer e*
*Ay lê Nûrê*
*Fîstanê l'bejnê zer e*
*Sevav Nûrê*
*Canê mi bi canî te re*
*Ay lê Nûrê*
*Canê mi bi canê te re*
*Ay lê Nûrê*
*Rihê mi bi rihê re*
*Ay lê Nûrê*
*Rabim Nûrê birevînim*
*Ay lê Nûrê*
*Bibim ji canê xwe re*
*Sebav Nûrê*
*Hat bû Nûra hecîya*
*Ay lê Nûrê lê*
*Hat bû Nûra hecîya*
*Sebav Nûrê*
*Ew çû bû mi nedî ye*
*Ay lê Nûrê*
*Ew çû bû mi nedî ye*

*Fîstankî bajarî ye*
*Ay lê Nûrê*
*Fîstankî bajarî ye*
*Sebav Nûrê*

## KIRÎVÊ LÊ

***Wer kirîvê wer kirîvê***
***Kirîvê lêêêêêêêêêêêêê***
***Wer kirîvê wer kirîvê***
***Kirîvam wer Henna***
***(Ev malik du car tê gotin)***
***Destê Hinna bi bazino Kirîvê lêêê lêêê***
***Destê Hinna bi bazino***
***Kirîvam wer Hinna***

***Wer kirîvê wer kirîvê***
***Kirîvê lêêêêêêêêêêêêê***
***Wer kirîvê wer kirîvê***
***Kirîvam wer Henna***
***(Ev malik du car tê gotin)***
***Destê Hinna bi bazino***
***Kirîvê lêêêê lêê***
***Destê Hinna bi bazino***
***Kirîvam wer Hinna***
***Hinna ji malik mezino***
***Kirîvê lêêê lêê***
***Hinna ji malik mezino***
***Kirîvam wer Hinna***
***Rabim Hinna birevînim***
***Kirîvê lêêêê lêê***
***Bi bavêm avê Hesino***
***Kirîvam wer Hinna***
***Nisêrbînê bi qişle ye***
***Kirîvê lêêêê lêê***
***Nisêrbînê bi qişle ye***
***Kirîvam wer Hinna***
***Rêka Xaço av tê re ye***
***Kirîvê lêêêê lêêê***
***Rêka Xaço av tê re ye***
***Kirîvam wer Hinna***

*Bi wê Qurana di mala me ye*
*Kirîvê lêêêê lêê*
*Bi wê Incila di mala we ye*
*Kirîvam wer Hinna*
*Dilê min û te di hev heye*
*Kirîvê lêêê lêêê*
*Dilê min û te di hev heye*
*Kirîvam wer hinna*
*Rabim Hinna birevînim*
*Kirîvê lêêêê lêê*
*Efû li ba Xwedê heye*
*Kirîvam wer Hinna*
*Nisêrbînê bi dikan e*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Nisêrbînê bi dikan e*
*Kirîvam wer Hinna*
*Singa gewram li meydan e*
*Kirîvê lêêêê lêêê*
*Singa gewram li meydan e*
*Kirîvam wer Hinna*
*Alîkî deşt e, yek zozan e*
*Kirîvê lêêêê lêê*
*Alîkî deşt e, yek zozan e*
*Kirîvam wer Hinna*
*Nisêrbînê li ber avê*
*Kirîvê lêêêê lêêê*
*Nisêrbînê li ber avê*
*Kirîvam wer Hinna*
*Qîz û xorta dayi navê*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Qîz û xorta dayî navê*
*Kirîvam wer Hinna*
*Gewra mi bejinzirav ê*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Gewra mi bejinzirav ê*
*Kirîvam wer Hinna*
*Silav şandî ser silavê*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Silav şandî ser silavê*
*Kirîvam wer Hinna*

*J'gewrê pêva mi tu kes navê*
*Kirîvam wer Hinna*
*Bejna Hinna şiva ter e*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Bejna Hinna şiva ter e*
*Kirîvam wer Hinna*
*Ba lê dixe ji xwen û mere*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Rabim Hinna birevînim*
*Kirîvam wer Hinna*
*Bibim ji rih û canê xwe re*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Bibim ji rih û canê xwe re*
*Kirîvam wer Hinna*
*Kirîvam ji dêrê tê*
*Kirîvê lêêê lêê*
*Kirîvam ji derê tê*
*Kirîvam wer Hinna*
*Ji dêra Keverzo tê*
*Kirîvê lêêêê lêê*
*Ji wê dêra Keverzo tê*
*Kirîvam wer Hinna*
*Bihna nûrê ji singa wê tê*
*Kirîvê lêêêê lêê*
*Bihna nûrê ji singa wê tê*
*Kirîvam wer Hinna*

## GEWRA KINIK

*Bavê gewrê çû hecê*
*Bavê gewrê çû hecê*
*Wey emrê rebbê ilahî*
*Îşella venegerê*
*Hezar qrûşê manê*
*W ez gewrê têxim bedêlê*
*Kinê kinê kinê kinê*
*Kinê kinê kinê kinê*
*Kinê kinê kinê kinê*
*Tu helala canê min ê*
*Bavê te xezûrê min ê*
*Dayka te xesûka min ê*

*Banadêdî: Bi qeştînê*
*Te nade min bi revandinê*
*Rabim kinê birevînim*
*Xwe bavêm şahê Ecemê*
*Ay kinê kinê kinê*
*Xelk kinikin ne wek te ne*
*Wele kesî nahubînim*
*Nahubînim nahubînim*
*Nahubînim nahubînim*
*B'Xwedê w ez kesî nakim*
*Ez cotê memka ez venakim*
*Miradê bê his venakim*
*Wele kesî nahubînim*
*Nahubînim nahubînim*
*Nahubînim*
*Ez lawê apê xwe nakim*
*Lawê xalê xwe nakim*
*Bi Xwedê ez gundîya nakim*
*Bi Xwedê w ez şêxa nakim*
*Bi Quranê w ez mela nakim*
*Bi Xwedê w ez seyîda nakim*
*Ew keskê serê wan şîn in*
*Nava wana wek tenî nin*
*Bi Xwedê w ez hecya nakim*
*Bi Xwedê w ez hecya nakim wey*
*Nîvê wana qaçaxçî nin*
*Bi Xwedê w ez etara nakim wey*
*Şevkê li malê xwe namînin*
*Bi Xwedê w ez qaçaxçîya nakim*
*Bi Xwedê w ez qaçaxçîya nakim lê*
*Hem kuştînin him mirinin*
*Malê wa bi xelkê dimînin*
*Ay kinê kinê kinê*
*Bi Xwedê e ez feqîra nakim*
*Cilkêwana qetyayî nin*
*Bi Xwedê şivana nakim wey*
*Li çol û çîya digerînin*
*Bi Xwedê ez bajarya nakim*
*Ez qupçê singa ez venakim*
*Bin Mêrdînê Qubalî ne*

*Qubalî ne, Qubalî ne*
*Qubalî ne, Qubalî ne*
*Ew xwedyê pîvaz-hîşîn in*
*Bi Xwedê w ez Qubalya nakim*
*Bin Qubala Rişmilî nin*
*Ew mêvana nahewînin*
*Bi Xwedê w ez Rişmilya nakim*
*Bin Rişmilê Masetî nin*
*Masetî nin, Masetî nin*
*Kurt û qutê wa pir in*
*Aqla l'serî diçelqînin*
*Kinê kinê yeka ciwan e*
*Mi sond xwarî bi Yasînê*
*Bi Quranê*
*Bi Xwedê ez kesî nahubim*
*Ji xeynî Silêmanê tenbûrvan e*
*Ay kinê grover ê*
*Sibhan nema ji navê te re*
*Piştî nanêd we ra denê*
*Xelkêd kin ne wek te ne*

## GEWRÊ NAYÊ

*Hêêêêê.........*
*Nahê de nahê lê*
*De nahê nahê nahê*
*Nahê de nahê lê*
*Wê va zeryê çema nahê*
*Zeryê çema nahê*
*Qîza şêxê Teya hê*
*Qîza şêxê Teya hê*
*Tu bûka şêxê Şema hê*
*Bûka şêxê Şema hê lê*
*Sed hezar qelen dahê*
*Sed hezar qelen dahê lê*
*Bîst hezar xelat dahê*
*Bîst hezar xelat dahê lê*
*De nahê gewrê nahê*
*Hêhêêêêê..........*
*Nahê de nahê lê*
*De nahê gewrê nahê*

*Mi dîyê te nedîyê lê*
*Mi dîyê te nedîyê*
*Mi dîyê te nedîyê lê*
*Liser banê xênî yê*
*Ser banê xênî yê lê*
*Wê sêvoka hecîyê*
*Sêvoka hecîyê*
*Mi li eslê gewrê pirsî yê*
*Eslê gewrê pirsîyê lê*
*Çavreşê bajarî yê*
*Çavreşê bajarî yê lê*
*Dosta lawkê Omerî yê*
*Lawkê Omerîyê lê*
*De nahê dahê nahê*
*Nahê de nahê lê*
*Mi dî li deryê serahê*
*Nahê de nahê lê*
*Te dî li deryê serahê*
*Nahê de nahê*
*Tu xortek ala çema hê*
*Nahê de nahê*
*Tu xortek ala çema hê*
*De nahê gewrê nahê*
*Nahê de nahê lê*
*Mijdî lideryê kulekê*
*Nahê de nahê lê*
*Çavreşê çav belekê*
*Nahê de nahê lê*
*Çavreşê çavbelekê*
*Nahê de nahê*
*Rêpirçê sing ji werdekê*
*Nahê de nahê lê*
*W ez zarû û xeşîm im*
*Nahê de nahê*
*Tu bêdilîka mi nekê*
*Nahê de nahê*
*Tu bêdilîka mi nekê*
*Nahê de nahê*
*De nahê gewrê nahê*

# WER GOVEND Û DÎLANÊ

*Hêhêêê...........*
*Eyşê Eyşê Eyşanê Eyşanê*
*Eyşê Eyşê Eyşanê Eyşanê*
*Wer govendê,dîlanê Eyşanê*
*Lê Wer govendê, dîlanê Eyşanê*
*Mi Eyşê dî derencê de*
*Eyşanê*
*Bêbav dî derencê de*
*Eyşanê*
*Pîkê xwe l'pîkê wê de*
*Eyşanê*
*Em tevde ketne hewşê de*
*Eyşanê*
*Hewşa mala bavê de*
*Eyşanê*
*Hewşa mala bavê de*
*Eyşanê*
*Em ketin xêra Xwedê de*
*Eyşanê*
*Mi dî bû li devê derî*
*Eyşanê*
*Mi dî bû li devê derî*
*Eyşanê*
*Sîng penîrê koçerî*
*Eyşanê*
*Wey tu bi guharê Heyderî*
*Eyşanê*
*Tu bi guharêHeyderî*
*Eyşanê*
*Wey Eyşê Eyşê Eyşanê*
*Hoppanê*
*Eyşê Eyşê Eyşiko*
*Eyşiko*
*Wey Eyşê Eyşê Eyşiko*
*Eyşiko*
*Mê kewa ser ferşik o*
*Eyşiko*
*Mêkewa serferşik o*
*Eyşiko*

*Rebbî tu miradê me biko*
*Eyşiko*
*Rebbî tu miradê me biko*
*Eyşiko*
*Bi wê keçka xweşik o*
*Eyşiko*
*Bi wê qîzka xweşik o*
*Eyşiko*
*Mi dî bû Nisêrbînê*
*Eyşanê lê*
*Te di bû NIsêrbînê*
*Eyşan ê*
*Mehla Qişle d'lezînê*
*Eyşanê*
*Mehla Qişle d'lezînê*
*Eyşanê*
*Çavreşê diberqînê*
*Eyşanê*
*Wê rûsorê te çavşîn ê*
*Eyşanê*
*Rûsor ê, te çavşîn ê*
*Eyşanê*
*W ez rabim Eyşê b'revînim*
*Eyşanê*
*Rabim Eyşêb'revînim*
*Eyşanê*
*Tirsam ji hebsa Mêrdînê*
*Eyşanê*
*Wey tirsam ji hebsa Mêrdînê*
*Rep Xalibê diqulpînê*
*Wey axir ceza datînê*
*Hoppanê*

## QAYDÊ XIRPANÎ

*De lêêê lê de lêêê lê*
*A mi d'go te nanî*
*De lêêê lê de lêêê lê*
*A mi d'go te nanî*
*Wek nihîna du canî*
*De lêêê lê de lêêê lê*

*Wek avîya bi kanî*
*De lêêêê lêêê de lêêê lê*
*Wek avîya bi kanî*
*Wey keşko lawko xirpanî*
*Hema lêxin xirpanî*
*Keçko lawko xirpanî*
*E çûm Bêrûdê kermalî*
*Bêrûdê bi kermalî*
*Mi salek kir bû himalî*
*Mi kir bû himalî*
*Du sala kir bû rûşberî*
*Du sala kir bû rêşberî*
*Mi salkî kir bû hamalî lê*
*Mi salkî kir bû gavanî*
*Mi kir bû gavanî*
*Mi du sal kir bû şivanî*
*Mi kir bû şivanî*
*Mi barik qaçax anî*
*Barik qaçax anî*
*Mi îsal kir bû çawişî lê*
*Mi îsal kir bû çawişî*
*Mi da bi kilê sibhanî lê*
*Mi têra çavê te nanî*
*Xorte kir torevanî*
*Wey qulequltê Mihelmî*
*Qulequltê Mihelmî*
*Wey keçko lawko xirpanî*
*Lo lawko xirpanî*
*W ez hatim alîyê vî-yalî*
*Çûbûm alîyê wî-yalî*
*Wey cabika nestirînî*
*Ser xanîya re hedîsî*
*Xanîya re hedîsî*
*Û mil çêkirin bizbûrî*
*Çêkirin bizbûrî*
*Barût çêkirin bezekî*
*Çêkirin bezekî*
*Ha no xwarzîyê mi çar in*
*Xwarzîyê mi çar in*
*Di nav de birakê te nehatî*

*Birakî te nehatî*
*Simbêl sor fîstanê sorî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*Wê çûbûm alîyê wî-yalî*
*Simbêl sorê Heyderî*
*Simbêl sorê Heyderî*
*Lê serbana ji fesadî*
*Serbana ji fesadî*
*Şixulkirê Kermêtî*
*Weke ê Kermêtî lê*
*Tenbûr çêkir sivanî*
*Tenbûrçêkir sivanî*
*Qereçî ne ji xwe partî*
*Qereçî ne ji xwe partî*
*Ewil ji şêxa re teslî*
*Ewil ji şêxa re teslî*
*Wey bê xefl û birincî*
*Bê xefl û birincî*
*Weka Çeto aqincî*
*Weka Çeto aqincî*
*E çûm xwedî sê jinê dî*
*Xwedî sê jinê dî*
*Kevok in xirdê hecî*
*Kevok in xirdê hecî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*Çûbûm alîyê wî-yalî*
*Mi dî bi rişkê Alûcî*
*Mi dî rişkê Alûcî*
*Du mêkewê xurpanî*
*Weyla go, yadê xurpanî*
*Hatbûm alyê vî-yalî*
*We çûbûm rexê wî-yalî*
*Cem ezmanê wî Yêzdî*
*Cem ezmanî wî Yêzdî*
*Simbêlê sor fîstanê sorî*
*Simbêlê sor fîstanê sorî*
*Tu bi qaçaxî dibêjî*
*Tu bi qaçaxî dibêjî*
*Teşqelçiyê Dîyarbekir*
*Teşqelçîyê Dîyarbekir*

INSTITUT KURDE de PARIS
BIBLIOTHÈQUE

*Hatim alîyê vî-yalî*
*Hatim alîyî vî-yalî*
*E çûm Biyeta rengî lê*
*E çûm Biyeta rengî*
*Mi qama yekê pîva*
*Li ser bextê Silê bi lê*
*Ji sê bihusta ma yekî*
*Ji sê bihusta ma yekî*
*Mi tiştê wilo mi nedî*
*Ez kewişîm ji şêrizkê kurikî*
*Ez kewişîm ji şêrizkê kurikî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*Çûbûm alîyê wî-yalî lê*
*Li nav tahta de borî*
*Li nav tahta re borî*
*Hatim aîlyê vî-yalî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*Ha li fireyê hecî*
*Li firêxê hecî*
*Tu bi qelêrê miştînî*
*Bi qelêrê miştînî*
*Hatim Salata rengî*
*Hatim Salata rengî*
*Mi ordekik wêde dî*
*Ordekik wêde dî*
*Bi guharê Heyderî*
*Singpenîrê koçerî*
*Li va çîmê di badayî*
*Li va çîmê giddikî*
*Li va zendê badayî*
*Li va zendê badayî*
*Çar bihust û çar tilî*
*Çar bihust û çar tilî*
*Mi li eslê Gewrê pirsî lê*
*Bavê nefsê Talacî*
*Hatin alîyê vî-yalî*
*Wê çûbûm rexê wî-yalî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*E çûbûm kurka Çeto lê*
*Mi keçik wê didî*

*Mi keçik wê didî*
*Mi çarika wê hilda*
*Mi çarika wê hilda*
*Bi dê û bavêd heramê*
*Mi takî mû bi serî nedî*
*Mi takî mû bi serî nedî*
*Mi eslê keçkê pirsî*
*Keçka Yaqûbû tivingî*
*Delalê*
*Şêrînê*
*Xweşikê*
*Memikê*
*Xirpanî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*Wê çûbûm rexê wî-yalî*
*Ji nav te kar bû bi lalî*
*Ji nav te kar bû bi lalî*
*W.ez hatim rexê vî-yalî*
*Ew mastfiroşê Dala*
*Ew mastfirşê dala*
*Xwe berda xetta Sûrî*
*Çûbûm xetta Sûrî*
*Çapozîdê yahûdî*
*Çapozîdê yahûdî*
*Egalxwarê tenbûrî*
*Egalxwarê tenbûrî*
*Hatim alîyê vî-yalî*
*Çûbûm alîyê wî-yalî lê*
*Bênamûs.............î*
*Namûsiz.............î*
*Wey keçko lawko xirpanî*
*Lê a mi digo, te nanî*

## DERDÊ QÎZA ZINARA

*Det wer wer wer wer wer*
*Weeer weeeeew weeeer wer*
*Det wer wer wer wer wer*
*Ez xulam memkê grover*
*Xulam memkê grover*
*Wey serî sor û binî zer*

*Serî sor û binî zer*
*Wek berfa zinarê*
*Wey siya çara te bi ser*
*Siya çara te bi ser*
*De wer wer kezîzer*
*Det wer wer wer wer wer*
*Weeeeer weer weeer wer*
*Weeeer weeer weeer wer*
*Wey selwat li wechê pêxember*
*Selwat li wechê pêxember*
*Tu ji dîlanê t'were der*
*Tu ji dîlanê t'were der lê*
*Det wer wer kezîzer*
*Kezîzerê mi çar in*
*Kezîzerê mi çar in lê*
*Her çar bi dost û yar in*
*He çar bi dost û har in*
*Bê lome li mala mi de nin*
*Bê nan in gava siwar in*
*Kezîzerê mi şeş in*
*Kezîzerê mi şeş in*
*Evdalê gundê me şeş in*
*Evdalê gundê me şeş in*
*Her şeş bi çarê reş in*
*Her şeş bi çarê reş in*
*Wey paşilê wek şebeş in*
*wey paşilê wek şebeş in*
*Lê ramûsanê wa xweş in*
*Ramûsanê wa xweş in*
*Hat bû êvara înê*
*Mêkewa ser hêlînê*
*Tu b'kevoka xebxebşîn ê*
*Tu b'kevoka xebxeşîn ê*
*W ez rabim Gewrê birevînim*
*Rabim Gewrê birevînim*
*Li serma dilê.......*
*Kezîzerê Erwendê*
*Kezîzerê Erwendê*
*Wey sing doşek balîfzend ê*
*Sing doşek balîfzend ê*

*Wey aqil serê mi stendê*
*Aqil serê mi stendê*
*E di bextê te w Pêxember de*
*Di bextê te w Pêxember de*
*Lê kinê wer dawetê*
*Lê kinê wer dawetê*
*Lê de wer wer kezîzer*
*Mi dî yê mi nedî yê*
*Mi dî yê mi nedî yê*
*Lê li ser banê xênî yê*
*Li ser banê xênî yê*
*Wey çavreş ê ti Omerî yê*
*Çavreşê Omerî yê*
*Qîza apê hecî yê*
*Qîza apê hecî yê*
*Wey tiştê wilo mi nedî yê*
*Tiştê wilo mi nedî yê*
*Fîstankî bajarî yê*
*Weeer weeer weer wer*
*Weeeer weeer wer wer*
*Wey selwat li wechê Pêxember*
*Hatim vî-yalî mala*
*Hatbûm wî-yalî mala*
*Li mi wijdanê bara*
*Mi wijdanê bara*
*Wijdan ket binya cara*
*Wijdan ket binya cara*
*Mi xwe berda nav mala*
*Li dê w bavê-m helal bê*
*Kes nedî li ber dîwara*
*Ji xeyna pîr û kala*
*Xeyna pîr û kala*
*Pirsa dosta xwe kirî*
*Wey Gewrê çû nav hevala*
*Gewrê çû nav hevala*
*Mi dest avêt bû qirrikê*
*Dest avêt bû qirrikê*
*Bû xurrîna guhara*
*Bû xurrîna guhara*
*Mi li eynikê li xwe d'nêrî*

*Wele nadê-m zer bûyê*
*Hemmî ji xem û xiyala*
*Wê derdê qîza zinara*
*Xwedêyo tu xweş-Xwedê yo*
*Xwedêyo tu xweş-Xwedê yo*
*Wey Xwedêyo tu bakî rakê*
*Xwedêyo tu bakî rakê*
*Vî ewrî ji hev bela kê*
*Ewrî ji hev bela kê*
*Pîra bi destê kala kê*
*Qîza bi destê xorta kê*
*Qîza bi destê xorta kê*
*Mi bi Gewrê hevdu şa kê*

## GIRESÎRA BI SÎR E

*Lê Girsesîra bi sîr e*
*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Gir xopanê bi sîr e*
*Tolikvan ê Meyro*
*Wa swara hîrehîr e*
*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Wa swara hîrehîr e*
*Tokikvan ê Meyro*
*Birêd Meyro wezîr e*
*Lêêêlê lêêlê Meyro*
*Brakêd Meyro wezîr e*
*Tolikvan ê Meyro*
*Giresîra bi nok e*
*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Gixwopanê bi nok e*
*Tolikvan ê Meyro*
*Wa swara hokehok e*
*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Wa swara hokehok e*
*Tolikvan ê Meyro*
*Xwşkê Meyro belalûk e*
*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Brakê Meyro belalûk e*
*Ezîz-canê Meyro*
*Lê Geresîra bi ce ye*

*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Girxopanê bi ce ye*
*Tolikvan ê Meyro*
*Wa swara heyyûhey ye*
*Lêêlê lêêlê Meyro*
*Brakê Meyro file ye*
*Tolikvan ê Meyro*

## MELE YE MELE!

*Mele ye mele ye*
*Mele ye mele ye*
*Wey gidyano mele ye*
*Mele ye mele ye*
*Mele bi tac û turbe ye*
*Mele bi tac û turbe ye*
*Sebav ne ji bavê xwe ye*
*Sebav ne ji bavê xwe ye*
*Mala wî kerxane ye*
*Wey gidyano meleho*
*Mi di nava rihê gaho*
*Nava rihê gaho*
*Li qîzka bûye bela ho*
*Li qîzka bûye bela ho*
*Wey gidyano meleho*
*Wer mele ye mele ye*
*Bû êvara înêêêêêêêê*
*Bû êvara înê*
*A bû êvara înê*
*Bû êvara înê*
*Dersa keçkê Yasîn ê*
*Dersa keçkê Yasîn ê*
*Çavê mele l'doxînê*
*Çavê mele l'doxînê*
*Keçkê dibî kadînê*
*Devê derî dixelqînê*
*Devê derî dixelqînê*
*Keçik dike qêrînê*
*Keçik dike qêrînê:*
*Seydayo li bextê te me!*
*Mi hêvyo hevala meke!*

*Mi ji hevala qut neke!*
*Wîsara pê dikeeeeeeeeeee*
*Wisara pê dikeeeeeeeeee*
*Xanîsara pê dike*
*Şaşikê şanî dike*
*Şaşikê şanî dike*
*Cibbê şerîf li xwe dike*
*Cibbê şerîf li xwe dike*
*Rê digrê li ba keçikê*
*Rê digrê li ba keçikê*
*Derpî ji keçikê dikê*
*Derpî ji keçikê dikê*
*Wî pehnî di keçikê dikê*
*Wer gidyano melle ho*
*Wer gidyano melle ho*
*Mi di nava rihê gaho*
*Mellakî kotî ye*
*Çi mellakî kotî ye*
*Mellakî kotî ye*
*Revîya çû sûrîyê*
*Revîya çû Sûrîyê*
*Sekinî li ber yek derî ye*
*Sekinî li ber yek derî ye*
*Tav jî li derî tarî ye*
*Wek maqûla efendî ye*
*Wek maqûla efendî ye*
*Navê jinkê Hewê bû*
*Jêr digo, diya sêwî ye*
*Digo diya sêwî ye:*
*Seydayo ma ev çî ye?*
*Seydayo ma ev çî ye?*
*-Mahkûmê dewleta Tirkî bûm!*
*Mahkûm dewleta Tirkîyê*
*Wey gidyano melleyo*
*Bi şewkê gerîye*
*Bi şewkê gerîye*
*Eba xwe raxistîye*
*Eba xwe raxistîye*
*Da ser diya sêwî ye*
*Mele ye mele ye!*

*Mele ye mele ye!*
*Çi melakî tevlihê ye*
*Melakî tevlihê ye*
*Dani bû ser erdê ye*
*Danî bû li ser erdê ye*
*-Tirsa minê tune ye*
*Ji melkemotê çare ye*
*Mele ye mele ye*
*Ne, bi tac jû turbe ye*
*Melakî kevnare ye*
*Sebav ne ji bavê xwe ye*

## DÎLOKÊN LI SER LEGÊ

*(A)- Leglegê û hacî begê*
*Çevbelekê hacîbegê*
*Mîr mistefa zengil heva*
*Te d'ya min dî, mi d'ya te dî*
*Ser kanîka sor û sipî*
*Qaskek rûnê, berdexwûnê*
*Xwûn şewitî, tev perpitî*
*(B)- Leglegê û hacî begê*
*Gula mîro çavbelekê*
*Şûşa bilbil dermanê dil*
*Qebra kûrî, tev de mûrî*
*Hewar dikim Şêx Resûlî*
*Ne l'van cîya, ne l'wan cîya*
*Kul bikeve herdu cîya*
*Heb hemîne ji Romîya*

## PÊKENOKA EVÎNDARIYÊ

*Lê keçikê keçvanokê*
*Qaqilokê xweşpîvokê*
*Dirantefsê pozbacanê*
*Kezîkurê qafkeçelê*
*Bejinkutê lêv jî girê*
*Lê, bermalya mala minê*

## DÎLOKÊN SERSALÊ

*Qerqûşik û merqûşik*
*Xwedê ji vê malê re*
*Kurekî têxe nava pûşik*
*Serê dîk bi kulav e*
*Binê dîk bi kulav e*
*Xwedê kurê vê malê*
*Niha bike zave*
*Serê salê binê salê*
*Xwedê bihêle hûr û*
*Girê vê malê*

## DESPÊKA LEYZTOKA ZAROKAN

*Yekê yekê yekanekê*
*Du biskanê*
*Ezîzanê kezî pahnê*
*Li nav linganê*
*Gula çepo çepilmîşo*
*Aregîşo*
*Totil eynê*
*Şam û şeynê*
*Desthineyê*
*Bîst li te yê*

## BÊXEBERDAN

*Kî xeber de:*
*Pîrek ji wê ve tê*
*Xurme xurme*
*Nav delinga wê*
*Tije kêz û kurm e*
*Kî xeber de*
*Di devê wî de bibe qawirme!*

## TIŞTEKÎ MIN HEYE!ESIL ÇI YE?

*Yek û dido*
*Bawer sisê*
*Çeqla fisê*
*Mem û Zînê*
*Çavhêşînê*

*Gindir mindir*
*Xwe d'tehtê kir*
*Di cî de mir*

## HEJMAR 24 E?

*Rovî rovî sindik*
*Serê dûvê rovî b'kincik*
*Rovî çûye mala xala*
*Bar kirîye j'barê dara*
*Hişk e, ter e, qut e, dara*
*Bijmêr!*
*Heke nebû bîst û çara*

## RADANA DI LEYZTEKÊ DE

*Biz didim ba didim*
*Derî li we ra didim*

## HERACKIRIN Û QURÛÇ

*Qano qano qûno*
*Heta bêrî çûno*
*Qanê min hemû*
*Di qûnê de şîn bûno*
*(Herac: Leyiztikçîyê ku di*
*Leyizteka xwe de wenda dike)*

## WARÊ BAV Û KALA

Carekê teyrek hebû hêlîna xwe di nîvê zinarekî pir bilind de çêkirî bû.Taqê zinêr hilûstanekî bû wek sabûnê û riqîrût bû. Di nîvî de wek dikanokekê ciyek hebû û teyr li serê hêlîn sazkirî bû. Pirî ku ew der piçûk û teng bû, nîsqirok jî cîyek vala ji bil hêlînê cî tune bû. Çi cara ku têjik ji nav hêkan derdiketin û xwe dilivandin, terayî xwarê dibûn û dimirin, rawil wan dixwarin. Ji ber vê sedemê dola wî teyrî qet zêde ne dibû. Her sal ya têjikek bitenê sax difilitî, yan jî qet nedifilitîn.

Rojekê teyr bitenê ye û li ser hêlînê ponijdayî e. Hema lingekî xwe datîne, ew bilind dike û yê di datîne. Zilamek di ber zinêr re li riya xwe diçe. Ji nişka ve çavên wî bi teyrê dikeve, lê dinêre û temaşe dike. (Dibêjin ku Feqîyê Teyran bûye.) Û bi zimanê teyr û trûdan zanibûye. Ew bangî teyrê dike:

-Ya teyra xweşik! Çima tu wisan mirûzdayî yî?

Teyrê bersîva wî da,serpêhatîya xwe û derdkişandina ji tengayîya hêlina xwe û terabûna têjikên xwe gotê. Zilam dibêjê:

-Ne, dinê mezin û fireh e! Tu here li hinek zinarên dî ji xwe re çiyekî xweş bivîne!

Bi vê gotinê re, axîn û keser ji hinavên teyrê hatin. Ewê kulmek stêrik barand û gotê:

-Ez dizanim ku dinê fire ye! Ciyê ji vir xweştir jî gelek hene! Lê, ev der cihê bav û kalane! Destê min jê qut nabe!

## XANÎ BI MIŞKAN VE ŞEWITÎ

Zilamek hebû xanîyê wî tije qul û xewêreyên mişka bûn. Gava ku dibû şev ji xirepişka wan, xew nediket çavên wî de.

Rojekê agir bi xanîyê wî dikeve. Hema ew direve der ji dûr ve lê temaşe dike. Xelk tê ku êgir bitefînin, ew dibe asteng û nahêle. Gava sedemê nehiştin jê dipirsin, weha dibêje:

-Jêwin, jêwin! Bila xanî bişewite bibe qirrêk! Xênî tije bûbûn qul û xewêreyên mişka! Çi cara ku ez radiketim, ew dihatin guhên min gez dikirin! Ox, ox! ew çil ewil ji mişkan re jî nema!

## «PA MIN ÇI ZANIBÛ»

Bavikekî koçera hebû, tevekê wan eskerqaçaxî bûn. Yek jî ji wan ne çûbû ji Tirkîyê re eskerî ne kiribû. Cendirman cihê konên wana tesbît kirin û bi sehera sibê re bi ser wan ve girtin.

Esker hawirdor li wan girt. Qenim nehiştin ku çîçek jî biderkeve. Tevê zilama jibinê konan deranîn, li rastekê civandin, wan sehkirin û cizdanên wan yên nifûsê xwestin.

Pa eyb e eyb! Cizdanê yekî ji wan jî tine bû. Eskeran wan keleş û fêrisên zilama li navrastê avêtn erdê, bi çog û şîşên tivingan li wan xistin û kerobaro kirin.

Heçîka mêrê koçer , yek wî bikuje jî, qenim ufînî û kufînî ji devê wî naderkeve. Tevê eskeran li wan û semax û tebata ku li ber lêdanê dikirin, mat û heyirî man û tevek ji xwe re sar û cemidî û şaqiz bûn.

Serbazê esker ji wan pirsî:

-Çima hûn ji ber lêdanê nagirîn?

Zilamekî koçer bersîv dayê:

-Qumandar! Ma qey girîn karê mêra ye?

Serbaz gote:

-Heta niha we bi vê eskerqaçaxîya xwe, çewa dikir?

Yê koçer gotê:

-Di nav me de zilamek bi tenê ji hikûmetê re eskerî kirîye! Ji êlê, kî ku bi cîyekî ve biçûna, cizdanê wî yê ku eskerî kiri bû, bi xwe re dibir !

Dîsa serbazî pirsî:

-Ma sahkirina eskerên me di riyan de, bi wêneyê li cizdên û li wî merivî varnediqilîn, ku ew meriv û wêne ne yek in?

Mêrê koçer gotê:

-Qumandar! Ma tu nizanî ku em kurd tev dişûfin hevûdu? Ma eskerê evdal wê çi zanibe? Ma tilîya xwe bihn nekirine ku bizanibin?

Li pey lêdaneka hov î kov de, eskeran tevekê wan zilamê koçeran dan pêşîya xwe û birin qezê, ber derê şihba eskerîyê. Ewana ka bi qefle re şeyandin eskerîyê, bajarê Edirnê ber tixûbê Yûnanîstanê!

Êl bê xwedî ma. Kar û bar tev kete stûyê pîrekan û kalan. Încar ew kalên koçera ku bûbûn notirvanê girikên hevîran, di dawîya emrên xwe de dar girtin bi destê xwe, kulav avêtin nav milên xwe, bilûra xistin devên xwe û çûn ber pêz, dest bi şivanîyê kirin.

Di nav êlê de pîreka pir hejhijî û kal hebû. Pirî ku ew pîr bûbû, meriv digot qey, ji sala Deqnanos maye. Lê pirîya ku ewê mast û şîr xwari bû, qey te digo, hê bîst salî ye. Pîrê bi şev û roj, girînê dikir û çînê li darxist. Tevên pîreka kincên xwe vacî li xwe kiri bûn û reş girêda bûn. Pîra kal weha digot û digerand :

*-De lorî lorî pîrê bigorî*
*Wele mi dizani bû*
*Bile mi dizani bû*
*Lewra mi xewnê dîtî bû*
*Lewra mi xewnê dîti bû*
*Eskerê tirko hatibû*
*Bi ser kona ve girti bû*
*Mêran rezil kiri bû*
*Mêran hêsîr kiri bû*
*Dest û pîyê wan girêda bû*
*Wan bi kambaxa Edirnê ve şandibû*
*De lorî lorî pîra we bigorî...*

Kalekî bangî pîrê kir û gotê:

-Hey porkurê bi ser wan girtîyan ve! Lê çima te nedigot, ku me ray û tevdîra xwe bigirtana?

Pîrê stêrkên çavên xwe zawa kirin, paqij kir û got:

*-Ero lo loooo! Ma min çi zani bûû*
*Ero lo loooo! Ma min çi zani bûûû*
*Ero lo loooo! Ma min çi zani bûûû...*

# TOP-POT

Zilamekî kurd diçe eskerîya Tirkan. Gava ku wî dibin, ew digije eskerîyê nagîje, pirî ku zilamekî bi dest û pê bûye, hema ji çîna topê re vediqetînin. Û ders û êtîma wê didinê.

Di pey çendeyek de, wî dibin ser topê û piratîkî wî hîn dikin. Dersdarê wî dibêje:

-Ev çek top e!

Ew jî dibêje:

Ev çek pot e!

-Na na! Ne pot e, top e!

-Pot e!

-Bêje top!

-Pot!

-Top

-pot!

-Tooop, toooop!

-pot!

-Kuro te min peqihand! Bêje tooop, tooop,

-Pot, pot, pot!

Û dersdarê wî lê dixe, lê dixe heta ku li erdê gêj dibe. Piştre hişê wî tê serî û dibêjinê «top», dîsa ew dibêje «pot».

Li ser top û potê heftîyek sax li wî dixin û ceza didinê. Ew dikin û nakin, bi rastîya navê wê, ku ew bêje, top nabêje.

Ji ber ku di nav koma esekeran de lê dixistin, hevwelatîyên wî pir dipixpixin û ji wî diqehirin. Ew, bi tenê gazîyê wî dikin û li cîye tenha dibêjinê:

-Kuro! te navê kurdan xirav kir! Serê me li ber tirkan berjêr bû! Di nav leşkeran de heçîka kurd di hemû îş û karan de di pêplûka yekemîn de ne û gelek jêhatî ne! Malnexirav, ma qey tu nizanî bêjî top?

Ew bersîva wan dide û dibêje:

-Kuro ez dizanim bêjim, top! Îşê van segbavan pir zor e! Gava ku ez bêjim top, wê bêjin de ka bêje namlû! Ku ez bêjim namlû, wê ew bêjin de ka bêje meqerizma! Ku ez bêjim meqerîzma jî, încar wê ew bêjin de ka bêje tetik! Ku ez tetik jî bêjim, êdî ew ji hev naqetînin, wê dirêj kin û dirêj kin! Min carekê gotîye «pot»û çûye! Nema êdî ez ji pota xwe tême xwar! Di ku de zirav be, hema bila di wir de jî biqete! Ma ya me û wan, ji vê pêve heye?

# HINGIV Û KUNCÎ

Rojekê du zilam bi hev re ne û bi riyekê ve diçin. Riya wan gelek dûvedirêj e û bi rê ve ew pir birçi dibin. Li ser riya xwe ev laqê gundek tên, diçin malekê da ku nên bixwin

Ew mala ku diçinê zilam jî tune ne. Ew birçîbûna xwe ji pîrekan re dibêjin û li oda mêvanan rûdinin. Sifra xwarinê tê ber wan. Ew bala xwe didinê ku teyfikek hingiv e, teyfikek kuncî ye û du sê nan in. Ew ji xwe re şaş dibin û şaqiz dimînin ku wê çewa hingiv û kuncîya bi hev re bixwin! Ji xwe re qederek disekinin, naxwin.

Kurikek heft-heşt salî derê odê vedike û tê nik wan . Kêfa wan tê, ji xwe re dibêjin «niha ev lawik dizane ku meriv çewa van dixwo» û bangê lêwik dikin:

-Xwarzê, xwarzê! Were tevî me nên bixwe!

-Na xalo! Li nik me eyb e ku zarûk tevî mêvanan xwarinê bixwin!

-Na bavê xalo! Ne eyb e! Were!

Lawik diçe li ser sifrê rûdine, perîyek nan digere di nava hingiv de radike û li ser kuncîyan datîne, paşê gepê dixe devê xwe û dixwo.

Ew herdu zilam êdî ji lêwik fêr dibin ku meriv çewankî dixwo! Yek ji wan berê xwe dide lêwik û dibêjê:

-Xwarzê! Li welatê me jî, eyb e ku zarûk tevî mezinan xwarinê bixwin! De rabe here der

Lawik hema radibe û diçe !

# JINA GAVAN Û JINA PAŞÊ

Çiqas serê siban jina paşê diçe serkanîyi, dibîne ku jina gavan li wir xwe tahfîl dike. Rojek didu, sise, pênc, deh roj were bi wê rewşê derbas dibin, jina paşê difikire: «Mêrê min paşa ye û mêrê wê gavan e! her sibe ew xwe li ser kanîyê tahfîl dike, û ez ancax heftîyek yan deh rojan carekê xwe tahfîl dikim! Ev çewa wisa dibe?»

Şevek di nav livîna de, jinik doza wî îşî li paşê dike! Ew xwe dide çiv û mivan û ji jinikê dûr direve. Jinik dibêjê:

-Ev tu çiqas beredayî! Tu weke gavan jî nabî! Ew ji siban heta êvaran li pey dewarên mozê hewqas dibeze, diçe û tê, û tu ji siban heta êvaran li ser textê xwe rûniştî yî, qet karek jî nakî! Dîsan tu weke wî nabî!

Bala paşê peyva jinikê ya navê gavan pir dikişîne. Ew ji xwe re dibêje: «Miheqeq di vê de tiştek heye, ka çi ye» û ji jina xwe dipirse:
-Keçê xêr e, mesela Gavan çi ye? Çima tu wî dixî navê?
Jinik dibê:
-Pa lê! Çiqas roj serê siban ku ez diçim ser kanîyê, ku vaye jina Gavên li ser kanîyê xwe tehfîl dike! Lê ez û te, em ji heftîyekê carek jî xwe tahfîl nakin!
Paşe dibêje:
-Rast e, tiştek nabe!

Wê şevê paşe ka tiştek dike yan nake em têkil nebin, lê belê ev peyva pir li Paşê tîn dike û pê dêşe! Di dilê wî de bû kulek û heta sibê ji xwe re wê fikrê kir!
Serê sibê çewa ku paşe diçe qesra xwe, bangê xizmetkarekî dike û dibêjê:
-Tu xweş here ba Gavan bêje bila ew ne sekine û bi lez were vira! Lê belê tu li şûna wî li ber dewaran be hetanî êvarê!
Xizmetkarê wî bi bayê bezê diçe nik Gavan û dibêjê:
-Paşa te xwestîye nik xwe!
Xizmetkar li ber garanê dimîne û Gavan dibeze diçe nik Paşê.
Paşa; Gavan li ser kursîyekî xweşik dide rûniştandin û dibêjê:
-Gavan! Hema îro ji alîyê Xwedê ve rehmek ketîye dilê min, ez dixwazim bi te qencîyekê bikim! Hewqas sal in ku tu gavanî dikî, qenim tu yê ji vî ezyetî xilas bibî û wê jina te jî rihet bibe! Vêga tu jî qe ji gavanîyê aciz nebûyî?
Gavan dibêje:
-Paşayê min! Ez ji gavanîyê pir aciz bûme! Pa tiştekî min tune! Sermîyanekî min ji tune ye! Ne arazîyê min heye û ne jî malê min heye! Ma ji gavanîyê pêştir ezê çi karî bikim?
Paşa dibêjê:
-Maxwene! Vêga tu qey nikarî ji xwe re tîcaretekê jî bikî? Ew çax tu yê ji beza li pey dewaran bifilitî û wê jina te jî bibe xatûn!
Gavan dibêje:
-Paşayê min! Tu li qusûra min nemeyzîne, mîna ku tu henekên xwe bi min dikî! Nexwe ezê bi sipîyên serê xwe qê tîcaret bikim!
Paşa dibêjê:
-Kurê min, ez vê yekê dizanim! Min ji te re got ya, rehmek ketiye dilê min! Ku tu vî karî ji xwe re bikî, ezê sed zêrî bidim te û wê bi temamî jî ji te re bin! Ez karê wan jî navêm û ezê tîcareteka pir rihet ramî te bidim: Hema tu yê li ser hev hêkên erzan bikirî û li van gundên dora

me tu yê wan bibî û ji xwe re bifiroşî!

Gavan dibêje:

-Paşayê min, eger tu tiştekî were bi min bikî, heta ku ez bijîm, ma ezê qencîya te ji bîr bikim qey?

Di pey wan peyvên paşê de, hema gavan xwe davêje ser nigên wî û dibûse. Lê belê Paşe dibêjê:

-Yek şertekî min bi tenê heye! Ew jî dîsa ji bo xêra te ye: Tu çiqas hêkan bikirî û çend heban û li kur, ku tu bifiroşî, geleke her êvar tu hesab werînî bidî min! Ew jî;ka ca tu bi kêrî vî karî têyî yan na! Ekene ezê ji te re karekî din peyda kim!

Bê guman ji wê pêşnîyara paşê re, pir kêfa gavan tê. Hema Paşe dertîne û sed zêrên zer dijmêre destê gavan. Ew radibe ji Paşê xatir dixwaze û diçe mala xwe. û meselê ji jina xwe re dibêje:

-Jinê, jinê ezê bibim ticar û tû yê bibî xatûn!

Roja din berdestî sibê hêj zû gavan hema radibe û berê xwe dide mazata hêkan, diçe.

Gavan bi şeveqa sibê re digîje wir. Ew roj çiqas hêkên ku li wirê hene ew dikire. Sê heb sindoq tije hêk dike û li ser pişta kera xwe dike cembeke , û vedigere diçe gundan ku bifiroşe!

Li gundan dema danina qepikan (qurp) despêkiriye û hêk jî bûne qatî, isnıetî peyda nabin. Ew ku diçe kîjan gundî, jin lê dicivin hema hêkên wî li heva diqedînin. Her pîrekek her yekê pazde, bîst, sîh û çil hêkan dikire. Û nivîsandina wî jî tune! Çi jina ku çend hêkan kirîbe, ew mecbûr dimîne ku di serê xwe de zevt bike. Çimkî her êvar pêwîste ku ew here hisêb bide Paşê. Her rojê Gavan diçe du-sê-çar gundan, ku dibe êvar jî ew dadigere malê.

Pirî ku xelk hêk kirîne, încar difikire û nafikire nayê bîra wî ku kî çiqas hêk kirîne û çiqas nekirîne! Hema ew di serê xwe de dibe û tîne: «Ha min li filan gundî hewqas hêk firote bêvan pîrekê! Û li bêvan gundî jî min hewqas hêk firotibûn wê jinika kirassor!...»

Piştre ku ew hisabê firotina hêkan şaş dike. Êdî rûyê wî nade ku here nik paşê jî. Di ser wî de sê çar roj derbas dibin, pirî ku ew difikire, gava ku dikeve nav livîna xwe de hisabê kirîn û firotina hêkan dike: «Filankesê pazde hêk kirî bû! Na wele huvde hêk bûn! Na wele nozde bûn!...»

Bi şevan ji Gavan di nav livîna xwe de hisabê hêkan dike. Hey jina wî pê re henek û laqirdîyan dike, wî miz dide, hema ew dibêje:

-Ka ca bisekine! hêj hesab maye!...

Gavan ji ber tavilê, nema ku êdî tewqeyê jinikê dibe! Jina wî jî eynî dibe wek jina Paşê.Serê siban gava ku jinik diçe ser kanîyê hema cêrê xwe tijeav dike û vedigere mala xwe! Êdî tahfîlkirina li ser kanîyê, bi ki-

rîn û firotina hêkan re kuta dibe,

Ew çendeyek e ku bala jina Paşê jina Gavan dikişîne ku nema li ser kanîyê xwe dişo : « Hebe tune be, Paşê hicranekê bi Gavan kirîye! Ecêb, jina wî berê her sibe xwe dişûşt, niha ew jî bûye wek min! Ka ezê îşev jê bipirsim! Ewî çi bi gavan kirîye!»

Êvarê di nav livîna de, jinik ji Paşê dipirse:

-Paşa! Maxwene ev te çi bi Gavan kirîye?

-Xanim ma ezê çi pê bikim!

-Belê wele te hicranek pê kirîye!

-Tu ji çi dizanî?

-Ez ji jina wî dizanim!

-Çima qê çi bûye bi jina wî?

-Ev pêlak e hema jina wî jî wek min tê ser kanîyê, cêrê xwe tije av dike û vala vedigere malê!

Paşe nema êdî xwe zevt dike û dikene. Kenekî were dike ku zikopîşto dibe û ji jina xwe re dibêje:

-Hajte were ye haaaa! Gavan bi kirîn û firotina sedhêkan ve lipikîye, derhal ji kar û barên şevê daket! Încar ez welatekî îdare dikim! Ma ezê çewa karibim ku tu her sibe xwe tahfîl bikî? Hêja tu digot: «Çima jina Gavan her sibe xwe dişo, çima ez jî her sibe xwe naşom?».

# LEWNÊ JINA

Sofîyekî kal lê pir alîxwedê hebû. Ewî çi gava ku limêj dikir, di pey de, bi seetan rûniştî dima ji xwe re dia dikir û berzûrî Xwedê dibû. Carekê jina wî dibêjê:

-Vêga di pey limêjan de hewqas rûniştî dimînî, tu çi ji Xwedê dixwazî?

-Ez îman û Quran û axret û bihişt û horîyan ji Xwedê dixwazim!

-Tu, qet parastina ji belayên dinê û ji lewnê jina jî, ji Xwedê naxwazî?

-Na!

-Çima?

-Lewnê jina çi ne, heta ku ez ji Yezdanê xwe bixwazim?

Jina sofî biryara xwe da, ku weynekê bîne serê wî. Rojekê Sofî gayên xwe dide pêşiya xwe û diçe ku here cot! Jina wî jî, berî ku ew bigîje cihê cotê xwe, diçe li serseda cot çend heb masîyên qirase yî sitûr dixe binê

xwelîyê û litayêta vedigere mala xwe. Sofî digîje ser erdê xwe û gayên xwe girê dide û cot dike. Ew xetek-dido diçe-tê, di ber gîsnê wî de, çima masîyek dernayê! Sofî dibêje:

-Sibhan ji hikmetê Xwedê re! Di binê xwelîyê de masî dertê! Her hal ez alê Xwedê me, lewra ku ewî ji min re masî şeyand!

Çi cara ku ew xeta xwe dibe sersedê, masîyek dertê! Sofî ji binê xwelîyê çend heb masîyên sipehî dîtin û xistin tûrikê tov, hilanî!

Dibe wextê çêlekdanan, jina wî taştê jê re tîne ba cot. Ew bi kêf û şewq gazî jina xwe dike:

-Hito! Hito! Tu dizanî ku min îro di ber gisnê xwe de çi dîtine?

-Sofî! Te çi dîtîye?

-Masîîî! Masîîî! Min masî dîtîne?

-Malneket! Masî û binê xwelîyê?

-Ka li tûrikê tov binêre!

Jinik diçe bala xwe didê, erê rast e, wanê di tûrik de çend heb masîyên qirase hene!

Ji kêfa masîyan re, taştê jî bi Sofî ve naçe xwar. Ka ew ji taştê çi qeder dixwo, ji jina xwe re dibêje:

-Van masîyan bibe malê! Da ku tu şîva me ya êvarê çêkî!

Jinik masîyan hildide û vedigere malê. Ew masîyan, diqelişîne, dişo û xwê dike, da ku xira nebin û vedişêre. Ji kêfa şîva êvarê re, Sofî jî, hetanî reşika mexrebê ew roj çotê dike. Sofî Ew, wêrojê firavîn jî naxwe! Çewa hebe şîva wî masî ne! Derengîyaşevê Sofî tê mala xwe. lê kerbê masîyan pirîya ku sofî xwe birçi hiştîye, dilê wî dixele! Hêj ew li derva ye, ji wir gazî jina xwe dike:

-Hito, Hito! Şîva min xweş hazir bike! Ez ji birçîna ketim!

Jinik nan û dewê tirş datîne ber. Sofî dibêjê

-Keçê! Kanêne masîyên me?

-Sofî masîyên çi?

-Ew masîyên ku ji ber gîsnê min derketi bûn!

-Sofî ev tu dîn bûyî? Masî û binê erdê?

-Wey min di devê nehsed bavê te gayê! Hey keça kerê! Ev tu henekên xwe bi min dikî?

Hema Sofî radibe, «Terp û rep» li jinika xwe dixe. Dibe qêrîn û girîna jinikê û bi nava gund ve dibeze:

-Ay gundîno! Gidîno heware!Sofî dîn bûye îşev wê min bikuje!

Gundî bi carekê dixuricin pêşîya wî û wî zevt dikin. Lê belê gundî dikin û nakin Sofî nasekine, hema kişîmê jinikê dike.

Hinek rîsipîyê gund jê dipirsin:

-Sofî! Çima tu li jinikê dixî?

Sofî dibêje ku:

-Min masî şandibûn malê ji bo şîva me ya êvarê! Ew min li derewê derdixe, dibêje «Masîyên çi»! De were pîncar wê nekuje!

Jinikê ji wê gotina Sofî, demara qels girt û berê xwe da gundîyan:

-Heyran! Ne, Sofî îro çûbû cot, ne çûbû masî, heta ku masî anîbin!

Hema Sofî diqîre û dibêje:

-Ji xwe, ne min di ber gisnê xwe de masî dîtibû!

Çewa ku sofî were dibêje, dîsa jinik dibêje wan:

-De încar lê binêrin! Pa ku ew ne dîn be, lê çi ye?

Gelî gundîyan! Hûn tevek cotarî ne! Kesî ji we seh kirîye, ku ji ber xeta cot masî derketibin?

Bawerî ji gundîyan re çê bû, ku Sofî dîn bûye! Wê şevê wan, sofî bi kuteka axurê ve girêdan. Ji lingên wî heta qirikê bi werîs hişk şidandin û heta sibê lêxistin!

Jina Sofî jî, darekî girte destê xwe û «Goliko soro te çi xwarîye» lê da. hemjî bi cêranavê berî ser dide û lê xist! Di ber lêdanê de, jinik dibêjê

-Masî û bêne erdê? Masî û ber gîsin!...

Sofîyê kal î limêjker, ji bilî birçîbûna xwe, heyrê limêja eşa bû, ku lê nebore! Ew li ber jina xwe dikeve hêvî û zarîyan. Hema dibêje:

-Hito! Tu bi xatirê Yezdan kî, min veke, da ku ez limêja xwe ya eşa bikim! Ez nema êdî behsa masîyan dikim!

Piştre sofî vekir. Ew çû limêja xwe ku bike, ewê jî, masîyan qeland û savarekê çê kir! Jinikê masî xistin lengerîyê, savarê berî ser da û danî ber Sofî da ku şîva xwe ya êvarê bixwe!

Pa Sofî birçî ye û hê li taştîya sibê ye. Ewî bi kevçî girt û li savarê xist, hema dît ku serê masîyekî di binê savarê de xuya kir! Ewî bi kevçî savarê girte ser de û lengerîya xwe zivirand. Wî kevçîyê xwe dîsa ku li savarê da, dîsa serê masîyekî dît. Serê wî masî jî bi savarê temart û kevçîyê xwe li ciyek din xist! Di wê re jî, çima serê masîyekî derneket! Hema savarê dide ser wî jî ditemêrê û xwe dide paş, naxwo! Jinik dibêjê:

-Sofî! Çima tu şîva xwe naxwî?

-Hirmet!Ewên ku ji ber gîsnê min derketibûn, di binî de ne! Ez newêrim li wan binêrim!

Jinik dibêje:

-Sofî! ji niha û şûnde, çiqas ku te ji Xwedê tişt xwestin, bêje: Xwedê hifza minbike ji lewnê jina!

Hê ji nû ve Sofê têdigîje ku masî bi dehsî ne!

# BABAKURDÎ

Li bajarê Şamê cebanekk heye pir giranbiha û navdar e. Di wir de gelek mirîyên ali Xwedê, qenc, ewlîya û enbîya radizin. Rojekê peyayên Ereb, di nav tirban de ji xwe re piyase dikin, diçin û tên; ji ol û dinê, ji siyaset û dewletê, û ji tiştên berê ku di navbeyna Kurd û ereban de bûne, dibêjin û dipeyivin. Hema yek ji wan dibêje:

-Mêrê qenc û alê Xwedê ji Kurdan hîç ranebûne! Ekene, wê dewleta wan hebûna! Ji vê yekê tê zanîn ku di olîtîyê de jî Kurd pir kêm in!

Hevalekî wî bersîv didê:

-Tu şaş î! Ji Kurdan gelek merivên mezin rabûne, Mesele: Silhedînê Eyûbî Rostemê Zal, Nûh Pêxember, Îbrahîm (Berhîm) Pêxember, Xan-şerefî Cizîrê, Mewlana Camîyê kurdî uhwd tev Kurd bûne!...

Ew zilamên ereb hema ji nişka ve seh dikin ku awazek ji hatifî hat:

-Haaa vaaa yek ji kurdan eeeez!

Ew bi tirs û lerz li hawîdorên xwe dinihêrin ku ji tirbekê nigek bilind bû, derket heta çokê bi jor ve hilkişiya û were sekinî! Lê belê saweka were wan girt, heta ku bi xwe ve mîz kirin, ji tirsa tebat û semaxa wan nema karibin ku li wir bisekinin. Ew bezîn ku birevin, lê çokên wan erdê nedigirt.

Li gor gotina kesên ku dîtine; ew nig vêga jîê li der e û pembû û cilik û caw lê pêçandî ye! Belam ji bo ku azbeta wî mirîyê kurd veşêrin û wî bi erebtîyê navdar bikin û bikin pêşîyekî ereban, navê wî danîne «Pembû Baba»! Lê piranîya xelkê ereb dîsa dibêjinê «Baba Kurdî»!

# ASAXTIR-QEDEXE YE

Yekî Kurd hebû, Tirka wî girt û birin eskerîyê. Lê belê wî bêjeyek bi tenê jî bi zarê tirkî nedizanî. Ji bo wê yekê serbazê esker sibe, nîvro û êvarê her rojê sê caran lê dixist. Dikirin û nedikirin, ku ew tikrî fêr bibe, nedibû!

Serbaz, eskerê tirkînezan disipêre onbaşîyekî xwe da ku li gor wî, ka-rek jê re peyda ke û wî bide şixulandin! Ji bo hin şuxl û karên dî jî, ew meremozîyan dike, paşê wî dikin dergevanê tuwaletê!

Rojekê ew esker li ber derê tuwaletê ye û xwe nitirandîye.

Dibîne ku waye serbazê wî yê ku pir lê dabû hat ku biçe tuwaletê.

Dergevan hema radibe, dibêjê:

-Qumender! Asax tir! (Qedexe ye!)

Serbaz dibêjê:

-La law, ez serbazê we me!

-Tu kî bî jî, qedexe ye!

-Kuro qey ji min re jî?...

-Qumender! Qedexe, qedexe ye! Hûn vî tiştî ji me re dibêjin!

Serbaz dike-nake dergevan nahêle ku ew bibore tuwaletê! Pa serbaz tengezar bûye û dike ku bi xwe ve birî, hema ew dike ku xwe li derî bixe, here hundurû, dergevan tivinga li milê xwe dadixe û lê sererast dike:

-Xwe tev med! Xwe tev med! Xwe tev med! Ezê te bikujim!...

Hema serbaz dibêje «xir» û direve, rast diçe nik onbaşîyê dergevan û mesela xwe û wî jê re dibêje. Onbaşî tê nik wî. Ji dergevan re dibêje ku:

-Di eskerîyê de qedexebûn ji qumendaran re tune ye! Ew çi bikin bi kêfa xwe ne! Bihêle da ku ew here tuwaletê! Ne wê vêga ew bi xwe ve birî de!...

# GULÊ Û ÇÛKO

Çuko gavanê gund bû, Gulê jî, jina Çûko bû. Li Kurdistanê yê ku gavan be, bilî heqê dewara ku ji gundîya distîne, her malek nanekî pahtî jî, heroj dide gavan. Ji mala gavan merivek, li nav gund malo-malo digere, nanê xwe berev dike û tîne mal. Eger zarûkê gavan ê guvrok hebin, ew li nav gund digerin û nanê xwe berev dikin, eger tunebin, ji ber ku gavan bi dewara re meşxûl e, jina gavan wî karî dike. Zarûkên Çûko yê mezin tunebûn, jina wî li nav gund digerîya nan berev dikir.

Diyar e ku malbata gavanê gund, di nav gundîyan de bêrûmet e. Gava jinê gundîya diçûn ser kanîyê kuav bînin, ji ber ku kanîya gund hindik av jê dihat, tev diketin dûvik, dora kîjanê bihata, wê cêrê xwe tijî av dikir. Jina gavan wextê ku di dûvik de bûya kijan jina ku bihata, diket pêşîya wê û Gulê ji pare dahf didan. Lê dema ku jina melê gund dihat, tevê jinê gund dora xwe didanê. vê jinê digo: Were têkeve dora min, wê jinê digo: Were têkeve dora min, wisa wisa jina melê diket pêşî û cêrê xwe tije av dikir û zû vedigerî diçû mal. Di dûvike kanîyê de, jina mele tim li pêşî bû û jina gavan tim li dawî bû.

Ev rewşa ha, pir Gulê êşand û ew ji xwe re fikirî û mitale kir. Xwe bi xwe got: Ez jî merivim û jina mele jî merive. Çima ez timî dikevim da-

wîya dûvik û jina mele tim dikeve pêşîya dûvik. Çûko êvarkî garanê anî nav gund, bi dilekî kizirî, bi halkî westîyayi û birçî, çû giha mal û xwe vezeland. Got: Gulê, ez birçime zû ji min re nan werîne. Gulê ji mêrê xwe re got: Ez ziqûmê ji te bînim, eger tu mêrbûyayi, tu dê mele bûyayi. Tu xwelî li min be ez jî xwe mêrim, xwe bi xwe got. Çûko ji Gulê pirsî: Hermet çima? Gulê dest bi xeberdanê kir û got:

-Lê ji hinga ku tu bûyi gavanê vî gundî, çi cara ku ez diçim ser kanîyê, jinê gund tev min dixin paşîya dûvik û çiqas ku ez dibînim jina melê tê ser kanîyê, jinê gund dora xwe ya dûvik didinê ew dikê, heta ku dikeve pêşî, cêrê xwe tijî av dike û zû vedigere mala xwe. Û Çûko va ez ji te re dibêjim, eger tu dibî mele, ez jina te, ezê bimînim li cem te, ger nabî mele, ez ji te re jinantî nakim. Çûko ji jina xwe re got:

-Gulê rebenê ez li kur û meletî li kur, ez merivkî nezan im, min nexwendîye, bavê min min nedaye xwendin, ancax ez ji gavantîyê fahm dikim. Heçî mele ne wan ilmê şerîf xwendîye, bav û kalê wan wanakan dane xwendin. Hermet Xwedê daye mele û jina mele, ma sûcê min û te çîye? Gulê got:

-Eva min ji te re got, eger tu meletî dikî bike, eger nakî, ha van zarûkan xwedî bike. Û nanê gavanîyê ji nav gund berevke. Gavan ji jina xwe re got:

-Hermet kaca tu îşev bitebitee, ezê bifikirim heta sibê Xwedê mezine.

Sibe zû hê berî wextê dîka, Çûko ji nav livîna rabû, çû û hat, çixare li ser çixarê dikşîne, uf-ufa wî ye, kuf-kufa wî ye, ew ji êvar de pirî mitale kirîye û fikirîye, xew neketîye çavê wî heta sisê. Gulê ji xew şîyar bû û got:

-Çuko, te çi biryar xwe da?

Gavan got:

-Hermet, ez nikarim li van dora meletî bikim çimkî tev min nazdikin, gavantî û meletî ne ber bi hev vege, yek heywên diçêrîne, yek însên. Lê min riyekê dîtiye ka tu jî dieyşînî yan na.

-Dibêjin li welatê Serhedê mele kêm in, miletê wir hewqas ji dîn fam nakin, bes ji wan re, dîn mesaqot e, ji bo Kurd li wan itaba nekin ew jî dibêjin, em jî misilman in. Ezê bi wir ve herim û tu li ber malê û zarûkan be. Eger min meletîyekê ji xwe re girt, dê tu jî dibî jinseyda, ezê paşê gundîyê xwe bişînim wê mala me bînin û emê kêf bikin. Gulê ji gavan re got:

-Hey xwelîliser, ne wexta ku werin pey malê, wê ev gund ji wan re bêje, ne Çûko gavanê me bû. Ew çax tiştê te tev derdikeve derva.

-Lê em çewa bikin?

-Emê tev bi hevre herin, ji xwe tiştekî me tune, emê zarûkan bigrin û sibekê zû ji vî gundî derkevin.

-Êde bira!

Şevekê nîvê şevê gavan keraxe ya şamî hazir kir kurtanê sêrtkî lê kir, kera xwe ya qereçî jî hazir kir û berdestî sibê zû, zarûkên xwe li wan siwar kir ew û Gulê ketin rê û gund terk kirin. Heftîyek sax bi rê ve çûn, çiqas zarûk birçi dibûn, Çûko li gundê devê rîya xwe digerîya, nav , penîr pîvaz, werhasil tiştê ku Xwedê dikir qismet gundîya didayê û dianî.

Çûko şaşikeka çartewî daye serê xwe, kurkekî heftrengî li xwe kirîye, Gulê çarşebekê li xwe kirîye, rûçahvikê jî berdaye û li rê dimeşin. Kî rastî wan tê, ku li rewşa wan mêze dike, ji heybeta xof dibe û dipirse, xwedê hebînî hun çi kesin? Çûko bersîv dide dibêje, ez alim im. Û min bihîztîye ku li vî welatî alim kêm in, ez hatime ku li gundekî.

Çûko li ser mêrgekê datîne. Bêrîvanê gundekî di wir de derbas dibin, gava jina Çûko dibînin, tev heyirî dimînin û dipirsin.

-Xwedê hebînî, hûn kîne, çi kesin, we çima li vir danîye?

Gulê pirî li nav gunda gerîyabû û nanê gavanîyê daye hev û du, erçena wê pir zexme û bi xeberdane, ji wan jina re behsa meletîya mêrê xwe dike. Werhasil pirî wesfê mêrê xwe dide. Jinê wî gundî tev ziloq dibin û li Çûko dimeyizin. Çûko jî şemlek avêtîye ser rûwê xwe, zikr û îbabeta dike û hey-hey jê diçe .

Di nav çend rojan de nav û dengê Çûko li welatê Serhedê belav dibe. Tevê wan gundê dorê tên û li ser Çûko, bo ku wî bikin melê xwe, şer dikin û pev diçin. Bi ternikî nexweşa tînin ba Çûko, sax diçin. Qîzê xame tên bo mirazê xwe fal vedikin, hê li wirin, xort wan dibînin bi hev qayil dibin. Dawî, dawî tên, li ser mêrgê baş dibin û diçin, û Tişta jê re anîne, ser wê mêrgê tije pere kirine, sê-çar kon vedane û binê wan tije elalet bûye û zikrê xwedê dikin.

Axekî li wan dora jî derketîye refunêçîrê, li wira wê ilaletê dibîne ji dûr ve, ew û xulamê xwe hespa dajon û bi bez tên ser mêrgê û dipirsin:

-Ev çi ye, çi nîne, hewqas alem li vir civîyaye? Yek bersîv dide:

-Axê delal, şêxek hatîye vira, her tiştî dizane, li ser rûwê erdê bilî wî kes hewqas zane tune, hebe tunebe ev wekîlê Xwedêye li ser rûwê erdê û Xwedê wî bo me rê kirîye Axê vedigere bi ser xulamên xwe ve û dibêje:

-Ev şêx derbê min e ku ez wî bînin gundên xwe, şxwe ev çend sale ez li yekî mîna vî digerim lê heta nuha bi dest min neketîye. Pêşî lazime ez tecrîba wî bikim paşê ez wî bînim gundê xwe.

Axê ji hespê xwe peya dibe û diçe binê kon, li ser çoka rûdinê û destê şêx maç dike. Xulamê axê ji yeko yeko tên destê wî maç dikin û hêvîya

dia jê dikin. Axê ji şêx re dibê:

-Qurba tu roja inê mêvanê min î.

-Bilabe axê delal.

Û axe û xulama dîsa destê wî paçî dikin û para tên, diçin mala xwe. Piştî çûna axê ew gundî tev êdî ji şêx bê hêvî dibin..

Roja înê, axê beran û berxa şerjê kirin û bi hezaran milet berev kir. Deh pazdeh siwar şeyand du şêx, şêx anîn û hatin. Çîyê alemê tune bû ku di koşka axêde rûnin, li bandera axê kulavn û yemenîya û xalîya raxist û ilalet kişa ser. Xwarinê rêz kirin û milet ket serî xwar.

Pey xwarin pê de, li huzûra wê ilaletê încar wê şêx îmtîhan bike, eger di imtihana axê de. Şêx derket, şxwe wê wî bîne gundê xwe, eger derheq imtihana axê de, şêx derneket wê axe serê şêx jêke.

Bilbilekî axê hebû tim gula dixwar. Baqê gula di nav qefesa wî de bûn. Ji xulama re got: Hûn qefesa bilbil têxin nav xirarekî û bira gulê wî jî li ber bin, gava min got, bînin hûnê bînin, deynin ber şêx û ezê ji şêx bipirsim, ev çi ye di vir de?.

Xelk tev ketîye heycanê, ka wê axê çi ji şêx bipirse û wê şêx bikaribe bersiva axê bide. Piştî ku firaxa jî rakirin, wan dora paqij kirin, milet li hev û du wergerîya û heleqe girtin. Axê ji şêx re got:

-Şêxê min, gerçî bawrîya min bi te heye ku tu şêxekî mezinî, lê ezê yek tiştekî ji te pirskim, eger te derxist, ez zanim tu alimî, eger te dernexist, bitirba bavê min ezê serê te jê kim.

Madê gavan qulipî, rengê wî zer bû, ji xwe re fikirî, lê çare bo wî nemabû û rîya revê jî tinebû. Axê bi dengek bilind ba xulama kir û got:

-Zarûno, ka bînin. Xulama qefesa bilbil ku di xirarê de ye anîn li ber şêx danîne erdê. Axê berê xwe da şêx û pirsî:

-Şêx ev çi ye di vir de?

Darê gavantîyê hat bîra şêx, daneheva nan ji nav gund hate bîrê, potpote Gulê hewqas bi serê wî de kiribu hat birê, dora kanîyê û jina melê wî gundê wî yê berê hat bîrê, di dilê xwe de got, ez li kur, meletî li kur.Nişkeve di dilê xwe de got:

-Ax Gulê te çi anî serê Çûko!

Û axê ji xulama re got: Ka derxin. Gava derxistin çi derxin ku va bilbil di qefesa xwe de bi nikula ketiye ser gulê xwe û dixwo. Gava milet dît ku bilbile û li berê qevde gulin, teva çepik lê dan û gotin, evêdî ne şêxe jî, hebe tune be, fenafîllahe.

Hahakê axê şeyand mala şêx ji ser mêrgê anî, jêr e koşkekê vale kir mala wî xiste, tişta jêre berev kir û çar-pênc xulama xist bin emrê wî. Û nav û dengê gavan bi şêxantîya herî mezin derket û li welatê Serhedê belav bû. Gavan bu sevda. Gulê bû jinseyda û bi xweşîya xwe man û em jî li derê biyanîya macir man!

# ELFOYA DELAL

Pîrek hebû navê wê Elfo (Hezarê) bû. Ewê bi xwe sofîtîyeka pir jî dikir û timî li xelkê waz dikir. Lê belê ewyeka were bû ku meriv nedika rîbû li serçavê wê binihêre, pirî ku bêbîçim û nelihevhatî bû; herdu çavên wê heryekê tûkek ewr li serê bûn. Pozê wê ji bin ve,ji zarêşê qut bûbû. Guhên wê jî, her yeke weke merşikekê bûn. Devrûyê wê tevek bi xwirî bûn; her kotika di rû de, heba nîskê tê de bi cih dibû. Û keçel gurî û rût bû.

Elfo digîşte ki, ew diçû çi civatê, digot: «Bira qey ez ne delal im?» Rokî ew li ber neynikî disekine û li xwe dinêre û dibêje:

-Heyran! Xelk dibêje, Elfo ne delal e! Ez nizanim ka kura min ji ya xelkê kêmtir e! Kêmayîya min ev e ku: Niçiçkek ewr li ser çavê min e!

Piçek, ji serê pozê min kêm e Guhekî min dirêj e û yek jî piçek kêmayê tê de heye. Ew jî di binê por de ne, naxwîyên!

Devrûyê min piçikek bi ziwan e! Lêvaminî xwar, hey piçek bi meyl e! Û porê min hebek tenik e!

Ha ihah! De Xwedê hebina! ka kura min ji ya xelkê kêm e!

# «ÇIRIYAYE Û DIRIYA YE»

Zilamek û jinek hebûn, herdu jî di xewa de bixwe ve mîz dikirin. Her kes bi wê mezereta wan hisî bû. Tu kesek, ne qîz bi wî zilamî re, û ne jî mêr bi wê jinê re dizewicîn. Rojekê ew zilamê kelmîz diçe nik wê jinika kelmîz û dibêjê:

-Hirmet! Ji bo vê eyba me, ez jî bê jin mam û tu jî bê mêr mayî! Were ez û te, em bi hev re bizewicin!

Jinik wê pêşnîyarê pir dieyişîne û herdu bi hev re dizewicin!

Di şeva pêşî de, mêrik jê re dibêje:

-Hirmet! încar eyb e, ku em bi xwe ve mîz bikin! Emê bi dor rakevin! Bila yek li yê dinê notirvanî bike! Çi gava yê razayî ku mîz bike, bila yê notirvan wî rake, da ku em bi dewşeka xwe ve nemîze!

Jinik wê pêşnîyara mêrê xwe qenc dêrand. Mêrik raket û jinik lê dinotire. Carekê ha ku jinikê dît, mêrik bi xwe ve mîz kir. Hema ewê hişk

bi serê çpûçikê mêrê xwe girt û wî ji xew şiyar kir! Ew çû çolikê mîza xwe kir û dewşek ji şilayîyê hat. Ew kete nav livîna û raza!Mêrê wê lê notirvanî kir. Mêrik carekê dît ku ewê bi xwe ve mîzê berda. Hema wî destekî xwe danî ser qelîşteke û pê ve dewisand:

-Jinê rabe! Jinê rabe!

Pa eyb e eyb! Qey di nava pêçîyan de mîz disekine!

Heta ku jinik ji xewê rabû, wê şetek mîz berî ser dewşeka xwe da. Mêrik berê xwe dayê got:

-Hirmet, hema jê qere! Wele çirîya ye û dirîya ye!

# NAV PIRSÎ

Carekê du zilam di rîyekê de laqê hev tên. Yek ji wan kal e û yek jî xort e. Ê xort ji yê kal dipirse:

-Xalo! Navê te bi xêr?

Ê kal dibêjê:

-Navê min Mîrxo!

Ê xort încar dibêjê:

-Xalê Rêxo, navê bavê te bi xêr?

Mîrxo dibêje

-Te çi navê min safî kir, înca ma dora navê bavê min?

# HA BAVÊ MINO XORTNO

Xortek hebû ji xwe re jinekê anî, mele mara wî birî û ew û jina xwe êvarê razan. Di wê şeva ewil de ku xort zewicîye, çima hinek li talanê gund naxin! Û çiqas heywanên gund hebûn, tev dibin.

Wê şevê hewar li gund daket, gundîyan kar û barên şer kirin û xwe hazir kirin ku li pey talanê xwe herin. Zave jî meselê seh kir, tena kiras û derpî derkete ser banan, herdu destên xwe xist ber kêlekên xwe de û kire gazî:

-Ha bavê mino, xortno! Ha bavê mino, xwortno! Ha bavê mi no, xortno! De ez derdê we nebînim! Li pey talan herin, vegerînin û kitikê ji wan nehêlin!...

# ÇÛN Û HATINA BIŞÎRANÎ

pîrek hebû keça xwe da mêr. Lê belê keç her rojek du rojan, carekê dihat mala diya xwe. Rojek, dido, sisê, em bêjin çar, pênc werhasil mêrê wê jî û diya wê jî, ji wê rêveçûna wê gelek nexweş dibûn û bêzî dikirin. Ji bo ku dilê wê nemîne, diya keçê rasterast nedigotê ku hewqas gur newe, û wê ji ber xwe ve jî, fam nedikir ku hewqas neçe û nê! Rojek diya wê were sergirtî dibêjê:

-Keça min! Cara ku tu hatî jî, bi şîranî were!

Keçik têdigihîje ku diya wê doza şîranîyê lê dike. Çimkî gelek rez û bostanê mala mêrê wê hebûne. Roja din keçikê barek tije helîl, bastêq, mewîj, şaran û helawî dike û davêje ser pişta kerekê, berê xwe dide riya mala diya xwe, diçe.

Diya wê dibîne ku di pey gotina ku ji keça xwe re gotibû de, bi rojekê şûnde, waye hat û barek sax jî şîranî bi xwe re hanîye!

Dê ji keçê pirsî:

-Keça min! Ev çî ye ku te ji diya xwe re hanîye?

Keçê gotê:

-Dadê! Ne te gotibû min, ku tu hatî bi şîranî were!

# VIRA FEQÎ Û RASTBÊJA MELÊ

Carek ji cara, li welatê Serhedê melak û feqîyekî xwe hebûn. Hikûmata Tirka fermanê wan rakir û ew revîn, terkeserî dinê bûn û çûn welatê Berîyê mele bû melê gundekî û feqî jî li nik wî ma, xwend. Xelkê wî gundî pir qedr û qîmetê dane wan û li wan xwedîtîyeka bê hejmar dikir.

Rojekê civata gund li camîyê gerîyaye û ji xwe re qal û bala dinê, axretê û îşên xwe yên şexsî dikin. Feqe dî di nav wan de qala welatê xwe dike:

-Li Serhedê pir sar e! Gava ku dibe zivistan çemê Mûradê qeşem digre û meriv, heywan, paxêlên barkirî, tevek di ser re diçin-tên û qenim ximûme jî nagîjê!

Xelkê Berîyê, tu kesek di jîyana xwe de sermayê nedîtine û xasmaçemqeşamgirtinê!.. Ewan teva ji wê gotina feqî lêvên xwe gez kirin û

yekî gotê:

-Feqîyê çak û rind! Ma tucarî kesek dîye ku çeman cemedê girtine?

-Erê! Li welatê me hemû çem jî cemedê digirin; Çemê Firat, çemê Reş (ava reş), çemê Heftreng... û pênc-şeş mehan ji were sergirtî dimînin!

Gundîyan wê peyva feqe bawer nekirin. Ewî, ji bo ku bi wan bide bawerkirinê, ji wan re got ku:

-Seyda jî pê dizane! Ez û wî ji cîyek in! Û wî bi çavên xwe jî dîtîye ku cemedê girtine! Eger hûn dixwazin jê jî, bipirsin!

Ew gotin ji civatê re bû kedereka pir mezin. Yek çû kêleka Melê û gotê:

-Ha Seyda! Ev Feqîyê te tiştek dûrî qailan dibêje!

-Feqe çi dibêje?

-Ew dibêje ku çemê Mûradê qeşem digire û meriv di ser re diçin tên! Xwedê hebîna ev yek rast e?

-Na xêr! Welat ketîye bîra Feqe û bi we şa dibe!

Bi wê gotina Melê re, Feqî gelek li ber xe ket, li derewê rast bû, ji mamostê xwe tije û têr bû fedîyeka were di civatê de kir ku xwîdan da, sor bû, bezmê wî xira bû, hema di dilê xwe de digot: «erdê biqelişe û ez di te re herime xwar!»

Civat ji mizgeftê peşkilî, her kesek çû mala xwe, Feqe berê xwe da Melê û got:

-Ha Seyda! Çima te were min di civatê de li derewê sererast kir?

Ma qey em hin din di ser cemeda çemê Mûradê re buhurîne?

Mele berê xwe dayê û got:

-Feqîyê min î delal! Heta niha jî te ji dinê fam nekirîye! Ev der berîstan e! Tu dibînî ku ji kelekela germê meriv nikare li der bisekine! Încar tu jî ji wan re behsa berfa Serhedê û cemeda çemê Mûradê dikî! Yekî ji wan jî, ev tiştên ku tu dibêjî, nedîtîye! Ma wê kî ji te bawer bike? Eger ku min jî bigota, «feqî rast dibêje», wana wê ji min jî bawer nekira û piştre wê bi gotina: «Seyda jî çi dereweke kir!». Ma te qet hedîs nexwendine? Ku dibêje: «Kî têkeve nav qewmekî, ew ji wan e!» Îro, mademkî em li berîyê ne, me nedîtîye ku çemê Mûradê cemed girtîye!

# PÎZPÎZKA MELÊ

Meleyek û du kurên wî hebûn. Ew herdu jî bijin bûn. Mele û jina

wî, herdu kurên wî û bi du jinên xwe ve, şeş kes bûn. Ew herşeş kesên mala melê , tevek li nik hev û dinê diman û yek odeyeka wan bitenê hebû! Di wê de hemû radibûn, rûdinîştin û radiketin!

Rojekê mele bangê herdu kurên xwe dike û dibêje:

-Lawên min! Em hersê jî di yek odeyekê de, were di paşilên jinên xwe de radikevin, ne qenc e! Dînê me, ji vê re destûr nade! Girînge ku em ji xwe re pîzpîzkekê bikirin! Çi gava ku yek ji me, mîyetê li jina xwe xirav kir, bila ew li pîzpîzkê de, da ku yên dî, herin derve! Di pey ku îş kuta bû, bila dîsan lê xe! Încar yê ku bixwaze îşê xwe bike, bila ew û jina xwe herin hundurê û karê xwe biqedînin!

Herdu kurên mele, wê dîtina bavên xwe çak dêrandin. Hema mele rabû û çû bajêr, pîzpîzkeke kirî û li tayêta vegerîya malê. Ewî li dîwêr singek kuta û pîzpîzka xwe, pê ve daleqand!

Şeva pêşî Melê prowa kir. Piştî raketinê ku lembe tefiya, li pîzpîzka xwe xist, got:

Tûûûûût, tûûûûûûûût. tûûûûûûûûûûûûût!

Çewa ku dengê wî tînîyê hat, herdu kurên mele û bi herdu jinên xwe ve, ji nava livînên xwe rabûn û çûne derve! Li dervaew qederek man. Dengê pîzpîzka bavên wana ji hundurû hat, û mele jina xwe têne derve.

Vêca kurê mele yê mezin û jina xwe diçine hundurû. Ewan jî li wir îşê xwe kuta kir.

Evên li derva dengê pîzpîzkê bihîstin. Yên li hundurû derketin derva. Încar dor hate ser kurê mele yê piçûk!

Ew û jina xwe ji diçine hundurû. Mele û jina xwe, kurê wî yê mezin û bi jina xwe ve, li ber derî dipên. Di pey kutakirina karê wan ê li hundurû de, deng bi pîzpîzkê ket!

Ewên li der, tevek çûne hundurû, her yek û jina xwe ketin nava livînên xwe de û razan.

Lê belê ji despêka kar heta dawîyê, gere tu kesek bi kesî re xeber nedana. Herîşaret, bi pîzpîkê bû. Încar, her şev mala mele îş û karên xwe yê şevê were dimeşanda!

# BERSÎVA YEKSALE

Rojekê paşe û wezîrê xwe ketin pirsa û ji hev û dinê tişt pirsîn. Paşê got:

-Wezîr! Di dunyayê de tiştê ku gepek be û pir xweş be esil çi ye?

Wezîr got:

-Hêk e!

Bi ser paşê û wezîr ve, salek buhurî. Rojekê ew dîsa hatine rûqalê hev û paşe ji nişka ve got wezîr:

-Bi çi re?

Wezîr têgihîşt ku ew pirs, dumayîka pirsa sala berê ye ku paşê wî, jê dipirse! Û ewî got:

-Bi xwê re!

# «EZ DIZANIM»

Zilamek hebû, dilê wî pir diçû apraxan. Ku wî şev û roj apraxan bixwara, jê nedikerixî. Mixabin jina wî, ne nizanibû ku xwarinê jî çê bike!

Rojekê ew ji jina xwe re dibêje:

-Hito! ez ji kerbê apraxan kamkojî bûm! Ka ca tu here nik cîrana me ya Gulanê, bila te hînî çêkirina apraxan bike, da ku tu îşev ji me re hinekan çêkî!

Jinik radibe û diçe nik cîrana xwe ya Gulanê. Wê, çêkirina apraxan jê pirsî û cîrana wê gotê:

-Tu yê ewil pelan bikermitînî!

Jinikê got:

-Ez dizanim!

-Tu yê pelan ji ava kel derînî!

-Ez dizanim!

Tu yê danê xwe nerm bikî!

-Ez dizanim!

-Tu yê pîvaz û qelî û xwê û dermanê germ û ava bacanan têxî nave dan!

-Ez dizanim!

-Tu yê danê xwe bi kevçî delal li hev bêxî!

-Ez dizanim!

-Her pelek, wek kevçîyekî dan bêxî nav û li hev bipêçî!

-Ez dizanim!

-Kîjana ku te pêça, tu yê têxî beroşê!

-Ez dizanim!

-Ku beroş tije bû, avê berî ser de û deyne ser êgir!

-Ez dizanim!

-Hinek befşikan jî deyne serê, da ku nepelişin!
-Ez dizanim!
Werhasil, cîrana wê çiya ku jê re got, wê jî got «Ez dizanim!» Di pey wan gotinan de Gulanê got:
-Tu yê dirgekî pez jî, di şûna derxwûn de deynî ser devê beroşa xwe!
Jinikê ji vê re gotÊ
-Ez dizanim!.
Jinik hate mal. Mêrê wê jê pirsî:
-Hito! Tu hînê çêkirina apraxan bû yî?
Jinikê got
-Jixwe tiştê ku min dizanibû, tev ew bûn ku Gulanê ji min re digot!
Kêfa mêrê wê hat. Ew ji xwe re dibêje: «Îşev ezê miradê dilê xwe bi apraxan bikim!»
Jinik anî lazimatîyên apraxan tevekan hazir kir û dest bi çêkirina wan kir. Wênakê beroşa xwe tije aprax kirin û danî ser êr. Ewê dirgekî pez jî, ji dêla derxwûn ve danî ser devê beroşê de! Û agir lê gur kir.
Beroj bi kel ket û aprax pijîyan, danî erdê û rû kir. Piştre ew. Ew û mêrê wê rûniştin û ketine ser de û xwarin!
Heba ewil ku mêrik avête devê xwe, tameka were li devê wî peyda bû, ji berê mejîyê wî legîya . Were tehl bû weke zirindal. Ewî berê xwe da jinikê û gotê:
-Keçê! Ev te çi xistbû nava van apraxan?
Jinik hê nû li xwe varqilî, ku dirgê rêxê danî bû ser devê beroşê! Û gotê:
-Pa ez nizanim! Cîrana me ya Gulanê çi tiştê ku ji min re gotibû min ji were kirîye! Pa ez nizanim! Pa ez nizanim! Pa ez nizanim!...

# MILYAKET WÊ LÊXIN

Dibêjin ku Xwedê ji bo her merivek yê li ser rûyê erdê re, milyaketek li ezmana ve buhtî kirîye, gopalek û defek daye destan; çi gava ku li dinê ew meriv xêrek bike, milyaket gopalê xwe li defê dixe! Û gumînîya defê, ji dengê topekê bêtir diçe!
Ji gotinan ew herêma ku milyaketên defçi lê ne, ji gurmînî û zirmînîyan, tu kesek di wê re nixare dersab bibe, pirîya ku li jêrê însan xêran dikin û ew jî defê dikutin!
Lê belê ji bo her çineka însên re, qefleyek milyaketên defçî hene. Ew

kirina xêra dipên! Bê guman ji bo meleyan jî qeflek milyaket heye. Bes deng ji defên wana nayêt.

Milyaketên defçîyên ji bo kirina xêrên çîna mela, tev bi hev re, li herêmekê ne, gopalên xwe bi destên rastê bilind kirine û defên xwe bi destên çepê girtine, danîne ser çokên xwe û sekinandî mane! Ku meleyek xêr bike, wê ew jî gurmînî ji defa xwe bînin!

Dîsa li gor gotinan, ji hinga ku Xwedê dinyayê ava kirîye û heta niha, ji wan milyaketanan yekî bi tenê jî, def nekutaye!

# HEMA MAST SEDUBÎST CARÎ MAST

Zilamek hebû ew ji jina xwe gelek ditirsîya. Hisreta dilê wî bû ku di mala xwe de ew bê tirs û bizd xwarinek bixwo yan tiştek bike! Zilam pir zengîn bû û heywanên wî jî pir hebûn. Di xwarinan de pirîya ku ewî ji mast hez dikira, di xewna xwe de jî ewî mast didîta.

Rojekê jina mêrik di teştê de mast hînik dike. Bi heskê hildifirîne û tev dide. Mêrik jî, ji xwe re li quncikekî rûniştîye û were çavên xwe zilaq kirîye û li mastê mêze dike. Qet jinik nizane, ne mêr heye, ne tune ye!

Jinik rabû ji bo karekî xwe, ji nik teşta mast çû der. Mêrik jî ji xwe re got, «firset ev firset e» hema rabû û êrîşê bire ser teşta Mastê! Û hesk li ser heskê berî ser devê xwe da, xwar!

Ha ku mêrik dît jina wî hate wira. Gava wê dît, ku ew mastê dixwe. heskê girt û bi nava serê wî ket:

-He tu mastê dixwî he! He tu mastê dixwî he! He tu mastê dixwî he!

Mêrik bi derve de revî û jinik jî, bi heskê lê dixe! Ser û çavên wî tevek di nav mastê de man. Hema ew destê xwe lê dipalîne û dixe devê xwe û dibêje:

-Hema mast sedubîst car mast! Hema mast sedûbîst car mast!....

# FEQE ISAM Û FEQE EVDILWEHAB

Isam û Evdilwehab herdu feqîyên Mewlana Camî yê Kurdî bûn. Wan herdu qeqîyan bi hev re li nik Mewlana di demekê de dixwedana û

hevdemê hev û du bûne.

Li ser herdu feqîyan Mewlana, li Kurdistanê gelek xeber û meselok hene û ji alê gel ve têne gotin. Belam yek xwûynerm bû ye û yek jî xwûyhişk bû ye:

-Feqe Evdilewheb gelek xwûynerm û milahîm bû ye. Her kesek jê razî bû ye. Di xwendina xwe de gelek, di cî de bû ye û sererû dimeşîya ye! Ji ber van rabûn û rûniştinên wî yên di cîyên xwe de, Seydayê xwe lê mar kirîye! Wî pirtûkekê li ser Kitêba Seydayê xwe yê Mewlana ku bi navê «Camî» ye, nivîsîye û wê haşî kirîye. Pirtûka wî jî, bi navê «Haşîya Evdilwehab» e! Gelek xweş e.

-Feqe Isam gelek çist û jî bû bi rik, û di xwendinê de gelek kûr bi fikir bû ye. Wî dil berî qîza seydayê xwe yê Mewlana daye. Mixabin Seyda qîzê nedaye wî, çewa me li pêş got, daye yê din. Feqî bi navê «Haşîya Isam» pirtûkek li ser pirtûka Seydayê xwe yê Mewlana nivîsîye. Wî jî «Camî» yê haşîê kirîye. Bes li seydayê xwe gelek itrazan dike û wî li xeletîyê sererast dike. Sebebê vê yeka: Di nava xelkê me de ku pê tê xeberdan; ji bo ku Mewlana qîza xwe nedayê, daye yê din, lewra ku wî pirtûka xwe were nivîsîye!

Mewlana Camî bi herdu feqîyan re gelek caran bişîfre û sergirtî mijûl bûye. Rojek li ser dersê Mewlana fîtoka xwe li tasê dixe. Ew îşaretek bûye ku daye herdu feqîyan. Ew herduradibin û diçine der.

Feqe Evdilwehab diçe tasekî av ji Seyda re tîne. Qederek diçe Feqe Isam tê, ku wa hinarek, wî ji Seyda re anîye! Mewlana berê ji Feqe Evdilwehab dipirse:

-Te ji fîtoka min çi fam kir?

-Min fam kir ku tu av dixwazî!

-Feqe Isam teji fîtokê çi fêm kir?

-Seyda! Gava ku te fîtok li tasê da, ji min re wisa dengek çê bû, kû Bê guman daxwaza Seyda hinarek bû ye!

# PAŞAYÊ BÊ AQIL

Zilamek hebûye, ew di dema xwe de gelek aqilmend û şareza bûye. Mixabin ew zilam kaldibe, kût dibe, kor dibe û ji çapa xwe dadikeve. Zilam nexweş dikeve, lê belê xuyaye ku wê nexweşîna dawîyê be. Ew di nav livîna xwe de vezelandîye û ba kurê xwe dike. Kurê wî tê, ew ji binê balifa xwe kîsekî derdixe û dibêjê:

-Kurê min lawo! Ezî nexweş im û yê miarinê me! Wesyeteka min li te heye! Gava ku ez mirim, tu yê li dinyayê bigerî! Te yekî pir bê aqil ku dît, tê xêra min vî kisê zêran bidî wî!

Di pey wê wesyetê de zilam diçe dilovanîya xwe. Wî binax dikin, xelk tê şerxweşîya wan! Mala wî, şîna wî kuta dikin. Încar lawê wî radibe, diçe digere ku wesyeta bavê xwe pêkbîne!

Edetekî bisilmanan heye, ku yek dimire, di pey ferzîyatên wî de, dest bi kirina wesyetên mirî dikin.

Lawik kîsikê zêran dixe berîka xwe û li hawîdorên gundê xwe, li gund û bajaran digere, Ew ji xelkê dipirse, napirse:

-Yê herî bê aqil kî ye! Ezê kîsek zêrên bavê xwe bidimê!

Pa eyb e eyb! Kî ji bo kîsek zêr dibêje, eva ez! Lêwik încar riya gund û bajarên dûr digere diçe! Ew li hespê xwe siwar e! Xurcezîna wî li paş e! Kîsekê zêran jî di wê de ye û xwe berî bajarek î dûr dide! Ew dibîne ku li meydanê waye merivek paşûpê li kerê siwar kirine! Rûwê wî reş kirine! Qemçika (dûv) kerê dane destê wî! Kera wî dajon û alem tevek li pey wî ye, yê bi keviran, yê bi daran, yê bi kulm û sîleyan lê dixin û yên ku tûkê nav rûyê wî jî dikin bêhisab in!

Ew sosretgerandina wî zilamî, ji mêrik re dibe mereqek pir mezin û xwe digîjîne hinekan, dipirse:

-Xwedê hebîna! Vî zilamî çi kirîye? Ku wiha lê dikin!

Hinek bersîva wî didin:

-Wele wî tiştek jî nekirîye! Ev paşayê me yê kevin e! Hersalê carek em paşakî nû hildibijêrin! Û Paşayê kevin jî, em were lê dikin!

-Vêga ev paşayê we yê kevin e?

-Belê!

-Vêga evê ku we nû wî hlbijartîye, saleka din, hûnê were li wî jî bikin?

-Belê!

-Sipas, mala we ava.

Û lawik lê dide ji wirê diçe. Ew di dilê xwe de dikifikre: «Min yê layîqê wesyeta bavê xwe dît» ji xwe re dibêje û diçe pirsa koşka paşayê nû dike!

Ji xwe koşkên paşeyan li her welatek dîyar in. Ew ji hinekan dipirse jî, qesra paşê dibîne û diçe ber derê wê. Notirvan li ber derî ne û jê dipirsin:

-xêr e ku tu hatî ber derê qesra paşê?

-Ez dixwazim ku herime nik wî!

Notirvanek diçe hundurû û ji paşê re dibêje:

-Wa siwarek hatîye ber derî, dixwaze ku bi te re bipeyîve!

Paşê destûr dide ku xort were nik wî. Ew ba lêwik dikin û ew diçe hafa paşê:

-Paşayê min çaxê te bixêr!

-Bi xêr û selamet! Xortê delal tu ji kû yî? Te xêr e tu hati vir?

--Paşayê mi! Sivdera te her bilind be! Ez merivekî xerîb im! Wesyeteka rihemtîyê bavê min heye, ez dixwazim ku pêk bînim!

Ez gerîyame ne gerîyame, ji te pê ve, yê ku layiq be ji wesyeta bavê min re, min kesek nedîtîye!

-Lawo, ma bavê te çi min dinasî? Û tu jî min nasnakî!

-Bavê min te nas nedikir! Ez jî te nasnekim! Bes bavê min peyvek gotibû! Li gor wê peyva wî, yê ku musteheq be, ji te pêştir ez kesekî nabînim!

-Ka bêje! Çi bû wesyeta bavê te?

Lawik kîsikê zêran ji ber xwe derxist û gotê:

-Paşayê min! Ev kîsê han tije zêr in! Bavê min gotîye, li dinê kî ku herî bêaqil be, tu yê vanakan bidî wî! Ev pêlaka ku ez li dinê digerim ku vê wesyeta wî bînime cih! Tu ji min bibore, tu paşa yî Tu dikarî vêga serê min jî bibirî! Lê belê hewqas ez gerîyeme, min ji te têve yekî bêaqil, heta niha nedîtîye!

-Xwortê delal û çak! Ez ji te naxeyîdim û serê te jî nabirim! Bes tu dê ji min re bêjî çima te min layîq dîtîye ji vê re!

-Min rewşa paşayê kevin dît! Saleka din wê li te jî were bikin, lewma!

# BIRAYÊ VIREK Û YÊ RASTGO

Carekê du bira hebûne. Yekî ji wan, gelek vir û derewan dikirin Û yekî jî, hîç derewan nedikir û rastgo bû. Ewê derewker di nava xelkê de pir bi rûmet bû, jê dihate hezkirin û gelek qedr û qîmetê didanê! Ew bi kur ve biçûna, xelkê çixare, çay, qehwe û xwarinan didanê. Lê belê ewê rasgo tu kesek ha jê tune bû, rûmeta wî di nava xelkê de nibû û destekî wî hisêb jî nedikira. Ew qedr û qîmetên, ku xelkê ji bo vir û derewen ku didane birayê wî, wînakê dehf dida bi bal ku ew jî, derewan bike! Da kuew jî, xwe di nav xelkê de bi qedir bike!

Lê belê pêşîyên me gotine ku «Meriv viran bike jî, gereke hinek xwê tê de hebe. Ekene, meriv ji bin dernayê.

Birayê rasgo, biryara xwe dide ku wê ew jî, êdî derewan bike. Rojekê herdu bira bi hev û din re ne û diçine civatekî. Li civatê gelek kes, ji hev

û dinê re xeberan çîrokan, metelokan û serpêhatîyan dibêjin. Xelk ji xwe re bi wan xeberdanan dikene û kîfa xwe dike. Birayê rasgo jî ji nişka ve dibêje:

-Ka ca bisekinin! Do min tiştekî ecêb dît!

Yek ji civatê dibêje:

-Gelo çi bû?

-Min dî ku ji asîman ve, dengê zûrezûra cewrikên kûçikan dihata!

Gava ew vê peyvê dibêje, tevê civatê pê dikene! Û dibêjinê:

-Hey Malnexera! Ji vê vira mezin! Cewrikên kuçika û asîman!...

Ji bo wê vira wî, civatê kenekî bêqedar kir. Ew jî pir li ber xwe dikeve! Birayêwî berê xwe dide civatê û dibêje:

-Çima hûn were dikenin? Ma qey ne mimkine ku teyrê qertel, xwe li cewrikekî dabe û bi hewa ve biribe!

Gava ku birayê virek wisa dibêje, tevê civatê dibêjin, «ev tişt rast e, û timî jî, teyr were dikin»! Herdu bira radibin, ji civatê diçine mala xwe! Birayê virek ji yê rasto re dibêje:

-Birayê min! Virkirin jî pîşeyek e! Yê ku ne pîşê wan be, ew nikare li hev bîne!

# ZIRNA ZER

Kurê jinikeka mirtiv rojekê diçe nik meleyekî û dibêje:

Seyda ! Xêr di vî karê me de êdî nemaye! Ji min re alîbêtekekê çêke, ezê ji xwe re bixwînim!

Bi wê gotina lêwik gelek kêfa mele pir tê û hema qelemê digire, jê re «Elbêtik» dinivîse û dersa lêwik dide. Bû êvar û ew çû mala xwe. Çima diya wî pê re cizûkê nabîne:

-Lawê min! Ev çi ye bi te re?

-Dadê! Cizûka xwendinê ye!

Jinikê cizûk vekir, pelên wê wergerand, wergeran û li tîpên erebî bi balkêşî mêzekir û di ber xwe de kenî, serê xwe hejand û berê xwe da kurê xwe, gotê:

-Lawê min! Ma tu dê çawa ji bin barê van tipên wek rêçên qijikê biderkevî?

Lawik ji diya xwe re got:

-Dadê! Ma kê ji diya xwe ketîye û tîpan zanibûye?

Jinika mirtiv ji xeberdanên kurê xwe pir qehirî û moçkên wê rabûn.

Ewê berê xwe da kurê xwe û gotê:

-Hey çilzimano! Weyla bi qurbana min kirî! Te dest ji zirna zer berdaye û dev bi pitpitoka ereban girtîye!

# ÇERMÊ GAMÊŞÊ

Li civatekê zilamekî pirsek kir:

-Ji goştê şamîyan çi pir xweş e?

Ji civatê hineka bersiv dan, gotin ku:

-Çermê wê pir xweş e!

Zilamekî saxik jî li vir bûye. Rw seh dike, ku çermê şamiyan pir xweş e. Îcar, ew têdigihcêi ku çermê her heywanê ji goşt xweştir e. Rojekê ew livateke din rûniştî ye! Li wirê dîs pirsa xweşbûna goşt derdikeve holê. Yekî ji civatê pirs kir:

-Ji goştê gamêşan çi pir xweş e?

Zilamê saxik hema destê xwe bilind kir û got:

-Çermê wî pir xweş e!

# BAGERANÊ AXEYAN

Li gundekî axeyek hebû. Xulamekî wî axeyî yê pir saf û saxik jî hebû. Ew êvarê jê re dibêje:

-Xulam! tu xwe hazir bike, da ku sibê tu herî gundê filan axe yî!

Dibe roja din hema ew xulam, bîr nabe ku here nik Axê paşê here, radibe, dide rê û diçe gundê wî axeyê ku axê wî êvarê gotibû yê! Xulam digîje gund, rast diçe koşka Axê:

-Siba te bi xêr!

-Tu bi xêr hatî! Te xêr e vê sibê were tu zûrabû yî û hatî vira?

-Axê min êvarê got, ku tu yê sibê herî wirê!

-Çima!

-Ez nizanim!

-Ha, ha, haaah! Hate bîra min! Bageronsekî Axê te li nik min e! Ji wê bonê ye ku ewî te şandîye!

Ew axe bageran (bangor-bangêr) dide ser pişta wî û berê wî dide rê, tê gundê Axê xwe datîne. Axe jê dipirse:

-Ev çi bageran e, tu tînî vira?

-Ne, te gotibû min, sibê here ba filan axeyî! Ez vê sibê zû rabûm û çûm! Wî gote min ku bageranekî Axê te li nik min e, loma ku ewî te şandîye!

Axê wî dibêjê:

-Na! Bageranê wî li nik min e! Minê bigotana te, da ka tu bageranê wî jê re bibî!

Axe bageranekî dî jî dide ser pişta xulam, û berê wî bi du bageranan ve dide rê û ew disa diçe gundê axeyê din!

# HECIYÊ ŞEREFÎKÊ

Şerefîkê navê gundekî ye, di navbera Dîyarbekrê, Bismilê û Farqînê de dimîne. Hecîyek li wî gundî hebûye, ew bi navê «Hecîyê Şerefîkê» ji alê xelkê ve hatîbû navdarkirin!

Hecî merivekî pir henekçî bûye, hazircewab û çeneqewî bûye. Çi gotineka ku xelk pê bikenîyana, ewî digot û xelkê dida kenandin. Çend heb gotinên wî yên meşhûr hebûne. Dibêjin ku Hecî timî wiha digota:

-Ez di siwarê xweyqerewat kim!

Ez di xweybedlê bi pêlava Trabzûn kim!

Ez di xweysîwana bê fotor kim!

Hecîyê Şerefîkê gelek li nav milet digerîya. Tu gund û bajarek ji ber wî nedifilitîn. Ser danîyan li nas û dostên xwe dikir, yekî ku nexweş biketa diçûj pirsa wî dikir, li şahîyan û dawetan digerîya. Lê belê çiqas yekî kunexweş biketa, û biketana ber sekeratan, miheqeq Hecî diçû ber serê wî û digotê:

-wele min bi te ve, tu jî çûyî!

Eger ku hecî di çaxê mirina yekî de, negiştana yê ji, gava ku wî dibirin mezela , binax dikirin û mele telqîna wî ku diqedanda, Hecî gazî dikirê:

-Ha filankeso! Wele min bi te ve, tu jî çûyî,

Xelkê ji Hecî re digot:

-Hecî ne tuyê jî rojek bimirî! Pa ne emê jî, ji te re were bêjin!

Hecîyê Şerefîkê kal bû, nexweş ket û kete nav cîyan de. Lê belê gundî pir lê haydar in, çi gava ku ew bikire, wê herin ser wî û wê jê re bêjin:

-Me bi te ve, wele tu jî mirî!

Di wê nexweşîna xwe de, Hecî rojek bêhal dibe! Ewî fam kir ku êdî

wê bimire! Birek zilam jî li dora cîyê wî civîyane, li pawukê ne ku Hecî bimire û gazî bikinê.

Di wê demê de, ew gazî wan zilaman dike:

-Ka ca werin li dora min bicivin! Hûn tev werin! Gazî gundîyan teva bikin, bila werin wesyeteka min heye, ezê li we bikim!

Xeberê didine milet, tevek li ser Hecî dicivin. Were xelk bi ser hev û dinê ve dicimciqe ku di xênî de êdî rê namîne. Gelekan xwe bi ser ve xwar kirîye û gelek jî ji paş ve, cî tune ku ew xwe bigîjînine hafa livîna Hecî! Milet tev ker û bêhis maye û li pawuka wî ne, ka wê ji wan re çi bêje,! Hecî peyva xwe ya dawî got:

-Gelî gundîya! Gelî gundîya! Min bi we ve! Bi Xwedê ez jî çûm!

# DIRÛTINA EWRAN

Li gundek zilamekî pir derewker hebû. (Emê bêjin, navê wî Xiço bû) Pirîya ku ewî derewan dikir, lingên meriv bi erdê ve dizeliqîn. Kêfa xelkê jî, ji virên wî re dihat, pê henek dikirin û bi wê rêveçûnê ve, ewî ji hana kufletên xwe dibuhuranda.

Li gundek dî jî, zilamek hebû, ewî jî pir derewan dikir. (Emê bêjin, navê wî jî Miço bû) Derewên Miço wek derewên Xiço di nava xelkê de, hewqas nedihatine qîmetdayîn! Her ku diçû Miço, li hember Xiço kêm diket û rûmeta wî dişikest.

Miço rojekê ji xwe re dibêje:

-Xiço tu rûmetek ji min re nehiştîye! Ez li kur, ku dipeyîvim, xelk henkê xwe bi min dike û dibêjin: A ha! Tu ji riya Xiço ve hatî! Tu ne bi mizgînîya wî yî jî! Ezê herim di nava gundê wî de, wî rezîl û riswa bikim!

Û Miço radibe, dide rê û diçe gundê Xiço! Ew digîje gund. Ji zarûkan pirsa mala Xiço dike. Ramê wî didin li derî dixe. Kurê Xiço yê pênc şeş salî derdikeve. Ew ji lêwik dipirse:

-Birazî! Bavê te li mal e?

-Na!

-Bi kur ve çûye?

-Li asîman hinek ewr çirya bûn! Bavê min çûye ku wan bidirû!

Miço çewa wî gotinê ji lawê Xiço dibihîze, hema vedigere û berê xwe dide riya gundê xwe, diçe! Û ji xwe re dibêje:

-Heeeewuuuu! Ev kurê wî yê piçûk were ye! Lê niha wê bavê wî çewa be!

# ELIYÊ XEMXWIR

Zilamek hebû navê wî Elî bû. Ewî ji bo her tiştek re xem dixwarin. Çi, li kur, gava ku ewî seh dikir, dikeribî, mereq dikirin û xema wî dixwara. Ji ber wan xem û kerban, çiqas diçû Elî jar dibû, qels dibû û nexweş diket.

Elî ji ber wan xem û derdan nexweş ket. Ew kete halê mirinê û di nava ciyan de vezelîya! Hewqas jina wî, teselîyan didê jî, pa qê feyde dike! Biraxwe û pismamên wî tev hatine nik wî û gotinê:

-Bi vê rewşa xwe, tu yê bimirî! Elî dev ji van kul û kederan berde!

Ew pir bi Elî daketin, dilê wî xweş kirin û teselîyan danê!

Elî jî soz da wanakan, nema êdî ku wê ew xeman bixwe û kedera tiştek jî wî nekişîne!

Çendmeh bi ser Elî ve buhurîn. Ew hinekî xweş bû û ji nava livînan rabû. Rojekê ew diçe karê xwe, dibe êvar û Elî vedigere malê. Ew gelek vestîyaye û gelek birçî jî bûye. Jina wî şîvê danî ber, Elî kete serê û xwar. Ew di şîvê de ye, jina wî gotê:

-Ero Eliyo! Te bihîztîye ku îro çi bûye?

-Na!

-Îro kera mala cîranê me yê ewko, teliqîye! Û dehşikeka bê dûv jê re çê bûye!

Elî çewa ku wî peyvê ji pîreka xwe dibihîze, girar di qirika wî de asê dibe! Bi kotek û elfeketî jina wî av berî ser devê wî dide, qirik vala dibe û dihna Elî derdikeve! Jinik jê dipirse:

-Elîya! li min rebenê! Ev çi bû ji te?

Devê Elî digere û dibêje:

-Elîyo rebeno, de were xeman mexwe! De ha ihah! Wê ew dehşik saleka dinê wê dibe ker! Wê xwedîyê wê bar lê ke û wê here aşê! Eva qemçika wê ji tuneye! Hema ku ker bi barê xwe ve, kete herîyê, wê xwedîyê wê bi kur bigire, da ku wê ji nava heriyê rake! De ka ezê çewa xeman nexwin! Pêşîyên me jî gotine: «Gava ker bikeve herîyê, qemçik li xwedî ye!».

# QAŞO DIBÛ BAJARÎ

Li gundekî zilamek hebû. Ewî dikir û ne dikir, têr nedixwar û timî jar û belangaz bû. Zilam êdî ji milêbatî ya axê axayan bêzî kiribû. Ew zilam biryar xwe dide ku wê mala xwe bibe bajêr! Ew jî bi hêvîya ku wê ew ji xwe re karekî peyda bike û wê jina wî jî, bibe xatûn!

Mêrik erebeyeka hespan anî, qaf û qurên xwe berev kir û avête ser. Ew li ser rê ne, wê bi rê kevin, jina wî wenda bû. Ha virde jin, ha wirde jin, jinik lê cûm û cela diba. Ew diçe pangê ku saxtî bike, ka jinik li wê ye, yan na! Ew dibîne ku waye jinik li pangê, kirasê xwe bi meqesê dibire! Mêrik jê dipirse:

-Keçê! Tu çi dikî li virê?

-Ez kirasê xwe kin dikirin!

-Çima?

-Ne em diçine bajêr, de!

-Ma te qe nebihîztîye ku mele li mizgeft digota: Ku kirasê qut li kîjan jmê be, ew lê dibe agirê dojê?

-Ferze ku mele got! Pa çima qîza wî kirasê xwe qut dike?

Hema zilam vedigere û tiştên xwe ji ser erebê datîne û dibêje:

-Hêj em negihane bajêr, jina min agir li me dibarîne! Lê ku em li bajêr bin wê çewa bibe?

# MÎRXO-RÊXO

Zilamek hebû navê wî Mîrxo bû. Ew yekî kal û alê Xwedê bû, Xelkê jê re digot «Xalê Rêxo».

Rojeka inê ye û tevên gundîyan li mizgeftê ne! Mîrxo dibêje:

-Gelî bisilmanan! We navê min xirav kirîye û Xwedê jî, ji navxirakirinê pir dixeyide! Ez pir ber gunehên we dikevim! Ezê sibê çêleka xwe serjê bikim û hûn tev werin goşt bixwin, da ku hûn êdî navê min xirav nekin!

Gundîyan soz danê ku goştê bixwin, nema êdî wê navê wî xirav bikin. Mîrxo çêlekê serjê kir. Tevê gundîyan hatin û xwarin. Ê ku xwarina xwe kuta kir, rabû bi destê wî girt, xatiran jê xwest û gotê:

-Xalê Rêxo! Te bi çi niyetê dabe, Xwedê qebûl ke!

# BINEFŞA NARÎN

Binefşê qîza Fêriz beg bû. Fêriz begê jî pismamê Derwêş beg bû. Lê belê di nav eşîrê de Fêriz begê, ji Derwêş begê re hey kêmik bû.

Sibeyekê Derwêş Begê li ber derê konê xwe desmêj digire, dibîne ku qîzek ji wê ve tê û dikeve deriyê konê pismamê wî Fêriz begê de. Pirîya keçik delal û rind bû, Derwêş begê dil dikevê. Ew gazî Fêriz begê dike û pirsa wê keçê, jê dike. Fêriz begê li xwe mikur nayê û dibê hay û gumana min ji keçeke were ku tu dibêjî tuneye! Derwêş begê di dawîyê de pê dide rastkirin ku ew keç qîza wî ye! Û dibêje «Gereke tu wê qîzê bidî min. Pevn di navbeyna wan de bi kilamtî têne gotin: Derwêş begê dibêje:

-Dilê min divêyo Faris Bego dilê min diveyo
Tu bide min wê keça xwe ya Binefşê yo
Ezê bizewicînim her heft kurên te ji êlê yo
Eger tu naxwazî
Ezê ji te re berdim kerîyên pez ji gomê yo
Ezê ji te re berdim garana dewaran ji pangê yo
Ezê ji ter berdim colê hespan ji tewlê yo
Ezê ji te re berdim keriyên berxa ji kozê yo
Na eger tu van jî naxwazî
Ezê bidim te hezaran zêr û zeger, mal û temelên dinê yo
Na wele eger tu vanakan jî naxwazî
Ezê wê ji te bistînim bi kotek û darê zorê yo

Bavê Binefşê dibêje:

-Nabe wele Derwêş Bego ev yeka nabe
Binefşa min zarûk e ji te re nabe
Eva han di ola me de qet jî nabe!

Di pey vê hevpeyvînê de jî ku Binefşê nade Derwêş Begê, dibêjê:

-Ezê te û her heft kurên te bikujim û Binefşê ji xwe re werînim!

Bavê Binefşê şevek bi şev radibe konê xwe bar dike û diçe xwe davêje tor û bextê Cembelî Begê mîrê Hekarîya. Derwêş Begê sibe radibe ku li şûna konê Fêriz Begê wanê gîya jî şîn bûye!

Înca em werim ser Cembelî Beg! Cembelî Begê li nav konan gava ku çav bi Binefşê dikeve, ew jî dil dikevê. Bi çi kul û zorî ve bavê wê Fêriz Beg qayîl dike û Binefşê ji xwe re nîşan dike!

Derwêş begê hisa Fêriz beg hiltîne ku çûye nav êla Cembelî Beg. Ew eşîra xwe tev dicivîne û davîje ser konên wan. Derwêş beg Binefşê ji wan distîne û ji xwe re tîne tê mala xwe!

Ew yeka li Cembelî begê bû qormatîyeka pir mezin. Gelek zeman di-

buhure ew radibe, xwergirtina xwe digorîne û diçe nav êla Derwêş begê. Ev diça nik beg û jê re dibêje:

-Ez feqîrek im, bê kes im, ji xwe re li şivantîyê digerim!

Derwêş begê wî (Cembelî Beg) ji xwe re digre şivan. Di nav êla Derwêş begê de tu kesek Cembelî nas nake, ku mîrê Hekarîya ye!

Bêrîvaneka Binefşê diçe bêrîyê. Gava ku şivan dibîne, çi binêre, bilûrek di devê wî de ye, hewara Xwedê ji vê bilûrê! Vizeviza bilûra wî ye holehola pez e li dorê dicive! Pirî ku şivan xortekî bedew e, çewa qewraşa Binefşê çav pê dikeve, pa eyb e eyb! Çavîn wî dikevine ser satila şîr de! Wê ew çewan şîr bidoşe! Heram be wextê ku şîr ji pêz didoşe,pirîya ku çavên wê ziloq bûne û li şivan dinêre, çirek dikeve satilê û deh çir dirijine erdê!

Gava qewraş tê malê, Binefşê dinêre ku şîr di satilan de tune! Binefşê dibêjê:

-Hey kezîya te kur be! Kanê şîrê te?

Qewraş dibêjê:

-Xatûna min! Ma ev şivanê ku we girtîye qey şivan e! Ji hinga ku ew diçe ber pêz, ez nagerîne ku şîr têkevê!

Roja dinê Binefşê qewraşeka din dişîne bêrîyê. Ew jî çewa çav bi şivan dikeve, pirîya ku xortekî bedew e, ji xwe heram be, ew qurek şîr jî nayîne, pirîya ku li şivên nihêrtîye ûşîrê xwe dotîye erdê! Qewraş gava vedigere malê, Binefşê dinêre kuşîrê wê ji yê qewraşa roja berê jî hindiktir e. Binefşê dibêje:

-Hûn ji qestana şîr nadoşin! Ka ev çi hewal e! Ma ev bû çi ku pez ji şîr qut bû!

Roja din Binefşê karê xwe dike û ew bi xwe diçe bêrîyê. Li wirê çewa ku Binefşê çav bi şivan dikeve wî dinase ku dergistîyê wê yî Cembelî ye. Hema ew dixeriqe û ji dil ve diçe! Bêrîvana qenim qurek şîr dianîn, Binefşê qenim qurçekê jî nadoşe! Binefşê bi termikî li hêstirekê dikin û wê tînine mal. Nexweşîna wê li nav eşîra Derwêş Begê belav dibe. Jin, mêr, zarûk tev li Binefşê dicivin û dikevin xem û miraqan. Ka çi qeder derbas dibe. Binefşê bi hişê xwe ve tê û dibêje:

-Ez ji derdê vî pezî ketime halê mirinê! Ev çend roj in ku pezê me ji şîr hatîye birîn! Û Binefşê narin didomîne:

-Ez ji qewraşan gazin nakim! Ji derdê pêz çewa ew jî wek min nexeriqîne!

Çend roj wisan dibuhurin, încar şivan xwe nexweş dixîne. Xeber ji Binefşê re diçe ku «Şivanê we nexweş e û pez bêxwedî maye!» Binefşê çend peya dişîne, şivan tînine malê. Binefşê dibêje:

-Şivan xerîb e, bê xwedî û bê kes e! Ji bo Xwedê wî bînine oda min

ezê lê binêrim hetanî ku Xwedê şîfa xêrê jê re bişîne!

Şivan xwe nexweş xistîye û li erdê term e! Binefşê wî dibe oda xwe û xwarinên xweş didê, Dernan û derzî lê wer dike, lê miqate dibe û xwedîtî lê dike!

Mixabin kurekî Binefşê jî, ji Derwêş Begîr çêbûye! Binefşê navê kurê xwe jî danîye «Cembelî»! Hizrê du-sê mehan Binefşê di mala xwe de şivan xwedî dike, wî hiltîne, datîne wek bira bavê xwe! Binefşê hewqas roj, wî di mala xwe de xwedî dike, tu kesek jî pê nahise ku ew(Şivan) Cembelîyê Mîrê Hekarîya ye!

Bara şevê, Binefşê qevdek dirî dixe binê dergûşa kurê xwe, da ku bi lêwik ve herin timî bigirî, da ku ew fersenda xwe bibîne, here têkeve paşila Cembelî de.

Şevekî Binefşê li ber serî dergûşa xwe ye û ji xwe re kilaman dibêje, tu nabêjî, xesûya wê jî pîreka keftorî ye û di nav livîna xwe de şiyar e û li wê guhên xwe tapêl kirîye! Binefşê ji xwe re dilorîne:

De lorî, lorî, lorî Cembelîkê min de lorî
Wezê (û ezê) Cembelîkê piçûk di xew rakim
Wezê Cembelîkê mezin di nav sing û bera kim
Wezê Cembelîkê piçûk bi qurba kim
De lorî, lorî, lorî Cembelîyê min de lorî!

Xesûwa Binefşê bang dikê:

-De hişe cengena heram! Ew çi kilam in ku tu dibêjî?

Binefşê dibêjê:

-Ne ke ku ez werime ba te! Ezê serê bav û birayên te di te rakim!

Binefşê û şivan karê xwe yê şûnê kirine. Ew dixwaze ku kurê wê raneze, timî bigirî da ku ew di xew ve neçe! Hema şev ker bibe wê herin! Binefşê du hesp jî hazir kiriye û dipê; ku xelkê malê tev di xew ve herin, ew û şivan wê li hespan siwar bibin û wê ew şev birevin! Şev ker dibe! Mala Derwêş begê tev di xew ve diçin! Binefşê kur di bêşikêde dihêle, hema radibe û şivan ji nav ciyan radike û xwe berî derve didin. Ew li hespan siwar dibin û yalla konên wan hûn li kû ne, berên xwe didine rê û diçin welatê Hekarîya!

Derwêş beg serê sibê radibe dibîne ku Binefşê û şivanê wî tune ne! Hêja ew bi xwe dihise ku hebe tunebe ew şivan Cembelî bûye! Lê îş ji îş derbas bûbû. Û ew bi tepan li çika xwe dixe.

Derwêş beg defa hewarê dikute û eşîra xwe dicîvîne. Ew davêjin ser konên Cembelî û bavê Binefşê. Ji wanakan ref û nêçîrê. Bavê Bnefşê û heftbirayên wê li ser hev û dinê dikujin û dîsa Derwêş beg, Binefşê digire û ji xwe re tîne û tên welatê xwe!

# SÊ KURDÊN TIRKÎZAN

Carek sê heb heval hebûne rojekê ew ji hev re dibêjin:

-Lazime em çendekê herin welatê tirka, da ku em hînê peyivandina bi tirkî bibin!

Ew hersê radibin û diçine Anadolê. Li wê ew gelek wext dimînin. Wey herama reş be ku hînê tirkî dibin. Ew li wir j bi zarê xwe yê zikmakî xwe ser bi hev re xeber didan. Her yek ji wan, ji bil bêjeyek bitenê zêdetir, ew hinê tirkî nebûye. Yek ji wan hînê «Ben», yê din hînê «Kêf îçin» û yê dîtir jî hînê «Heq Etmîş» bitenê ew hîn bûne!

Ew hersê hevrî, bêrîya malên xwe dikin û berê xwe didine welêt, tên. Bi rê ve ew laqê termekî mirî dibin. Ew hersê li dora term diçin- tên, diçin tên û qaşo bi hev re bi tirkî dipeyîvin:

-Ben, ben, ben!... (Ez, min)

-Kêf için, kêf için!... (Jixwe- ji kêfan re)

-Heq etmiş, heq etmiş, heq etmiş!... (Heq kiribû)

Cendirmeyên qereqolê bi kuştina wî mirî hisîyane û li hespan siwar in û têne wir. Ew dibînin ku waye sê meriv li dora termê mirî diçin û tên! Cendirme ji wanakan dipirsin:

Kî ji we vî zilamî kuşt?

Yek dibêje:

-Ben, ben. (Ez, min)

Ew ji yê dinê dipirsin:

-Bo çi we vî zilamî kuşt?

-Kêf için, kêf için..(jixwe- ji kêfan re)

Ew ji yê dîtir dipirsin:

-Çi sûcê wî hebû ku we wî kuşt?

-Heq etmiş, heq etmiş...(heq kiribû)

Cendirmeyên siwarî hersêkan jî, li wira digirin û dibin wan davêjine girtîgehê

# ŞÎRET

Mêrik û jina xwe şer dikin û ji hev dixeyîdin. Ne mêrik bi jinikê re xeber dide û ne jî jinik bi mêrik re xeber dide.

Şevek êvarê şîva wan goşt bû. Ew rûniştin ku şiva xwe bixwin. Mêrik kurê xwe datîne ser çoka xwe û piço piço goşt jê dike û dide devê lêwik. Di nava goşt de ew parîyek kezî dibîne û dide devê lawê xwe û dibêjê:

-Ha kurê min vê kezîyê bixwe! Meriv kezî bixwe çûçikê meriv pê mezin dibe!

Ew deng diçe jinikê. Lê belê ew bi mêr re napeyive, hêdîka di ber xwe dibêje:

-Weyla bi qurbana lawik kirî! Çima van şiretan li xwe nake

# «ÇILE TÊ QÊ BIHAR NAYÊ»

Rojekê berf tê, tê, tê, heta wisa dibe ku êdî xanî di binê berfê de winda dibin. Pîrekek hebû alifê heywanê wê diqede û ji xwe re perîşan dibe. Jinik radibe diçe mala axê gund û dibêje:

-Axa Alifê heywanên min kuta bûye û tev birçi mane! Ez hatime cem te ku tu têrek ka bidî min.

Axa dibêje:

-Eger tu îşev li ba min rakevî ezê ka bidim te.

Tu nabêjî, kîjan pîreka ku ji axê ka xwestîye, ewî wê bazarê pêre kirîye! A ku qebûl kirîye Axe ka dayê, a ku qebûl nekirîye, wî ka nedayê.

Jinik wê pêşnîyara axê qebûl nake û vala vedigere mala xwe.

Ew şev hatanî sibê jink dia dike û berzûrî Xwedî dibe. Bi emrê yezdan ew şev baranek tê, lê belê baraneka wisane, qey tu dibêjî ava devê cêr e û hetanî sibê didomîne. Serê sibê radibin ku berf helîyaye û piçe piş li erdê belekî mane. Ew gund tev pez û dewarên xwe dibine çêrê û ji hewya heywên û ji bêalifî difilitin!

Înca bihar tê. Gil û giya şîn bûye û li çokê dikeve. Heywan êdî bi devê xwe têr dibe. Axê gund qotê xwe xwar kirîye û li dora malan ji xwe re tûran davêje. Ew di ber mala jinikê re dibuhure, jinik wî dibîne, hema radihîje qotedarekî û dide ser mirîşkê:

-Kişşe keyagayê! Qê çile tê bihar nayê? Qê hema tim û daîm wê gan bêne bi têra kayê?

# PEYVA BI TECWÎDÎ

Mele Xelîlê Sêrdî di çaxê xwe de ilimdarekî pir bi nav û deng bûye. Lê belê ew zêde olperest û tesewusçî bûye. Peyvandina wî ya xweser jî, li gor xwendina Quranê ya taybetî (Tecwîdî) bûye. Ew ji çavên xwe jî pir kêm ketîye, şaşik û kurkê wî, ilimdarîya wî gelek didane nîşandanê!

Rojek ji rojan Mele Xelîl diçe sûkê ku ji xwe re satilek mast bikire. Pîrekên gundan yên li dor Sêrtê, di serê siban de, mast dianîne serê sûkê û difirotin. Xelkê bajêr diçûn û ji xwe re dikirîn. Rojekê Mele Xelîl diçe wir û li nav satilên mastan digere. Ew digere satilek mastê gamêşan dibîne. Ew destên xwe li serê digerîne ka ca toyê wî çewane! Toyê ku li ser maste jî, destek qalind e û ji keçikê dipirse:

-Maaassttê teeee bi çiiiqaaaass?

Keçik bihayê mast ji wî re dibêje. Ew jê dipirse_

Tuuuu jîîî lliiiisser? (To jî li serê ye?)

Keçik ji wî fam dike ku ew dibêje «tu jî bi mastê xwe ve, bi wî bihayî?» Hema keçik jê re dibêje:

-De here korê şeytan!

Mele dibêjê:

-Eh amê min çî got?

Û ew disan ji keçikê dipirse:

-Tuuuuu jîîî llisser?

Keçika xwedîya mast ji wî re sixêfan dike û dipêre. Ji ber peyvandina Sêrtîyan ya nerinda bi kurdî heta ku ew û keçikê ji hev fêr dibin, xelkê sûkê tev li wan têne hev!

------------------------------

.: Mele Xelîl Sêrtî bi eslî xwe ji Hîzanê ye. Di sala 1754 an de ji dayîkê bûye û di sala 1843 an de çûye heqîyê. û 25 heb pirtûk nivîsîne.

# XOŞAV Û EZEXANE

Carek li Tirkîyê partîyek binavê AP (Hêza Dadgeh) hebû. Ew hêz li Kurdistanê di nav bûrjuvazên kurdan de şax û rehên xwe berdabû û piranîya wan kişandibû nav xwe de. Ew çax kîjan axe, şêx, beg û keya yên nezan û kifikmejî û zengarî hebûn, diçûn nav wê hêzê de. Û di Parlementoyê de serokê wî, li gor daxwaza xwe û vana çîna xwe, hikûmetê dimeşanda!

Yek ji wan miletwekîlîyên ku qaşo hatibû hilbijaritinê û di parlementoya li Enqerê de bû, û ew bi xwe jî, şêxek bû, rojek nexweş dikeve. Tixtorê wî yê taybetî tê û derzî û dermanan jê re dinivîse û dibêjê:

-Pêwîste ku her tim Qomposto (Xoşav) bixwî.

Belam Şêx xwendin û nivîsandinê nizane! Ew receta xwe digire û diçe ezexaneyek da ku derzî û dermanên xwe bikire. Dermanên wî didinê û vedigere. Şêx hejmara dermanên nivîsandî û ya ku tixtor bi dev jê re gotîye, ne wek hev dibîne û vedigere ezexanê:

-We dermanê min yek kêm daye!

Ew li receta wî dermanê ku dabûnê dinihêrin temam e. Navên tevên dermanan jêre dixwînin û ew dibêje wan:

-Lê kaye qomposto? (Xwoşav)

Ezexaneçi dipirse:

-Tu ji kur i?

-Ez milletwekîlîyê Qerekosê me!

-Qomposto li vir nayê firotan, ancax li aşxaneyan tu dê peyda bikî!

# «DOST BILA DOST BIN»

Zilamek hebû hertim li kurê xwe şîretan dikir:

-Kurê min bila dostên te dost bin! Bila ne post bin!

Li ser wan şîretên ku bav li kur dikir ew dixeyidî û pozê xwe jê ji bav dikir, digot:

-Dostên min ji dostên te çêtir in!

Rojek bavê wî gotê:

-Lawê min were ez û te, emê tecriba dostên xwe bikin!

Kur bi wê pêşnîyara bavê xwe qayîl bû. Bav û kur anîn beranekî serjê kirin. Cendekê berên di firûnê de sax qelandin. Nanên sêlê pijandin û li dora cendek berev kirin, doqêsipî lê pêçan, bû fenanî mirîyek ê kefenkirî û di kadînê de veşartin!

Lêwik diçe nik dostên xwe û weka ku bavê wî jê re gotîye, ji wan re dibêje! Ew daxwaza alîkarîyê ji kîjan dostê xwe dike, dibîjinê:

-De wê ve here, karê me tuneye, êdî em werin alîkarîya te bikin û termê destkuştîyê te veşêrin!

Lawik vedidere tê nik bavê xwe û dibêjê:

-Ji dostên min yek bi tenê jî nehat bavo!

Bav dibêjê:

-Lawê min! Tu here ba dostê min filan û filan û filankes!... Silavên min li wan bike û bêje:

-Bavê min mêrekî kuştîye! Gotîye: Bila were alî min, da ku em termî veşêrin! Û tu li tayêta vegerî, werî!

Kurik diçe nik wan dostên bavê xwe û çawa ku bav gotibûyî, dibêje!

Ew ji wan ji kî re dibêje, bersiva wî:

-Li ser çavan û l ser seran! Hema tu here, gava ku şev tarî bibe, ez li mala we hazir im!

Lêwik tê û çewa bersîv danê, wisan ji bavê xwe re dibêje.

Bavê wî dibêjê:

-Te dît! Min ji te re negot!

Dibe êvar, şev tarî dibe û dostên bavê lêwik têne mala wan. Kî yê ku lawik jê re gotibû, hatibû! Kur û bav dikevine pêşîya wan û diçine kadînê. Termi di nav kulavek dipêçin, datînine ser milên xwe û berên xwe didin bi çîyê ve, diçin. Li çîyê ew dikevin şikeftekî de. Her yek ji wan, ê qazme girtîye, ê bêr girtîye, lê didid di şikeftê de çal dikolin! Bav û kur hêjî deng nekirine. Piştî ku wanekan qederek çal kolan, bavê lêwik bangi dostên xwe dike û dibêje:

-Gelî dost û hevalan! Ka ca bisekinin ezê ji we re tiştekî bêjim!

Ew tev disekinin û guh lê tapêl dikin! Mêrik dibê:

-Ez û vî kurê xwe, li ser dostên xwe bi hev re ketin sîqalê! Min gotê: «Dostê min dost in», wî gote min: « Dostê min ji yên te dostir in»! Ev termê han jî, beranek e û di firûnê de min kirîye parêv! Ew çû ji dostên xwe re got, ku «min mêrekî kuştîye, werin da ku em veşêrin, mixabin kesek ji dostên wî nehat. Înca min şande pey we, vaye hûn tev hatine! Meriv ku dostê hev û dinê be, di qisûmatên weha de kifş dibe! De încar werin em têkevine ser goştê berên û bixwin!

# TELEVIZYONA MUXTÊR

Gundek hebû, tevek mirîdê mala şêx bûn. Eletirîk hê nû hatibû gund. Berê pêşî Muxtarê gund televîzyon kirî û anî wê li oda xwe ya muxtarîyê danî. Xortên gund gava bi televîzyonê hisîyan, tev hatin ber û lê temaşe dikirin. Sofîyan li hember Muxtêr û xortan derketin û derheq wan de piropaxandekî pir pis dikirin! Sofîyan wiha digotin:

-Muxtêr kerxanê xistîye mala xwe!

-Yê ku li televîzyonê binihêre ew ne bisilman e!

-Muxtar vî gundî xirand!

Yê ku here wir jina wî jê berda ye!

Di mizgefta gund de, kar û barên sofîyan hew ew bû ku derheq xortan û telvîzyona Muxtêr de pirapaxanda pîs dikirin! Roj derbas bûn, hefte derbas bûn,meh derbas bûn, çiqas dihere xelk bêtir diçe mala Muxtêr. Sofî bi tenê man, ew man û camî! Were bûbû ku êdî jinên sofîyan jî diçûne ber televîzyonê. Televîzyona Muxtêr ji sofîyan re bûbû fenanî dahbekî û wan dikir û ne dikir, tebata wan ne dihat û di mizgeftê de ne dihewîyan: «Ka ev televizyon çi tişt e ku were jin û zarûyên me diçin berê!» hema ji hev û dinê dipirsîn!

Hin bi hin ewan derheq televîzyona muxtêr de qisedana xwe kêm kir û yeko yeko xwe ji hev dizîn û çûne berê! Li oda Muxtêr kî ji wan sofîyang ava hev û dinê dibînin, ji hev fedî dikin û serê xwe dixine ber xwe, li hev mêze nakin. Lê belê xortên gund gelek qedr û qîmetê didine wan û ji ber wan ve radibûn.

Li ber televîzyonê tevên sofîyan hevû dinê dîtin û bi hev hisîyanl Yek heba dîsa lê mêze nekidir û çi keçikên ku derdiketin jî, ji wan re xeberan digotin û çêr dikirin. Ewan hin birin rêza pêşî ji xortan sitend. Xort diketine pişt wan. Hêdî hêdî alê pêş bi temamî giha sofîyan û xort li ber derî li ser şikalan rûniştin.

Mele li mizgeftê bê cimaet ma. Çiqas ew bang dide, tu kesek nayête limêjê. Mele têgihişt ku tevê sofîyan diçine mala Muxtêr! Her çiqas dilê mele jî, ber teleziyonê dixwest, bes heta wê gavê ji tirsa sofîyan ne diwêrîya ku here berê. Lê încar jê re fitwe ketê. Çi cara ku banga eşa dida, hema rast lê dida û diçû mala Mûxtêr. Xortan dît ku wanê şevek melê jî hate wir! Tev ji ber ve rabûn û wî birin jorê odê dane rûniştandin. Kêf bû kêfa xortan! Mele jî hate ber televizyonê!

Gava wêneyên keçikan derdiket, tevê sofîyan ziloq dibûn û lê dinêrtin Li wan dinêrtin, dinêrtin heta dilê wan dixelîya, av ji devên wan di-

herikî û bi mizdana nav gavên xwe diketin! Muxtar derheq sofîyên li ber televîzyonê weha digot:

-Sofîyên gundê me, êdî ji nimêjê qerîyan û timî dihatine ber telezîyonê! Sira pêşî ji xortan sitendin! Pirîya ku li keçikên di televizyonê de dimeyîzandin, êdî tev har bûbûn û ji tirsa wan jinebîyek ne diwêrîya ku derkeve derva!..

# ÇIL SIWARÊN BÊSERÎ

Carek ji cara rihme li dê û bavê hazir û guhdara. Hûn paristî bin ji cendirme û polîsên koledara.

Rojekê çil siwar bi hev û dinê re ne û diçin ber derê konê axakî, peya dibin. Belam ew axe jî ne li mal e, ji xwe re çûye ref û nêçîrê. Hahakê xulamên wî,mêvanan dibine bin kon, xwarin qehwe, çay û çixare ji wan re pêşkêş dikin. Di binê kon de, bi rêzê dewşekan danîne û ew çil meriv li ser wan rûniştine û ketine galgala dinê. Li derê kon hespên wan jî, li ser sigan girêdane û alif dane ber wan Ji mêvanan re çar-pênc beranan avêtine erdê û digurînin, karê firavîna wan dikin!

Axe ji ref û hêçîrê de hat. Gava ewî li dora konan çil hespên hazir û zînkirî dît, kete tavilan û bêtebat lê da û bezî çû nik serkarê xwe û pirsî:

-Xêr e! Ev çi hesp in, tev were hazirkirî ne, li van deran?

Serkar gotê:

-Axeyê min! Wele ez nizanim! Vê sibê, gava ku tu çûyî nêçîrê, hema hindik di pey te de, me dît ku çil siwar bi hev re, li ber derî peya bûn! Wanê tevek li binê konê mîvanan rûniştîne! Û va me jî, ji wan re pez gurandîye!

Axê ji serkarê xwe re got:

-Ka ce here nik wanakan û ji yê ber derî bipirse; ka mezinê wan kî ye, da ku ez herim berê pêşî xêrhatinê tê bidim û bi destê wî bigirim!

Serkar diçe binê kon. Li alê derî yek ji wan rûniştîye, û xwe bi ser ve xwar dike, bi dizîka di guhê wî de dibêje:

-Bako (birko) ji van çilan mezinê we kî ye?

Ew dibêje:

-Mezin ez im!

Û li tayêta dizivire, tê nik Axê û dibêje:

-Axayê min ! Min ji yê li ber derî pirsî, wî got ke; mezin ez im!

Axe gotê:

-Ka ca here ji yekî din bipirse; Ka mezinê wan kî ye!

Serkar diçe ji yên li ber derî ku rûniştine ji yekî dinê dipirse:

-Bako, mezinê we kî ye?

Ew jî destê xwe li singa xwe dixe û dibêje:

-Mezin ez im!

Serkar vedigere û dibêje Axê:_

-Yê ku min vê carê jê pirs kir, wî jî got; Mezin ez im!

Axe dîsa serkarê xwe dişîne û ji yekî dîtir di pirse. Ew jî dibêje, mezin ezim!..

Axe bangê tevî xulamên xwe dike û dibêje wan:

-Ev çil siwarên ku hatine li binê kon rûniştine, bê serî û bê tifaq in! Ew ne hêjane ku vî nanê ku hûn ji wan re hazir dikin! Vanê ez vedigerim û diçim! Yek ji we defa hewarê bikute û yek jî bila here nik wan û bêje:

-Hinekan talanê me bir! Azê me jî ne li mal e! xîret ketîye erdê û segan jî pîê lê nekirîye! De rabin ku em li pey bikevin! Eger rabûn û hatin, ji xwe hûn dizanin ku kêjane ku hûn nan bidine wan û hûnê bêjin; Talan derew bû û hûnê wan bizivirînin binê kon û nên bidine wan! Ekene, wan ji ber kon biqewirînin, bila herin!

Axe ji konan dûr dibe. Defçî li defa hewarê dixe. Xulamek diçe binê kon û dibêje wan:

-Gelî mêvanan, hinekan lê da û talanê me bir! Axê me jî ne li mal e! De rabin û emli pey herin!....

Heta wê gavê, ew bi qormatî li binê kon dipeyivîn, kuşîna çixara wan bû û qehwe li ser qehwê dadiqurtandin. Ewan çewa ku dengê birina talan bihîst, bevz wan wergerîya, çavên wan zer bûn, li hev û dinê mêzekirin, xidûkî kete nav wan de û bê pêjn bûn! Ew yeko rabûn û bi alê hespên xwe ve çûn. Ew tev li hespên xwe siwar bûnû berê xwe dane riya kujê ve hatibûn û çûn!

Axe jî, li ciyek dûrxwe daye serê tepeyek û li wan temaşe dike. Defçî jî, defa hewarê sekinand û Axe hate nav konan û got:

-Ji her kesek re tifaq pêwîst e û seryek! Ekene her kes ku bêje ez, ez, ez!.. îş nemeşe û merî nikare xwe ji destî dijminan biparêze! Wek van mêvanên me!...

# SEREKOMAR Û TUWALETA ELEMÛZÎK

Carekê, Cewdet Sunay wextê serekomarê dewleta Tirkîyê bû, ew û jina xwe deçine gera awrupayê. Diwêlên Awrupî gelek qedr û qîmet didine wan û di ezibînin. Ew şevekê li cîyek mêvan in, ji wanre qesreka xisûsî ya giranbiha radixin û di çaxê razana de, wanakan dibine wir da ku rakevin.

Lê belê, ew şew petronên Avrupî ji Serekomar û jina wî re gelek xwarinên cure cure çêkiri bûn, vexwarin dabûne wan û hem neşiniyeka giranbiha ji wan re saz kiri bûn. Dibe derengîya şevê, çima destava serekomar nayê! Ew û jina xwe herdu ji tengezar dibin, ew di xanî de xalîna raxistî ne, vegirtina dîwaran û derîyan tevek bi texteyên gûzan çêkirî ne û nîgarên xweşik û rengareng li ser kevirên mermer bi dîwaran ve daliqandî ne. Ku di xênî de tuwaleta elefiranga neyête xwanêkirin ji, ji serekomar gazin nayêtine kirin!

Serekomar di odeyek de sindoqeka mezin dibîne: «Gelo wê ev ne tuwalet be» ji xwe re difikire. Li dora wê diçe û tê, ew destê xwe tavêjê, çavîyek di sinkoqê de vedibe. «A hah min tuwaletê dît, a hah min tuwaletê dît» dibêje û mezgînîyê dide jina xwe!

Serekomar li wê çavîyê rûdine û destava xwe dike. Ew îşê xwe kuta dike û vedigere nik jina xwe û dibêjê:

Xanim! Ev awrupî çiqas şeytan in! Tu dibînî ku vê tuwaletê bi çi sosretê ve çêkirine!

Încar jina wî dihere tuwaleta «Bi sosret». Gava jinik dikeve odê, bihneka genî li pozê wê dixe. Ew ji xwe re dibêje: «Qey ev tuwalet hewqas bihna genî dide! Nebî ev der jî, wek enqerê av hatîye birîn!» Jinik li ser tuwaletê rûdine. Çavên wê li dormadarên «Tuwaleta bi sosret» bi hinek bişkokên rengareng dikeve. Ew dibêje: «Gawiran vê tuwaletê çi delal çê kirine» û pêçîya xwe li ser wan digerîne. Bi dana pêçîyê re, çima «Tiringî» ya saz nayête wê! Ew ji neşka ve li ser destavê vedicinîqe û bi hewa ve hildifire. Hê ji nû ve jinik fam dike ku ew sindoq ne tuwalet e, «hebe tune be, ev sota mûzîkê ye!»

# «LI PAWUKA XWEDÊ BIHÊLE!»

Carekê meleyek hebû, ew dil ketibû jinekê . Jinik jî, jinebî bû û kurek wê bitenê hebû, Mesela melê li nav alemê tevek belabûbû û her kes pê xeber dida. Lawê jinebîyê bi kur ve diçûn, xelkê jê re digota, «mele dil berî dîya te daye» û lêwik pir ber xwe diketa

Mesela melê gelek lêwik diêşand. Rojekê wî li dîya xwe doz kir û gotê:

-Lawo! Ez kor û kotî bibim, hay û gumana min ji melê tuneye! Lê belê kurê min ku ez bim li pawuka xwedê bihêle, ji her tiştî çêtir e!

Lêwik bala xwe didê ku êdî ji tan û niçan nema ku ew di nav xelkê de tebat bike û felata dîya wî, ji destên melê tuneye! Lawik li melê notirvanî kir, ka wê kengê here ser minarê bang bide!

Rojekê lawik dibîne ku mele çû serê minarê, lawik jî bi dizîkan pê ve hilkişîya, ewî ji serê minarê hetanî xwarê, li ser pêplûkan nok reşandin. Lawik ji mizgeftê dûr dibe û li pawukê ye kaca di pey bangê de wê mele çewan bibe!

Mele banga xwe qedand. Zivirî ku dakeve jêr û were li pêşîya cimaetê limêj bike. Ew çawa pîyê xwe davêje ser pêplûka ewil, lingê wî ji bin ve difiştiqe, «fîşeleeep» ew tera dibe û teqle li ser teqlê, ew ji serê minarê qolopanî dibe hetanî jêr melê tê!

Cimaet jî li mizgeftê li pawuka melê ye. Ew dipên û napên mele ku were nayê! Sofîyên li mizgeftê radibin bi telbê melê ve diçin. Gava ku wî dibînin, çi bibînin, waye melê di nav xwûnê de digevize! Çav! dest, ling, ser û poz, cîyek bi wî ve saxlem nemaye, qasikek di wê rewşê de mele dimîne û pepikan dike repp!

Lawik çewa ku mirina melê seh dike, bi bayê bezê diçe û mizgînî dide dîya xwe:

-Dadê, dadê! mele ji serê minarê de ketîye û mirîye!

Dê dibêje:

-Lawo! min ji te re negot, «li hêvya xwedê bihêle! Ancax ew heqan bi heq dike!»

Lêwik ji dayîka xwe re got:

-Erê dadê! Eger min li pawuka Xwedê bihiştana, heta niha wê melê qûn li te biçirandana!

# QOLÇIYÊ GÛVEDAYÎ

Carek ji cara qolçîyek hebû, lê belê ji tirsa wî kesek ne diwêrîya ku li çolan û diriyan de çixareyek bikişîne. Ewî li kur bi hekî re qutîya çixarê bigirta, peran jê distandin.

Rojekê zilamekî rêwingî bi riya xwe ve diçe. Ew zilam li hawîdorên xwe dinihêre û nanihêre, his û pisa qolçîyan li wan der û dorana, nake. Û bê tirs û bizd qutîya xwe ya çixarê dertîne. çixareyek dipêçe û agir berê didê. Lê belê her carê ku ew mijek lêdixe, deh metre dûyê wî bi ser dikeve.

Qolçî ji dûr ve wî zilamê çixare kêş dibîne ku wanê çixare dikişîne. Ew hespê xwe dajo û bi cirîdê bi alê zilam ve diçe. Lê belê zilam çi cara ku mijek li çixara xwe dixe, ew li hawîdorên xwe dinihêre. Ka qolçi li wan doran hene yan na! Carek zilam dibîne ku waye li pey wî qolçîyek bi beza hespê tê. Hema ew xwe berdide ber çayê, erdê vedide, qutîya xwe dixê, xwe davêje ser û li serê rûdine destana xwe yamezin dike. Qolçî tê tangava wî, ji hespê xwe peya dibe û rast diçe bi alî ve. Heta ku qolçî digîje nik wî, ew jî ji ser destavê radibe û ber bi qolçî ve diçe. Qolçî wî zilamî seh dike. Lê tiştek bi wî re nabîne. Qolçî bi çavên serê xwe dîtibû ku dûmana çixarê biser ve hildikişîya û qutîyê pêre nedît û qehirî. Qolçî guman kir ku wî zilamî li cîyek qutyeê veşartîye. Ewî, zilam vegerande cîyê ku lê destav kiribû.

Qolçîyê dewletê bi lepên xwe, destava mêrik hilanî, şûna wê veda, veda çima qutya mêrik dernexist! Pa qutî jî tije titûn e, û destikek kaxizê qaçax jî li serê ye! Qolçîp gotê:

-Te digot qutîya min tune ye!

Qolçî padaştê (ceza) titûnê 5, yê kaxiz 5 û heqê destlewitandin û heqkolana xwe jî 10, bîst wereqên tirkî ji mêrikê rêwî stend û hêj wî serbest berda.

# QOLÇÎ Û GUHÊ KERÊ

Carekê qolçîyek ji Sêrtê hebû. Lê belê çixarekêş ji destên wî hatibûne qaqa reş û ewî bin li wan teng kiri bû, pirîya ku padaştîya (ceza) qutîyên titûnê ji wanakan distanda.

Rojek zilamekî gundî li kera xwe swar e û bi rê ve diçe. Ew li pey

xwe dinihêre ku waye, ew qolçîyê har li pey wî tê. Ha hakê ewî titûna qutiye xwe rijande erdê û bela kir, kaxizên xwe yên qaçax jî dixe guhekî kerê, tê de weşart.

Qolçî gihaşte nik zilam û wî seh kir. Ewî qutîya vala pê re dît. Qolçî dizane ku ne qabil e çixare kêşan bê titûn bimînin. Ewî bala xwe dayê ku xwedîyê kerê titûna xwe li erdê bela kirîye. Lê belê ewî kaxizên çixarê ne dît. Qolçî ji mêrik re got:

-Erê! Vaye te titûna qutya xwe rijandîye, lê kanê kaxiz?

Mêrik gotê:

-Kaxizên min tune bûn, hew titûn bi tenê hebû, ew ji min wê ji tirsa te rijande erdê!

Qolçî vê gotinê bawer nake, ku titûn hebe û kaxiz tune be! Ew li nav kurtanê kerî gerîya, gerîya kaxizan nedît, ewî kurtanê kerê piçik û parî kir, lê belê kaxiz tune ne. Ew dîsa xwedîyê kerê sah dike, kaxizan nabîne, li nav kurtan digere, nabîne, qolçî gotê:

-Sozê namûsê ji te re! tu kaxizên xwe ray min bide, ka te li kur veşartîye, ez padaştê ji te nastînim!

Eybe eybe qê mêrik ji sozê qolçî bawer dike! Werhasil qolçî gelek sondxwarin, pêda ket û êmîntîya wî anî, ku ji wî pereyan nasitîne. Di dawîye de mêrik cîyê tê veşartina kaxizên xwe rayî wî da. Qolçî got:

-Li ser namûsa min be min qet û qet jî, bîra guhên kerê ne dibir! Lo mademkî tu ev mêr î, û ez jî, ji te hînê guhên kerê bûm, hema tu ji min firîqet be û ji te re oxir be!

# HECÎ MALÊ SPART Ê DÎN

Carek ji cara , zilamekî pir dewlemend hebû û jina wî ji pur xweşik bû. Mêrik hinek kal bû û jina wî, çavlderî dikir. Lê belê mêrik timî li jina xwe notirvanî dikir da ku ew destê rêjiyan neke!

Wî zilamî rojek biryara xwe da ku here Hecê. Lê belê ew ji jina xwe piştkul e û aminîya wî nayê ku here û jinikê bitenî di mal de bihêle. zilam çû yekî dîn dît û jê re got:

-Ezê herime Hecê! Tu were ber mala min heta ku ez ji Hicazê vegerim, ezê heqî te bidime te!

Ew ji xwe re difikire «ku ez herim Hecê, evê dîn li ber mala min be, ji xwe jina min li xwe danayhîne ku pêre bide û bistîne! Ji bo min ya herî çak ev e ku ez bikim!»

Mêrik wî zilamê dîn anî ber mala xwe û ew bi oxira xwe ve çû. Bi ser jinikê ve ew çend roj derbas bûn, ku Hecî ji mala çûye Hecê û ew kewijî. Ewê bela xwe li yê dîn xist. Lê belê dîno jê direve û newêre xwe nêzî jinikê bike. Jinik ji xwe re fikirî «ezê çewa bi wî re rakevim!» û tebata wê bê mêr ji qet nayê!

Xwedê negiravî, jinikê xwe tazî kir û li ser dewşeka xwe dirêj kir. Ewê ba yê dîn kir û gotê:

-Ka ca were! Di nav gavên min de birînek derketîye, xêra xwe derman bike!

Yê dîn dike ku destê xwe bavêje şûna birînê, jinik dibêjê:

-Na, na! Destê xwe navêjê! Di nav gavên te de destek din heye, wînakê derxe û deyne ser birînê!

Yê dîn çi dike ji bo Xwedê dike! Ewî doxîna xwe vekir û xirê xwe deranî. Jinikê pê girt û danî ser devê wê birîna ku wê digota. Jinikê, wî li ser berînê bir û anî. Bê guman ew tişt, li xweşê yê dîn jî diçe. Werhasil yê dîn birîna jinikê dikevîne. Încar ew hînê wî tiştî bû, tamijî û her carê qasek, ew ji jinikê re dibêje:

-Xanim, xanim! Ma birîna te naêşe?

Jinika cêhil û can, ji xwe ew li xwedê û li tiştekî were digerîya û ew tişt bi destê wê jî ketibû. Her roj, ewê sê-çar caran bi dîno re birîna xwe dikewanda.

Wextê vegera hecîhan hat. Mêrê jinikê bê qeza û belagihaşte gundê xwe. Lê belê dîsan dilê Hecî ji jinikê waswas e û kutekut dike. Hecî bi bez çû ku here mala xwe. Jinik jî çêye kanîyê ku av werîne. Ew qederek e ku Hecî ji mal dûr bûye û nizmbûna sivdera derîyê xwe ji bîr kirîye. Çewa Hecî lingê xwe di ser şûmûkê re davêje hindurû, ji jor ve serê wî li sivderê dikeve. Hecî hema gej dibe û li erdê pij dibe. Ewê dîn çewa dibîne ku hecî li erdê pij bû, hema ew doxîna xwe vedike, xirê xwe dertîne û li ser û çav û poz û guhên Hecî dihesikîne! Di pey qasek de Hecî bi hişê xwe ve tê, çevên xwe vedike, çi bala axwe bidê! Ku yê dîn xirê xwe di ser û çavên wî de dibe û tîne! Ewî bi wê rewşa yê dîn fam kir ku ew tişt, ji jina wî qewimîye û jê pirsî:

-Dîno tu çima were dikî! Qê çi feyda vê yekê heye?

Yê dîn dibêje:

-Ne çiqas cîyekî Xanimê jî diêşîya, ji min re digot, tu were awiha bike û min were dikir, hema ew pêre pêre xweş dibû û radibû pîyan!

# BÛKA SÊMEHÎ

Hebû tuneb, keçeke pir delal û nazenîn hebû. Keçikê dil berdabû xorgekî û bi wî re hertim pîwendîyên xwe didomanda. Bi dizîka li gor mara «Hîleşer'î», bi xort re zewicî, bû, lê kesek hay jê nebû.

Bav û dîya xortî, çûn li gor irf û edetên xwe, wê keçê ji bavê wê xwestin. Bi daweteke heyteholl ve, ji kurê xwe re anîn. Pêre pêre, keçik bi zarû derket û dipey sê mehan de, welidî. Xezûr û xwestîya wê, li bûkê mikur hatin, gelek zordestî û kotekîyan lê kirin, hitil mitil digotinê:

-Ev sê meh in ku me ji kurê xwe re anîye, te vî zarûkî ji kur aniye?

Ruwê keçikê jî, ne dida ku mesela rastî ji wan re bibêje, lê ji wan re digot:

-Heyran, hina qewlê zarûk anînê qey ne neh meh in?

Xezûr û xwestîya wê digotin:

-Belê wisa ye? Lê yê te, ev sê meh in, ku te zarûk anî!

Bûkê got:

-Na, yê min ev neh meh in, ka ez ji we re hisab im!

«Kanûn û kan û kut<br>
Sibat û sat û sut<br>
Mehka çû, mehka tê<br>
Û mehika pezê Bavo tê de dizê»

Eva bûne neh meh û qewlê zarûka min qediyayî ye!

«Kanûn û kan û kut», li gor hisabê bûkê, navî meha despêkê ne. Yani meha Kanûnê paşî. «Sibat û sat û sut» ev jî meha sibatê ye.

«Mehika pezê bavo tê de dizê» jî, meha Adarê ye.

Navdarkirina du mehan bi «Çileyê Pêşîn û Çileyê Paşîn», tiştek ne raste. Çimkî «Çile» bi xwe navek e. Yani Çil roj. Lewra zivistana xedar, bi navê «Çile» hatîye navdarkirin. Pêşîyên me li ser vî teştî weha gotine: «Kanûnkut, Çileyê hirr, Kanûnkiş».

«Kanunkut»: Deh roj in. Despêka wan, ji yekê meha duwazdeyan hetanî dewîya roja dehem a wê mehê. Çewa ku ji vî navî jî tê zanîn, çaxê kudandina hewyê, hunduran û ber agir e.

«Çileyê hirr»: Çil rojên zivistanê yên xedar in. Bi despêka roja yazdeyan ji meha duwazdehem dest pê dike û hetanî kutabûna roja bîstem a meha pêşîya xwe, ku meha yekem ji sala nû ye. Ev çil roj, ku diqedin zivistan jî qediyayî tête hisêbkirin.

«Kanûnkiş» : Ev jî deh roj in. Ji van deh rojan re «Dehkên Mîya» jî

dibêjin. Çimkî bi piranî, despêka zayîna mihan di van dehrojan de, despêdike. Kanûnkiş, ji roja 21. meha yekemîn despêdike di domîne hetanî dawîya mehê.

Her çiqas ji van mehan re ereb dibêjin «Kanûnê ewel, kanûnê sanî» jî, çewa ku me li jor nivîsî, li ber çavaye ku ew nav kurdî ne. Nevên kurdî yên kevnare ne û ereban ji me dizîne. Ew jî wek wan dizên din, zimanê me didizin û paşê difiroşine me!

# NAWÊ MANGEKANÊ KURDÎ

Bi kurdî navê mehan weha ne: Kanûna paşî, Sibat, Adar, Nîsan, Gulan, Hezîran, Temûz, Tebax, Îlon, Çirîya pêşî, Çirîya Paşî û Kanûan Pêşî.

Navê mehan bûni kurdî pir cûre cûre têne gotin. Li gor mestereyeka ji pirtûkxana Şahê Îranê, ku me bi dest xist, têde navê mehên kurdî weha nivîsî bûn:

1-Rêbendan : Bendane, Bendan, Çileyê Paşîn, Kanûna Paşîn.

Çewa ku ji nivîsarê tête zanîn, serê sala kurdî ji meha Adar, yani ji Newrozê despêdike. «Roj jimêrî Amanc/4»

2- Rêşemê : Reşan, Pûlan, Xwedhelkirin, Newroke, Bedaroke, Bewarû, Reşemeh, Sibat.

3- Newroz : Axlkêve, Axlêqe, Hermêpejkevan, Adar, Azar, Cîjenan, Bercîjenan, Mart.

4- Banemerd : Banemerd, Şesebaran, Şistebaran, Bazebaran, Hermêgenan, Pirbaran, Nîsan.

5- Gulan: Zerdan, Sawan, Heywan, Gulan.

6- Pûşper: Germacman, Perper, Baranbiran, Mendaremang, Merdaremang, Peran, Tirmeh, Hizîran.

7- Xermanan: Nixşan, Cûxinan, Berepayîz, Soran, Newrûxşan, Tebax.

8- Gelawêj: Bextebaran, Eyar, Giran, Çelehavîn, Mayistemîz, Tirmeh.

9- Rezber: Mêwegenan, Mîran, Bazeberanîyê kurt, Beran, Îlon.

10- Gelarêzan: Xezelwer, Xezan, Weran, Gelawer, Bawer, Barêzan, Gulwer, Kewbwar, Çirîya Pêşîn.

11- Sermawez : Sioxwar, Agirdan, Awran, Paşepayîz, Saran, Çirîya Paşîn.

12- Befranbar : Befrewan, Befrembar, Befran, Çile pêşîn, Kanûna pêşin.

# ŞERTÊ MISILMANIYÊ BÛNE ŞEŞ!

Hebû tinebû, meleyekî wazoke hebû. Mele li serê sergo û poxanan, li bênder û berojkan, li ser çem û kehnîyan, li civat û eywanan, rastî kî dihata, çi misilman, çi ne misilman bûya, ji wna re şert û şirûtên misilmanîyê digot û yên ku nezanîbûn jî, xwe bi wanakan re dixeyîdanda! Çi kesê ku mele wî biqefalta wiha jêre digot:

-Riknê îslamê pênc in, limêj e, rojî ye, hec e, zekat e û bêjeya şehadetê ye.

Û got:

-Riknê îmanê jî şeş in, bawerîya bi yekbûna Xwedê ye, ya bi melaîketên wî ye, ya bipûrtûkên wî ye, ya bi qasidên (Pêxember: Peyamber) wî ye, ya bi roja dawîyê ye, û ya bi qederê ye, ku xêr û xirabî tev bi Xwedê ne û şeyandina di pey mirinê de jî wê bibe!

Ew mele, rojekê rastî qefleyek koçer têt. Ew ji deştê, ber bi zozanan çîyayê Sipî ve diçin. Mele wan li serêrê sekinand û dest bi waz û nesîhetên xwe kir!

Belam ji berê pêş ve, heçî koçer, hewqas tewqe bi olê ve nakin. Hew heywên xwedî dikin, di zivistanan de li germîyanan, û di havînan de jî li zozanan jîyana xwe di buhurînin. Ewan guhên xwe li mele tapêl kirin. Jinika ve, serokê wan berê xwe da melê û got:

-Melê çak û rind, hey ez bigorî, erê rast e, şertê mislmanîyê pênc bûn, lê niha bûne şeş!...

Li ser vê peyvê, çima melê ne enirî! Xwe li erdê da, «ez bi rih û gîyan» çewa tu wisa dibêjî û melê got:

-Welyesteîzû billah, tu kafir bûyî, eşeda xwe bîne, eşeda xwe bîne, eşeda xwe bîne!...

Serok ji melê re got:

-Ez bigorî, em koçer hewqas ji ol fêm nakin, lê tiştê ku em dizanin, çewa ku te got, şertê misilmanîyê pênc in, û tevlî tivingeka birno û du rext fişek ve!

# GIRÎNA MÊRKÊ KOÇER

Zilamekî koçer rojekê ji bo karekî xwe çû gundekî. Ew roj în bû. Melê gund selewatên ji bo limêja înê xwend, tevekên gundîyan çûne mizgeftê şû yê koçer jî, bi mazûrvanê xwe re çû wirê.

Mizgeft ji xelkê cimviqî bûbû û tê de rê nemabû, pirîya ku ew roj xelk çûbûnê. Mele li ser mînberê dest bi xwendina xutbê kir Feseka sor li serê melê ye, kurkekî reş li nav milan e, rûyê wî çar bihost dirêj e û defa singê wî tev girtîye.

Di nav xwendina xutbû de, zilamê koçer ji nişka ve dest bi girînê kir. Girîyekî were dike, minet dibê: «Hebe tune be, ji bo pirîya ku melê xutbe xweşik dixwîne û ji tirsa Xwedê ye ew girîna wî».

Girîna wî ji xelkê tev re bû tevilek mezin. Xelkê tevat ne dikir ku xutbe biqede û jê bipirsin, ka ew çima digirîya. Di pey kutabûnê de, tev li dora wî civîyan û jê pirs kirin:

-Birako, çima tu di nav xutbê de hewqas digirîyayî?

Mêrikê koçer dîsa bû kirîna wî û girîya. Di pey qasikekî de ewî sitêrîn çavên xwe xuwa kirin û gote wan:

-Wê salê ku em çûbûne zozanan li çîyayê Kosorê, nêrîyekî min hebû, kambaxa hirçê kete nav kerî de û wî kuşt. Meriv li wî siwar dibû lingên meriv ne digîşte erdê. Rûwê wî nêrîyê min jî were dirêj bû, gava ku min rûyê mele didîta, eynî weka rûyê nêrîyê min bû, û nêrî dikete bîra min; dilê min li ser wî pirîya ku şewitî, min de kira û nekdikira, girîna min dihata!

# MEHRBIRÎNA XORTÊ TORÎ

Xortekî Torî ji xwe re keçek anî. Roja ku bûkê anîn, ba mele kirin ku were mehra wan bibire. Mele ji xort re got: «Min ji te re çewa ku got, gereke tu pî fenanî min bibêje! Ekene, mehra te çê nabe». Xort û mele û wekîlê bavê keçikê û du heb şade, li cîyek xewle rûniştin û dest bi birîna mehrê kirin.

Mele ji xort re got:

-Min li te nîkah û tezwîc kir filankesa qîza bêvankes!

Zavê got:

-Min li te nîkah û te zewîc kir filan kesa qîza bêvankes!

Melê got:
Hak ma yabo wer mebêje!
Zavê got:
-Hak ma yabo wer mebêje!
Melê got:
-Kuro ma tu kerî?
Zavê got:
-Kuro ma tu ker î?
Melê got:
-Hakk ma yabo vî kera bibine pangê!
Zavê got:
-Hak ma yabo vî kera bibine pangê!
Melê got:
-Çima tu wilo dibêjî?
Zavê got:
-Çima tu wio dibêjî?
Melê got:
-Gereke tu bêjî, min ji xwe re jinê qebûl kir!
Zavê got:
-Gereke tu bêjî, min ji xwe re jinê qebûl kir!
Werhasil, heta ku Mele bi xort da fêmkirin, dikê serê sibê li wan xulxulandin.

# KENÊ BALÛL

Noşîrewanê Adil hikimdarekî pir mezin û bi nav û deng bû. Balûlê Dîwane birayê wî bû. Balûl her tim bí mad û mirûzdayî bû. Noşîrewan dikir û ne dikir ku ew rojekê bikene, ne dikenîya û timî di fikir û di xîyalan de bû Noşîrewan rojekê ji xelkê xwe re got:

-Kî bivîne ku Balûl carekê bikene, ezê perûweka mezin bidime wî!

Ji bo girtina perûwê ji Noşîrewan, gelek meriv bi şev û rojan, li Balûl notirvanî kirin û li nik wî laqirdî û henek dikin da ku ew bikene û herin nik

Noşîrewan perûwa xwe jê bistînin! Lêbelê Balûl qet û qet nakene.

Noşirewan rojekê masî kirîn û çeyand cem jina xwe ji boşîva êvarê. Jina wî ji qewraşa xwe re got:

-Eger ew masî nêr bin, meyne koşka min! Eger yê mê bin, wan werîne!

Balûl çewa wê mesela jinbira xwe seh kir, keniya. Ewî kenekî were kir ku xelk lê heyir man û ew zikopişto dibe. Zilamek bi bezê çû nik Noşirewanû mizgînî dayê, ku waye Balûl dikene. Noşîrewan perûwa wî zilamî dayê, ne dayê em jê biqerin, ew bazda û hate nik Behlûl. Noşirewan ji wî pirs kir û pir jî difikire, ka çima ew kenîya ye. Ewî kir û nekir, Balûl mana kenê xwe jê re negot. Noşîrewan pirîya ku wî qehirand, ew mat ma û mana kenê xwe ji wî re got:

-Gava te masî kirîn û çeyande nik jina xwe, ewê ji qewraşa xwe re got, ku «ew masî nêr bin, meyne nik min, eger mê bin, wanan werîne» Ew qewraşa jina te zilam e! Ev îsal heft sal e, ku wî xwe xistîye qîyafetê jinan û li ber destê jina te kar dike! Çi gava ku tu ji oda jina xwe bi der dikevî, ew û ina te, bi hev û dinê re, dikevin kêf û laqirdîyan! Hay û gumana te ji vî karî jî çê nabe! Ji bo ku tu qet guman ji, ji wê nekî, loma ku ewê der heq masîyan de were got! Gava min vê yeka bihîst, li zibdîya jina tu û li evdalîya te, min xwe negirt û ez kenî,!

Hêrsê li Noşirewan xist, mûyên serê wî bûn weka şûjin, çavên wî sor bûn, çend heb vebuhtîyan şeyand, wê qewraşê anîn û li civatê tazî kir, Ku rat e waye lewlebek di nav bavên wî qewraşê de ye! Noşîrewan serê qewraşê û jina xwe bişûrê xwe yê herbê jê kir û hêjqedr û qîmet da birayê xwe yê Balûl!

# BANGA MELÊ

Carekî li gundekî meleyek hebû. Ewî dil berî jinike gundî dabû. Ne mêrê jinikê, ne gundî û ne jî, jina melê tu kesek bi bengîtîya wî û hinikê ne dizanîyana. Mala jinika dilketîya melê, bi mizgeftê ve bû. Çi gava ku mele diçû mizgeftê bang bida, ewî di nav banga xwe de gazî jinikê dikira, dipirsî ka mêrê wê li male yan na. Eger mêrê wê ne li mal bûya, jinik dihate der. Eger mêr li mal bûya, jinik ne dihate der. Bi vî hawayî mele dizanîya û îşaretan didane hev û dinê.

Sihdeka were melê bû, ku ji wî gundî tu kesek, ne li mêj dikir û ne ji kesek dihate mizgeftê. Jinikê û mele di mizgeftê de hertim îşên xwe diqedandana û li tayêta jinik vedigerî mala xwe.

**Banga melê:**

-Ellahu ekber, ellahu ekber
Mêrê te li male yan nel male?

Eşhedu ellaîlahe îllehllah
Dengê min xweş dighê nik te ha hah?

-Eşhedu enne mihemmeden resûlûllah
Xweş were mizgeftê xweşkoka min ha nihah!

-Heyye elesselah
Deng nayê te nihah?

Heyye elelfelah
Qey mêr nik te ye hah?

Ellahu ekber ellahu ekber
Te qet neda min îro yek xeber!

Laîlahe îllellah
Wey min nîya te hah!

# MELÊSERÎ VEGERANDIBÛ

Carekê dogotin meleyek hebû, ewî dil berî jineka gundî dabû. Qey te digot, ew jinik hojrîyeka bihştê ye, piriya ku xweşki bû Mele dikira û ne dikira, çara ku jinikê ji mêrê wê berde berdan û li xwe mehr bike, ne didîta. Mele li ser meselên jinberdanê, ji gundîyan re, li mizgeftê hertim wazan dikir.

Wazên melê ev bûn:
-Meriv gepa mezin têxe devê xwe jin têrte berdan!
Meriv tûka xwe bavêje erdê, jin têtê berdan!
Meriv berê xwe bide qîbleyê û mîz bike, jin têre berdan!
Meriv li jina xwe bixe, ew dikare xwe bide berdan!
Ev wazên melê gundîyan were tirsandibû, ku kesek de diwêrîya ne tiştek bike û ne jî, ji jina xwe xeber bide. Hema yekî ji jina xwer re xeberek bigotina, jinikê digot: «Mêzeke ezê xwe ji te bidime berdanê ha»!

Rojekê mele dît ku waye mêrê wê jinika ku dilê wî ketîyê de, berê xwe daye qiblê û dimîze. Mele bi bezê çû nik wî û gotê:

Bi qurana ku min xwendî, jina te, ji te hate berdan!

Mele wê meselê di mizgeftê de, ji tevekê gundîyan re got. Ewanan li mêrik hilo hilo kirin. Mêrik çû nik jina xwe û got:

-Hirmet, ev çend rojin ku mara min û te betal bûye, êdî tu ne jin amin î, ji mala min here! Ezê çi bikim qê qedera Xwedê bû li enîya mi nivîsî bû! Waye melê mara min û te betal kirîye.

Jinika gewre ji xwe ji Xwedê tiştekî wisa dipa û lêda çû mala bavê xwe.

Di pey wê bûyerê de bi çendekî, mêrê jinikê dît, ku waye mele wê jinikê ji bavê w xwestîye, qelen dayê û wî ji xwe re bîne! Hêja mêrik fehm kir ku, mele şilqatîyan lê kiribû, û jina wî jê dabû berdanê!

Mêrik weka casûsan, bi şev û bi roj, li pey melê kudend! Ka ca ew jî nabînem, ku mele jî rojek berê xwe bide qiblê û mîz bike. Ji bo ku jin ji mele bête berdan û dîsa jina xwe ji xwe re werîne. Çiqas ku mele bête berdan û dîsa jina xwe ji xwer re werîne. Çiqas ku mele diçû desmêjê, mêrik xwe lê dinotiranda. Rojekê mêrik haw ku dît mele berîya wî çû ser quleteynê. Ew ne dikarîbû ku here wira, li nzîkê quleteynê darek hebû, ew hilkişîya serî darê û li mele çavrênî kir. Mêrik bala xwe da melê ku waye, bilokê xwe daye bi alê qîblê ve û dimîze. Mêrik ji serê darê gazî mele kir:

-Mele, mele bi qurana ku te xwendîye, jina te ji te hate berdan! Waye te jî berê xwe daye qîblê mîz dikî!

Mele bi ser mêrik ve zivirî û gotê:

-Kero min berê wî ji qîblê zivirandîye!

# MELE, MÎRO, MIŞK Û KOÇER

Her kes pê dizane ku heçika mele ne, ji nandayînê re pir tima û çikûz in. Çimkî ewan dîtiye, nedîtiye xelkê daye wan û wanakan tucarî nedaye xelkê!

Mûrî (Yan jî mûrîstang), hewwaneke çavhûr e. Çevê wanakan bi çavan nayête dîtin û bi zorê meriv dibîne yan jî qet nabîne. Bo vê yeka ye, heta hinek dibêjin, «Mûrî bêçav in.»

Heçîka mişk in, heywanine xisarokî ne. Ew bikevine kîjan malê di kambax dikin û gelek telefatên mezin dikin.

Koçerin ji ber ku tu war û wargeyên wanakan tune ne, heçika di havînan de li zozanan û di zivistanan de jî, li deştan dijîn. Ew bi kur ve diherin, pezên xwe berî çendiniyên xelkê didin, mêrgên pawandî diçêrînin û pir xisar û zîyanan didine bêmonîyan.

Li ser rewşa van her çarên ku me gotî, Evdirehmanê Kenan, ji gundê Mezirxalikê (Hezo) bi helbestî wiha gotîye:

«Nanê melle wê çavê mîro qet kes nedî
Mişkê gobel, mêrê koçer bê zerer kes nedî».

# NEDIRÊJ

Çîrokeke min heye. Lê belê gelek dûvedirêj e. Carek ji cara rehme li dê û bavê hazir û guhdara.

Carekê hebû kerek û kundirek. Kerê kundir kot, kot, kot û kot. Çîroka min ev bû ku min ji te re got. Eger ku ne tu bûnayî jî min vê çîrokê li dîwana tu mîr û hakiman jî ne digota.

# BERÛ Û BIZIN

Pirs: Ev bizin çend kîlo heye?
Bersîv: Min bi qemçikê negirtîye!

«Berû dan bizinê
Dest avêt qemçikê».

# TAMSARÎ

Jinika Torî kurê wî mir. Jinikê li ser kurê xwe, yê tayê bi tenê pir şîn û girîn kir û xwe kurr û kemmo kir. Navê kurê wê, mihemed bû. Piştî mirina kurik bi neh mehan, zarûkek ji wê re çêbû. Bi çêbûna zarûkê re, jinikê bala xwe dayê, ku lawikeke. Ew ji xwere kenîya û got:

«Eva Mihema li şûna Mihema, Melkemoto bi tamsarîya xwe ma»

# DAR Û KULAV

Zilamekê gundî hebû, sal duwazde meh, emrê wî bişivanîyê re dibihurî. Mêrik êdî ji wî karê xwe illella kiribû. Ewî dest ji şivanîyê berda û mala xwe bire bajarekî. Mêrik dilê xwe xweş dike û dibêje: «Ezê ji xwe re karekî peyda bikim û wê jina min jî bibe xatûn, weka jinên bajaryvaniyan!»

Mêrik li bajêr xanîyekî ji xwe re kirê kir û mala xwe xistê de. Ewî bala xwe dayê ku xelkên li bajêr tevek betal in, geda û birçî ne. Mêrik pêyre pêyre poşîman bû û li tayêfa mala xwe dîsa şûnde hanî gundê xwe yê berê. û ji gundîyan re got:

-Heyran, dîsa min mala xwe hanî gund! Ezê herim ber pêz. Ez ji sekna li bajêr poşman bûm! Li wira her tişt biqapanê ye! Min li bajêr tebat nekir û xelkên li wir tevek birçî ne...

Pirîya ku ew şivanekî qenc bû ji şêrandina pêz re, gundîyan li wî pir lave dikirin û ewî dîsa şeyandine ber kerî. Mêrik rayîşte tûrikê xwe, nan û pîvazên xwe xistê de, darê xwe girt û kulavê xwe avête xwe û pez derxista çêrê. Mêrik li ber pêz li bilûrê dixe û xwe bi xwe ji xwe re hertim dibêje:

«Dar û kulavê min, rehme li dê û bavê min.»

# BIRÎNA XEDAR

Strînek ketibû lingê pîrê. Çar jin girtin bi derzîyan û ketne ser lingê wê. Ew pênc metre bi kûrayiyê ve çûn, strîn ji ber heşt çavan wenda bû. Çimkî ew her çar jin jî kor bûn. Kurê pîrê hat, bala xwe dayê ku diya wî ya pîrê, pir dinale.

Lêwik got:- Dadê çi hewalê te ye?

Pîrê got:- Lawo qey tu nabînî, ev limn eynî «Bû birîna Hesê Balo» û çû.

# MÊRÊ LI BER TIFIKÊ

Zilamekî tiral hebû, ew tu caran dernediket derve û her tim ji xwe re, li ber tifikê rûniştî bû. Kar û barên malê, tev jina wî dikir, çi yên hindur û çi yên derve. Ew nediwêrî ku ji jina xwe re bêje, «witt!» Çimkî jinikê her tim wî bi nekirîna titûnê di tirsand û rihê mêrik jî di çixarê de bû.

Zilam timî li ber tifikê pîjkirî bû, qelûna wî tije titûna Nihê bû di dev de bû. Ewî timî bizotê êgir datanî ser qelûnê û di kulpandê. Ji dûwê çixara wî, were bûbû ku di malê; de her tîşt zer bûbûn. Rojekê titûna wî qedîya. Jina wî çû ku jêre titûnaê bikire. Li ba titûnfiroş qedîya bû. Jinik vegerîya mal. Mêrê wê jê pirsî:

-Hito, te ji min re titûnê kirî?

Jinikê gotê:- Titûn li ba titûnfiroş qedîya bû!

Mêrik ji xwe re got:

- Ha ihah, încar ezê çewa bikim!

Jinikê tepek li serê wî da û gotê:

- wey «Mêro Xwedê bikim ku gur te bixwin»!

Mêrik kenî û gote jina xwe:-

Jinê, jinê «Eger ez ji ber tifikê herime sifikê, bila gur min bixwin»!

# REHME LI KEFENDIZ

Zilamek hebû, kar û barê wî hertim dizî dikir û zarûkên xwe pê xweyî dikir. Lêbelê wî zilamî tu caran dizîya kesên sax nedikir. Ewî kefenên mirîyan didizîya!

Tirseka were li xelkê çê bûbû ku hinekan mirîyê xwe, nû bixistana tirbê de, bi rojan û mehan, li ser tirbê nobet digirtin, da ku kefendiz newe kefenê wî jê ne şiqitîne û ne be. Kefendiz di nava xelkê de eşkere digot:

-Ê ku bimire, ha kefen lê hebe ha lê tune be, ji wî re wek hevûdin e, ji xwe kefenê mirîyan ne ditî ye, çi gava milyaket werin ser û wî rakine pîyan, kefen wê jê bişiqite û wî tazî bimîne! Û ez jî feqîr im, xisarê nadime saxan, şixwe wê kefen di bin erdê de birize!....

Kefendiz pîr bû û rojekê ji nişka ve ket û mir. Di pey mirina wî de, xelkê limirîyan êdî nobet negirt. Xelk ji xwe re rihet bû. Lêbelê di pey

mirina wî de, dîsa xelkê dît ku waye hinek mezel hatine vekirin, kefenên mirîyan ji wan kirine û çûşikên wan jî, jê kirine û xistine nav devên wan ! Ew qisûmata han, xelkê gelek êşand. Xelk behitî bû. Her kes di tangava xwe de dipirse û digere, ka evê li mirîyan were dike kîye, çi kese ke, ins e, yan cin e, yan dehbe ye! Di pey tawîbata xelkê dûv-dirêj de, ew diz derket, ku kurê kefendiz e!

Kurekî kefendiz ê xort hebe. Qey meriv dibêje, bavê wî pîyê xwe rakirîye û wî danîye şûnê de. Wî xortî ji, wek bavê xwe dest bi dizîya kefenên mirîyan kiribû. Încar ku ew rabûbû, xelkê heft xwezîya xwe bi bavê wî di anîya. Xelk bi dizîya kefen bi tenê jî qayil bû. Ewî wê sosreta giran ku di anîya serê mirîyan, xelk jê pir hêrs bûbû. Gava ku ev kefendiz derkete holê, xelkê navê bavê wî danîne: «Rihmetîyê kefendiz». Kî bi kur ve biçûna, digot: «Wey rehme kefendiz», çiqas insanekî baş bû!

# TÊRXWARIN

Carekê sê heb feqîyên hevalên hev li cihkî gihane hev Ewan ji xwe re qala kar û barên dinê kirin û ji hev û dinê tiştan pirs kirin. Ji nav wanakan yekî ji herduwên din pirsek weha kir:

-Têrxwarin ew e ku meriv bixwo, bixwo, bixwo hetanî zikê meriv biwerime, bibe fenanî def û gava meriv rep bike ku neqîjîn erdê, tê zanîn ku ew çax meriv têr xwarin xwarîye!

Ê din got:

-Na, ne were ye! Têrxwarin ew e ku meriv bixwo, bixwo û bixwo hetanî xwarin hebe meriv bixwe, û kî ji meriv pirs kir got, te çi xwarîye, hema meriv ji devê xwe wê xwarinê derîne û rayê wî bide! Têrxwarin ev e!.

Ê xwedîyê pirsê got:

-Di eslê xwe de, têrxwarin tune ye, lêbelê hema beskirin edet e!

# TOPEK E Û LI WÊ DERA HA YE

Hebû tunebû digotin melekî hebû, ewî pir wazên xwe dikir. Deng û bahsên melê li gundên dorê jî belav bûbûn û ji dormador xelk dihatine godarîya wazên wî.

Ji rojan rojek bû, ez ne xelet bim wê roja înê be, li mizgeftê mele waz

didan. Pa wisa milet hatîye mizgeftê, were bi ser hev û dinê ve çimçiqî ne, êdî di mizgeftê de rîya pîyekî jî nema bû.

Mele li ser kursîya wazê rûniştî bû, çarmêrkî pal dabû, kurkê reş li nav milan bû, şaşika bi kumê sor ve jî, li serê wî bû, heta ku deng jê dihat digêrîya û bala xwe dabûyê. Civata guhdar jî wisan bi rêzê sef bestî bûn, tevde li ser çokan rûniştî bûn, serê wan jî di ber wan de bûn, heçî kal û mal tevde devê wan yektel bûbû, kef û kunc bi ser devê wan daketibû, giştikan limelê guhên xwe tapêl kiribûn û dipoijîn.

Waza melê derheq yekbûna Xwedê de bû û digota:

-Xwedê yek e, navê wî bierebî Ellah e, bê hepa û hemta ye, bê şirîk û ortax e, bê hevrî û heval e, ne li erd e, ne li asîman e, ne destên wî hene, ne nigên wî, ne çavên wî hene, ne pozê wî, ne guhên wî hene, ne teşt û milên wî, kes nizane li kure, ku tu bêjî jî, li wêderê ye, hazire ûş nazire, her tiştî dibîne û ji rihê me jî nîzikitirê me ye!

Bi vê rewşê mele wazan dikir û didomand. Hemo ji nişka ve, zilamek ji nav civatê rabû û ji melê pirsan kir. Bi pirsa wî re, civat veciniqî û giştkan serê xwe rakir bala xwe danê ka ew kîye ji melê pirsan dike.

Zilam gotê:

-Ha seyda! Maxwene vêca Xwedê qey bê dest e?

-Belê!

-Mala Xwedê jî tune?

-Na xêr!

-Herema Xwedê jî tune?

-Haşa wekella, na xêr!

-Dev û poz û guhên wî jî tune ne?

-Na xêr!

Piştî wan bersivên melê ku tev «Na xêr» bûn de , mêrik xwe bi xwe ji xwe re got:

-Hêêêwwûûû, nexwe ew bû çiiii!

Û ji melê re got:

-Ê seyda mademki ku rast e wisa ye û haşa tu neweyî (derewan) jî nakî, lê çima tu hewqas dirêj dikî? Hema bêje:

«Topeke û li wêdera ha ye».

# XIRABAJAR

xirabajar, bajarekî herî kevnare yê kurdan bûye. (Ez bawer im ku wê navê wî «Erzen» be, di pirtûkên dîrokê de. Niha li wê şûnê bitenê hinek jêmay hene û nihajî rewşa wirê dide xwiyakirin ku ew der di zemane kî de bajarek bûye. Cihê wî bajarî, di navbera qubîn (Beşîrî) û Misirc (Kurtalan) û Hezo (Kozluk), di deşta Telîban de, li ser kevîya Çemê Awîskê bûye. Niha cihê wî, mexereka pir rast û fire ye û jicotêre cîyekî gelek xweş e.

Piştî ku ew bajar bûye kavlê kayê, û bi salan wext û zeman bi ser ve buhurîne, axê ku ew deşt di binê vegirtina wî de bûye, li cotkirina wê deştê, tu caran heqek ne daye. Heqê her cotarî ew bûye ku, kî li wir cot bike, di ber gîsnê wî de, çi qeder zêr derkevin, ji wî cotarî re ne. Eger tiştek derneketina jî ew cotarî bi zehmetîyaxwe dima, parestûwa xwe dixwranda û diçşya mala xwe. Lê belê, di wê deştêî de, ne qabil bû ku yekî cot biqedandana û jixwe re zêran ne dîta . Ji cotarîyan, mêrê zirp î qenc ew bû ku gîxnê xwe mizeqf (di kûrayîya erdê de) berî erdê bide. Bê guman ew çax zêr derdeketin.

Zilamekî jar û geda hebûye. Pêşek zarokên wî hebûne. Ew nikaribûye, ku wan zarûkên xwe xwedî bike. Ew rojekê çûye nik Axê. Rewşa neçarbûna xwe jê re gotîye û jê xweşîye ku li deşta Telîban ew erdekî bidê da ku cot bike, bi hêvîya ku ji xwr re hinek zêr bibîne û zarûkên xwe pê xweyî bike.

Axe du ga, halet, gîsn, misas, kulabe û nîrek dane zilêm, erdek jê re kifş dike û mêrik li wir dest bi cotê dike. Hefteyek sax ewî cot kirîye tu tiştek di ber gîxnê wî de derneketîye. Bi qîmê zielam westîye ye û ji xwe têr û tije bûye. Cotê wî li ser qedandinê bûye, maye xetek û nîv êdî wê cotê axê bibiranateslîm bikirana û wê biçûêna mala xwe. Hema Carek ji nişk a ve ew haw ku dibîne gîsnê wî di binê erdê de, li niqrekê di erqile! Gayên xwe dide sekinandin û bi kulaba xwe, wî qasî dikole. Erê, ew dibîne ku wanê kûpek e! Gava ku ew derxwûnê li ser devê kûp hiltîne, çi bala xwe bide ew kûp jizêran mişt e, û wek rojê hema dişçirisin1

Mêrik pêre pêre zarûkên xwe yên birçî difikire, di serê xwe de ji wan re dinyaka têr û tije ava dike, çavên wî tije histêrkên şadîyê dibin û bê hemdê xwe bi dengekî bilind ew dibêje:

«Eger ku Xwedê bidê, ji xetek û nîvê jî dide».

# TEMENÊ ROVÎ Û KÊSÛ

Rojekê bişeveqa sibê re, kesuwek û roviyek laqê hevdu dibin,li hev silavê dikin, pirsa hal û ehwalên hev û dinê kirin û serpîhatîyên xwe ji hev dû re gotin. Di dawîyê de, rovî ji kêsû pirsî:

-Birayê kêsû, gelo nizanim ez mezin im, yan tu?..

Kêsû bersiv da û got:

-Ma xwe ne! ma tu nizanî ku ez ji te miezintir im?

Rovî got:

-Na xêr! Ez ji te mezintir im!

Kêsû got:

-Ma qey pir zor e! Were em emrê xwe hisab kin!

Rovî got:

-De başe! Rovî got:

-Tu ewil temenê xwe bêje!

Kêsû got:

-Na xêr! tu dê ewil emrê xwe bêjê!

Werhasil, pêşîyê rovî dest pê kir û emrê xwe got:

-Birakê kêsû, wer li min nemeyzîne, ku pûrta min hilûstankî (şayîk) ye, di sala deqnanos de, ez xwortekî çardesalî bûm!

Biwê gotina rovî re, kêsû dest bi girînê kir û bû ax û oxîna wî:

-Hey kezeb lawo, heydelal lawo, ez pey te nemînim li dinyayê!...

Di pey girîneka dûvedirêj de, bû hilqehilqa kêsû, rovî ber dilê wî dide û ji xwe re şaş ma, ka çima kêsû wisa digirî

Di pey girînê de, kûsê hêsirên çavê xwe zuwa kir û rovî bi dengekî nerm jê pirstî:

-Birakê kêsû, tu çima were digirpyayî?

Kêsû bersîv da:

-Pa çima ezê negirîm! Di sala deqnanos de, lawekî min hebû, di çaxê te de bû, çû bû herbê û tê de şehîd ket, xebera reş ji min re hat, ew bira min ket, lewma bû ku ez girîm!

Rovî wisa biken gotê:

-Wele ez dizanim! qermûçekên sitûwê te, ne yên van sala ne!

# ZIRARÊ MIYAN

zilamekî koçer hebû, her tim li çîyê dijîya, rojek ewî rîya xwe şaş kir çû û çû, ew laqê gundekî hat. Gundîyan wî naskirin ku qewmê çiyê ye, tevek lidorê hatine hev û kêfa xwe jê re hanîn. Di wextî hevpeyvîna wî û gundîyan de, ji nişka ve, mêrikê koçer bala xwe dayê kuwaye dengek tê. Ew deng jê re bu miraq û pirsî:

-Ev çi deng e?

Yekî gundî jêre got:

-Ew dengê mele ye, bang dide!

Ê koçer pirsî:

-Babo, ev bang çi tişt e?

Ê gundî got:

-Bang banga şerîf e, yani dibêje, wextê limêjê ye, bila her kes werin mizgeftê da ku em bi cimet limêj bikin.

Ê koçer got:

-Zirarê mîyanji vî dengî tuneye?

Ê gundî got:

-Na, na, zirarê mîyan tuneye!

-Nexwe jêwin bila biqîre hetanî ku zikê wî têşe!

# DIRIYA TÛJ

Rojekê du zilamên Botî ji gund derketin û bi çîyê ve çûn. Di çiyayên wan de benîştê gûnîyan hebû, ji xwe re dicivandin û difirotin itarokan. Ewan bi wî hawayî derbaskirina famîlên xwe dikirin. Ew herdu zilam bi-çîyê be qederek çûn, ji herêma gundê xwe dereketin û rîya xwe şaş ki-rin. Ewan kir û nekir, êdê ew bi ser riya gund xwe ve nebûn ku vegerine malê!

Ew herdu zilam rastî dehlekê hatin, di wî de her cûre fêkî hebû, dilê wan dibija çi dixwarin piştre çûne ser kanîyê ewan têr ava hênik jî vex-war. Li kêleka kanîyê wan kemeka dirîya reşdît, ne dizanîyana ku ew kem çi tişt e. Ew destên xwe didinê, ji sitirînan tev dibe xwîn. Ew li wîê dirikê heyirî man. Yekî ji yê din re got:

-Ero, ev Xwedê çiqas mizawire ku hewqas bi vê kemê ve pîjên tîj (tûj) çêkirîye!

Ê din bersiva wî da û got:

-Na la lawo, Xwedê nayê bi kêrê tîj nake, hema ji wan re gotîye tîj, ew tev bi xwe tîj bûne! Ma xwedê ne mizawir e, xwedê pir bi aqil e!

# XÊRWAZÎ Û KULZIKÎ

Hebû carek ji cara, li dormedarê Urfayê Berhîm Peyamber (Îbrahîm Pêxember) hebû û alaya rastîyê ewî bilind kir û xelkê vexwend bibalê ve. Lê di dema wî de mezninê Kurdistanê Nemrûd (Nemir) bû, pût û senemên wî hebûn, ew û xelkê wî tev ji wan re perestinîyê dikirin û wan diparastin. Lê belê Berhîm ji alê Yezdan ve hat vebuhtîkirin; ku wê ol û gotinên wî di nav xelkê de belev bike, riyarastîyê ray wanabide û wê wanakan ji parastinapût û seneman vegerîne.

Belam Nemrûd jî, di wê demê de xwe xwedê beyan kir bû û kar û xebatên Berhîm bi wî bûyerê gelek zor û giran bûn. Încar ewî dest bixebata binerd kir û xwe di nav şkeftt û zinarana de veşart, bi beyanî dernediket derve.

Dema Nemrûd agahdar bû ku Berhîm xwe peyamberê Yezdan beyan kirîye, ewî serî xwe danî ser herdu lepên xwe de û fikirî:

-Ezî xwedê me! Ev sêwiyê me rabûye doza ku dimeşîne, di dawîyê de seltenet û welatê min dê hilweşîn! Ezê çi ceza bidimê?

Di wî çaxî de, di dinê de, mêrê kupîyê xwe li pîyê Nemrûd bixistana tune bûn. Nemrûde li Deşta Rihayê êgirek dada; agirekî were bû ku pêlîdana wî digihaasîmanê banî. Nemrûd anî Berhîm Peyamber xist Mencenîqê de û şixuland! Berhim wek gula topê ji devê Mencemîqê fîştiqî û firî, firî çû kete nav agirî de. Ji germa êgir kesek nedikari bû ku xwe li Deştê bigire: pirî ku gur jû bitîn bûbû!

Lê belê, li gor riwayetan bi destûr û fermana Yezdanêwî, baran barî, wek ava devê cêr bi ser êgir de, Gumgumokê û Marmarokêherud bihev re li ser çiyakî lê temaşe dikirin. Gungumok hema devêxwe tije ba dike û bi bal wî ve dike pifepif; da ku genim agir gur û geş bibe û Berhîm bişewite.

Încar Marmarokê jî devê xwe tije av dike û bi bal wî ve difîştiqîne da ku agir li Berhîm bitefe û neşewite!

Li gor rîvayetan ew çax firîşteyeklawî wan tê û dipirse. Ewil berê xwe dide Gumgumokê, dibêjê:

-Ya heywana piçûk! ÇIma tu were bi alêî agirê Berhîm Peyamber ve

puf dikî! Me qey bipufa te wê agir gur û geş bibe?

Gumgumok bersîvê dide û dibêje:

-Na! Lê belê ya min jî hema dilnexwazî ye! Ez dizanim ku bi pifa min agir lê gur û geş nabe!

Încar berê xwe dide Marmarokê û dipirse:

-Ya heywana piçûk û zirav! Çima tu were bi alî aigrê Berhîm Peyamber ve bi devê xwe avî difiştiqînî! Ma qey bi ava devê te wê agir bitefe?

Marmarokê got:

-Na! Lê belê ya min jî hema daxwazî û zêrxwazî ye! Ez dizanim ku bi ava devê min agir lê natefe!

Ji bo vê bûyerê ye ku melan gotine, kuştina gumgumokan dirist e û ya marmarokan gune ye!

# AZBATA BRAHÎM PÊXEMBER

Dixwazim li ser azbata qehremanê vê çîrokê ji xwendevana re hinek agahdarî bidim.

Berhîm peyamber bi navê «Îbrahîm Xelîl» hatîye navdarkirin. Her çiqas ew bi esl û azbata xwe kurd e jî, mixabin em hewqas li wî bapirê xwe xweyî dernakevin. Belam di nav xelkê me de wisa hatiye zanîna çiqas yekî ku bûbe pêxemberê Xwedê, ereb bûye! Ev yeka ne wisa ye. Bes piraniya pêxemberan ne ereb in. Herweha ji navên bab û bapîrên wî jî tê zanîn ku ew famile kurd bûye û ji tevê navên bab û bapîrên wî kurdîtî difûre. Ji bilî vê yekê, cihê jîyan û rabûn û rûniştina BerhîmPeyamber Kurdistan bûye, lidormadarê bajarê Urfa, Riha û Şermensûrê (Adîyeman) bûye. Û wargê havîngeha wî li dor bajarê Bedlîs û Wanê bûye. Vêga li Kurdîstanê gelek cih hene ku bi navê «Îbrahîm Xelîl» navdarkirî ne.

Jêderka azbata Brahim Pêxember me ji du pirtûkan niqandiye:

1-Rewdun-Neîma Şêx Ebdurrehmanê Axtepî, ku ji EDNAN girtîye û berjor heta digîjîne ADEM pexember bi rêzê nivîsîye (Rû:147-Şerh)

2-Mewlûda Kurmancî ya mele Ehmedê Batê ye, ku ji EDNAN girtîye û berjêr heta digîje Muhemmed Pîxember, bi rêzê nivîsîye. (Beş:6)

Încar emê ji despêka navê Mihemmed Pêxember bi rêzê binivîsin heta ku di ser Ibrahîm Pêxember re dibihure û digîje Adem Pêxember, selat û silavên Xwedê li teva bin.

1-Muhemmed Pêxember

1-Ebdullah
3-Ebdul Muttelip
4-Haşim
5-Ebdul Menav
6-Qusey
7-Kîlab
8-Murre
9-Kêb
10-Luwey
11-Xalib
12-Fehr
13-Malik
14-Nedir : Li gor beyana MEWLÛDa Batê «Nedir bûye Qureyşî». Yani navê Qureyştiîyê wî girtîye û ew nav bûye bernavik ji famîla wî di pey wî re, heta gihaye Mihemed Pêxember.
15-Kenan
16-Xuzeyme
17-Mudrik
18-Îlyas
19-Mudr
20-Nezar
21-Med
22-Ednan
23-Elyese
24-Hemîse
25-Yerîb
26-Yeşcer
27-Qeydar
28-Îsmaîl : Îsmaîl bi navê «Îsmaîl Zebîh» (Îsmaîlê Serjêkirî) Hatîye navdarkirin. Çimkî bavê wî yê Îbrahîm Xelîl, Peyman dabû Yezdanê xwe ku wê yê Îsmaîl qurban serjê bike. Li ber serjêkirinê Fireşte Cibreîl beranek di şûnê de jêre tîne û ew ji ser jêkirinê difilite.

Bûyereka Îsmaîl ya din ji ev e: Îsmaîl hêj piçûk bû ye di pêçekê de, dê û bavê wî, li cihê ku vêga mala Xwedê (ke'be) lê ye, wîdatînine erdê û ew ji xwere li avê digerin. Ew digerin negerin li dormedarê xwe avê nabîn. Îsmaîl serpişt li erdê vezelandîye, digirî, pepik û nigan li erdê dixe û zimezim ji erdê tîne. Şûna nigên wî kort dibe, çal vedibe û ji binê erdê av dertê. Aveka were gur derdikeve ku lehî jê diçe. Bavê wî ji dûr ve dengê lemelem û firefira lehîyê seh dike, bi bez tê nik kurê xwe û ji avê re dibêje: «Bisekin»! Av ji herikandinê qut dibe, wek bîrê di cihê

xwe de disekine û dimîne. Û li ser wê avê xanîyek ava dike û Îsmaîl tê de datîne. Navê wî cihî «Meqamê Îsmaîl»e û niha jî heye. Di pey de navê wê avê bû Ava Zemzem»ê. Niha jî ew av heye û di nav misilmanan de pîroz e û aveka şîfa tê qebûlkirin.

29-Îbrahîm Pêxember (Berhîm Peyxember)

30-Tarûx

31-Tahûr

32-Sarûx

33-Erxewan : Erxewan, navê dareka delal û xweşike û gelek bi sûs û rewş e; Çîçekên wê ji rengê sor û mor in û bi taybetê li dormedarê gol çem û kanîyan şîn dibe.

34-Falix

35-Abir

36-Şalix

37-Erfexşed

38-Sam

39-Nûh Pêxember : Nûh, yanî nû. Di peyvandina Botan de niha jî, ji tiştekî nû re «Nûh» dibêjin. Di wextê Tofanê de, Gemîya Nûh Pêxember li ser avê diçû, tê de heştê kes hebûne û laqî çîyayê cûdî dibe; ku serê wî di avê de wenda ne bûbû Gemî li ser çîyê disekine. Hin bihin av kêm dibe, kêm dibe û diçike. Ew li quntara çîyê gundek bi navê «Heştîyan» ava dikin. Û niha jî ew gund bi wî navî ye ava ye û xelk tê de hene. Navê Çîya jî bûye «Cûdî», yani Gemîya Nûh Pêxember ji xwe re cih dît.

40-Lemek

41-Metûşelx

42-Îdrîs Pêxember

43-Medir

44-Mehleîl

45-Qeyman

46-Enoş

47-Şîş Pêxember

48-Adem Pêxember.

# MELÊ! BÎNE QEYSA BERÊ

Hebû tunebû, jinikkeka xwe dîdergûş hebû.Dergûşa wê tim û daîm bi xwe ve mîz dikir. Jinik jiber mîza pitika xwe bê mecal mabû û potikên dergûşê tev de rizî bûn.

Pîrka lewlibaz tê mala, jinikê, gava rewşa mala wê dîbîne ku tev de mîz e dibêje::

-Keça min çima tu dergûşê xwe nabî cem melê? Bila jê re nivîştekê çêke! Nivîştên melayê me, yek bi yek in!

Jinikê dergûşa xwe danî qoqlîka xwe , pênc çerxî pere jî xistin berîka xwe û berê xwe da riya mala melê:

-Melê, pitika min bi xwe ve mîz dike, hêvî dikim ku tu nivîştekê jê re çêkî, da ku bi xwe ve mîz neke! Va min ji te re pênc çerxîyan jî anîye!

Mele kitêba sor danî ber xwe. Pelan qeliband. Bi ser cîyekî ve xwe bû û got:

-Xwişka min, va min çara pitika te di vî rûpelî de dît, niha ezê nivîştekê çêbikim, ku êdî hew pêştir ew bi xwe ve mîz neke!

Jinik, nivîşt ji melê stend, pitika xwe hilda û hat mala xwe. Şeva dinê, jinik bala xwe dayê ku pitika wê, ji bil mîzê, bi xwe ve gû jî kir! Şeva din dîsa wisa,!.. Werhasil çiqas şev e, pitik bi xwe ve gû û miz dike. Mala jinikê tev de lewitî, êdî ru kes nedikarîya ku bi ser malê ve xwar bibe.

Jinikê dîsana pitika xwe hilda û ber bi mala melê ve bezîya.

Melê Melê, pitika min heta niha bi xwe ve mîz dikira, de pey nivîşta te de, încar bi xwe ve gû jî dike, hêvî dikim ku tu bînî qeysa berê!

Çîroka min hinek kin
Lê marîfeta wê pir e

# GOVENDA PÎRÊ

Carekê li gundekî pîrek hebû. Di cihêltîya xwe de wê gelek îşan kiribû û govendgêreka temem bûye. Pîrê di dawîya emrê xwe de çû Hecê û tevê gunehên xwe mihû kirin û ji xwe re tobeka rast ji kir.

Rojekê li gund dawetek çê dibe. Govndgêrî dewetê xweş kirine, def û zirne lêdikevin û heytehola wan bi ser gund ve girtîye. Hecî pîrê çewa ku dengê dawetê dibihîze, ber pê ve diçe. Li ji dawetê hinek dûr Pîrê ji xwe re li çî kî rûdine û li wan temaşe dike. Lê belê kurmên dawetê têne Pîrê, «Kurmê şîrî heta pîrî» û dilê wê dixwaze ku têkevê! Bes ew ji hecî-

tîya xwe fedî dike.

Hinek xort, çewa ku ji dûr ve pîre dîtin, ber bi wê ve çûn, bi milê wê girtin û gotinê:

-Dapîrê were tu jî têkeve govendê!

Pîrê got:

-Lawo ez hecil heremeyn im, govend guneh e, ez pîr bûme, dev ji min biqerin.

Her çiqas pîrê xwe li ber wan kudand jî, bi kotekê milên wê girtin û wê anîn xistine govendê. Ketina govendê, her çiqas bi dilê pîrê bû jî, lê ji ber xwe ve ewê fedî dikir ku here têkeve dawetê.

Hecî Pîrê di serê govendê de ye û rahiştîye kevnineka sipî û got:

-Xwedaawoo til miin guneeh nenvîsîîîî!..

-Xwedaawoo til miin guneeh nenvîsîîîî!...

Bi wî hawayî Pîrê di govendê de çend tûr çû, hat û lê germ bû. Canîtîya wê hate bîra wê û xwe şidand:

-Tidbê binvîs, tidbê nenvîs, tidbê binvîs, tidbê nenvîs!...

# ŞERÊ SOFIYAN

Carek ji caran, Ehremen (Şeytan) xwe xist şûfê qîzeka pir bedew, gelek xişir bi xwe ve kir û ji xwe re got:

«Îro ji feqiyan û sofîyan, ezê mala yek ji wan xirav bikim, ka ji wan kîjanin!»

Pêşî, Ehremen berê xwe da xwendegeha feqîyan, derî vekir û çuxênî wî bala xwe dayê ku waye li dor 50 e heb feqî li ser mitala xwe de ne û bê his û pis dixwînin. Ehremen li ber derî li pîya, xwe virde û wirde hejand. Bû xirexira xişrên wî. Were zimînîyek kete hundurû de û feqîyan yeko yeko serên xwe hildan û bala xwe danê. Gava mêzekirin ku lê binêre, pirîya ku sipehî û xweşk e.

Mîrê feqeyan pirsî:

-Hirmet tu çi kes î ?

Şeytên got:

-Ez horî me, Xwedê min ji bihiştê, ji we re şandiye, di nav we de kî pir alê Xwedê be, ez ji wî re me!

Hinek feqî rabûne pîyan, bû ox oxa wan û bi bal ve bezin. Mîr bi wan de xeyidî û got:

-Ka werin em li pirtûkan mêze bikin, ka ca Xwedê horîyan ji bihiştê

dişîne dinyayê, yan na!

Ewana pirtûkên xwe kerobaro kirin, tu tiştekî were, di tu pirtûkê de nedîtin. Feqeyan bi zimanê çivîkê bi hev re xeberdan, ji bo ew kiç jî, ji wan fêm neke, û gotin:

-Hebe tunebe, di vê derengîya şevê de, ev ne keç e, Ehremenê kor e! û feqeyekî got: «Qeda bi keve li çavê şeytanê recîm!»

Ji nişka ve, haw ku dîtin, ew keç wenda bû. Feqeyan tev bawer kirin ku rast bû, ew keç şeytan bû.

Ehremen çewa ku ji cem feqîyan derdikeve, raste raste berê xwe dide çîyê, diçe şekfta abidan ve. Di şikeftê de 70 ê heb sofî hene, bi şev û roj limêjan dikin û rojî digirin. Sofî tev ji xewa diponijin, ê ku di xew ve çûye, yê ku şalik avêtîye ser serê xwe û wirdan dikişîne, yê ku şevlimêjan dike. Werhasil her yek ji wan ji xwe re bi tiştekî ve xwe lipikandî ye.

Ehremen li ber derî, xwe li ba kir û çingeçinga xeşrên wî di şikiftê de sofîyan veciniqand. Ewan teva bi hev re serên xwe hildan. Yên di binê şalikê de bûn jî, bi destekî xwe, alîyekî şalika xwe bilind kirin û mêze kirin ka ew çi deng e. Gava dîtin ku waye keçek e, û meriv debê qey horîyeka bihiştê ye û waye li wir e!

Sofîyekî xwe negirt û jê pirsî:

-Keçkokê, tu çi kes î?

Şeytên got:

-Ez horî me, Xwedê min ji bihiştê şandiye, di nav we de, kî di dereca bi bal Xwedê ve bilidtir be, ez ji wî re me!

Di pişt peyva wî de, sofîyekî got: «Qencê Xwedê ez im»!

Yekî din got: «Ez im»! Yekî din got: «Na wele ez em»! Çiqasê ku li wir hebûn, her yekê got, «Ez im»!

Werhasil ez çi serê we bi êşînim, sofî rabûn û li hev û dinê xistin! Şerekî wisa giran di şikeftê de qewivî ku dê weledê xwe tavêje. Di berizandina ewil de, 50 e sofî şehîd ketin!

Ehremen, li wan 20 ê ku mane dinihêre û dibêje:

-Di nav we de, ka yê qenc kîye?

Tevan dîsa bi hev re gotin, ez, ez, !... û li hev û din xistin. Di berizandina vê dawîyêde jî, 15 heb şehîd ketin! pêncê mayîn jî, her yekê cîyekî wan şikestîye û bi rewşeka xirab ve li erdê pîj bûne. Evên xazî, bi kulî kulî, ber bi qîzikê ve çûn, heta gihaştine ber derî. Ha ku bala xwe danê ku destê wan û erd!

Hêja li xwe varqilîn ku ew dijmin e
Îcar jî bi biratî dest dan hev û din e

# MORÎKA ŞÎN

Careke zilamek hebû, du heb jinên wî hebûn. Pirîya ku herdu hêwîyan şer dikirin û porîn hev dikişandin ew jî, li ser gotina ku ji hev re digoti: «Mêr ji min hiz dike«, ya dinê digot, «ma wele ji min hiz dike», serê wan diqewimî. Liser şerkirian wan, rehetîya mêr jî qet nemabû.

Mêrik, her yek jineka xwe, bidizî morîkeka şîn dayê û gotê:

-Ez ji kîjanê pir hiz bikim, ez vê morîkê didimê!

Mêrik hema bi gav û saet dibêje:

-Morîka şîn bi kê re, dilê min bi wê re!...

Bi vê gotinê mêrik re, herdu jinik jî, dilên xwe xweş dikin, kêfxweş dibin û li hember hev û dinê quretîyan dikin. Ew difikire dibê «morîka şîn bi min tenê re ye» û ya din ji difikire dibê «morîka şîn bi min tenê re ye». Lê hay ji hev tunene û nizanin ku morîk bi herduwan re jî he ye!

Li ser vê zibîdîya mêrê wan, şer jî di navbera wan de kêm dibe. Rojekê herdû hêwî bi hev re diçin beravê. Li ser tiştekî beredayî li wiraşer kirin. Hêwîya piçûk ji ya mezin re got:

-Xwelîserê, eger mêr ji te hiz bikirana, wê morîka şîn bidana te!

Hêwîya mezin pirîya ku qehirî, hema morîkê ji berîka xwe derxist û ray hewîya xwe kir. Gava wê ya morîk di destê hêwîya xwe ya mezin de dît, wê jî morîka xwe deranî. Bi wê yekê, herdu jî, bi zibîdîya mêrê xwe hisîn; Ku mêr di navbera wan de leyztek kirîye. Herdu hêwîyan li ber beravê, bi hev û din r soz dan ku tucaran êdî bi hev û din re wê şer nekin û wê bi hev re li mêrê xwe bixin. Gavak ewhatine mal, bala xwe danê ku waye mêrik li ber tifikê rûniştîye û qelûna xwe dikişîne. Mêrik berê xwe da wan û got:

-Morîka şîn bi kê re, dilê min bi wê re!...

Bi wê gotina mêrik re, herdukan kiçîmê mêrik kir û lêdan. Lêdan lêdan ha «Goliko soro te çi xwarîye». Herdu jinên mêrik miradê dilê wî kirin ji lêdanê!

# XEYDA ZAVÊ

Carek ji cara, digotin li gundekî Torê, zilamekî xwuyanî hebû. Wî zilamî kurê xwe zewcand û daweteka bi heytehol li dar xistibû. Xwençe ji gundên li dora xwe reşeyandibû xelk gelek hatibûne daweta kurê wî zilamî. Di dawetê de, siwaran bi hev re cirîd û colan dikin, xweyçekan bi hev re gullan berî nişanê didan û kêf û henek û laqirdîyên ku dibûn di tu dawetan de, ne bûne û ne jî dibin, kes slaixdana wê nikare bide.

Gava bûkê anîne mal, zava ji ber darikê birin maleka din. Li wir xortan qederek kêf û henek kirin û ji xwe re leyîztin. Bavê zavê li ser serban tejik dan raxistin û sifra xwarinê da dirêjkirin û alem û ilaleta dawetê tevek ketin ser de. di pey xwarinê de, bavê zavê, cihêzên ku bûkê bi xwe re anîbû, li berbûyan belav kir û tevê xwendîyan ji bavê zavê re gotin: «Bûka te li ser xêrê be û ew xêr û xweşî ji hev bivînin», xatir xwestin û her çûne mala xwe.

Pirî ku roja dawetê xelk hebû, di çaxa xwarinê de, kesek hay ji zava birçî mabû, bi qîmê ew erinî bû û xwe nitirandibû. Êvarê di çaxê razanan de birazaveyan çûn ku zava bibine cem bûkê. Ewan kir û nekir, zava ne bi wan re dipeyîve û nejî, li wan dinihêre. Ewanan guman kir ku, bûk wê ne bi dilê zavê be, lewra ku ew erinî ye. Eger ne, gereke zava pir bi kêf bûna. Ewan ji xweyda zavêj tu tiştek fêm nedikir. Birazaveyan biryar girtin ku wê zava hilgirin û bibine nik bûkê. Ewan çewa bi zavê girt û wî hildan, devê wî vebû, xeberda û got:

-Ez naçim danatirînim bûkê, ez naçim danatirînim bûkê, kî savar xwarîye bila ew here datirîne bûkê, kê savar xwarîye bila ew here datirîne bûkê!...

Hê nû ew fêm kirin ku erna zavê li ser nexwarina savara dawetê bû.

# QEY DAHŞIK JÎ LÊ NE?

Hebû tunebû axakî pir mizawir hebû. Rojekê dîsa li oda wî civat gerîya bû. Lê belê civat wê carê civateke pir mezin bû. Li ser gotina axê, kesên li civatê, her yek ji wan çîrokek, metelokek û leqemokek gotin. di pey kutabûnê de, axê încar dest bi pêkenîyan kir li kesên di civatê de. Axê yeko yeko ji wanakan pirsî:

-Kî ji we, di emrê xwe de, xwe li kerê hesikandîye?

Ji civatê tu kesî dengê xwe nekir. Hemîyan xwe bê his kirin. Daha

rastîya wê, wanaka ji wê pirsa axê fedî dikir.

Kesî ku bersîv neda, axe hêrs bû û car din ji civatê pirsî:

-Hûn çima bersîva min nadin? Kî ji we kiriye, bila pêçîya xwe bilind bike!

Ji gundîyan re, ya herî zor ew bû, yê ku rastî ne bêje,belkî axe, li wî were xezebê û mala wî ji gund derîne. Ji bo vê yekê, çiqas sofî û hecîyên li wira hebûn, bê his û pis, her yek ji hindava xwe ve, pêçîya xwe bilind kir, û bêdengîyeke bê qedar bi ser civatê ve girt, wisa bû ku êdî çitînî jî, ji yekî ji wan dernediket!

Axe, li rastê xwe mêze dike, li çepê xwe mêze kir, bala xwe dayê kupiranîya civatê, pêçîkên xwe pîj kirîye, şaşika sipî li serê wî ye, û ew jî, ji xwe re daketîye fikir û mitalan, û di dilê xwe de, dibêje: «Qelo ezê jî, pêçîya xwe bilind bikim, yan na!» Di wê ponijandina melê de, carekê bala xwe da axê, ku wanê li wî dinihêre. Mele jî, pêşîya xwe ya eşedê, pêçîya beranî danî ser nîvê wê û destê xwe qamе ve bilind kir û got:

-Qey cahşik jî lê ne?

Bi vê gotina melê re, pilqînî bi axê ket û civat, tev de kenîyan. Kenekî were kirin ku hemû ziko piştobûn. di pey wî kenî de, êdî gundî ji ne avîtina xwe ya ji gund filitîn!

# QÎZA PÎRÊ BÊMÊR MABÛ

Carekê pîreka pir feqîr û geda hebû û tu kesekî wê tune bû, ji bil keçeka wê bi tenê.Qîzik xame bû, hate mêran, lê belê ji bo ku dîya wê ne yeka xwîyanî bû, û bê kes bû, kesek ne dihat û qîzekê ne dixwesta. Êdî qîza pîrê gelek nîr lê derbas bûbûn û di malê de pîr bûbû.

Li Kurdistanê, demek hatina xwezgînîyan bi siwaran kifş bû. Çi gava hinek siwar bihatana gundekî, xelkê dizanibû ku, ew miheqeq xwezgînî ne, yan jî, ji bo meseleka girîng e ku ew hatine wî gundî.

Rojekê, qîza pîrê li ser kanîyê gareta xwe dişo. wê bala xwe dayê ku wayeçend heb siwar li bir derê mala dîya wê peya bûn. Keçikê ji xwe re got: «Hebe tune be, miheqeq ew siwar xwezgînîyê min in», û ew pir kêfxweş bû. Ewê dest bi lawikên li ser evînê kir. Tareta xwe dişo û keçik ji xwe re dibêje û di xunxunîne. Çi cara ku keçik av tavêje heya xwe û bi destekî jî tareta xwe dişo, wiha dibêje:

-Eger rast be ku ew xwezgînîyê min bin» Ewkê min jî ket nav ewkan» Eger rast be ku ew xwezgînî yê min bin, «ewkê min jî ket nav ewkan»!..

# TIŞTÎRA ÎSA Û NÊRIYÊ MIHEMED

Carek ji cara xêr û xweşî li hazir û guhdara.

Keçeka pir delala xweşik î nazenîn hebû. Ewê dil berî fwqîyek dabû ku li gundê wan dixwend. Di gund de ne feqî û ne jî keçik dikaribûn ku pêwendî bi hev û dinê re deynin.

Rojekê feqî çû mala bavê keçikê ku tayîna xwe werîne. Keçikê tayîn da destê wî û mecal dîtin ku bi hev re bipeyîvin. Feqî ji wê re got:

-Ev gund tevek mirîdê mala şêx in! Her êvarên înan de, cemayî heye! tu jî here li ber destê şêx tobe ke, her car here cemayê, ezê jî werime wir û ez û te hesretadilê xwe emê li wir birêjin!

Keçik wê dîtina feqî rind dêran. eyîşand. Bû êvar û ew raza. Sibekî zû keçik rabû û zor da girînê. Dîya wê dike û neke, qene ew xeber jî nade û hima zor daye girînê digirî. Dîya keçikê wê bi zorekê da xeberdan û wê got:

-Dadê qet mepirse, tiştê ku îşev min di xewna xwe de dîtîye, nayête gotin, hema ez ditirim û pirçûnek bi laşê min ve diçin ez dikim û nakim tebata min nayêt!

Dîya wê jî pê re zor da girînê gotê:

-Ez qurbana te me lawo ka ce ji dîya xwe re bêje?

Keçikê got:

-Dadê, îşev min di xewna xwe de dît ku zîyayek dihat û xwe li min dipêça! Ewî min di guvişand, hetanî herdu çavên min ji serê min dipekîyan! Min bala xwe dayê ku waye şêxê te ji wê ve tê! Şêx, bi gopalê bi destê xwe daweşande zîha û min ji wî xilas kir!

Dîya keçikê got:

-Hey kezîkur, hewqas min ji te re digot jî, tu nedibûyî mirîdê mala şêx! Lê hêja tu çi sekinî? de xweş rabe em herin mala şêx û jixwere tobe ke!

Keçik û dîya xwe çûn mala şêx. Dîya wê ji şêx re, serpêhatîya keça xwe ya di xewnê de got. Û gote şêx:

-Min keça xwe aniye nik te ku tobe ke!

Şêx ji dîya qîzikê re got:

-Di gundê we de, bitenê keça te bê tobe mabê. Bi serê seyda, eger ne ji vî gopalî bûyana, vêgavê keça te ney sax bû. Lê dîsa tu şikir bike, min wê da xatirê te! Çimkî tu mirîdeke xalis û muxlis î ji mala me re!

Keçikê li ber destê şêx tobe kir. Ew û dîya xwe vegerîyane mal. Çi cara ku li gund cemayî çêdibû, keçik diçûyê, ew û feqî digîştine hev û bi

hev re dipeyivîn!

Şevekê tevekên gundîyan li oda keya civîyane. Keçik û feqî jî hatine wir. Ew herdu li alê derî sekinîne û hin bi hin, ew xwe nêzî hev dikin. gundîyan dast bi cemayê kirin. Ode, pirîya ku ew şev tije bû, û tev ketine cezbeyan de, berpisyarê şêx got ku, bila hinek derkevine der, di odê de cih pir teng e! Ji keçik û feqî re, firset bû û wan berî her kesî xwe gihande derva.

Keçik mirîda nû ye û pir germ e. Wê xwe li erdê weka murxî (heywana nû serî jê dibe) gevizand û xwe li erdê gêndir dike. Keçikê bala xwe dayê, ku li derva xelk pir e, ewê xwe avêt çaleka kûr de û kire hey hey. Feqî li kevîya çalê diçe û têt. Keçikê got:

-Hîh, hîh, hîh, hî ez tiştîra Îsa em!

Feqî xwe avête çalê û wî jî got:

-Hah, hah, hah, ha, ez jî nêrîyê Mihemed im!

# HICRA TIJE APRAX

Di şeveka êvara înê de, feqî li hev kom bûn û ji xwe re leyîz û ji hevdue tiştan dipirsin, leqemok û metalokan ji hev re dibêjin û yek caran jî, radibin ji xwe re «Bêlimte» (daweta feqîya) digirin.

Di nav peyîvandina feqîyan de, qala xwarinên xweş hat, feqîyekî pir xwire hebû got:

-Xwezila ev hicra me, hetanî ber qarçan tije aprax bûna û em têketina serî de!

Feqîyekî din bersiva wî da û got:

-Heeeey malnemîrat, wî çaxî derî dihate girtin, îcar emê çewa biçûna tayînên xwe?

# DIZÎYA GÛZAN

Rojekê zilamek diçe dizîya gûzan. Ew bi geredareka mezin ve hilkişîya jor, li ser gulyekî rûnişt, gûzan berev dike û têxe tûrikê li milê xwe . Zilam carekê li binê darê nihêrî, ku wa hirçek li binê darê ye û bi darê ve hildiperike da ku were serê darê. Mêrik ji tirsa hirçê, xwe li ser darê ji his birandîye, kistînî ji wî dernakeve û hema li hirçê dinihêre ka wê hirç çi bike, çi ne ke!

Hirç bi darê ve hilkişîya, hilkişîya, giha serê darê û li ser gulîyekî qa-

lind tind da û hebo hebo gûzan ji darê kir. Çi gûza hirç ku ji darê dike, bi herdu lepên xwe, her gûzek têxe lepek de û lihev û din dixe, kakilên wan tavêje devê xwe û qalikan berî xwar dide. Di nav gûzan de herçî ya ku pûç dertê, hirç dibêje: «Piçç» û hildifirîne!

Ew zilam li ser darê asê ma. Ji tirsa hirçê ew ne diwêre xwe berî xwar bide, ne jî diwêre bike hewar û gazî, hema di dilê xwe de ew dibêje, rebî rebî hirç bi min nehese, ji bo ku min nexwe! Hirç jî jixwarina gûzan têr nabe û ewzilam jî li serê darê weka tûtikan ma. Ewî bala xwe dayê ku wê roj lê bavêje û xwedîyê gûzan, wî di dizîyaxwe de zevt bike.

Carekê gûza di nav lepên hirçê de, pûç derket û wê got: «Piçç». Wî zilamî jî got: «Piçç û qurreder». Hirç, ji wî dengê ku ji nişka ve bihîst veciniqî û terayê xwar bû. Hirç çewa ku li erdê dikeve, di cî de dimire. Zilam ji xwe re dibê, «ji qestan hirçê xwe li erdê pîj kirîye, ji bo ku ez dakevime xar û ew min bixwo». Ew, gumana ku hirç li erdê mirîye qet na ke!

Mêrik li serê darê ma hetanî roj avêt. Lê belê her çiqas termê hirçê ew li jêr dibîne jî, ewle nabe ku xwe berî xwar bide. Ha ku ewî dît, xwedîyê baxçe hate wir. Gava xwedîyê baxçe dibine ku hirçek li binê dara gûzê raketîye, qêrînîyek jê diçe û berê xwe bi mal ve dide direve! Dizê serê darê, dît ku dîsa his ji hirçê nehat, ewî gazî xwedîyê baxçe kir û got:

-Were, were, hirç mirîye!

Û ewî xwe berî jêr dide.

Xwedîyê baxçe, bi gazîkirina wî re, ji para vegerîya û çû ser termê hirçê nik wî zilamî. Xwedîyê baxçe ji diz pirsî:

-Bira ev çihalê te û hirçê ye, tu li serê darê û hirç jî, li vê azîya Xwedê mirîye?

Dizê gûzan serpêhatîya xwe û hirçê jê re got:

-Bira qet mepirse! Êvarê golika me nehatibû mal. Ez çûm nik mele min devê gur jî lê gireda û paşê çûm lê gerîyam. Ez gihaştime newala kuştîyan, di ber şikêra rihmetîyê Mîrze de derbas bûm, ha ku min dît hirçek bi min ve derket, û ez revîm. Ez çiqas direvim û bi paş xwe ve dinihêrim ku hirç jî dide ser min û êrîşê min dike. Min baz de, wê bazde, min bazda, wê bazda,min ji ber hirçî merfera xwe nedît, di ser benda baxçe di min xwe helqevazt. Hirçê jî, xwe di ser bendê re hilfirikand û da pey min. Ez hilkişîyam serê dara gûzê! Min ne dizanîya ku hirç jî, dikarin hilikişin serê daran. Ez li ser darê çiqas bi gulîyên zirav ve hildikişim, hirç jî li peymin dihat. Hindik mabû ku hirç ji paaş ve, bi lingê min bigire, hema min pehînek daweşandê, hirçê got repp ket erdê û di cî de cehimî. Min digot, belkî hirç ji qestan were xwe bê his kirîye, da ku ez dakevime jêr û min bixwe!.

# ROVIYÊ KEDÎ

Carekê feqîyan li çolê têjikeka rovîyan dîtin, digrin tînin anîne hicra xwe û ji xwe re kedî kirin. Feqîyan bermayê xwarinan didane rovîyê xwe, ro bi ro ew mezin dibû, qelew dibû û diqebili. Ew rovî eynî wek pisîkan, dinav wan de diçe û tê, dihere derve ji xwe re digere û dîsa vedigere nava feqîyan. Gava dibû şev, rovî xwe dixiste nav livînên feqîyan ûê dipaşila wan de radiza.

Şevekê feqî tev razane. Rovî, xwe ji xwar ve dixe bin lihêfa feqîyekî de û radize. Ew feqîyê razayî fisek berdide. Hima dibe pişkepişka rovî û ji bin lihêfê derdikeve. Rovî, qederek dikuwixe û dike pişkînî dîsa vedigere şûna xwe radize. Feqî dîsa fisekê berdide. Rovî dike pişkînî û dîsa derdikeve der.

Rovî xwest ku bizanibe ka ew bihna genî ji kur ve tê û bi pozê xwe li, lihêfê digire û ji ser vî kaş dike. Rovî hawîdorê feqî bihn kir. Ewî poxê xwe da bi alê qûna wî ve, his kir ku bîna genî ji wir derdikeve! Hema ewî pepikên xwe li nav çavên xwe da û xwe qilapanî kir. Rovî çû gerîya çend heb goreyên feqîyan civand, kire gilok û anî heşande qûna feqîyê razayî de. Ew feqî, bi hepişandina tiştekî di pinda xwe de his dike û ji xew şîyar dibe,bala xwe didê ku rovîyê wan e!

# ZIYAFETA QULING Û ROVÎ

Rojekê rovî û quling gihane hev û din. Bi wê hevgihaştinê re dostanî û şêrînayîyeka were ket havbeyna wan de, ku salixdanên wê nayêtin gotin. Di pey de, ew hertim diçûne nik hev silav ji hev re dişeyandin û timî pirsa hal û rewşa hev û din dikirini.

Rojekê rovî ji quling re xeber şeyand:

-Filan rojê tu dê werî mala min, tu xwendiyê min î!

Li ser wê hinara rovî, quling pir kêfxweş bû û rabû çû mala rovî. Rovî jî peloreka ruhn çêkir û berî ser sêleka fireh da. Ew herdu ketin ser de û xwarin. Rovî her carê zimanê xwe li kevîya sêlikê dide, hetanî kevîya din dibe û pelorê paqij dike. Quling, her carê ku nkulê xwe li sêlikê dixe, êş dikeve mejî û tu tiştek, ji pêlorê nakeve devê wê. Quling du -sê car nikul li sêlê dan û got:

-Birakê rovî her hebe û bereketa Silêman Pêxember di nav de be, min têr xwar!

Qulingê, xwe ji ser pelorê vekişan û birçi ma! Rovî li pelorê doman, hetanî ku xilas kir. Quling, ji wê zîyafeta rovî erinî û dilê xwe girt. Ew jî difikire kawê çewa heyfa xwe jirovî bigire û di serê xwe de dek û dolaban çêdike. Ew rabû ji rovî xatir xwest, berê xwe da mala xwe û çû.

Çend roj tê de çûn û Qulungê ji rovî re hinariyek şand:

-Filan rojê tu vexwendîyê minî!

Qulingê nok kelandin, berî sewîlekî dan û çavnêrî li rovîp kir ka wê kengê were da ku heyfa xwe jê hilîne. Pa rovî bi kêf û lezeka were rîya mala qulingê dikudîne, qey tu dibêjî hinek siwar in ji rê ve tên û xaranîyan didin. Haw ku qulingê dît, rovîpê ve derket. Ew çûn ser û çavên hev û din û pirsa hal û rewşa hev kirin. Quling anî sewîlokê nokan danî ber rovî û got «fermo».

Quling her carê nikulê xwe yê zirav î dirêj, di devê sewîl re berî nav nokan dide, devê xwe tije dike û dadiqurtîne. Lê belê rovî bi wê xasûktîya xwe, dike û nake devê wî di qula sewil re danakeve nav nokan . Yek nokek bi tenêjî, rovî tanı nekir. Wî dora devê xwe dalast û got:

-El hemdilah, Xwedê zêde ke, min têrxwar!

Bi wî awayî qulingê heyfa xwe ji rovîyê xasûk sitend.

# ÇAROXA KURÊ MELÊ

Carekê meha Remezanê di Çileyê Hirr de bû. Berî ku rojîya Remezanê biqede xelkê gund tevek çûne nik melê û fitrên xwa danê. Li wî gundî zilamekî pir feqîr hebû û tiştekê wî tune bû, ku ew fitrên xwe bide melê. Bitenê çermekê wî zilamî hebûye. Ew jî gayekê wî miribû û çerm mabû. Zilam radibe diçe nik melê û rewşa bêçarbûna xwe jê redibêje:

-Melê, melê, tu tiştekî min tuneye ku isal ez firtên xwe û zarşkên xwe bidim! lê çendak berê gayê min mir, çermê wî maye! Eger kuçerm ji dêla fitran ve çê bibe, ezê wî bidim te!

Gava mêrikê feqîr ji melê reqala çerm ji bo fitran kir, melê xwe xeyîdand û gotê:

-Na xeyr! wellahil ezîm ji dêla fitran ve, çerm qetîyyen çê nabe! Encax genimê sor î libo, libo yan jî pere!... Eger ku tu fitrên xwe nedî jî, rojîya ku te girtîye di nabeyna erd û asîman de wê daleqandî bimîne naçe nik Xwedê îlla bi edakirina fitran re!

Mêrik vegerîya mala xwe û ji xwe re ponijî. Werhasil bi çi kul û halî ve, mêrik ewşev raza. Serê sibê ew radibe ku waye navtengek berf ketîye erdê û tevê gundîyan karên xwe kirine û diçin hêla kewan. Kurê mele jî, ji çûna hêlê re karê xwe kir, lê çaroxa wî tune bû. Ji bo çaroxê lêwik çû bi ser bavê xwe ve girîya û got: «Çarox«! «Çarox«! «Çarox«!

Mele, ji bo çaroxa kurê xwe gerîya û ne gerîha çerm peyda nekir. Piştre wî ji kurê xwe re got:

-Ewko duhî hatibû nik min! Ewî dixwest ku ji dêla fitrên xwe ve çermek bide min! Min jê re gotibû, ku çerm çê nabe! Tu here gazî wî bike bila ew xweş were vira! min îşev fetwa çerm dîtîye, ku ji fitran re dibe!...

Kurê melê çargavîyan bazda û çû mala wî zilamî jê re got ku: «Bavê min îşev fetwa te ditîye, xweş were mala me.«

Ew zilam bê ser û çav, bi û dilşadî xwe gihand mala melê. Mele pir kêfa xwe jê re anî û gotê:

-Pirîya ku duhî dilê min bi te şewitî bû, îşev ji bona te xew neketîye çavên min, pirî ku îşev ez li kitêban gerîyame da ku fetwa çerm ji bona fitran bibînim. Ennîhayet di cîyek de ez rast hatim, ku bi qewlekî zeîf çerm jî, ji bo edakirina fitran çê dibe!... Lê belê mixabin tevê çerm jifitran re çê nabe, îlla hinek jê! Gotina ku di kitêbê de nivîsîye eynen wehaye:

-Serzik û binzik mekrûhetun, sirta piştê heta devî qûnê fitrîyetun!

Mêrik çû çermê xwe anî û ji dila fitran ve da melê. Mele ji parestûwa çerm hetanî qorikê û bi fireyîya piştê ve, bi kêrê birî û ji xwe re hilanî! Ji çerm kêlekan û serzik, dîsa li xwedî vegerand! Melê jêre got:

-Încar, rojîyaremezanê ku tegirtibû, biste be êdî daleqandî namîne û wê Xwedê qebûl bike!

# JINIKA ŞERMOKE Û MÊRIKÊ DÎN

Carek ji cara, digotin li gundekî jineka bê mêr hebû. Jinika rebena jinikê jiderdê mêran kewijî bû pirîya ku fedî jî dikir, wê taqet nedikira ku ji zilamekî re derdê xwe yê bê derman bêje.

Li wî gundî zilamekî dîn hebû û jinikê çavên xwe li wî nitirand, Jinikê wî zilamê dîn rojek anî mala xwe, hêkerûnek çêkir û danî ber. Di pey ku mêrikê dîn xwarina xwe xwarde, pê re ket laqirdî û henekan. Jinik ji xwe re difikire;«Ezê bi vîyê din re kezeba xwe ya sotî, hênik bikim ew dîn fanıa tiştekî nake, kesek jî bi min nahise», xwe bixwe dilê xwe xweş

dike»!

Mêrikê dîn, heta wê gavê tiştek were neditîbû. Lê hey ew ji wê direve, dibê ka jinik wê çi bike ji min, ku ew wisa lê dike. Dîno hey virde çû, wirde çû, jinikê wîn kişande ser livîna xwe û wî qayîl kir. Ewan li wir çi kiribe xwedê ji me nexwaze, şixwe wan kirîye, mîrikê dîn carek li serê botîyê xwe dinihêre, ku waye tiştekî sipî têre avêt! Hema ew jinişka ve qîr dide û bi derva ve direve, dike gazî:

-Ay bavo! ay dayê! gelî gundîyan heware! gidîno kaca werin! ewkê kirîye ku mejîyê kirê min di devê wî de avêtîye!..

# HÊKA MIHÎNÊ

Carek jicara , xêr û xweşî bibare li hazir û guhdara ji bil mişk û marê qulên dîwara.

Zilamekî Torî hebû, barê xwe yê dimsê li ser hêstirê ediland, berê xwe da bajarê Sêrtê û çû ku dimsa xwe bifiroşe. Mêrik gihaşt sûka Sêrtê, çû irasa fêkî û barê xwe li wir danî, li ber derê dikanekê ewî kundirekê mîranî dît, bi heyret lê nihêre û jixwedî dipirse:

-Hakk yabo ma ev çiyaa?

Pêşpîyan gotine ku «mêrê Sêrtî zibîdînê. Xwedîyê dikanê fam dike ku, ew izlam yekî nezan e û gundî ye, jê re dibêje:

-Eh amê! ma tu nizanî ev çiye ? Ev hêka mihînê ye!

Zilam dipirse:

-Meriv çi dike ji vê hêkê?

Xwedîyê dikanê dibêjê:

-Tuyê vê hêkê bibî mal, têxî ciyek tarî de, tu dê cilikan lê bipêçî, di pey çeneyek de, wêî biterike û ji hev vebe û canîyeka mihînan ji navê derkeve!

Xwedîyê dimsê ji xwe re fikirî û got: «Ma ji vî karî kartir çi heye? mihînek bi pêncî wereqaye, ez vê hêkê bikirim, piştî du sal şûnde, wê canîka min mezin bibe û ezê lê siwar bim». Ewî barê dimsa xwe bi wî kundirî tirampe kir û ha hakê vegerîya mala xwe. Ew li hêstira xwe siwar bû kundir danî ber xwe, bi herdu destên xwe zevt kir û berê xwe da malê. Ew gihaşte herêma Torê û rê kete nav kaş û kendalan. Çima ew kundir ji ber wî ne fiştiqî û di berwar de serberjêr çêû. Wînakê xwe ji ser hêstirê avêt û li pey kundir bezî. Lê kundir çû li kuçekî ket, bû piçik û parî. Ji wî qasî çima têjikeka kîvroşkê ranabe! û bezî çû. mêri guman

kir ku ew têjik ji nav kundirê wî bi derket. Ewî da serê hetanî wê têjikê girt û xiste tûrikê xwe, anî mal wî hal û mesela hêka mihînê ji jina xwe re got, ku ew tejik canîka mihînê ye!

Bû êvar û ew heyirî man, wê canîka xwe di kur de bihewînin. Jina wî got:«Em wê têxin hevşîya (hewş) pêz pe» Ewan wê xistine wir, halet jî dane ber derî ku ew dernekeve. Sibekî rabûn ku canîka wan ne di şûna xwe de ye! Hey vir de, hey wir de,çûn û hatin û ji hevdure gotin ev kamber di kur de derketîye! Mêrik çû gazî «Qend» kir û wî anî, ji bo ku ew bêje wan ka canîk di kura hewşê da revîye!

Qend (aqilmend) li dora hewşê çû û hat. Cîyekî ku canîk tê de revîya be, ewî ne dit. Ew dîsa vegerîya hate ber derî û got:

-Ma hûn nizanin ku canîka we di kur de revyaye? Ma hûn korin kuvê qula di halet de nabînin! Hebe tunebe canîk di vê qulê di revîye.

# SOLA SÊRTIKÎ

Di çaxekî de li herêma Torê bajar tune bûne. Xelkê herêmê her sal di payîzan de, xelkê her gundekî bihev re, ya diçûn Dîyarbekrê, yan jî diçûn Sêrtê berî ku zivistan were, lazimatîyên xwe yên zivistanê dikirîn û vedigeryane gundê xwe!

Rojekê xelkê gundekî tev bi hev re berê kerwanê xwe didin bajarê Sêrtê, dikevine rê û diçin. Barên wan dims, helîl, bastêq, şaran, mewîj, nîsk, nok, genim û ce bûye. Gava karwan digije Sêrtê, ew li irasê barên xwe datînin dest bi firotina malên xwe dikin. Di pey de, her yekê çi jê re lazime, ji dikanan ji xwe re dikirin û hazirîyaxwe dikin ku vegerîne gundê xwe

Lê wan teva çav li hev û dinê kirine, kî çi kirîye, yê din jî, ji xwe re eynê wî tiştî kirîye. Ew li ser derketinê ne ku êdî wê ji bajêr derên, dibînin ku hevalakî wan ji xwe re soleka sêrtikî ya bi dûçik kirîye. Tevek li dora solê diçin û tên, her yek pê digre têxe lingêxwe, ew dertêxe yekî din radihîje wê. Piştre hemû vedigerine sûkê, her yekê, ji xwe re eynîji wê solê yek dikire û paşê vediger nik hevalên xwe.

Karwan berê xwe da rê û ji sêrtê derket. Ew du sê siet birê ve çûn, gihaştin ser çemê Reşa. Wan li wir olaq û hêstirên xwe berî çêrê dan û wan jî li ser çem nan û pêxwarina xwe xwarin. di pey xwarinê de, tevan xwe li mêrgê pîj kirin û di xew re çûn. Çend xort jî çûn li ser kevya pirê rûniştin û lingên xwe pê ve berdan. Ji yên razayî ku şîyar dibe û wan xortan li ser kevîya pirê dibîne, ew jî diçe wir û pîyên xwe bi pirê ve ber-

dide. Karwan yanî tevek wisan li ser pirê rêz dibin û lingên xwe pê ve berdidin. Yek jiwan dibêje:

-Hakk! ma yabo nigên me tevan wek hevdu ne, ma emê çilo wan ji hev nas bikin?

Ew zilam çewa ku wisan dibêje piştre, te bihev re dibêjin: Hakk ma ezî pîyê xwe nas nakim! ew dibêje ez pîyê xwe nas nakim, ê din dibêje, ê din, ê din!... Werhasil yekî ji wan lingên xwe nas nekir û wisan bi pirê ve nigên wan berdayî û li ser kovîya pirê rûniştî man!

Rêwingîyek tê ku di ser pirê me derbas bibe bi rîyaxwe ve here. Gava ku ew bala xwe dide wan, birek zilam rûniştîne û lingên xwe bi pirê ve berdane, ji wan dipirse:

-Gelî biran! ma we xêre ku we tevan bi pirê ve lingên xwe berdaye?

Yek jiwan bersîv didê:

-Em lingên xwe ji hev nas nakin, eva nîv dan e ku em wisan li vir rûniştî mane û riya me jî pir dûr e!

Yê rêwingî dibêje wan:

-Ez lingên we ji hev cuda bikim, dê her yekê ji we ferek sola xwe bidine min?

Ew hemû bi dayina ferek sola xwe qîma xwe tînin. Piştre ew bidarekî digire û terp-rep li lingên wan dixe. Derb li kî dikeve ew lingên xwe di kişine û mêrik ferek solê distîne. heta ku tev radibin pîyan. Lê hemû heryekê bi ferek sol in. Piştre mezinê wan dibêje: Ma hûnê çi bikin ferek sol? Hema, wê jî bidine mêrik, qencîya wî li ser me pir heye. Wan ew fera mayî jî dayê û pêxwas ketin rê çûn mala xwe.

# HOMA Û XELLE

Rojekê ji nedive navê genim kete bîra wî û pir ber xwe ket û ponijî! Bi mirûztî ve ew rabû çû nik kurdên Zaza,got

-Heyran, we navê min xirav kirîye, ez vî navê «Xelle» ku li min daniye, qebûl nakim, çimkî ez qûtê îmanê me, ez tiştekî pir bi qedr û qîmet im, eger ne ji min be, tu kes nikare li dinê bijî!

Kurdên zaza, li hember vê yeka genim derketin. Ewan bi kîn û bêzîyeka pir mezin, bersîva genim dan, gotin

-Çara ku em zimanê xwe yê zikmakî ji bona xatirê te biguhêrin tune ye, û tu kes jî nikare zimanê bav û kalên me, li me qedexe bike û rake.

Genim ji xwe re girîya, ha virde ha wirde wêde pirs kir, got

-Gelo, mezinê vî qewmê çiya kê ye, da ku ez herim nik wî, gilîyê wan bikim?

Hinekan ji genim re got:

-Ev kurdên zaza, tev di çiyan de ne û meiletekî pir mêrînî ne; serên xwe ji tu kesek re xwar nekirine û nakin, ancax ew bi xebera Xwedê dikin: Eger ne, ew bi xebera tu kesek jî nakin!

Genim, piştî ku li dinê ji wan bêhêvî bû û zaza jî, ji ya xwe nehatine xwar, ew rabû çû nik Xwedê, da ku gilîyê wan bike! Li ber derî, milyaketan genim girt, pirsa nav û bernavkê wî kirin û hêj wî berî hunduru dan, çû nik Xwedê. Got:

-Ya xwedanê sermedî, te min ji bo qûtê îmanê peyda kirîye, û te navê min danîye «Genim», piçtre van qulên te yên zaza navê minê xweş û rind, xirav kirine û danîne «Xelle», ez vî navî li ,qebûl nakin. Ez hatime nik te û gilîyê wan dikim!

Xwedê ji genim re got:

-Here mala xwe û li ser dûvê xwer rûne! Zaza qewmekî pir hişk e,tu kes bi wan re serî dernexistîye, ez jî biwan re serî dernaxim! Ma qey tu nizanî ku wan navê min jî danîne «Homa»! Hêj ez dengê xwe nakim încar hê tu binavê xwe ne qayîlî?

# ŞÎNA ÎSKENDER

Îskenderê Zilqerneyn di şerekî de birîndar bû. Ji wî ve beyan bû ku birîna wî qewî xedar e. Ewî gazî sereskerên xwe kir û got:

-gelî heval û hogiran, ez ê birîndar im, birîna min jî gelek xedar e, ez ê mirinê me, bivê birîna kotî ez ê ji nav we herim, lêbelê wesyeta min liwe ev e:

Eger dîya min bi mirina min bihese, wê pir har bibe û ew nahêle ku hûn laşê min têxin tirbê de. Hûnê min li hespê min siwar bikin, hêkekê têxine nav destî min da ku ew bizanibe min dinê tevek zevt kirîye, şûrê min li milê min sererast bikin, kolosê min li serê min biedilînin, hêj min bivine dîwanê û licîyê minê her car rûnî kin! Di pey ku we weha kir de, hêj nûhûnê ji dayîka min re bêjin, kurê te mirîye. Lê ew nahêle ku hûn min têxine tirbê, încar hûnê min têxine tabûtekê da dîya min û tabût hûnê dixanîyekî de bi tenê bihêlin. Di wî xanîya de li dîwêr singek bikutin û nanekî pê ve dalelqînin, bila nan gelek bilind be da ku destê wê negehîjê. Dîya min wê li ser tabûtê şîn û girîn bike, hûnê ji derva ve,

derî biqefêlin, lazime ku ji tabûtê û ji dîya min û wî nanî pê ve tu tiştek din di hunduru de tune be. Di xênî de bila dîya min bimîne, tu kes bi ser wê ve jî ne çe, heta ku wê gazî we kir û got, werin tabûtê bivin, binax bikin!

Piştî ku Zilqerneyn van wesyetên xwe kir, qasekî hindik derbas bû yan na, mir. Li gor wesyeta wî, ewan termê wî bir malê.. Gava dîya wî fam kir ku ew mirîye, kezîya xwe kur kirin, pêşîya kirasê xwe çirand, enîya xwe bi tenîya xacirgat reş kir, destek incên reş li xwe û şînê li der xist, li ser term gerand! Xelkê xwest ku term bibin binax bikin, dîya wî got:

-Ma kurê min ê binê erdê ye? Ez bi rih û gîyan ku hûn vê yekê ji min re dibêjin!

Çewa ku Îskender wesyet kiri bû, tabûtê xistine odakê û de şû dîya wî li ber serê tabûta wî rûnişt û gerand! singek li dîwêr kutane û nanekî qul jî pê ve daleqandine! Wekî din ewan li wirê tiştekî din nehiştin û ji derva ve, derî li ser wê û tabûta Îskender radan, dayîk û tabût xwe bi xwe di hunduru de bitenê man!

Dîya Îskender girîya, girîya, du roj, sêroj, ez nabêjim çar roj ew girî heta ku qirika wê hate girtin, êdî deng jê dernediket. Pirî ku ew birçî bûbû, çavên xwe li nan gerand. Vir de, wê de, ew çû û hat, erê nanekî li pel dît! Lê dê kir û nekir, ku destê wê bigêje nan, negîhîtê. Tiştek ku ew rabe ser jî wê nedît, ji bil tabûtê pêve!

Dayîkê bê hemd û hişê xwe, tabûtê bi alê dîwêr ve kişand, da, rabû serê û nanê li pel anî xwar, kir çar qep daqurtand, piştre wê çavên xwe li avê gerand, lê belê av nedît. Ewê bêhemdê xwe kir e qêrînî û got:

-Wey ev min çi kir. Min pê li tabûta kurê xwe kir! Weriiin gidînooo weriiin vê tabûtê ji ber çavên min bivin û binax bikin!

# HIVDE HIJDE NOZDE

Rojekê zilamekê Botî ji bo karekî xwe, xwe berî gundên deştê da. Ew çû ber derîyê malekê û li derî xist, got: -Hûn mêvanan xwedî nakin?

Xelkên deştan ji mêvanperweîyê re, ne hewqas çê ne! lê belê ew car li wê malê qewimîbû û ew zilam li wir bû mêvan.

Mêvan çû hunduru û şîva êvarê jî hazir bû. Şîva wan kutilkên bi kuncî bûn û qelî jî di wan de hebû. Bê hemd dilê meriv dibijiya wanakan. Jinik ser bergeşê tije kir kutilk û anî danî ber mêvan û mêrê xwe. Ew

cara yekemîn e ku mêvan, kutilkên were xweş dibîne û zor dayê. Mêvan bi dilbijandineka were kutlikan dixwo, meriv qey dibê, ku ew ji ber xelayê filitîye!

Mêvan çewa dest bi xwarina kutilkan kir, xwedîyê malê jî hejmartin. Ewî tam bist heb kutilk xwarin! Jinik û zarûkên xwe ewşev bê şîv man. Bû sibe, mêvan çû û mêrik sond xwar ku êdî hew pêştir, mêvanê ku ji Botan be, nahewîne!

Divê navê de, çend sal di borin. Ew mal dibîne ku waye zilamekê xerîb liderê wan da û dibêje, ez mîvan im! Xwedîyê malê di çe ber derî û jê dipirs:

-Birako tu ji kuderê yî?

Mêvan got:

-Babo ez xelkê Bota me!

Gava ku ewî were got, xwedîyê malê lê vegeran:

-Birako wele min sond xwarîye, ez tu caran mîvanê Botî nahewînim! Û serpêhatîya xwe û wî mîvanê Botî yê ku bîst heb kutilk xwaribûn, jêre dibêje. Mivan dibêje:

-Ehhheww ew çi yekî çavbirçi bûye!

Xwedîyê malê, fam dike ku wê ev mêvan hewqas ne xwire be. Jê di pirse û got:

-Birako, ku tu biyana, dê te çend kutilk bixwarana?

Ewî got:

-Wele ez çiqas kutilk bixwim jî, hivde, hijde, nozde!

# MELÊ KOÇERA

Carek ji cara feqîyek hebû, ew bû melê koçeran jibo meha remezanê. Heçika koçer in hewqas hayî limêjê û tiştên dînî tune ne, lê belê jibo ku bêmanî ji wan gazinan ne kin, ew di mehên remezanande her tim meleyan ji xwe re digirin, fitre û zekatên xwe didine wan û di wê mehê de kêmayî dîn û dîyaneta xwe dimişînin!

Mêlê, ew meleyê ku girtibû, bi dorêher roj malek wî dibiere mala xwe, li wir radiket xwarin, vexwarin dixwar û ewan li wir li mêjên xwe li du melê dikirin. dipey her li mêjeka eşa de, bi cemaet wanakan limêja terwîhan dikir û di pey de civatî ji xwe re her yek tiştek digota, serphatîyên xwe, çîrok, metelok, leqemok digotin heta derengîya şevê, û civat belav dibû. Civata koçeranne ji mele tiştek dînî dipirsî û ne jî mele jiwan re tişteke dînî digota1

Meha remezanê qedîya, şeva êvara îdê, teê koçeran çûn nik melê û fitrên xwe pê xweş kirin, yê ku zikarta wî jî hebû dayê de!

Mezinê koçeran şeva êvara îdvê ji melê pirsî, got:

-Ero melê, maxwene aniha emê sibekî çito bikin?

Mele gotê: -Emê sibê tekbîrên îdê bidin û piştre limêja îdê bikin!

- Încar di pey de?
- Emê cejna hev û din pîroz bikin!
- Emê têkevin ser xwarina îdê, miradê dilê xwe pê bikin!
- Încar di pey de?
- Emê li nav konan bigerin û cejna malan pîroz bikin!

-Încar di jpey de?

-Emê herin vê navrasta han, bi birê, bi tefşê, sêgavê û bi pezkoguro bileyîzin.

-Încar di jpey de?

-Încar emê rûnin xwe rihet bikin!

-Încar di jpey de?

-Încar di pey de, emê rabin û di dîya hev û dinê deynin!

# HEMA TEV EZ Û EZ

Zilamek hebû heft heb kurên wî hebûn. Jinav hemîyan ewî ji kurê xwe yê piçûk pir hes dikire. Mêrik şekirekî, fêkîyekê ji kur bi dest bixistana, ji kurê xwe yê piçûk re dianî. Çi gava ku ew bihata mal, çi tiştê ku pê re hebûna, derdixist û digot, ev ji kî re û her heft zarûkan bi hev re digotin: -Ji min re, ji min re, ji min re!...

Di dawîyê de, mêrik ji her şeş kurên xwe re digot::

-Ev birayê we yê piçûk e, ev tişt bila jê re be! Zarûkên din tevan parestûwa xwe dixwirandana û çav berî dostên ê piçk dikirin.

Ev pêgiratina bavê wan, wisa kiribû ku ew zarûk tev ji birayê xwe yê piçûk diqehirîn û bêzî dikirin. Gava ku bavê wan ne li mal bûya, bi kulmikan, bi inkûzkan, bi niçan lê dixistin û qwincirîkan didanê. Lê gava ku bavê wan li mal bûya, yek ji wan ne diwêrîbû ku kistînî bike û tiştekî jê re bêje.

Rojekê mêrik ji bajêr hat. Heqîba xwe tije kiribû şekir û fêkî, ji zarûkên xwe re anîbû. Ew li ber tifikê rûnişt û heqîbê danî kêleka xwe. Yeko yeko tiştan jê derdixe û ji zarûkên xwe re dibêje:

-Ev ji kî re?

Wek carên din, kurê wî yê piçûk dibêje:

-Bavo ez!...

Werhasil çîya ku mêrik ji heqîbê derdixe û dibêje, ev ji kî re, yê piçûk berî tevan dibêje bavo, ji min re! Ew birayê piçûk, ji birayê xwe yên din, çar pinç qat zêdetir, pişka xwe ji bavê xwe distîne..

Golikeka wan a sêwîtenê hebû. Ew du roj bûn ku avê nedabûnê .

Bavê zarûkan, gazî tevan kir û got:

-Kî ji we golikê dibe av dide?

Tvê Zarûkan xwe bêhis kirin! Mêrik careka din pirsî, dîsa wan dengê xwe nekir. Kurê wî yê piçûk, berê xwe da birayên xwe û got:

-Çima hûn dengê xwe nakin?bersîva bavo nadin Qey kul ketîye malê hema ji her tiştî re ez û ez!...

# TUNEBÛNA QADRO

Rojek ji roja, li Kurdistan Tirkîyê, kurdekî êzîdî ji ola xwe bêzî dike û timê xwe li bisilmanîyê xirav dike. Ew zilam radibe diçe nik miftîyê Farqînê (Mele Mihemed Uyaniq) û dibêjê:

-Miftî efendî, ez êzîdî me, min bawerî anîye ku ola we ji ya me rastir e, ez hatime nik te daku tu min misilman bikî!

Miftî li yê êzîdî dinihêre û dibêjê:

-Di dînê îslamê de qadroyên vala nemane, bo vê yekê em nikarin kesek dî bigirine dîn, ka here mala xwe çendeyek din jî tebat ke, belkî qadroyek vala bû, ew çax emê te têxin şûnawî!!

Mêrikê ezîdî radibe ku here mala xwe. Miftî jê re dibêje:

-Ka ca bisekine! A niha hate bîra min! Mele Evdileyê Timoqî ji ola îslamê derketîye, şûna wî vala maye, emê te têxin şûna wî de!

Çend roj di wê ortê de derbas dibin. Mele Evdilê Timoqî wê mesela Miftîyê Farqînê dibihîze. Hema ew radibe û diçe Farqînê. pêşa kirasê xwe yê îzalix tije kevir dike û diçe ber xanîyê Miftî. Mele Evdile yeko yeko wan keviran davêje li derî û şibakên mala Miftî dixe û bi avîtina keviran re jî dibêje:

-Lebbeyke ellahummme lebbeyk, la şerîke leke lebbeyk

Lebbeyke ellahumme lebbeyk, la şerîke leke lebbeyk

Miftî jî, wê gava di mal de rûniştîye, hema dibîne ku piçik û parîyên caman bi ser ve têne xwar. Ew ji jina xwe re dibêje:

-Ka ca mêze ke ew kê ye were keviran davêje şibakan!

Jina Miftî gava diçe derve, çi bala xwe bidê, waye zilamekê rûdirêj e hema tekbîran dide û keviran davêje derî û pence-

reyên wan. Jinik jê re dibêje:

-Kuro, kuro ma tu dîn bûyî were bi keviran derî û pencerên me dişkênî?

Mele Evdile ji jinikê re dibêje:

-Ez par çûbûm hecê! mi recma şeytênjibîr kiri bû, ne kiribû! Pêwîste ku ez car din herim hecê û recma şeytên bikim, încar mêrê te bûye Ezazilê serokêşeytanan! Hema li vir jî ez recmê bikim, wê Xwedê heca min qebûl bike!

# SOTIN NAYÊ GOTIN

Carekê du bira hebûn, birayek pir maldar û dewlemend bû ew jina wî û du zarûkên wan hebû. Birayê din tevlî wî ve, neh kes bûne. Birayê xwedî zarû tiştek di mala wî de tunebû ku zarûkên wî bixwin. Birayê maldar pirî ku çikûs û tima bû, wî ji tirsa jina xwe ne diwêrîya ku gepek nan, yan jî diravek pere bide birayê xwe yê jar û perîşan!

Rojekê, jina birayê feqîr tevî zarûkên xwe ji birçîyan rûniştin û bi ser hevû din ve girîyan. Gava mêrik hate mal û wê rewşa wanakan dît, sitêrkên ziwa di çavên wî de avîtin û hema bi şûnde vegerîya derva. Ewî biryara xwe da ku ew şev wê dizîyekê bike! Lê belê ew zilamek ji xwe fedîkirî bû. «Mala xweyîyê tinebûnê ne ava be» got, lê ew bêmecal mabû. xwe bi xwe got: «Ya herî rind ew e ku ez herim heywaneka birayê xwe bidizim, çewa hebe em bira ne û bila tewqa min û xelkê, nekeve nav hev û din, ku ez û birayê xwe bin, tiştek nabe!»

Gayekî biryê dewlemend ê, destê meriv nedigişte ser pişta wî, pirî ku mezin û qelew e. Navê ga «Sotin» bû. Mêrik çû wî gayî dizî û anî malê. Di pangê de bû şerjê kir, goştê wî hûr kir, di sitîlê de pijand, danî ber zarûkên xwe, ewan têr goşt xwarin. Ew şev. Ji zarûkên wî re bû mîna cejna newrozê pirî ku kêf kirin.Goştê mayî jî mêrik kir qelî û ji zarûkan re hilanî.

Birayê dewlemend li gayê xwe yê wendabûyî gerîya. Cîyek ku ew pêve neçûbû nema. Ewî salixdana li tu der û erdan hilnanî. Çi cara ku ew tê malê, jina wî dibêje: «Ez bi rih û gîyan, te ga nedîtîye û çewa tu têtî mal». Jinik li wî pir serdest bû. Jinikê ji mêrê xwe re gotibû: «Ku tu ga nebînî ezê xwe ji te bidime berdan». Bo vê yeka mêrik bi şev û biroj li ga digerîya.

Birayê dewlemend ji dîtina ga bêhîvî ma. Eger ew ga nebîne jî, tirsa

jinê nikare here mala xwe ji tirsa jinê. Ew çû mala birayê xwe yê feqîr, da ku ew jî bi wî re were û herin li ga bigerin!

Mêrik geha mala birayê xwe. Birayê wî û jina xwe, bihatina wî re şaqiz man û pixavan kirin. Ji dilê herdukan jî tirpînî hat. tiştekî ku ew li serî rûne jî di mala wan de tune bû. Jinik çû serî gayê kuşerjêkirine, di nav merşikê de pêça, anî danî ber tifikê û wê li serî rûnişt!

Ewî hêj mesela wendabûna gayê xwe ji beriya xwe re negotibû, ji giçê li bin xwe ket şibhê. Gava ew li serê rûniştî ye, hema dişimite, weka tiştekî hilûstankî be di bin wî de, diçe û têt! Ewî ji kêlekekê ve, destê xwe bi giçê li bin xwe paland! Tewekî merşikê bidizîka hilanî. Erê, waye serê gayê wî ye! Mêrik îcarbi çavên xwe dît ku serê gayê wî ye ku birayê wî dizîye û şerjêkirîye! Lê belê ewî dizanîya ku birayê wî ji bêçarbûna xwe gayê wî dizîye! Lê ji birtayê xwe re hîç qal û bala ga nekir, ku wenda bûye! Lê rabû xatir ji wan xwest û çû mala xwe.

Jina wî jê pirs kir:

-Wê birayê te bi te re were ku hûn herin li ga bigerin?

Mêrik ji jina xwere got:

-Hirmet dev ji Sotin berde, «Sotin nayête gotin»!

# DINYA ÇERX Û DEWRAN E

Xocê, Menşûr, rojekê ji jina xwe re got:

-Hito, dilê min çiqas diçe kezebekê, vêga ezê herim sûkê kezebek bikirim û werînime mal, tu ditawê de biqelîne, ez û te, emê têkevin serê û jê têr bixwin!..

Xoce rabû çû sûkê, kezebek tevlî dilik û perçeyek bez ve kirî, girte bidestê xwe, û berê xwe da rîya malê hat. Di kuçeyeka taxê de, gava derbas dibû,jinikek laqê wî hat û jê pirsî:

-Ha Xoce, te ev kezeb bi çiqasî kirîye?

-Bi pênc çerxîyan!

Jinikê ji Xoce re got:

-Ezê ji te tiştekî bipirsim, eger te pê derxist, ezê pênc çerxîyan bidime te, eger te pê dernexist, tû dê wê kezeba xwe dibî min!

Xoce got:

-Başe, ez qîma xwe tînim!

Jinikê got:

-Heya min ji pêş ve ye, yan ji paş ve ye?

Kêfa Xoce hat, xwe bi xwe ji xwe re dibêje: Ma ji vê rihettir çi heye,

ma qey ez nizanim li pêş e, ku ev jinika dîn , hatîye û dilê wê heye ku min bixapîne! Xoce bi ken, berê xwe da jinikê û got:

-Li pêş e!

Jinikê ji paş ve derpîyê xwe şiqitand, xwe belotanî kir, berê qorikên xwe bi Xoce ve kir û got:

-Ka bala xwe bidê, li pêş e yan li paş e?

Xoce dîn dayê ku li paş e, û ji jinikê re got:

-Hermet wele yê her kesî lipêş e, wanê yê te li paş e, min pê dernexist, ha ji te re kezebê!

Jinik kezebê ji Xoce sitend. Xoce madê xwe kir, û li rîya malê kudand, gihaşte mala xwe, bi zikê birçî ve xwe li erdê pîj kir û bê his û pis ma. Jina wî, jê pirsî got:

-Kanê te digot, ezê herim kezebekê bikirim?

Gote jina xwe:

-Hermet hema dev jê berde!

Xoce di dilê xwe de, hema dibêje û dibilîne: «Wey wey jinikê, bila ad û wada Xwedê li canê min şikestî be, eger ev heyf ji te re ma, bila ez ne Xoceyê Menşûr bim!...»

Xoce roja din sibekî zû rabûj çû sûkê. Dîsa kezebeka wek a berê kirî û di eynî kuçê de, ber di mal ve meşîya. Bala xwe dayê, dîsa li wê kuşê , ew jinik li ser devê rîya wî sekinî ye. pirsî. Lê vêcarê kêfa wî pir tê, ji xwe re dibêje: pa min bi çavên serê xwe dît ku ewkê li paş bû, ma qey ezê heyfa kezeba do jê hilnedim» Xoce bi dilekî şad gazî jinikê kir û gotê:

-Te do mim xapand, ma îro jî? Qey ez niznaim, malê tel li paş e.

Jinikê depîêyê xwe şiqitand û ji pêş ve, heya xwe rayî Xoce da û gotê:

-Te got li paş e ne vanê li pêş e!

Jinikê dîsa kezeb ji Xoce sitend, û ew destevala ber bi mala xwe ve çû. Lê belê dilê Xoce tavêje kezebê, kelekel nefsa wî tê û her carê ku qala kezebê dike, jixwe dike ku dîn bibe. Bi çi kul û halî, ew şev lê sibe. Bi şeveqa sibê re, rabû berê xwe da sûkê û çû ber dikana qisab. Dîsa kezebek kirî û berê xwe da mal. Di wê taxa ku jinik dihate pêşîyê de, derbas dibû, ji nişka ve bala xwe dayê ku wa ew jinik dîsa li ser rîya wî rûniştîye. Jinikê dîs, şertgirtina li ser kezebê bi nîşandayîna li pêşî û paşîya xwe, ji Xoce pirsî.

Lê xoce bi denge kî zîz î melûl gotê:

-Hermet wele çerx û dewran e! ez nema êdî liser kezebê bi te re şert digirim!

# DESTEBIRATIYA HIRC Û ROVÎ

Rojekê li çiyê, ji nişka ve hirç û rovî laqî hev tên. Pirtînî ji dilê rovî di çe û dibêje:

-Birakê hirç, şixwe ez dihatim nik te. Dixwazim ku ez û te bibin destebira! Ez meriv ekî xasûk im, tu jî meriveka pir bi hêz î, lê belê tu pir gewende yî! Ez û te bi hev re, dê ji heqê xwe bêtin der û me jiyaneka pir xweş bi hev re derbas kin!

Hirç wê pêşnîyara rovî pir eyîşand. Ewan destê biratîyê dane hev û bûne canê -canê bi hev re. piştre ew herdu cûn xwe dane serê pozekî bilind û li hawîdorên herêmê, li kerîyên pez nihêrtin. Ewan dît ku waye kerîyek bi çîyê ve hildikişe, şivanek bitenê li ber e û seg jî pê re tune ne!

Hirç û rovî xwe bi alê kerî ve berî xwar dan. Di newalekê de ew gihaştin pez. Hirçê beranekî qirase kuşt, danî ser pişta xwe û vegerîyan. Bi rê ve, çopkên rovî ji tirsan erd nedigirtin û ji rêveçûnê! Hirçê ji rovî re got; «Bira xwe helqevêze ser pîşta min». Rovî li hirçê siwar bû û kete ser goştê beran û xwar.

Hirç giha quntara çîyê, li berzagekê rûnişt û ew û rovî ketin ser goştê beran. Şixwe rovî li ser pişta hirçê têr goşt xwari bû dilê wî nediçûyê. ê ku ne goştê genî be, hirç naxwe! Hirçê ji rovî re got:

-Birakê rovî, ez hetanî goşt di bin erdê de genî nekim, ez nikarim goşte teze bixwim!

Rovî gotê:

-Eva ev ne bû, tu serê min jî jê kî, ez nikarim goştê genî bixwim. Şixwe tu dizanî, xwarina min timî goştê çax. xwe divê ku em goştê xwe pişk bi kin.

Bi parvekirina gişt, hirçê qîma xwe anî. Lê çavên wê, lê ye ku para zehf ji xwe re bigire. Çavê rovî jî, lê ye ku bi biratî pişk bikin.

Hirçê bi penceyên xwe, cendekê beran kire du par. Parek mezin û parek jî piçûk. Rovî gotê:

-xwişka hirç, ma ev biratî ye ku te kir

Hirç gote rovî:

-Ne, ez mezin im, min laş hilgirtîye, tu jî li ser pişta min siwar bû bû yî û tu lepek î, parpîyek ji tere hebe, besî te ye! Û ez mezin im, pir dixwim, divê ku para min jî pir be!

Li ser pişkirina goşt, dudilî ket navbeyna hirçê û rovî de. Yek ji hir-

çê, yek i rovî, rovî ji hirçê re got:

-De here wêde hirça devgenî û qûn bi pirç!

Hirçê ji cî kiçîmê rovî kir. Rovî tiroş nekir û revîya. Ha li vir, ha li wir , rovî xwe di qulikên teng de bir û anî çivdan xwe. Ew xwe li kîjan qulê dixe, hirç jî di pey de xwe li wê qulê dixe. Çima hirç di qulekê de asê nebû. Hirçê kir û nekir, ne dikare bi pêş ve here, ne jî dikare bi paş ve were! Rovî li dorê çû, hat û peyvên were pîs ji hirçê re digotin ku pûrta hirçê ji wan diweşe. Di dawîyê de, rovî ji paş ve poça hirçê hilda û da binê qûnê! Rovî serê xwe hejand û got:

-Hey sibhanela, însanê sereş yê ku şîrê xav vexwarîye, «Heta ku di xwe de nebîne, hişêwî nayêserê wî!»

# ŞAHIDÊ DADGEHÊ

Zilamekî kurd hebû, dozeka wî di dadgeha Osmanlîya de zemanekî dûvedirêj domand, dikir û nedikir, dawî lê nedihat. Ew çax dadgehên Osmanlîya qazî, miftî û melan dikirin û li gor sazûmana şer'ê biryar didan.

Di pey wextekî dûvedirêj de, dadgehê ji wî zilamê kurd re got;

-Ku tu ji xwe re şadekî rastgo werînî, wê doza te kuta bibe, eke ne, tu yê ji vî heqî bê par bimînî.

Mêrik gerîya û ne gerîya tu kesê misilman, ku were jêre şadî bide, nehat ew çû ji xwe re yekî file dît û rewşa xwe jê re got. Mêrikê file gotê:

-Madem kesê misilman nayê ji te re şadî nade, ezê werim, hema di kur de zirav be bila di wir de biqete!

Lê belê ji mêrikê file re got:

-Wê qazî ji te pirsa şert û şirûtên misilmanîyê bike, eger tu şaş bersîv bidî, wê îşê me ji bin ve hilweşe!

Ê file gotin:

-Kirîv, ma erê em file ne, lê em misilmanîyê jî dizanin, tu di vî awayî de qet xeman mexwo!

Her şiqas yê file wisan got jî, dîsa mêrik jê re şert û şirûtên misilmanîyê bi kurtî gotê!

Herdu bi hev re çû nik qazî, û got:

-Qazî efendî, vaye min ji xwe re şadek anîye!

Qazî, ji bo girtina îfade gazî şahid kir û pirs jê kirin::

-Tu misilman i?

-Belê elhemdla!

-Xwedê çend in?

Di pey wê pirsê de, şahid ma sekinî û !...

Qazî dîsanê pirsî:

-Çima tu dengê xwe nakî, Xwedê çend in?

Şahidê file, serê xwe rakir û bi dengekî nivz got:

-Xwedê dido ne!

Qazî gotê:

-Haydê ji vir biqeştin!

Leşkeran şahidê file û xwedîyê dozê ji eywana dadgehê avêtin der. Herdu bi hevre ponijîn, serê wan di ber wan de, li rê kudandin û ber bi çûn. xwe ve meşîyan.

Bi rê ve, mêrik jişadê xwe pirsî got:

-Malnexira! çima te li cem qazî were got, ma tu nizanî ku Xwedê yek e?

Yê file got:

-De here lo! Jixwe qazî li mana digerîya! min gotê xwedê dido ne jî, ez jê ne filitîm, înca ku min bigotana, Xwedê yek e, jixwe wê qazî li min û te bixistina bidana!

# QAZIYÊ BERTÎLXWIR

Li gundekî Kurdistanê du zilam hebûn. Ew çax dewra Osmanlîya bû û sazûman jî şerîet bû. Li ser dan û sitandinekê herdu zilam ketibûn qirika hev û dim û bi tu hawayî, ew ji hev safî nedibûn. Hevqas camêr ketibûne navbeyna wan jî, li hev û dinê lihevhatin nedikirin. Ew rojekê di nav hev û dinê de dipeyivin û biryara xwe didin: Ku ya herî çak ew e, herine nik qazîyê şerietê, bila ew wan ji hev û dinê biqetîne!» çimkî dibêjin: «pêçîya ku şeriet jê ke, xwîn jê nayê»!

Herdukan , her yekê erzûhula xwe nivîsî, girtine bi destî xwe û li rîya dadgehê dudandin, gihandin wir û dane dest qazî.

Gava bu êvar, yek ji wan bi dizîka xwe gihîştande qazî û gotê:

-Qazîyê delal, eger tu vê dozê ji min re bixînî, ez bivirekî wisan bidim te ku fenanî şûrekî ye gava meriv li darê daristanan dixe di nîvî de dike du qet!

Qazî jê re got:

-Bila be! tu qet xudûkîyan meke, ka hetanî roja dadgeha we bêt î, Xwedê mezin!

Mêrik bi dilekî xweş vegrîya mala xwe û li ser guhekî raza. Ew ji jina xwe re dibêje:

-Hirmet, tu qet kul mexu û keder meke, îşê dadgehê temam e!

Lê belê ew qet hay ji bayê felekê tune ye, ku ê din jî, ji xwe rê qazî berdest kirîye.

Zilamê din, bi şeveqa sibê re, çû li derê qazî xist û jê re got:

-Qazîyê giranbiha, eger tu vê dozê ji min re bixînî, ez dê çêlekeka zer tevlî golikê bidime te, ku rojê du gadoş şîr dide.

Qazî ji wê teklîfê re tima bû û gotê:

-Bila xişûşî qet nekeve dilê te, ez serokê dadgehê me, ji min pê ve ê ku qerar bide kesekî din tune , heta wê rojê jî Xwedê mezin e!

Ew zilam jî, bi sozê bertîla ku ji qazî re gotî bû dilê xwe xweşdikir û radiza.

Herdu zilam bi dilxweş û şadî xwe biste kiribûn. Ew di dilî xwe de dibê wê dadgeh ji min re bixîne, ê din dibê wê ji min re bixîne.

Ew man ku roja dadgeha wan hat. Xwe edilandin, tiftifandin, qurmê simbêla badan, çûn şahidên xwe girtin û li rîya dadgehê kudandin Çûn bajêr.

Ew li eywana dadgehê ew pawuka gazîkirian qazî dipên û dilê herduwan jî kutekut e, li ser nigan diçin û tên û bala xwe didine saetê piştre. berdevkê qazî ba wan kir û tev çûn hundir. Qazî serê pêşî îfadeyên herdukan girt, dûre yê şahidan. Di pey îfadeyan de,qazî serê xwe berjêr kir, kete mitale û xiyalan, ismetî serê xwe ! Heyeta dadgehê, xwedîyên dozê, şahidên wan, ve buhtîyên dadgahê tev li pawuka peyva qazî ya dawîyê ne, ka wê wî heqîji ki ji wan re biryar bide.

Di nav wê bêdengîyê de, yê ku bertîla qazî, bivir gotibû, ji nişka ve got:

-Qazîyê dinê îslamê, çima tu bê his û pis mayî? Me ji hev biqetîne weke ku tu bivirekî linîvê darekî xî, çewa qet dike, wisan me jî, ji hev biqetîne!

Qazî serê xwe bilind kir, li hawîdorê xwe mêze kir û jê re got:

-Ne, çêlekê bi destîyê bivir ve rîtîye! ez nikarim bi destîyê bivir bigirim!

# JI HEFT FEQIYAN YEK FETISÎ

Carek heft feqî hebûne. Rojekê wan tayînên xwe anîn û rûniştin ku bixwun. Lê belê kevçîyekê wan tenê hebû. Ewan bi kevçî dorodoro dest

bixwarina xwe kirin. Heta kevçî li wan seredor dibe, gep di devê wan de diqede û çavrênîya kevçi dikin. Kevçî were xweş xweş li wan seredor dibe, qey tu dibêjî agir e û bi îûşê havînê ketîye!

Feqîyek di nav wan de bê diran bû. Dora kevçî hate ser, ewî hêj gepa xwe ya pêçî danequrtandi bû, dora diduyan gihayê. Ewî gepa diduyan jî xist devê xwe, hêj wî gepa xwe dicût, ha ku dît dora sisîyan hatê. Ewî gepa sisîyan jî avêt devê xwe, gep di gewrîya wî de asê bû. Dora Çaran hate ser, ji bo ew ji dora xwe li paş nemîne, wê jî avêt devê xwe û çavên wî zeloq bûn. Hevalên wî bi tepan li pişta wî xistin, av berî ser devê wî dan, eybe eybe qê fede difilite?!

# KÛÇIKÊ LI KÛÇIK PIRSÎ

Hebû carek ji cara, xêr û xweşî li hazir û guhdara. Hebû tunebû dibêjin maleka dewlent hebû. Ji ber ku pêwendîyên wan bi xelkê re pir hindik bûn û her tim bi tenê dijîn, ji xwe rekûçikek xweyî dikir. Kûçik jî, yek ji wan tûleyên hûrik bû û pir xweheskirî bû

Xatûna malê, tim û dayim, selikê dixist sitûyê xwe, çi tiştê ku jê re lazim bibûn dinivisanda, pere û kaxez dixistin selikê û dişeyand sûkê. Dikancîyan jî, tiştên ku di kaxez de nivîsî bûn dicivandin, dixistine selika di sitûyê wî de û didan pîya malê. Ji bil vanakan, her rojê du caran jî, xatûn kûçikê xwe dişeyande tendûrê cem nanpêj. Her beyan û her êvar, kûçik diçû nanên teze yê germ ji xatûna xwe ya nazikxeram re dianî. Çimkî xatûnê tu car nanê sar û tisî nedixwara.

Pa kûçik kûçikekî çewa bû. Qey te digot wî duwazde ilma xwendîye, heft dibistan qedandîye, pirî ku bi fêm û ferese bû.

Rojek ji rojan êvarkî bû. Roj li ber zeraîyan bû. Kûçik ji tendûrê nan anîn û Xatûnê bala xwe dayê, ku nanek jê kêm e. Ji xwe re got, «belkî nanpêj bi şaşî nanekî kêm şeyandîye.» Roja din jî, beyanê kûçik çû nan anî, dîsa nanek kêm bû. Êvarê dîsa nanek kêm anî Werhasil çi cara ku diçû nan, li vegerî, timî nanek kêm dianîya!

Xatûn, li şêl û hoya kûçikê xwe bi qîmê kete dudulîyê. Ha hakê ew çû nik nanpêjê xwe ji pirsî got:

-Ev çend roj in, tûlê min çi cara tê nan, li vegerê, ji hejmara ku ez dinivisîni nanek kême! Gelo hûn kêm didinê yanena,

Nanpêj gotê:

-Di kaxezê te de, çend nan nivîsî bin, em hewqasî dixin selika kûçikê te!!

Xatûnê re, xwe bi xwe ji xwere got:

-Hebe tune be hicran ji kûçikê min e, încar ka ew ji van nanan çi deke?

Xatûn çiqas ji kûçikê xwe dipirse, tu çi dikî ji van nanan, ew hema dûvê xwe dihejîne, dibe kustekusta wî, madê xwe dike û sitêrik bi çavên wî ve têne xwar! Xatûn tiştek ji wî fêm nake.

Xatûn ji kûçikê xwe pir hez jî dikir. Li ser wê rewşê, ew şaş mabû. Şerê dinê jî dest pê kirib û Eskerên deh diwêlan ketibû Kurdistnê! Xelayeke wisan hebû, ku dê weledên xwe diavêtin. Xelkê hew pincarê dixwar. Nan û pêxwarin di mala kesekî de nibû. Xatûnê jî, pirî jineka qarmical bû wê di xwe re nedidît ku here nan û tiştên xwe bikire. Çimkî ne rojek e, ne du roj e, ne sê roj e... Tirakelke wek wanên binê dara xurmê bû. Xwe bi xwe ji xwe re got: «Ya herî çak ew e, ku ez li kûçikê xwe notirvanî bikim, ka ew çi dike ji van nanan»

Rojekê beyanê zû, xatûna gewre dîsan selikê xiste sitûyê kûçikê xwe û wî şeyande nan. Lê ew jî ji, li pey wî derket taqîbatê. Di vegerê de xatûnê dît ku kûçik berê xwe ji rîya malê vegerand û ew li pey wî çû. Kûçik çû û çû û çû heta ket navbeyna hinek xirban . Xatûnê dît ku kûçikê wî, xwe berî nava kavilekî da. Ewê jî di jor de, li wî temaşe kir. Çi bala xwe bidê, ku kûçikekî pîr ê nexweş, ji herdu çavan kor, ji her çar lingan jî seqet, kal û ketî û li erdê pîjkirî ye! Kûçikê wê, ji selika di sitûyê xwe de, nanek deranî û danî ber devê wî segê perîşan Xatûn piştî ku vê rewşa kûçikê xwe bi çavên serê xwe dît, vegerîya mala xwe. Kûçik jî di pey de, qasikek şûnda hate mal. Ji qestana ewê nan jimartin. Dîsa nanek ji wan kêm derket.

Kûçik pirsî. Dîsan kûçik serê xwe hejand, dûvê xwe lûçikand û sitêrik bi çavan ve herikîn. Xatûn gotê:

-Herê tûlê min, ez bi fêlên te hesîyam! Tu kûçikê û li kûşikê kal û kûtî dibî xwedî, ez mirov im, ma ji te jî, êdî ezê fedî nekim?

# SOFÎ Û MIŞKÊ MIRÎ

Carekê sofîyek hebû, merivekî pir salih û alê Xwedê bû. Pirî ku ji Xwedê re îbadet dikirin, işqa nûra Xwedê li mîxê wî dabû, dest ji jin û zarûkên xwe berda û bi çîyê ve terkeser bû. Sofî di çîyê de rastî şikeftekê hat. Ji xwe re got: «ev şikeft derbê min e, ezê di vir de ji Xwedayê xwe re, zikir û ibabetan bikim heta roja mirinê!»

Qet jin û zarûk, mal û dinya nedihatine hiş û aqilê sofî. Pirî meleyan

ji wî reqala bihiştê, horîyên bihiştê û agirê dojeyê kiribûn, tirs û bizd ketibû nava sofî û ewî biryara xwe dabû ku ji wê gavê û pêve, wê jiyana xwe di rîya xwedê de bidomîne.

Gava sofî serê xwe xist şikeftê û li havîdor çavên xwe gerand, çi bala xwe bidê ku Şikeft tije di qul û xewêr in, tije kêç û kurm in, û têde çil - vila mişkan e, wek suwaran li hev û dinê diqelibin, û çokek zibila heywên têde heye. Ew jî pirîya, ku xelkê ji ber qemçîyan û cendirman û tahsîldaran, pezên xwe revandine û anîne xistine wê şikeftê de, û bi salan ew rewş li ser gundan domandîye, loma bû ku ew şikeft tije bû zibil!

Ji paşîya şikeftê ve,Sofî çelpeçelpa dilopên avê bihîst. Bi bezegurkî, ewî bidawîyê ve bazda. Li wê dikanokek dît, û di nîva wê de, kortikek heye û ji jor ve, dilop dilop av dadiweribê. Bi salan e ku ew dilop hatine û di wir de ji xwe re kortek çêkirine. Ava zelal tijeye û mişt e. Gava Sofî wê avê dît, pirîya ku kêfa wî hat, ji kêfan re dikira ku bifirîya. piştre xwe bixwe ji xwe re got: «Hebe tunebe, pirîya ku ez salih im, xwedê vê avê ji bona min peyda kirîye».

Di şikeftê de, Sofî dest bi limêjan kir. Di navbeynê de gelek sal borîn. Bara rojê ew carekê, diçe derve. Ji xwe re pincar, karok, qîvar û gil û gîya dicivîne û dîsa vedigere şikefta xwe.

Ew sofî di wê şikeftê de wisa bi pêş ve çû ku, êdî giha derenca «Zahidan». Herdu dinya ji wî re wek hev bûbûn, jê re bûbûn wek neynikê. Ji bo ku guneh jê re çê nebin, pê li mûrîyan jî nedîkira. Ji bo ku çavên wî, li pîrekan nekevin, çi cara ku diçû derve jî, şemla xwe bi serê xwe ve berdida.

Sofîyê zahid, rojekê li ser limêjê ye. Hew ku dît, wa ye mişkek li ser sicada wî ye û ji xwe re çirtikan dide. Yeqîn mişk jî bîna xwarin û marinê kiribû, loma bû ku hatibû wira. Sofî hêdîka got, «Bismillah» û destê xwe li mişk raweşend. Çima pêre pêre mişk nemir! Sofî ji xwe re got, «A hah, încar ezê çi bersîva Xwedayê xwe bidim, eva ez bûme qûtil û mistehêqê ezabê Xwedê bûm û çûm». Sofî zor da şîn û girînê. Jo bo ku ji cirma kuştina mişk li nik Xwedê bifilite, Sofî, termê wî, di nav potekî sipî de pêça û xiste ber kevîya şaşika xwe de û reqande limêjan. Sofî bi şev û roj digirî, zarzarîyan dike, daxwazîyan dike, hema dibêje û dibilîne: «Ya Xwedê tu min ji ber vê kuştinê ve nexî dojeyê».

Ji tirsa kuştina mişk, semax û tebat nedihate Sofî. Hewqas şevlimêj û rojî û zikir dikira jî, dilê wî ne dikete cî û got: «Ezê herim nik meleyekî, jê bipirsim, her çiqas min wî kuştîye jî, lê ev heftê sal in, ku cenazeyê wî yê bimbarek, wê di ber şaşika min de ye, û bi wî ve, ez serê xwe her roj sed caran ji Xwedê re datîneme erdê. Belkî ji bona vê yekê, Xwedayê mezin li min borî be!»

Sofîyê zahid rabû çû gundekî. Ji zarokan camîyê pirsî, nişandanê û rast berê xwe dayê û ket çû camîyê. Gava feqîyan û xelkê cim'etê sofî dîtin, tev jê bizdiyan. Pirî ku rih û simbêl û şaşik û kincên wî li hev ketibûn dihev gemirî bûn û bûbû mina ni dahbekî! Li pey melê limêja xwe bi cimaet kir û tizbîhên xwe jî kir û sofî serpêhatîya xwe û mişkê mirî ji melê re got. Di pey gotinê de, hema termê mişk ê mirî ji ber şeşika xwe deranî û danî ber melê. Pa sezmê Sofî zer bûye, histêr bi çavên wî ve tên, uf -ufîye, kufkufîye û ji tirsa Xwedê ew quncifîye hev û nînê.

Mele ji Sofî pirsî:

-Sofîyê Xwedê, ev çend sal in ku ev termê mirî di ber şaşika te de ye?

-Ez bi gorî, ev heftê sal e ku di ber şaşika min de ye!

Mele û civata li dorê, tev ji xwe re şaqiz man! Bû hilqehilqa feqeyan û bi Sofî kenîn. Mele berê xwe da Sofî û gotê:

-Sofîyê delal, ne ev heywanekî heram e, û mirarek e, ev heftê sal in ji ku te bi vî termî ve limêjan kirîye, ew limêjên ku te kirine jî, tev betal in, pêwîste ku tutevê wan limêjan ku te kirine jî, qeza bikî, eger ne, ji ber wan limêjan ve, tû dê bi salan, di dojeyê de bimînî!

Û mele domand:

-Firqa di navbeyna yên xwenda û nexwenda de ev e ku, helal û heramîyê, başî û xirabîyê, zordestî û bindestîyê, rohnî û tarîtiyê, rastî û xwartîtîyê û mirovatîyê bizanibe!

# MELÊ SOSRETGERANDÎ

Carek ji cara a sêlekekî bê dê û bav hebû, ewî dest bi feqetîyê kir û li nik meleyekî xwend. Gelek sal bi ser de derbas dibin, ew feqe di be mintehî û dersdarê wî bawername didê. Lê belê dersdarê wî dibêjê:

-Melê min î nû! Eva te xwendina dînî qedand di vê derheqê de tu kêmayîya te nemaye, lê belê çendeyek din jî bimîne da ku ez hinek xwendina zanîn û tevgera dinê ji te re bêjim, paşê încar ji te re oxirbe!

Feqîyê mintehî ji dersdarê xwe re dibêje:

-Na xêr! Xwendina dînî ji min re bes e, ya dinê min navê, îro dinya ye sibê axret e, ez ê çi bikim ji xwendina dinê malava?

Feqeyê Mintehî xatir ji dersdarê xwe û hevalên xwe xwest û berê xwe da bi alê rîya gundê xwe ve, çû! Gundê wî jî gelek dûr e. Ew di rîya xwe de rastî gundek hat, melê wî gundî jî li ser banê mizgeftê selatên limêja înê dixwend. Ew fikirî «ezê herim limêja xwe ya înê jî bikim û paşê têkevim rîya xwe».

Xelk hatine limêja înê û mizgeft tije bûye. Melê wî gundî pa yekî bi rî û şaşik e, lê belê rûyê wî qey tu dibêjî dergîlikek e pirî ku mezin e. Ew rabû ser mînberê û dest bi xwendina xutbê kir. Feqîyê mintehî bala xwe didê ku melê bi xeletî xutbê dixwîne. Ew di nîvê xutbê de rabû pîyan û ba melê kir:

-Mele mele ev tu çi tur xutbe dixwînî? Hey malik ava ne bi vê xwendina te xutbe betal e û limêja me nabe!

Xelkê li mizgeftê bala xwe danê ku ew yekî xort û cîhil e û melê wan jî yekî kal û bi şaşik û rûspî ye. Ji wî û ji melê, xelk bi melê bêtir bawer e. Cimaet rabû û kiçîmê feqê mintehî kir. Xelkê were li wî xist, hetanî ku ji kerê re got «şoş dîya min»! Feqe tê hişê xwe û dikeve bîra wî ku dersdarê wî gotibûyê «Xwendina zanîn û tevgera dinê ji te re bêjim, paşê tu here». Ew li «Na xêr» a xwe poşman dibe û dizivire ba dersdarê xwe. Gava ku ew digije nik dersdarê xwe, dersdar çi binihêre, ku ser û çav li Feqê mintehî reş bûne û poz lê werimîye. Jê dipirse:

-Feqîyê min î delal! ev çi bi te hatîye?

Ew serpêhatîya xwe jê re dibêje û dibêjê:

-Mamoste ez li «Na xêr» a xwe poşman bûme, pêwîste ku ez li nik te «Xwendina zanîn û tevgera dinê» jî bixwînim û paşê herim!...

Melê Nû qederek li wir dimîne û dixwîne. Ew dersên tevgera dinê kuta dike. Lê belê feqe lêdana xwe ji bîr nake û dixwaze ku rojek berî rojekê, ji wî meleyî heyfa xwe hilîne. Melê Nû di zanîna dinê de tam digihîje. Êdî di wê derheqê de tu kêmayîya wî namîne. Rojekê ew berê xwe dide wî gundê ku di mizgeftê de lê xistibûn. Melê Nû dîsa roja înê xwe digîjîne wirê. Vê carê ewî rû berdaye û wergirtina xwe jî guhurandîye da ku tu kes wî nas nekin, ku ewê berê ye!

Wextê limêja înê tê û mele radibe ser mînberê û xutbe dixwîne. Wek cara din dîsa mizgeft tije, di dev re ye. Melê nû xwe bi cezba dixe û zor dide girînê. Ew girîyek were dike hetanî xelkê li mizgeftê tevek li wî şaqiz dimînin. Xelk hev têne dora wî û jê dipirsin:

-Sofîyê delal! Çima tu hewqas bi dilekî şewat digirî?

-Pa ezê çima negirîm! Tayek mû ji yên bihiştê di nav rûyê melê we de ye, û diçirisîne! Ew ta bi kî re be, wê ew bê heşr û neşir here bihiştê. Ê ku pêre be û here dojê jî, di agir de ew naşewite. Ez ji şewqa cemala wî mûyî dikim û nakim tebata min nayê. Wey Xwedê tu min bidî xatirî wî mûyê di rûyê melê de!

Di pey gotina wî ya bi kelogirî de, cimaetê kiçîmî melê kir û wî ji ser mînberê anîne xwar! Wey li wî ku ew ji xwe re mûyek ji rûyê hiklişîne! Di nav destên wan de bû «qar» û «war»a melê û dike û nake ew xwe ji lepên xelkê nafilitîne. Xelkê bi rûyê melê ve yek tayek mû nehişt! Di

pey rûtbûna rûyê melê de încar mûyên serê wî hilkişandin. Serê melê jî rût -zilût bû. Melê Nû bi wê xasûşktîya kesnedîtî, melê sosretgerandî kir û heyfa xwe serheyf kir!

# MESELA KER TÊ DE

Carek ji caran, maleka pir feqîr û jar hebû. tiştekê wan tinebû, ne bixwin ne vexwin û li xwe kin, bes kerekê wan î reş tenê hebû. Ew jî,car caran ji çîyê barên êzingan lê dikirin û dibirine bajêr, ji xwe re difirotana û pê, lazimatîyên xwe yên girîng dikiranagnf di malê de. Mêrik û jinik bûn û kurekê wan î ezep bi tenê hebû.

Şevek derengîya şevê ye, , berf û bager dipûkîne, ji sermana kesek li derva xwe li xwe nagire. Di tifika xwe de agir kirine, mêrik û jinik xwe dane ber û kurê wan jî, di nav livîna xwe de, xwe vezelandîye, ge li vî alî ge li wî alî xwe diqelibîne û xew nakeve çavên wî. Lê belê weke ku di xewê de be, tu his û pis jê dernakeve. Jinik û mêrik jî, ji xwe re berûyan davêjin nava tirafê de, hêdî hêdî berûyên qelandî dixwun û ji xwe re xeber didin. Jinikê, ji mêrê xwe re got:

-Ha ewko! Xwedê hebîna, ma em kurê xwe qey nazecînin?

Mêrik ji, jina xwe re got:

-Ewkê qey tu nizanî ku tu tiştek me tuneye? Ez nizanim ku em kerê xwe bifiroşin!...

Lawik di bin lehêfa xwe de, çewa vî dengî ji dê û bavê xwe dibihîze, kêfxweş di be, û ji xwe re dibêje «Waye îşev zewaca min kete bîra wan» û serê xwe xir dike xewê radikeve

Paşê lêwik dimeyîzîne ku , bi rojan bi hefteyan wext derbas, dibe, his û pisa zewaca wî êdî ji dê û bavên wî, nayê. Lawik diqilqile, vir de, wê de diçe, xeberdanan tîne û ji xwe re dibê: «qet behsa mesela ker tê de êdî tune ye!» Û lawik fedî dike ku ji wan rasterast jî bipirse!

Şevekê dîsa lêwik û dê û bavê xwe li ber tirafa êgir û rûniştîne. Berûyên xwe di êgir de diqelînin. carê qasek ew ji dîya xwe re dibêje:

-Dadê ka îşev ji me re çîrokekê bêje?

Dîya wî dibêje:

-Lawo ez çîrok nizanim!

Lawik êdî ji rihê xwe dide sitû. Sebr û tebata wî êdî nema tê û ji dîya xwe re dibêje:

-Dadê dadê! ka ca ji me re mesela ker tê de dîsa bibêje?

# ATATURK Û ÎSMET PAŞA

Mistefa Kemal Ataturk serokê komaro Tirkîyê bû. Îsmet Paşa jî serokwezîr bû. Berî ku ew lêqelibandinê li sultanên Osmanî bikin herdu bi hev re heval bûn û di her awayan de bê hev û din tu tiştek nedikirin. Qaşo wan komar çê kir încar ji xwe her tişt kete destên wan û tiştên ku wan dixwestin jî kirin.

Rojekê Îsmet Paşa ji wezaretxana xwe tê mal. Ew dinêre ku jina wî «kur» daye girînê çavan li serê xwe sor kirîye. Paşe jê dipirse:

-Xanima min! Tu çima wisan digirî?

-Ez ê çewa negirîm! Hevalê te, hevalê te yê Misto, a berî vêga ji vir derket! Ew hate vir dest avête min û çû! Ev hevaltî û biratîya te û wî were ye? Bi bênamûsî ye? Lê vê gavê xelkê reben û jar ji destê we çewa namûsa xwe diparêzin, he!

Îsmet Paşa bi wê peyva jina xwe di kene û dibêjê.

-Xanima min tiştek nabe! Ev careke ku wî dest avêtîye te, ez heroj heyfa te jê hiltînim! Ji niha û şûnde îcar ez ê her roj lê ducar bikim!...

# PARA FEQIYÊ KOR

Carek feqîyekî ji herdu çavan kor hebû. Hevalên wî, pê dor û kar nekidirin, xwarin didanê, kincên wî dişûştin, wî li derva digerandin gelek alîkarîya wî dikirin. Çi cara ku feqîyan tayinên xwe dihanî jî, berê têr didan wî û paşê wan xwarina xwe dixwarin.

Belam ewan çiqas xwarin didane ber koro, pêşî destên xwe lê dipaland û digot:

-Heeeewww! Vêga yê min hewqs e, încar lêyê we vêga çiqas e!

Mîr feqîyan got:

-Çi tayînên ku we îro anîn, tevan deynin ber koro! û bêjinê:

-Ev tev para te ye! û xwe bidine paş, ka ca ew çi dibêje!

Feqîyan ratibên xwe anîn. Kîjana ku anîn, danîne ber koro. Ji re gotin:

-Fermo, xwarina xwe bixwo! Li alê din emê jî ya xwe bixwin! Û çend heban xwe li feqîyê kor nitirandin! Ewî destên xwe li ser firaqên xwarinan ber û anî. Hem di ber xwe de dibişire û hem jî, bi dizîkan dibêje:

-Ku ev tev para min be, li vêga ya wan çiqas e!!!

## XERZIKÊ ZOQÊ

Zoq bajarekî pir kevnare bû li navrûwa deşta Xerzan. Bajêr di destê began de bû, û qewî zordest û xwînxwar bûn. Di herêmê de kî sûcek bikira, began wî di Xerzek (zinar) de diavêtin xwarê. Xerzik zinarekî pir bilind kevirên wî sertûj û bi niçin û giçik in.

Meleyek sûc dike û beg wî tîne ku di wir de bavêje. Çi gava ku beg yekî di wir de werbikirana, xelkê herêmê jî dianîya hafê. Da ku hêbeta wî bikeve ser wan de.

Têwerkirina mele di Xerzik de, keşeyek jî temşecî hebûye. Gava ku melê davêje bi tifiqa xwedê ew namire! Keşe wê gavê dikene û dibêje:

-Kurkê melê ba girt, loma ku ew nemir!

Ev gotina keşê digîje guhê beg îcar beg keşê tîne û dibêjê:

-Bi serê bavê min! Ezê kurkê mele li te bikim û te di Xerzik de bavêm!

Beg kurkê melê li keşa dike û wî di zinêr de davêje. Lê belê kurk hîç feyde neda keşê û çû heqîya xwe!

## AVAKIRINA XANIYAN

Zilamekî pir maldar û bi nav û deng hebû. Her kes ji wî razî bû û jê re xêrxwaz û dilxwaz bû. Mixabin ew gelek kal bûbû ji çapa xwe daketibû. Zarûkên wî, yek kurek bi tenê hebû.

Ew zilam rojekê ba kurê xwe dike û lê şîretan dike dibêje:

-Kurê min, lingekî min çûye gorê û yek jî maye li dinê! Ha ku te dît ku rojekê ez çûm! Ha îro ha sibê!... Ji hinga tu xwefam bûyî te bavê xwe dîtîye, ji niha û şûnde wê rêveçûna te jî wisan be! Lê belê şîreta min a herî girîng li te ev e, ku li her gundek û bajarek tu ji xwe re maleka ava saz bikî. Û tuxwe fahş nekî û ji rêçika bavê xwe dernekevî!

Mêrik sermîyantîyamalê dixe destê kurê xwe û tewqeyê tiştek nabe. Mixabin çewa ku kurê wî dibe sermîyan, her ku diçe û xelk ji wan diçixe, dan û standina wan û xelkê kêm dibe û ber bi tenayîyê ve diherin!

Kur jî pê dikefe li her gund û bajarekî xanîyek ava dike! Deh gund, bîst gund, pazde bajar, bîstupênc bajar!... Dawîya gund û bajaran jî

nayê! Li kur xanîyê ku ava kirîye jî, wisan riqîrût dihêle û diçe, li devereka din xanîyekî nû ava dike! Wisan bû ku ewî dewleta qirase li tev li çêkirina xanîyan xerc kir û feqîr ket, li parsê hesilî û birçî man!

Bavê wî ketîye ser gopalan, çavên wî kor bûne guhên wî ker bûne. kalê firq dike ku ew dewleta mezin î bêhempa ji dest çû! Ew ba kurê xwe dike û dibêjê:

-Lawê min! Gava min te kir sermîyanê malê, dewleta me wek malê dewleta Elî Osman bû! Niha ez dimeyîzînim ku tu li parsê hesilîyî! Ev te çi ji vê dewletê kir.

Lêwik dibê:

-Bavo! Min qewîtîyên te anîne cî! Min li her gundekj û bajarek xanîyekî ava kir! Sermîyanê min tev li avakirina xanîyan çû û niha em jar ketin! felekê ber ji me gorand!

Bav dibêjê:

-Lawê min! Qey min gotibû te xanîyan ava bike! Min gotibû ji xwe re li her gund û bajaî maleka ava saz bike! ! Gund û bajarên Kurdistanîyê bêhejmar in lawê min! Ev dused sal in ku Osmanîyan welatê me zevt kirine û wan bi xwe jî, li her gund û bajarên welêt xanîyek ava nekirine! Ma tê çi bikî ji xanîyên rût, tût, neee!... û kalê can da haziran

# MA" HELHEL" BI TE MABÛ!

Carekê di navbeyna du beran de şer diqewime, herdû jî xwe di paş çeperan de vedişêrin, di tabî û kozikan de pîj dibin, li hev û dû tivingan sererast dikin û dibe qurmînî û gumînî berikan li hev direşînin. Ew roj şêrekî were diqewime ku kes nikare rabe nanek yan avek bixwe, vexwe yan jî pêwîstîyeka xwe pêk bîne. Kî ku ji kozika xwe weke çûçikê serî bilind dike, berik li nîvê enîyê dikeve. Pirî ku herdu ber jî şerûd û şervan û nîşançî bûn.

Zilamekî navgundî hebû. Ew jî diçe sedestî şer, li cîyek bilind xwe dixe ber tehtekî de û li şerê temaşe dike. Lê belê ji şervanan, ji dengê tivingan pêve, tu his û pis ji kesî dernakeve. Çi cara ku berik li yekî dikeve, wek murxî li erdê diperpite û dimire! Ewê navgundî jî hema dibêje:

-Helhell! !

Ew gelek car wê gotina xwe tekrar dike û tevên şervanan pê dilıisin. Ji wan wekirê ku xwedîyê wî dengî tenê kuştinê dike. Belam ew «Helhell....» tu nabêjî ku vala ye û ji kêmaqilîyê ye.

Şervanî ji ber hev û din radibin, şer kuta dibe û li qada şer cendekê

heft mêran li azîyê dimîne. lêşker tên cihê bûyerê, herdu teref jî civandin û îfadeyên wan girtin. Ew ji kî dipirsin, dibêje ku:

-Di şer de dengê tu kesek nedihat , ji bilî dengê Navgundî! Hew ewî tenê digota: Helhell, yekî din jî!... Û me didît ku wa yek li erdê diperpite!

Leşkeran Navgundî girt û birin. Li dadgeha xwe îfadeyên wî nivîsîn û lê rast kirin ku ewên mirî tevek wî kuştine. Navgundî avêtin girtîgehê û ma!

Tiştên nebûyî bi ser meriv ve were, gelekî zor e. Ew navgundî hema di nav girtîgehê de diçû -dihat û xwe bi xwe digota:

"-Ma helhell bi te mabû! Tu bûyî qurbana aqilsivikîya xwe! Çi were serê te heq e û misteheq hê ji para ye!..".

# MIRINA MÊRIKÊ NEMÊR

Zilamek hebû lê nemêr bû. Bi ser ve gelek sal çûbûn û ne dizewicî. Çimkî ew ne diwêrîya ku bizewice. Xelkê li wî gelek itaban kir, ew mecbûr ma ku ji xwe re jinekê bîne . Lê belê bi nemêrantîya wî kesek nedizanî.

Pîrek hebû, qîzeka wê bitenê hebû. wekî din tu kesekî wê tunebû. Ew mêrik ji xwe re fikirî û mitale kir, got:

-Ya herî rind ji min re ew e ku ez herim ji xwe reqîza pîra bê kes werînim. Jibo ku kesekî wê tune ye, wê keça wê li nik min bi vî halê min ve tebat bike. Eger ne, ku jineka din be, qîma xwe bi vê rêwşa min nayîne!

Ew mêrik çû qîza pîrê ji xwe re xwest û anî. Her êvar çaxê razana qitikekî dixe nav derpîyê xwe û ji jina xwe re dibêje:

-De xweş razê! Eger turanezêyî, ezê te bi vî xirrê xwe yê gir ji hev biqelêşînim!

Gava qîzik di nav derpêyê mêrê xwe de "xirrê gir" dibîne, dibehite û lihêfê dikişîne ser serê xwe û radikeve. Mêrik jî, pişta xwe dide jinikê û radikeve. Hetanî sibê ne ji jinikê û ne jî ji mêrik tu his û pis nayên! bi vê rewşê bi ser qîza pîrê ve gelek roj derbas bûn. Rojekê pîrê çû nik qîza xwe. Jê, pirsa mêrantîya mêrê wê kir.

Keçikê ji dîya xwe re got:

-Dadê, pa nebêje xirek mezin li wî malxirabî ye, qey tu dibêjî martek bi wî ve ye! Ez ji tirsan newêrim ku bi şev xeberdim û hema lihêfê dikişînim ser serê xwe û di xew ve diçim!

Pîrê fêm kir ku zavayê wê nemêr e. Ewê ji qîza xwe re got:

-Kezîya te kurr be, ma te tirba quzmiryan li kur dîtîye, heta ku tu jî bimirî? Vê carê ku hat û wisa ji te re got, tu jê re bêje, «tu ji ba bavê xwe bê minet î.»

Piştî ku pîrê vegerîya mala xwe, êvarkî mêrê jinikê hate nik wê û weke hercar jê re got. Keçikê ji mêr re got:

-Tu ji ba bavê xwe bê minet î, ka te tirba quzmiryan li kur dîtîye ku hetanî ez jî bimirim, ne!

Pêre pêre mêrik zanî ku jinik bi nemêrbûna wî hesîyaye. Çokên wî lerizîn, çavê wî tarî bûn, bevzê wî qelibî hema got repp li erdê ket û di cî de mir!

# CIYÊ BÊ SÊRTÎ

Zilamek hebû. Ew li gund û bajaran pir digerîya. Ew bi kur ve biçûna, laqî sêrtîyan dihat. Pirî ku ew ji sêrtîyan qehirî bû, rojekê ji xwe re got: «Pêwîste ez herim cîyek ku sêrtî li wir tune bin».

Ew zilam çû hinek cîyên were vala ku meriv li wir tunebûn. Zilam bala xwe dayê, ku waye çend heb sifarçî ji Sêrtê hatine wê li wir in û teq reqa wan e bi çakûç û taqmoqan, sifrên kevnare ji binê erdê derxistine, ewan rast dikin û qela dikin. Mîrik li tayêta ji wir vegerîya û li şopa xwe ji pa re kudand. Piçtre ewî xwe bi xwe ji xwe re got:

-Ya herî qenc ew e ku ez herim têkevime heya kerê de. Ancax li wir wê sêrtî tune bin.

Ew zilam çû xwe giştande makereka pîr. Ji paş ve, bi herdu kêvîyên heya wê girt û serê xwe kudandê. Ewî bala xwe dayê ku ji paş ve, yekî Sêrtî kir gazî got:

-Men fî ewnok? (Ew kê ye)

# MÊRGMEQES

Carek ji cara xêr û xweşî bibare li guhdara. Zilamekî gundî hebû, lê jina wî ji bajarê Bedlîsê bû jinêkê her tim bi çavê bajaryan li xwe dinêhirt, û bi çavê gundîyan li mêrê xwe dinihêrî! Ewî ji jina xwe re çi bigota, wê li tersê wî digot.

Rojekê jinik çû mala bavê xwe zeyî, mêr çû da ku wê bînemal. Jinik li hespê siwar e ûmîrik ji seyîs e ew dikavine rê û tên mala xwe. Li bindestê Bedlîsê li ser kevîya çem, ew di ber mêrgekê de derbas dibin. Ew hê

nû ye ku xwedîyê mêrgê, bi tirpanê gîya jê dirûtîye û rûyê mêrgê dûz - hilû ye. Mêrgwisa sawî dixweyê qey meriv dibêje, bi makînê yan jî bi meqesê gîya jê dirûtine, hewqas hilû û delal tê dîtin. Jinik ji mêrê xwe re dibêje:

-Ha ewko! tu dibînî çewa ku vê mîrga qirase bi meqesê dirûtine!

Mêrê wê dibêjê:

-Ma mîrg bi meqesan têne dirûti? bi tirpanê dirûtine!

Jinik dibêje: Bi meqesê dirûtine! mêrik dibêje: Bi tirpanê! Werhasil çiqas mêrik dibêje tirpan, jinik, jî dibêje meqes! Mêrik ji jina xwe re dibêje:

/Tu careka din bêjî meqes,,ecê te bavêjim golê!

Jina wî dibîje:

-Eva wele ku ne meqes be, ev mêrg bi tirpanê wisa xweşik nayê dinûtin!

Mêrik kir û nekir, jinik ji rik kû miqersîya xwe ya meqeaê nehate xwar.

Di kêleka mêrgê de goleka gerîne heye. Li serê timî kef û kunc e. Weke ku av bi binî ve dinixwire, hema li hev digere. Mêrik dehfek lê jina xwe wê ji ser hespê anî xwar. Wê kaş kir û bir ser hindefê Çem. Mîrik wê avête golê. Jinik kete berzirpa gerîekeê û avêwî kişand bi nîvê golê ve. Ew ji nîvê gerînekê di niqo dibe, ew destgekî xwe bilind dike û du heb pêçîyên xwe hema wek meqesê vedike û digre, vedike û digre!... Yani ewj bi vekîrin û girtina pêçîyên xwe, ji mêrê xwe re dide zahîn ku mêrg bi meqesê hatîye dirûtin. Hetanî ku jinik di golê de wenda dibe jî pêçîyên xwe wek devê meqesê vedike û digre. Piştî ku jinik niqo bûye jî, mêrê wê li ser hindefê Çem hema dibêje: Tirpan, tirpan!...

(Li ser vê bûyerê, xelkê herêmê navê wê mêrgê danîne "Mêrgmeqes". Ew mêrg di navbeyna Kevirê Qul û Bedlîsê de ye)

# GOŞTÊ BÊ XWÊ

Rojekê zivistan e, berf bêqedar hatîyeû kurşe girtîye. Zilamek li taxwûka xwe siwar dibe û berê xwe dide bi alê çîyê ve diçe. Ew zilamdi navbera çîyan de rîya xwe şaş dike û bi ser rîya gundê xwe venab. Ha ku ew dibîne laqê bajarek î mezin dibe.

Zilam dikeve nav sûkê û ji xwe re digere. hema li hewîdorê xwe hema dinihêre û şiqiz maye. Çimkî heta wê gavê ewî tu bajarên were miezin û fireh ne dîtîbû. Zilam di nav sûkê de bi kur ve diçe, û laqê kê

dibe, her kes di xidûkîya (perîşanîya) wî de jê fam dike ku ew ne alê bajêr e ûhebe tunebe, çîyayî ye!

Ew zilam pirîya kurêveçûneka dûv -dirşj kiri bû, di navbeyna çiyan de gerîya bû, gelek birçî jî bûbû. Ew berêî xwe dide aşxaneyekê ku nên bixwe. Tu nabêjî, ew dikana ku ketîyê de, dikana koşkal e. Ewl li xwedîyê dikanê silav dike û dibêjê:

-Pismam! ma çi xwarin li dikana te heye?

Koşkal bi dengê mêrik re ku behsa xwarinê dike, weka ku ji xew vecinîqe, diveceineq û bi balkêşî lê dinihêr. Ew ji wî fam dke ku izlamekê xerîb e û xelkê çiyan e. Dibêjê:

-Bira wele li dikana min bitenî goşt heye!

Mêrikê rêwingî dibêjê:

-Ma jê çêtir? Ka ca tu sênîyekê ji min re tije ke gotş!

Xwedîyê dikanê dibêje:

-Li dikana min sênî, lengerî, teyfik, sihan sahnik û tas tune ne, firaqên min tevek elb in, modern û nûderketî ne, ezê di wan de goşt bidime te!

Koşkal hinek çermên qalind ji bo pînekirirna binên solan ku xistîye elbikê de da ku di nav avê de nerm bibin datîne ber wî .

Ew jî dikeve ser wan çerman û dixwe. Di ber diranên xwe de dibe û tîne. dike diçû û na ke, ji hev nabin. Bi çi kul û halî ve, ew ji wen têr dixwe. Di pey kutakirinê de, radibe da ku here berê xwe dide xwedîyê dikanê dibêje:

-Ha pisman! tu nebêjî ku vîha fam nedikir ha wele goştê te bê xwê bû

# ŞERÊ KURBAVKUJÎ

Carekê du bira hebûn, linik hev diman; yek jê du kurên wî hebûne û yek jî kurdûnde bûye. Herdukan bi hev re kar û barên xwe dikirin û jiyana xwe derbas dikirin.

Rojekê herdu bira digel herdu kuran ve diçin çolê, ji heywanên xwe re gîy didûrin, ereba xwe bar dikin û vedigerin ku werin mala xwe. Bavê kuran li ser erebê siwar e û lipêşîyê tê. Ew li pey xwe dibîne ku bira û kurên wî nehatin, hema li riya xwe vedigere û ji para diçe. Mêrik laqî wan tê ku wanê herdu kûrên wî li apê xwe dixin. Hema ew tivingê ji milê xwe tîne xwar, rûdine û li herdu kurên xwe sererast dike, pêçî lî tetik dikşîne û dibêje;

-Qey çima ez ne kurê bavê xwe me! Ûn herdu bira alîyê hev dikin û ez alî birayê xwe nekim?

# BAVÊ HEFT KURAN BÛ LÊ KURDÛNDE BÛ

Rojekê zilamek diçe mala dostekî xwe. Çaxê xwairnê tê û xwedîyê malê sifra xwarinê sererast dike; li iyekî heft heb kurên wî dikevine ser xwarinê û li alîyê din jî ew û mîvanê xwe, dest pê dikin.

Mêvan bala xwe dide wan zarûkan, ku li ser xwarinê ew bê pê pêjn û b9 his ji xwe re rûniştine û xwarina xwe dixwin. Ew ji bavê zarkan re dibêje:

-Bira! Tu kurdûnde yî! Ji xwe re bizewice. Ji bo ku zarûknaji te reçêbibin!

Bavê zarûkan dibêjê:

-Ne ev zarûk tevên min in!

Mêvan dibêje:

-Ez dizanm ku ew ên te ne! Belam ez bala xwe didim wan ku liser xwarinê kistînî ji yekî ji wan dernakeve. Bo vê yekê ez tu xêrek di wan de nabînin,! Pêwîste ku tu ji xwe re bizewicî, bila hinek zarûvên jîr ji te re çê bibin, eger tu xwe li pawakaa van bihêlî, xwe kurdûnde hisêb ke!

# TIRKIYA ŞEVÊ

Carek cendirmên Tirka, bi şev davêjine ser gundekî! Ew li gund bi kî re dipeyivin, yekî ku bi zarê wan zanibe, tune ye. Keyayê (Muxtar) gund ji xwortekî re dibêje:

-Ero la lawo! Ka ca here gazî apê ewko bi ke! Ewî, ji tirkan re li Yemenê eskerî kiri bû! NIha ew bi zarê wan dizane! Bila were bi van segbavan re bipeyive! Ka ew vê şevê çi ji me dixwazin!

Ew xwort diçe ber derê mala wiyê tirkîzan û li derî dixe. Mêrik ji xew şiyar dibe û ew jê re, meselê dibêje. Ew ji xwortike re dibêje:

-Hêêêêuuu! Ma ez rebenê Xwedê çi tirkîya şevê çi diznaim ku werim bi cendirmeyên tirka re bipeyivim!

# HÊJÎRAN DIXWE Û VIRAN DIKE

Rojekê zilamekî rêwingî di herêma Torê re derbas dibe. Pirîya ku ew birçi û tî bûye ji kas daketîye. Riya wî dikeve navbeyan baxçe û bostanan de; li herdu alîyên rê bi daran ve fêkî sor û zer dike; ji sêvan, hirmîyan, hizîranîyan, hêjîran, mişmişan (Zerdel) û bi mêwan ve guşîyên tirî bi gulyan ve were berjêr bûne, nefsa wî dikele û dilê wî dibijê. Xasma gava ku ew hêjîran bigulîyên daran ve dibîne, hema ew di ser sêncê de hildiqevize û dikeve nav baxçeyekî de. Ew hildikişe serê dareka hejîran û dixwe. Keçika notirvan dibîne ku zilamek hilkîşea serê dara hêjîrê, bang dikê û ber pê ve diçe:

-Hêêê! Ew kî ye li serê dara hêjîrê! De peya be xwar!

Zilam hîç deng nabe xwe. Ew li xwarina hêjîran didomîne, Keçik bibezê tê li binê darê disekine dibêje:

-Hey kurê kerê! De peya be ji serê darê!

Mêrik ji keçikê re dibêje:

-Keçê hiş! ez werime xwar, ezê di te kim1

Ew peyva zilêm li keçikê hinek xweş tê. Keçik xwe bê pêjn dike û dipê. Mêrik jî li serê darê zor dide hêjîran û dixwo. Keçik qederek dimîne, mêrik nayê xwar. Ew dîsa dibêje:

-Hey kurê kerê! de ji serê darê peya be!

Mêrik dîsa dibêjê:

-Keçê hiş! Wele ez werime xwa ezê di te kim!

Keçik vê carê bi nermî dibêjê:

-Heına hêjîran dixwe dixwe û derewan dike!

# ŞÊX ÇÛBÛ HERBA QIBRISÊ

Zilamekî pur qeda û jar hebû. Rewşa jîyana şêxantîyê ketibû dilê wî de û ewî biryara xwe da hu wê ew bibe şêx. Lê belê ew li welatê xwe nedkirîbû uşêxantîyê bike. Ew rojekî radibe û berê xwe dide bajarê Wanê. Ew xwe dixwegirêdana şêxan de û li taxekê ji xwe re xanyek kirê dike û rûdine. Gava ew diçe der jî, şemlek tavêîje ser serê xwe û xwe jî bi dernaxa ku hinek bibînin! Di nav çaxek hindik de li dormadorê bajarê Wanê nav û dengêşêxantîyawî belav dibe. Ji nivîştan bigir heta pêrekên ku zarû nayînin, j her tiştî re ewî derd jû derman diîta. Ewî nivîşt, hemayil, berbejn, tayê bayê, reşkirina enîyê, nivîsandina li ser pişt û zik

û hwe çiya hene ewî çêdikir. Ji şêx re wisa li h ev dihat mîna ki kew li dar bikeve.

Polîsek liWanê heye. Jina wî sitewr e. Tixtorek nemaye ku ewî jina xwe nebirîye cem û jê re tu çare nedîtine. Jnika gewre çewa nav û dingê şêx seh dike, radibe û diçe cem û.

Ew derdê xwe yê bê derman jê re dibêje. Gava çêx çav bi jinikê dikeve, dilê wî dibijê û dike nake hêşerîyê wî di nav şalê wî de zevt nabe. Şêx ji jinikê re dibêje:

-Keça min! Şeveka ku mêrê te ne li mal be, tu xwe li ser textê xwe çîp tazî bike, herdu ling û milên xwe ji hev dûr bike, derê xwe vekirî bihêle, û razê. Ew şev wê milyaketek were mala te, rû û şaşika wî eyni wek yên min in. Nebî nebî ku tu bitirsî, wê ew milyaket li te dakeve, wê Xwedê kurekî salih dide te. Lê belê ku tu ji hinekan re bêjî ev derman betal bibe û tu nemê îdî ku zarok jî tînî.

Jinik ji şêx re dibêje:

-Jixwe zilamê min di şevan de kar dike. Her şev, ew ne li mal e. Hema ezê îşev were bikim.

Jina polîs ji şêx xatir dixwaze û dizivire mala xwe. Lê belê jinik bikêfeka were tê mal û di dilê xwe de zarûkan difilire, wan dide ber dilê xwe û bi wan kêfxweş dibe! Ew giha mal, mêrê wêjî limal rûniştîye. Ew bala xwe didê, ku jina wî pur bi kêf e, lê şaqiz dimîne û dipirse:

-Hanimçika min xêre îro tu pur bi kêf î?

-Zarûûûk, zarûûûk, ez ê zarûkan bînim!...

Bi gotina wê re, tirpînî ji dilê polîs tê. Ew di dilê xwe de dibêje «Gelo ev jî neçûbe nik wî şêxî». Polîs bi melaqîyan, jina xwe dide xeberdanê. Jinik mesela xwe û şêx jê re dibêje. Lê belê polîs qet ding nake, dibe êvar û wek hecar ew radibe diçe karê xwe. Jinik jî tebat nake ku bibe şev û çewa ku şêx ji goytîyê were bike.

Mêrik polîs wê mesela jina xwe û şêx ji hevalên xwe re dibêje. Wê şevê nijdeyek polîs tê li dor mala wî nobet digere. Hayû gumana jinkêjê ji tune. Derengîya şevê polîs bala xwe didinê ku wanê şêx hat û berê xwe da hundur û ewî di ke ku bikevê de, pê di girin. Ew li şêx dixin heta ku li erdê dibe term. Ew şêx avêjin ciba xwe û dibin davêjin gola Wanê.û şûnde vedigerin

Şêx di nav avê de çima bixwe ve nayê! Ew xwe kaşê kevîya golê dike û liwir dimîne. Lê belê pirî ku lê dane her derê wî birîn bûn û taqet tê de nemabû, ku rabe pîyan, hema li erdê vezelandî dimîne hetanî sibê. Roj li şêx davêje. Xelkê herêmê diçine nav baxçe û parêzên xwe. Hinek li kevîya golê gewdê şêx dibînin û jê dipirsin:

-Qurban evçi halê te ye?

-Aaaaxx! Qet mepirsin! Ez çûbûm herba Qibrisêî, di herbê de ez birîn bûm, ez hatim ku herim malika xwe, di ser golê re derbas dibûm, êdî ez ji taqet de ketim û hûn halê min dibînin.

(Ev bûyer di sala 1974'an de li Wanê qewimîye)

# DESTEBIRATIYA MAR Û HECÎ

Digotin carekê zilamek hebû. Di hinduruyê mala wî de li nêv kewarê quleka marekî hebû û çiqas roj, wî marî ji xwedîyê malê re zêrek ji binê erdê dianîder û dîsa vedigerîya qula xwe . Li gor gotinan, xwedîyê mlê û mar, gelek caran bi hevdure, bizimanê hal dipeivîn û qala kar û barên dinê û axretê dikirin. Herdukan destên biratîyê jî dabûne hev.

Ew zilam were dewlemend bûbû kuêdî nedihate libatê. Lê belê xwedîyê malê, tu kesekî ji bi destebiratîya xwe û mar ne dihisanda û jin û zaûkên wî jî pê nedizanîyan.Pirî ku perên wî pur bûbûn, hewhya wan pê re neidhate û canê wî dixwirîya. Mêrik biryara xwe daku wê here hecê.

Mêrik, kar û barên rêwitîya hecê kir. Ji xwe re digot :«Çewa hebe heta kuez ji mala Xwedê vegerim, wêdestbirayê min kewarê tije zêr bike, ezê ewêzîya mesrefê riya hecê derînin,!»

Mêrik, bi karwanê devan re, berê xwe da Hîcazê. Kevirê reş tu li kurî ez hatime tewafa te!... Lê belê destên wî timî di dilê wî de bûn û hema ji xwe re digot û dibiland: «Tafil kurê min î mezin bi mar bihese ûqisûmatekê bîne serê wî, yan jî were serê lêwik!» Çimkî kurê wî yê mezin, kurekî pur nahs û neseqirî bû.

Çewa mêrik diçe bi rîya hecê ve, kurê wî yê mezin, li hindurûyê xênî, li perên bavê xwe yên veşartî digere. Lidor wê kewarê diçe û tê, ha ku dibîne, marek li ber kewarê xwe kirîye kilor û serê xwe danîye ser nîvê kilora xwe. Lawik hema yekê nake didu û das bilin dike, heta ku birî têde heye, li nîvê kilora mar dixe. Ji alê dûvê mar ve, weke du bihostan jê tê birîn. Mar jî xweçengê wî dike û pê vedide! Lawik, dibê fîdirim û li erdê pêj dibe! Ne îsal, weke kuev heft sal e ew mirîye! Ew çend roj in, ku mar zêran derxistîye, li ser hev kom kirîye, tu kesek wan hilnedaye, mar jî miraq kirîye, ka çima destbirakê wî zêran hilnedaye!

Li ser mirina lêwik, di malê de, şûn û girîn dest pê kir. Termê lêwik anîn şûştin, kefen kirin û birin xistine tirbê de. Xelk di hatin serxwşîyawan, û fatîhe ji lêwik re dixwendin û digotin serî we saz be!...

Piştî şeş mehan, xwedîyê malê j rîya mala Xwedê vegerîya. tevê gun-

dîyan dîsa çûn serxweşîya wî û ewî tewaf kirin. Kijanê gundî ku tê jî, berê pêşîn, nav kefa destê hecî ya rastê maç dike û fatîhe ji lawê wî re dixwîne. Hecî ji xwirme, kulek, tizbî û ava Zimzim didê! Gundîyan ji hecire çewa ku mar bi kurê wî vedabû, gotin! Di dilê xwe de got: Hey ji xwe kur çûye, ez bawerim wê zêr jî ji destê min çûbin! Hecî çewa ku li ber marê xwe dikeve, hewqas li ber kurê xwe nakeve!

Bû derengîyaşevê, civata hecî belavbû, hecî rabûçû ber kewar û gazî marê xwe kir! Berê pêşîn, ewî destê xwelinav kewarê maland. Na xêr zêr li wir çi dikin! Ma serê xwe ji qulê dranî. Wî û hecî kêfxweşî li hev dan. Lê belê hecî jî ponîjdaye û mar jî!...

Hecî got:

-Birakê mar, her çiqas kurê min naşîtî kirîye, ku dûvê te qut kirîye û te jî wî kuştîye, dîsa wek berê emê bihev re destebiratîya xwe bimeşînin!

Mar bi ser hecî ve zivirî û got:

-Na hecî! Heta ku ez li dûvê xwe yê qut binihêrim û tu jî li kêlika kurê xwe yê mirî binihêrî, ez û te, em nikarin li hev û dinê binihêrin.

# SERGINDOR

Li gundekî zilamek heb navê wî xi ço bû. Ew jî du heb jinên wî hebûn. Her du jinan li gelek manî û srgiranî dikirin. Jinekê hertim xwe nexweş dixist û digotê:

-Ez nexweş im, xedar im, Xiço min bive tixtor!

Jina wî ya din jî hetim digotê:

-Ez tazî me xiço ji in re kincan bikire, min bive bajêr nik terzîyekî, destek cilê ademaqilî ji min re bide dirûtin!

Ji bier van hawayi, herdu jin jî hertim jixiço bi xeyd bûn, tu kar û îşek nedikirin, tev di stûyê wî de dihiştin. Xiço pur qeda bû, şeylillah jê re tune bû, heta neynok tune bûn ku xwe pê bixwrîne, û dûvê mişk di mala wî de ne dibû bi arvan!

Rojeçê Çeto jixwe re rûşnişt û xwe bi xwe fkiirî. Kûr çû, nivz çû, rast çû xwar çû, daket û derket, werhasil di dawîyê de wî ji xwe re vê ramana han hilbijart jû ji xwe re got:

-Ya herî çak ew e ku, ez îşev têkevim paşila herduwan jî û hikm û hinerê mêranîya xwe ya berê rayê wan bidim! Ekene, felata min ji destê van bibavan tune ye!

Bû êvar, çaxê raketinê hat. Ew çû xwe xist paşila ya nexweş Werhasil êrîş û derbênuî giran de, çewa ku jinik di xew ve di çe, xiço xwe ji bin li-

hêfa wê bi dîzîkan dikişîne der û diçe dikeve paşila jinika din. Çi mêanîya wî ku mabû, li wê jî di dericine ! Hew ku Xiço dibîne dîkên sibê lê dixulxulînin!

Zû zûka Xiço rabû, beroşê danî ser kuşik, xacirgat danî bin de, çend taran jî şikênand xiste binî, hinek beyarîk xiste serçavîya kuçik, kevir û hesteyê xwe ji berîkê derxist û jenand, pûş çirîskan girt, agirê şorbê vêxist, nîska pê dakir, çengek xwêya kara Sipî jî avêtê, da ku kela şorbê ne fûre, û berê xwe da jinika nexweş, gazîkirê:

-Hirmet rabe zû karê xwe bike, wanê şorbe kelîyaye em taştê bixwun, da ku îro ez te bibime tixtor!

Jinikê berê xwe da wî û gotê:

-Mîna ku îro hebekî ez baş im perên te jî tune ne, hema li hêvîya Xwedê bihêle, dev ji tixtor berde!

Xiço jixwe re di binê simbêla de kenî û jxwere got:

-Bi xêra îşev, evê ji tixtor qerî! ma ya din, çika mêzekim ka ew çi dibêje!

Û gazî wê kir:

-Hirmet, hirmet rabe karê xwe bike, em taştîya xwe bixwun û îro ez dê tebibime bajêr licem terzîyekî ji te re destek kincê ademaqilî bidime dirûtinê!

Jinik ji nav cîyê xwe bê his û pis rabû, ji xwewa çavên wê venedibûn, vegerî bi ser Xiço ve û gotê:

-Heyran, ev kincên li min niha pak in, bi pîne -mînan ezê bidirûm, îsal jî ezê bi van îdare bikim, tu feqîr î, gune yî jû perên te ji tune ne!

Xiço êdî ji kenan xwe negirt û ji xwe re bi dengekî bilind kenî. Li be ragirê kuçik rûniştî ye, qelûn di dev de ye, kulpîna duwê çixarêye bi ser xwe ve berdide, doxîna xwe vekir bi serê çûçikê xwe girat û jê re got:

-Ez qurbaanooo sergindooorooo! hem terzîyoooo hem tixtooroooooo!

# BILA LÊ XE

Carekê di zemanê Osmanlîyan de zilamek hebû wî girtin û birin eskerîyê. Şûna eskerîya wî zilamî liYemenê bû. Ew zilam heft salan li eskerîyê ma. Gava ku ew esker bû, bi ser welatê wî ve, xelaya pêşîn rabûbû û ji mala wî heft kes miribûn. Jina wî û du heb gedeyê wê tenê ji ber xelayê filitîbûn. Tu tişt di malê de tunebû ku bixwin, hew bi gil û gîyayê ewan jîyana xwe di buhurandin.

Werhasil, mêrik biçi kul û halî ve eskerî qedand û hate mala xwe. Gava ku hate malê, çi mêzeke! Jibirek zarûkên wî, du heb bi tenê mabûn. Ew jî, qey meriv digot rovîya ji qûna wan kişandine, hewqas ku qels û jar bûn. Mêrik ji xwe re vir de, wê de çû û hat, hinek genim peyda kirk bire aş, hêra û anî malê.

Axê gund, ji wî re got:

-Îsal ezê odeyek mezin çê bikim, ji nim re deh hezar kelpîç lazimin, di gundê min de yê jfeqîr tû yî, ez dixwaizm ku tu kelpîçên min bibirî!

Mîrik di ber kelpîçan de ye û dibire. Rojekê, jina wî firavînê dereng anî. Mêrik qurequra nava wî ye ji birçîya . Ew kas ketîye erdê û taqet tê de nemaye. Di pye qederek xweş de, bala xwe dayê, ku jinikê firavîn anî û hat. Jinikê dew jî ji mala axê anîye bi du nan û pîvazeka sor ve li ber mêrê xwe dnaî. Mêrik hema yek û didu nekir, rahîşte darekî û li jinikê da. Di nav lepên wî de, bû qîreqîra jinikê û kire hewar û gazî. Zilamekî gundî bala xwe dayê ku ew li ber kelpîçan lijina xwe dixe, bazda ku nehêle ew li jinikê bixwe. Mêrikê navbeynçî bimilê zilamê jinkê girt û gotê, «ji bo xatirê min lê mexe!»

Jina mêrik berê xwe da yê nevbeynçî û gotê:

-Birako jê biqere bila limin bixe, min derdê bêmêrbûnê pur diye!

# "ÇI FIRQA GUYÊ MIN Û YÊ ŞÊX HEYE?"

Rojekê li dîwana şêxekî hinek sofî civîyane, çaxê hinêjê tê diçine derve ku desmêj bigirin, da ku werin li jpey şêx limêj bikin. Di tuwaletê de çima sofîyekê kal û kût tera nav pîsîtîyê nabe! û rûyê wî tevek dibe bi gû. Gava ew derdikeve, sofpyên din bi rûyêwî ve gû dibînin, hema tev bi hev re xwe dihêlêqinê û destên xwe lê dixin û dixine devên xwe:

-Ev gûyêşêx e, henıû tebarek e!

Sofîyek di nav wan de heye, mîna ku hebek hişê wî li serê wî ye, ew ji hevalên xwe re dibêje:

-Heyran! gû, gû ye û necis e! Ma çi firqa guyê min û yê şêx ji hev dinê heye?

Ew sofî gava were dibêje nabêje, yên din tev bi hev re kişîmê wî dikin û lê dixin. Ew ha hakê direve û xwe digîjîne dîwaneû dikeve pişt şêx de, mesela xwe û sofîyan jê re dibêje. Sofî tev tên li dor şêx tind didin û dibêjinê:

-Ezîzê dilê me, ew hevalê me bûye munkir û ji dîn derketîye!

Gereke tu wî bidî me da ku em wî bikujin! Ewî tiştek wesan gotîye kunayête gotin! Kuştina wî helal e û bûye kafir!

Şêxê bi şaşikû rûdirêj, ji wanakan re dibêje:

-Belê rast e gû gû ye! Firqa gûyê min û yên we tuneye! Ez jî diçime tuwaletê dirîm û hûn jî...

# MELE Û FEQIYÊN WÎ

Hebû carek ji caran, ne ku hûn bikin bawer ji vê çîroka han, lê ez dibêjim wek hemû çîrokan.

Li gundekî meleyekî heftilm hebû. Di xedindenga (xwendegeh) wî de, li dor sed feqeyî hebûn. Feqîyên talib, mintehî, yên ku xwendina wan li jêr, di her dereceyê de hebûn.

Sibekîyan zû, bi despêka rojê re, hetanî derengîya şevê, Mele dersa feqpîyan dida û dijpey de, li mala xwe şevlimêjan dikir hetanî fecra sibê. Yekcaran Mele dikete nav livîna xwe, hinek xirmaş dibû yan nedibû, wekî din, şevên xwe wiha derbas dikira.

Rojekê êvarê tayînên feqîyan tev de goşt bûn. Di pey xwarinê de, hestîyên xwe avêtin quncikî xwendegehê. Piştî ku dersdanê wan çû mala xwe, û jwan jî mitaleya xwe qedandin, çend heb feqîyênpiçşk wek henekî kûçikan, bi wan hestîyan ve leyîztin. Yek ji wan, hestîyek dixe devê xwe û dibe miremira wî! Yên din jî li dorê diçin û tên û dibe kastekasta wan. Ji wan henekan re, balkêşîya tevên feqehan çêdibe û bi hev re tev xwe davêjine nav leyztikê de. Încar ê mezin kîjan e, ew hestî dixe devê xwe de û yên din li dorê kastekast dikin. Ê dawî mîrê wan me, ew jî hat kete nav û xwe li sitûyê ê ku hestî di dev de ye xist, wî avête erdêj û hesî ji dev deranî. Qêrîpn û zûrîn û hewtehewta wan bi ser tevê gun ketîye.

Di wî wextê de, dersdarê wan derketîye der, ku avek birijîne. Ew bala xwe didê ku waye ji asîman ve sitûnek nûr xwe berî ser xwendehehê daye û şemate jî, ji wê ve têt, hema Seyda, serqot û pêxwas ber bi wan ve dibeze û diçe dişibakê de li wan dimeyîzine ku waye, feqîyên wî ji xwe re, leyzteka segan dilîzin! Mele jî xwe bi gurrikî, li derî dixe û di keve hundurû. Çewa ew gihaşte mîr, wî davêje erdê, hestîji dev dertîne jû kire miremir!

Feqe gava dersdarê xwe dîtin, ji fehêta ji para vekişîyan. Mîr û seyda bi sitûyê hev û dinê girtin û hev lierdê gevizandin. Feqîyan qederekîxwş li herdukan temaşe kin û haw ku dîtin dîkên serê sibê li wan xulxulandin!

# KURTEKIRAS LÊ TÊ

Mele Mihemed miftîyê Farqînê bû. Ew yekî pur xebrxweş û wazbêjek temam bû. Di peyvînê de ew tu caran lixwe heyirî ne dima, hem di camîpyan de hem jî di nav a xelkê de, gava ku dipeyivî, meriv qeydigot, ew li ser kaxizên pirtûkan dixwîne ku were rind û bê kêmayîya bêjeyan diaxivîya.

Miftî rojeka înê di camîya Farqînê de, wazan dibêje. Naveroka wazên wî, li ser sitarkirirna pîrekan e û wiha dibêje:

-Gelî bisilmanan , bila qîzj ûjp;êrekên we xwe tazî û serqot ne in! Ezabdana pêrekan di dojê de yê herî mezin û zor, sedemê serqotkirin ûj çîprûtkirina wan e! Bi vê yeka hûn jî gunehkar dibin!...

Qîzeka Miftî heye, ew mamosteya dibistanê ye, kurtekirasê wê (Mnî etek) li raserî çokê ye, milrût û singvekirî ye, xelkê bajêr jî tevekdizanin! Gava ye, milrût û singvekirî ye, xelkê bajêr jî tevek dizanin! Gava Miftî di vê derheqê de wazan dike, hema sofîyek radibe û dibêjê:

-Migtî efendî, Miftî efendî! mademkî tu were lime wazan dikî, çimatu van wazan li xwe nakî? Berî vêga kuez hatim camîyê, min qîza te dît ku kutekirasek lê bû, çîp û mil ûj sing û serê wê tevek tazî bûn û diçû dibistanê!

Miftî ji wê pirsê qet etleyî neda wazên xwe, û hema bersîva wî sofî da:

-Erê lê, tedît çewa kurtekiras li tê?

# TIŞTÊ KU HÊ BÊ TU GUH BIDÊ

Carek ji cara zilamek û jineka bî hebûn. Ewan lihev dinê tim xiravkiri bûn û dixwestinku bi hev re bizewicin. Ew dipey gelek ji hevşermkirirn û ji hevdûşrevandinê de, rojekê gihaştine hev û ji hev re peymana zewacêî dan.

Mêrik êvarê ba mele kir, ew hat û mara wan birî. Încar mêrik û jinik bûne mêr û jonê hev û din ê rastî. Ew herdu çûn ser llvîna xwe da ku êdî i xwe re razên, lê belê ji hev gelek fedî dikin. Qey tu dibêjî, keç jû xwort ê nû ne, hêj çavên wan bi hev ketîye, herdukan jî tund daye û peyv ji yekî ji wan bi dernakeve. Mêrik xwest ku şerma xwe û jinikê birevîne ûj ewî qala jina xwe ya kevin kir:

-Hey dinyayê felekê xayînê! Rihmetîyê her rtim xwe dida vê kêleka dewşekê, min jixwe dida vê kîleka din û em radiketin!

Çewa ku mîrik behsa jina xwe ya kevin kir, bevzê jinikê vebû û wê jî got:

-Erê wele felekê xayînê! Dinya çerx û dewran e! gava ez û rihemetî jî diçûne ser cîyê xwe, wî jî xwe dida vê kêlekê û min xwe dida vê kîleka din û em radiketin!

Ji peyvên wan dixwîya kujina mêrik û mêrê inikê yên berê herdu jî mirî bûne. Bi van xeberdanan re peyvên wan gelek dirêj bû. Geh mêrik qala jina xwe ya kevin dike, geh jinek qala mêrê xwe yê kevin dike. Pirîya u herdukan jî, derdê bê mîrbûnû bê jinbûnê dîtibûn, di xeberdanê de herdu jî germ bûbû, ha kudîtin dîkên serê sibê li wan bang dan û wêşevê wan tu xêrekji hev jûjdinê ne dît! Mêri, ku carek behsa jina xwe ya rihmetî bikira, jinikêj çar -pênc car behsa mêîrê xwe yê rihmetî jdikir. Êdî mêrik xwe ji xeberdna wê nedifilitand!

Cîyê wan liser inzêlê bû û bayê sehera sibê li wan diweşîya. Mêrik dîn dayê ku dawîya wan xeberdanan nayê, berê xwe da jinikê û got:

-Hirmet ji êvar de, jina min ya kevin û mêrê te yê kevin herdu jî li vir in, ez jû tu jî, em dikine çar heb, ev inzêla me jî ancax cîyê du kesean li serê heye, çê na be ku em çar heb li ser cîyekî rakevin! Hema rabe here û oxir be ji te re!

# XEZEBA DÊLEGURÊ

Dêlegur li quntara çîyê xwe dabû ber berqefakê, têjikeka wê tenê xwe likêlekê pîj kirîbû û bi alîyê deştê ve li kerîyên pez temaşe dikir. Li deştê çar -pênc kerîyên pez belav bûbûnû ji xwe re diçêrîyan. Tevzûnek dihatin dêlegurê, ji kerbagoşt hema diranên xwe disîqirand, zimanê xwe li kêlekên devê xwe dadimaland, miremira wê bû û dikeribî!

Têjika wê jê pirsî:

-Hadadê, di salê de her pezek çend têjkan tîne?

Dêlegurê got:

-Lawo, her pezek di salê de têjekek tîne, yan jî qet nayîne!

Têjikê got:

-Dadê, lê tu di salekê de çend tejik tînî?

Dêlegurê got:

-Lawo, di salê de ez her carê şeş-heşt têjik tînim!

Têjikêj got:

-Ê dadê mademkî ew di salekê de her yekê têjikek tîne û tu heft/heşt têjikan tînî, çima ew hewqas zihfin û yê te hew ez jû ez bi tenê me?

Dêlegurê serê xwe hejand, bû jirrîna wê û gotê:

-Lawo, xezeba kuliber dilê dîya te ye, hê çewa ku tu jî mayî!

# MANIYA NEDANÊ

Niveka zivistanê bû, êzing qedîya bûn sir û seqema ku dihata bi simbêlê zilaman ve şembelîlik çêdibûn û zarûkên ewko ji ser man diqefilyan. Zilamî karê xwe kir, das û bivirê xwe hazir kir, nanê xwe xist tûrik û li ser kurtanê kerê xwe girêda, carek bala xwe dayê ku werîs ne xwîya ye. zilam virde, wirde li werîs gerîya, ew lê cûm û cela bû. Na herê qey ew werîs dibîne. Tu nabêjî, rojek berî mirtiv hatibûne gund, li nav malan gerîyabûn, hatibûne mala wî werîs jimalê dizîbûn. Mêrik ji xwe re heyirî û mat ma. Kerêjwî jî, yekî nêr ê hêşerî ye, hema dike zirînî û pêkolî dike, ew çav bi makeran ketîye û hema kiçîmê wan dike. Mêrik ji xwe re fikirî: «De ka ez ê herim mala cîranê xwe werîsê wan bînim û herime êzingan».

Mêrik çû mala cîranê xwe yê hecî Zişto (hinek jî dibêjin Xoce Nesredi bûye) ku werîsê wan bîne. Ew gihaşte ber derî, dîn dayê ku hecî jî li der desmêja xwe digire ewî got:

-Cîranê hecî siba te bi xêr.

-Ser çavan û seran, tu di nava xêrê de bî.

-Cîranê hecî ma ezêçi di nava xêrê de bim, êzingên me kuta bûne, zarûk ji serman diqefilin, min kerê xwe jî hazir kerîye, da ku herime êzingan, ez bala xwe didimê ku duhî mirtivan werîsê me ji malê dizîne û ez xidûk mame, încar ez hatime werîsê we da ku bibim êzingan!

Hecî yek û dido nekir, go:

-Me garis lis erê raxistîye!

# Ê CARA SISIYAN MELE BÛ

Carekê zilamek hebû, ew bûbû şivanê maleka koçer. Xwedîyê malê kalek ketî û kinanik bû. Lê belê jina wî ciwan bû, û ne teled û weledên wan hebûn. Jinik, sirf ji bo dewlemendîya wî pê re zewicî bû û hilanaîn û danîna malê tevek di destê wê de bû û kalê xwe tewqeyê tiştek nedikira!

Jinik dil dikeve şivanê xwe! Her şev , ew û şivan digîjin hev û çîya ku bivana ewan dikira. Mêrê jinikê yê evdal, weke ku«di guhê ga de» be, gumana jina xwe û şivan qet ne dikir kupêwendîyên wan bi hev û dinêre hene!

Rojekê jinikê gote şivan:

-Bi vê rewşa han, ku em wisa bidomînin, wê xelk seh bike, heromiro li van kaş û kendalan, di nav van teht û kelem û berqefan de, em karê xwe dimeşîniun, haw ku te dît rojekê hinek bi ser me ve hatin! kalê wê in pişik û parî bi ke, ku «parîyê mezin bimîne guh»ê min!

Şivan jê re got:

-Lê em çewa bikin?

Jinikê got:

-Şixwe bi şev temî tu li binîpya malan pez mexel dikî. Ji nihaû şûnde, ezê cîyê xwe û kalê li qeraxa kon, ji alîyê te ve deynim,dema ku ew serî dixe xewê, bi lêxistina defê jî şîyar nabe hetanî sibê, îcar tu bi şev were, ezê li benê kon benekî sor girêdim, bo ku tu şaş nebî, bi ben bigire û bi-hejîne. We çşax ezê di binê kevîya kon de, qûna xwe derînim, tu dê îşê xwe biqedînî û vegerî ber pezê xwe! Çi cara ku tu hatî û te ben hejand, ezê bizanibim ku tu yî! Bi vî hawayî, tu kesek jî bimin û te nahise û emê xêr ji bazara xwe bivînin!

Bi wê rewşa ku jinikê ji şevan re goti, herdukan di binê kevîya kon de bi rojan, îşê xwe di meşandin.

Di wan rojan de wargê ji xwe re meleyek nû girtiye, ew bê jin e û mala wî jî tune û her şevê, malek mele dibine mêvanîya xwe û xwarin, vexwa-rin û razana melê li ser wê malê ye.

Şevekê dora xwedîkirina mele hat mala Kalê. Bû çaxê limêja eşa, tevê koçeran hatin limêjê û di pey de çûn malên xwe. Dilketîyaj şivan, livîna ji mele re li goşeyekî kon danî û cîyê xwe û kalêjî, li cîyê xwe yê her şev danî û xir kirine xewê. Lê belê balkêşîya mele jinika ciwan î teze kişandîye, dike û na ke xew nakeve çavên wî de!

Qederek ji şevê çû û mele şîyar e, carek mele pê hisîya ku xirepişkek tê. Meleyê hêsîr çi binihêre ku jinikê di binê kevîya kon de paşîya xwe dranîye û tilapakî zilaman li piştakon, wî îşê neîş waye bi jinikê re dike. Di pey ku wan îşê xwe qedand de, xwe bi temamî melê herimî û bû no-tirvanêî jinikê. Qederek di wê navê de çû melêdîsa dît ku benê kon hejîya! Dipey hejandinê de, wek cara pêşîn jinikê dîsa paşîyaxwe di binê kevîya kon de, deranî û ji jpaş ve, wî zilamî karê wê da dîtin. Eh melê tam fêr bû ku îşareta êwî îşî hejandina benê kon e!

Mele bêhis û pêjn, ji nav cîyê xwe rabû û bidizî xwe kaşî derve kir û derket, ew rast çû paş kon cîyê benik. Mele bi benê kon girt û hejand.

Carekê wî dît ku jinikê qûna xwe deranî. Melê jî şevan bêtir hikim kir û bhis vegerîyanav cîyê xwe, serê xwe danî û raza!

Serê sibê şivan pezê xwe anî, ser çaka li binîya malan avdanê. Mele jî li ser çayê desmêj digire. Jinik jî satila xwe girt û hat bêrîyê, ku pez bidoşe. Jinkê gazî şivan kir got:

-Haj sêcaro!

Şivan bersîva wê da got:

-Ha ducarê!

Jinikê got, sêcaro! Şivan got, ducarê! Werhasil jinik ûj şivan ketin qirika hev û din, haha kê wê ew bihev rejşer jbikin, hema mele gazî wan kir û got:

-Ê cara sisyan ez im, ê cara sisîyan ez im!

Jinikê got:

-Wele min dizanîya ku derbên cara sisîya ne wek ên herdu carên ewilî bûn!

# GAVANÊ MOZGELANÊ

Zilamekî hebû pur feqîr bû û ew ji xwe re bû gavanê gundekî. Heqê gavan; serê her dewarekê elbek genim bû. Çi dewarên piçûk çi dewarên mezin, tev bi yek serê bûn. garana gund gelek mezin bû, di nav de ga conega, mozîk, golik, çêlek, naigin, ker , maker, hesp, mehîn, hêstir axte û piranî baqûrî bûn.

Gava, merivek pur zirtoke û jzîtoke bû. Gava ku ew hêrs dibû, biçoyê xwe yê jşimşadî berî ser pşta dewaran dida, rojê ewîligên sê -çar heban dişikênanda. Roj ku dihate nêzêkê nîvro, ewî dewarên xwe dibire mozgelanê, li ser kevîya çem wan dihişt, heta ku roj, ji nîvro diqelibî hêj ewî dewaran radikir û dibire çêrê.

Di havîna wê salê de, ebûra kermêş û mozeqirtkan li ber wî çemî rabûbû. Mozan bi kîjan dewarî vedian, ew ji çîyê xwe hildiqevizî û direvîya. Kîjan dewara ku direvîya jî gavan dida serê û bi sietan li pye wê dibezî. Ji bazdanê pirîya ku gavan westîya bû, ew li bin holika xwe rûdinişt û çi dewara birevîyana, lipey nediçû.

Rojekêj bû kelekela nîvroj û ebûra mozan bi ser garanê ve girt. Moz bi kîjan dewarê veda, ew revî. Gavan jî dibêje: «Ez di elba te kim jî». Kîjan revîya gavan got, ez di elba te kim, ez di elba te kim. Werhasil ji ber mozan dewar tev revîn, tenê golikeka qop î gurî ma!

# MÊVANÊ BÊ TEBAT

Mêrikekî rêwî hebû. Lê riya wî pur dûv-dirêj bû. Bi rê ve, pirî kuew z birçî bûbû ji rêveçûnê de ket, li pêşîya xwe laqî gundekî hat û çû malekî. got:

-Malê Xwedê ji we razî be, hema tiştekî hazir çi hebe werînin da ku ez bixwim rîya min dûre, ezê biçim!

Malik hahakêj lepeyek ji jmêvan re çêkir û danîn berê. Xwedîyê malê jû mêîrik ketine ser de û xwarin.. Lê belê mêvan kevçî li ser kevçya tavêje devê xwe, hem ji ber ku pur birçi bûbû hem jî ji bo kurîya wî dûr e xweş dixwe da ku ew zû bigehîje ciyê ku diçê. Mêvan kevçîyek lepe avêt devê xwe û devê wî şewitî. Ew, gepa di devê xwe d birîjîne erdê çê nabe, nerijîne erdê, devê wî dişewite. Hema ewî devê xwe bi jor ve bilind kir û di devêxwe de pifepif kir da ku gep sar bibe. Mêvan bala xwe dayê ku mazûrvanêwî, balkêşî lê dinihêre, ewî pir fedî kir û gotê:

-Xwedê hebîna xanîyê wel i ser çend maxa ye?

Xwedîyê malê, fam kir kujpirsa wî jiqûştengî ye, ne ku ji o znaîna xênî li ser çend maxan ye jû ji bo fedîkirina xwe ya devşewitandinê ya ji gepa germe Xwedîyê malê ji gotê:

-Li ser sebrekê û du pifa ye!

# KIRÎVATÎ

Carekê zilamekî Sêrtî û yekî gundî bûn kirîvê hev û din. Bi kirîvatyê re şîrantîyeka bê qedar ket navbeyna wan de, bêy hev û dinê tebat ne dikirin. zilamê gunî her çend rojan carekêfêkî, satilên mast, şoyên penîr, rûnê nivişk, uhw. Ji kirîvê xwe yê Sêrtî re dibir û diçû mala wî.

Zilamê Sêrtî jî rojekê rabû û çû mala kirîvê xwe yê gundî. Evê gundî qederek şa bû, kêfa wî hat û tevî gundîyan li wî hatine hev û pirsa hal û rewşa jîyana bajêr ji wî kirin. Evê gundî pirîya ku kêfa wî ji kirîvê jwî yê bajarî re tê, nizane çi xwairn bidê.Ew ji xwe re fikirî:«xwarina herî çak jşîr e, ezê şîr bidime kirîvê xwe û li bajêr pir kêm e. ". piştre taştê, firavîn û şîvê her tim şîr dide wî. Mîrikê Sêrtî wisa ji şîr çavreş bû ku êdî veeşana wî jê dihat.

Mêrikê Sêrtî vegerîya mala xwe. Çend roj di ortê de çûn, yê gundî jî rabû û çû mala kirîvê xwe yê Sêrtî. Ewî dîsa qederek tiş û mişt bi xwe re, ji wna re birîye û giha sêrtê, ew çû li derê kirîvê xwe da. Mêrikê Sêrtî

gava reqînîya derî seh kir, kire gazî:

-Men fî ewnok? (Ew kî ye?)

Ê gundî got:

-Ezim, ez kirîvê te filankes im!

Ê Sêrtî hate pişt derî û diçiraneka derî de lê nihêrt gotê:

-Eh amê kirîv te xêr e?

Ê gundî got:

-Kirîv min bêrîya we kiri bû ûş min got, ezê herim zarûkanê kirîvê xwe bivînim û vegerim!

Mêrikê Sêrtî, hema çûçikê xwe di çiraneka derî re derxist û gotê:

-Eh kirîv, zarûk tev ji vî ne, hema li vî binihêre, hesêbî te zarûkan tev dîtîye!

# JINEBIYA QÎZ

Carek ji cara , li gundekî çîya, jinikeka jinebî û mêrekî mêrbî hebûn. Ew herdu iî ne teled, ne weled û ne jî kesekî wan hebû. Rojekê mêrik û jinik, li cîyek haqê hev û dinê tên, linik hev rûniştin û ji hev re qal û bala xortanîya xwe kirin û bi serpêhatîyên xwe dibêjin. Lê belê, peyvên wan her çiqas diçû bihev şêrîn dibû. Ew wisa bi henekên xweş, wextê xwe dibuhurînin, weke ku herdu jî bi hev razî bûbin, û ha ha ye wê ew xwe li sitûyên hev û din bixin.

Mêrik berîya jinikê lê teqand:

-Hirmet, jina min jî tuney e û weled jû teled jî!... Ê te jî mêr tune ye û keç û kur jî!... Were ez û te em bi hev re bizewicin! Lê belê min çend jin anîbe, ezê bêjim! Te jî çend mêran kirebe, tuyê bêjî!

Jinikê tebat nekir kû bêje erê, yan na, hema got:

-Wele min heft mêr kirine!

Gava jinikê qala heft mîran kir, mêrik ji xwe re şaqiz ma û gotê:

-Gelo di nav wan mêran de mele hebûn yan na?

Jinikê got:

-Na wele mele tunebûn.

Mêrik kenîj bezmê wî vebû û gotê:

-Bi hersê dîna kim nexwe tu hêj qîz î!

# SÎTILA WENDABÛYÎ

*Melan gotine: Di dîn de fedî tune*

Zilamek hebû dil ketibû jinikekê de. Ewî dikir û ne dikira wê xwe bi dest ve bernedida. Rojekê ew zilam li newalekê laqî jinikê dibe û bela xwe lê xist, dîsa kir û nikir, ku jinik ber bi wî ve nêzîkayî bike, nekir. Mêrik gote jinikê:

-Hito, ev çardeh sal in ku dilê min ketîye te û ez lipey te digerim, her çiqas ez li nik pur jinan raketime jî, lê tama yê te başqe ye! Niha tiştekî minê bi dizî heye, gava ku ez ji kîjanê re bêjim, wê ew bixwe bixwaze ku ez li nik wê razim û ez ji tu jinan re jî nabêjim, ku ne tubî!

Bi wê gotinê re jinik sil bû û got:

-Ew tiştê te çi ye gelo?

Mêrik gotê:

-Wele ez nabêjim!

Jinik pêda ket û lê lava lkir. Mêrik gotê:

-Hito ez di kê kim, zêran jê derînim, bazin, guhar û gustîl hema çi hebe jû iyarê wan jî, tevek bîstûçar in! Încar tubikêfa xwe yî, tu dixwazî bihêle, û tu dixwazî jî nehêle! Yani ez vê mesela xwe jikê re bêjim, wê ew lipey min bigere ha!

Gava mêrik ji jinkê re qala zêran ir, tima bû û gotê: De were! Mîrik zibîdîyek temam bû. Ewî berê bazinek û guharekû gustîlek xistîye berîka xwe de. Cara pêşîê ewî xwe li ser dilê jinikê hilavêt, bazinek xiste serê xirê xwe û rabûpîyan! Erê jinkê bişavên li serê xwe bazin dît. ÛCara diduyanku ewî ku ewî xwe lê hesikand, guhar nîşanda. Cara sisîyan kuewî xwe heskand, gustîl deranî û ray jinikê da. Cara sisîyan de mêrik ji çapê ket û topa silhê teqand, jinikê jê re got:

-Xwedê ji te razî be, wê rojê li ber beravê sîtila mala bavê min wenda bû bû, çika vê carê jî xwe berde binî û li wir qenc bigere, ka ca tu wê jî liwir nabînî?

# MELE Û KADÎN

Rojekê çar -pênc jinkên kal û kût, li berojkekî gihan hev û sihbet kirin Ewan ji hev jûdinê re behsa canîtîya xwe, evîntî û dilketyên xwe kirin. Ji wanakan, kî ji wan, bi çend xortan re razabûne jî, ji hev re bê

şerm û fedî gotin.

Di nav wan de,jinikeka herî kal û ketî hebû. Ewê serpêhatîya xwe û mele jiwanên din re weha got:

-Sala berfa sor, li gundê me meleyek hebû. Rojekê mêrê min ney li mal e, min dît ku melê hat mala me. Pa ez jî kuresorî dikim, du dest li qirika min nayêtine hev û dinê û herdu gurçikên rûwê min pirî ku sor dikirin, qey te digot, her yekê hinareka Zivzîkê ye. Wê salê Kêmayî ketibû alifê baqûrîyên me, ez jî çûme axurê ku êm bidime wan. Ez ketim kadînê, min zembîl tije ka kir, min dît dengê xirep şkekê hat, ez li paş xwe zivirîm, min dît ku va welê me ye. Kezîkurê çima ewî di kadînê dest ne avîte min! Ez j we re çi bêjim! Dij pey de, hetanî heft salan jî ku min mîz dikir, ka pê re dihat!

# XEYDA KERÊ

Carek ji cara meleyek hebû ji kurda, Tirka wî girt û birin eskerîya xwe. Meleyê feqîr yek bêjeyek jî bi zimanê wan ne dizanya. Li eskerîyê pirîya ku lê dixistin, dersa tirkî didanê, ew di zemanekî hindik de tirkî fêr bû û bê tirs bi wan re dipeyivî.

Rojekê qumandarek yê bêlûka wan, hate nek melê û vêra bi tirkî peyivî. Ewî bala xwe dayê ku ew bi tirkî rind qise dike û qumander pê re laqirdîyan kirin. Ew çax tirkan peyîvandina kurdî qedexw ne kiri bûn.

Qumandarê tirk gote melê:

-Xoce, ji kerê re gotine, eslê te kurd e, û ew xeyîdîye, heft rojan alif ne xwarîye! tu ji vêya re çi dibêjî?

Mele ji qumandarê xwe re dibêje:

-Ev mesele rast e, çimkî kerê jî eslê xweînkar ne kirîye! kî eslê xwe înkar bike jî, pêxember gotîye ew ne ji min e, lewra eslê kerê tirk bû ye!

# DEVE HAT PÛLEKÊ PÛL TUNE BÛ

Zilamek hebû, pur dewlemend bû.Lê belê felek liwîçep gerîya û feqîr ket. Ew kete halekî wisan ku gepek nan jî, dimala wî de peyda nedibû.

Kurê wî zilamî, li sûkê dît ku waye deveyek bidestê delêlî ye û gazî dike:

-Ha wernê ev deve bi pûlekî ye!

Lawik bi bezê hate mal. Ewî ji bavê xwe re mesela devê jgot. Û got:
-Ka pûlekî bide min ezê herim wêdevê biirim!
Bavê lêwik got:
-Kurê min pûlek tune ye!
Li wî mîrikî çend sal bihurîn. Dinya lê fire bû. Malê jwî pur bû û dewlemenhdaîya wî hat qesa berê.
Rojek ji rojan, mîrik û lawê xwe bi hev û dinê re, li sûkê pyase dikirin. û kulpîna çicara mêrike û dûmanê be ser xwe ve berdide. Haw ku mêrik dît waye deveyek bidestê delêlî ye, digerîe û dibêje: «Bihayê vê devê sedpûle ha wernê!...
Mêrik kîsêj peran ji berika xwe deranî û sed pûl jimartin destên kurê xwe û gorê:
-Lawê mi here wêî devê jime re bikire!
Lêwik were bi xeyd bersîva bavê xwe da û gotê:
-Wê salê deve haibûj bi pûlekê te nikirî, încar niha tu bi sed pûlan devê dikirî ne!
Bavê wî jê re got:
-Kurê min «Deve hat pûlekî, pûl ekjî tune bû, vêgavê pûl heye, here devê bi sed pûlan bikire».

# KERÊ AXÊ DIÇÛ SÛKÊ

Di demekê de li bajarê Cizîra Botan axayekî pir zirp î zorkar hebû. Pirî ku ewî zordestî û niheqî li xelkê dikir kes nediwêribû, ku peyveka ne xweş ji kerê wî re ji bêje. Du hebpaya timî xulamtiya kerê Axê dikirin. Kar û îşê xulaman hew ew bû tenê xizmeta Kerê Reş bikin; êm bidin, wî mehes û timar bikin, av bidinê, dema ku berî derve bidin li pey wî bigerin û kerê reş biparêzin. Û ka kesek ji kerê re, peyveka ne xweş yan çêrekê dibêje yanena, ji bo ku ji Axê re bêjin û Axe jî wan ceza bike!.

Çiqas roj sibe herdu Kerê Axê berî sûka Cizîrê didan û li pey kerê dûredûr diçûn. Kerê Reş hînî xwarina fêkî û êmiş bûbû. Hema berê xwe dida ser dikanan û devê xwe dixist tiştan dixwarin. Çi tiştê ku dilê Kerê bibijiyanê, mast, bacanê sor, xiyar, qitik, petêx, zebeş, sêv, proteqal, mandalîn, mûz, gilyaz, încas biyok, hirmê, mewîj, hêjir, meşlûl şaran û helîl kakilê gûzê, behivan, dims, helaw û tehîn, bexdenûs tev dixwarin. Werhasil li ser kîjan dikanê tiştên ku kerê bidîtina dixwarin. Kerê çi bixwarina ji ne kes têkil dibû û ne jî, diwêribûn ku peyveka bêrê ji Kerê Axê re bêjin.

Di bajêr de her kes dizanî bû, ku kî çi ji Kerê Axê re bêje, wê ji Axê re bê gotin. Çaxê kerê reş li ser dikanekê têr dixwar, xweyîyê dikanê hem ji tirsa xwe hem jî ji bo kêfa Axê were digot: "De here kerê mala Axê! Tiştê te xwarî li te sihet û noşîcan be!"

Dema ku Kerê têr diwxar, dizivirî rast berê xwe dida bi aliyê tewla xwe ve, diçû diketê û li ser afirê xwe disekinî. Rojekê herdu xulam kerê birin sûkê û bişûnde zivirîn çûn cem Axê, gotin:

-Axayê hêja! Me fermana te pêk anî!

Axe pirsî got:

-Kuro îro li sûkê Kerê min çi xwar, li ser dikana kê xwar , kesî tiştek gotê yanena_

-Mast xwar, sêv xwarin, tirî xwar, bexdanûs!... Li ser dikana filankes û bêvankes fêkê xwar.

-Êêêêê! Xweyîyê wan tiştekî negot_

-Got "Kerê mala Axê sihet û noşîcan be li te"!

-Hiiim, haaahahaaaa!...

# JINIKA XEYIDÎ

Carekê li gundekî Torê, mêrikek li jina xwe da û jinik enirî, çû mala bavê xwe. Mêrê wê gelek caran çû pey de, ewî kir û nekir jina wî nehate mal.

Gundê wan du tax e. Di nîvê gund de çayek dibuhure û herdu taxan ji hev cuda kirîye. Herdu tax, her yek li berpalê çayê û li hember hev û dinê ne. Mala bavê jinikê li alîyekî çayê û mala mêrê wê jî li alîyê dinê, li tîra hev bûne. Êvarekyan, gava ku xelk li ser banan radizê û sebekîyan gava ku xelk radibe, herdu mal weka kuli nik hev bûn, hev û dinê dibînin û li hev dinihêrin.

Mêrê jinika xeyîdî, pirîya ku ji karên malê westîyabû, û pirîya ku feqîro bêrîya jina xwe jî kiribû, rojekê serê sibê zû, ji nav livîna xwe radibe piyan û gazî xezûrê xwe dike:

-Ha xezûro, ha xezûro! Îşev ez hatim taxa we, min ji para kuta yekî de, lê mêr bû yan jin bû ez wî nizanim, hûn tel li xwe binihêrin, şilayî bi kê ve hebe, bila ew xwe tahfîl bike, ji bo ku heram nemîne û ew guneh nekeve sitûyê min de!...

Di çaxî gazîkirinê de, xelkê herdu taxan, ji bo îş û karên xwe ji xewê şîyar bûne, ê li ser cîyê xwe rûniştîye, ê kincên xwe li xwe dike, ê ku ra-

bûye li ser limêja sibê ye, werhasil tevê gundîyan dengê gazîkirina mêrê jinikê seh dikin.

Xezûr, ji wê gazîya zavê xwe pir fedî dike û ber xwe dikeve. Hema ewî rahîşte çoyekî û êrîşê qîza xwe kir û lêxist. Ewî ji qîza xwe re got:

-Heniha rabe here mala mêrê xwe! Ekene ezê te bikujim, ma qey gereke em paşîya xwe jî, li ser erna te bidin, hêja tu yê vegerî mala mêrê xwe? Hey qîzza kerê reş!

# GAZ Û GAZUNÎV

Zilamek hebû, jineka wî ya pir delal û rind hebûye. Lê belê ne jinikê bêyî mêrê xwe diqedand, û ne jî mêrik bêyî jina xwe diqedand. Sed heyf û mixabin, rojekê mêrik ji nişkave dibêje, «zirp» û dimire!

Jina wî li serê şînê dike, digirî, porê xwe dikişîne, berê kirasê xwe diçîrîne û şala reş girê dide. Mele tê cinazê wî dişo, kefen dike û wî dibin dixine tirbê. Jina mêrik her roj,sibê zû radibe diçe ser mezelê wî digirî, digirî, hetanî êvarê û tê malê. Bi wê rewşê, jinik heftîyekê sax domand.

Rojekê jinik li ser tirbê ye û digirî. Ji riya ku di ber tirban de dibuhure, xortek tê. Ew dibîne ku pîrekek li ser tirbekê ye û digirî! Gava ku ew jinikê dibîne, bêbavê pirîya ku delal bû jî, ew ne bi dilekî, bi hezar dilan , dil dikeve jinikê. Hema xort ji ciyê xwe kiçîmê ser tirbê dike û zor dide girînê:

*-Ax kirîvo, ax kirîvo!*
*Ma ji bîra min diçe lo*
*Em li bin dara behivo*
*Me pîva yê te yek gazo*
*Yê min jî gazek û nîvo*
*Ez li pey te nemînim lo*
*Tu ji bîra min naçî lo*
*Ax kirivo, ax kirîvo!*

Bi girîna xwort re, jinikê dest ji ya xwe berda û lê temaşe kir. Lê belê gava jinikê ji xorto dengê «Gazek û nîv» ê seh kir, ber dilê wî da, teselîyan dayê, da ku êdî ew negirî! Bes, qê ew dest ji girînê berdide! Mola wî lê hatibû û zor dabûyê jinika jinebî, kirîvê xwe radike da ku biçine mal!

Jinikê, bi hêvîyan û zarîyan, wî ji girînê da sekinandin. Û gotê:

-Kirîv! Bi girînê mirî ranabin! «Tiştê çû mede dû! Tiştê ku bê guh bidê!»

# LINGÊ WÎ ŞIMITÎ BÛ

Zilamek dil berî jinikekê dabû, lê belê ewî dikira û ne dikira ku jinik pê qayil bibe û xwe nêzê wi bike nedikir.

Rojekê mêrik bangi jinikê dike, ew tê û mêrik jê re pesnê xwe dide, hem bi rê ve diçin hem jî ji xwe re dipeyîvin. Jinik û mêrik di nava kuçeyan re diçin, digîjine serpoxanekê, ji nişka ve çima kûçikek «help»înî nake! û davêje mêrik. Pirîya ku ew ditirse, mecala xwe nabîne hema ji tirsan xwe di çalê werdike û dinitirîne!

Jinikê bawer kir ku gotinên wî yên pesindayînê tevek vir û derew in! Hema ew herdu destên xwe dixe kêlekên xwe li hawîdor çalê diçe-tê û dibêje:

-Hak lawreşo tu ne mêr î!

Xwe li poxana vedişêrî!

Bêguman lawbêja jinikê li mêrik gelek têsîr kir û li zora wî çû tan lê ket, ew li hember jinikê berxwe ket, hema ji çalê derket, berê xwe dayê û got

-Ez rûşê te me, reşşê te!

Lingê min şimitî bû ez ketim çalê!

# MELE JÎ TAREKÊ JI PÎRÊ RE BIR

Li gundekî pîreka pir kal û lewlibaz hebû. Kî ku diçû mala wê, heta kupê karek nekira, wî nedida rûniştandin. Di nava gund de, deng û behsa pîrê belav bûbû. Ji tirsa karnekirinê kesek ne diwêrîya ku here mala wê.

Rojek li mizgeftê qala pîrê vedibe û cimaeta melê ji xwe re pê dipeyîve. Mele jî dibêje:

-Ma qê dahwîye ku pîrê bi her kesî kar dike! Ez vê yeka bawer nakim! Hûn bobelatan li pîrê dikin!

Sofîyek ji melê re dibêje:

-Seyda! Anika tu rabe here mala wê! Ew çax tû yê bi çavên xwe bibînî!

Mele radibe diçe mala pîrê. Mele derê sifê vekir û kete hundurû! Pîrê jî li namalê rûniştîye, çewa pêjna derê sifikê dike, dike gazî û dibêje:

-Ew kî ye li sifê? Xwedê ji te razî be, hey ku tu têyî ka ca j wir tarekê bi destê xwe re bîne, da ku em bavêjine ser êgir!

Pa pîrê got û mele jî seh kir. Încar ku ew karek ji wê re ne be wê

mele fedî be! Û pîrê were bi zimanekî xweşik got jî, bê hemdî xwe ewî rahîşte tareka rêxê û çû bir nik pîrê.

Pîrê bala xwe dayê ku melê gund e û bi wê şaşik û rûyê xwe ve, tarê girtîye destê xwe û jê re anîye. Ewê ji melê gelek fedî kir, berxwe ket û gotê:

-Wîîî lawo seyda! Ev tu yîîîî! Weyla li min kezîkurê, ne kes, încar meleee! Na, na, naaa! Ez bi qurbana te bûmo! Tu ji min û bavê min zêdeyî! Bive, bive, biveee! Bi qurana te xwendîye tu dê tarê dîsana bivî sifê! Min ne dizanî ku tu yî!

# SOFIYÊ ZINAKER

Hebû carek ji caran, xêr û xweşî li hazir û guhdaran, ji bil qolçî û qemçûrçî û tahsîldara.

Sofîyekî quzgêj hebû. Li kur çi qîz û jin û zarûkan bidîta, tecawizê wan dikir. Tizbîyeka 99 lib timî di dest de bû û xwe bi misilmantîyê jî dikuşt.

Sofî, rojekê di newaleka kur a bi dar û devî de, zikr û îbadetên xwe dikir, hew bala xwe dayê ku wa qîzikeka 9-10 salî, ji xwe re li pîvokan digere, û ras bi ser wî ve tê. Sofî gava ku çav li çimê qîzikê kir, wê girt û avête erdê.

Di nav lepên Sofî de, bû qar-qara keçikê û zor da girînê. Sofî, hirmîn û gurpîna wî ye li ser dilê keçikê û tizbîya wî jî di sitûyê wî de ye! Kef û kunc bi devê sofî ketîye, ufuf û kufkufa wî ye, çawa ku carînand ikete cezban, sisan jî dihêje û li ser dilê keçika pîçûk dirihile!

Keçik, şaşik û tizbî û rûyê wî dibîne, ji xwe re difikire û dibêje: Ez gazîyê bidime Xwedê û pêxemberan, belkî ew dev ji min biqere! Keçikê gotê:

-Sofî tu bi xatirê Xwedê kî, dev ji min berde!

Gava keçikê qala navê Xwedê kir, Sofî got:

-Celle celaluhû, ji ezameta Xwedê re!

Keçik dîn dayê ku Sofî daha zêde xwe li wê dixwe, gotê:

-Sofî tu bi xatirê pêxember kî dev ji min berde!

Sofî bi dengekî bilind got:

-Sellelahu eleyhî we sellem, ez bi qurbana wî zatê nûranî bim!

Keçik bala xwe didê ku ji bo navê pêxember jî, wî dev jê berneda û gotê:

-Sofî tu bi xatirê sihabîyan kî, dest ji min berde!

Sofî got:

-Radîyellahu enhuma, ez bi qurbana wan bibim!

Keçik, ketiye rewşek were xirab, hema diqîre û digirî:

-Sofî tu bi qedrê Hezetî Elî kî, dev ji min berde!

Gava ku keçikê behsa navê Hezretî Eli kir, mêranîya hez. Elî hat bîra Sofî û got:

-Wey kerremellahu wechehu!

Û Sofî bi çar gopalî, xwe li qîzikê dadixîne. Keçikê got:

-Sofî tu bi xatirê şêxê xwe kî dev ji min berde!

Sofî got:

-Wey rehîmehullah, wey rehîmehullan, ez bi qurban bim, wey rehîmehullab...

Di pey wê gotina Sofî de, fîşeka wî ya silhê teqîya, dilê wî xelîya, ew ji devgerî ket, situyê wî xwar bû û li ser dilê keçikê wek mirîyan pîjkirî ma!

# KURO EW AXE YE XWE JÊ RE BAVÊJ ERDÊ

Rojek zilamekî xelkê çîyan ji bo karekî xwe, dihere gundên deştê. Ew diçe gundekî (Hilêlîyê) dikeve nav kuçeyên gund û dimeşe. Axê gund (Ihsan Axe) ji dûr ve wî zilamî dibîne ku ew çeplên xwe dihejîne. Axe ji cî keçîmê wî dike, digîjê û wî dide ber sîleyan:

-Ez bi rih û gîyan tu çewa di gundê min de çeplên xwe li ba dikî!

Li gundên çîyan zordestîyan axeyan hewqas tune ye û ew zilam hêj cara yekem e ku laqî tiştekê were dibe. Ew bi axê digere û tavêje erdê. De lêxe kero te çi xwarîye! Bi kulmikan bi pehînan ew dikeve ser dilê Axê û lê dixe. Di bin de lêwî de dibe «qar» û «war» a Axê, ew roj zilam jî qet li Gund tune ne, pîrek û zarûk li wan têne hev û dinê û wî ji ser dilê Axê radikin. Lê belê Axe pir ber xwe dikeve, çima ku li ber çavên gundîyên wî, ewî wî avêtîye erdê û lê daye. Axê hema kiçîmê zilam dike û dikin û nakin nasekine. Pîrekên Gund ji mêrik re dibêjin:

-Kuro ew axa ye, xwe jê re bavê erdê bila li te xe!

# TIRA HEFTSALE

Hebû tunebû mêrikek hebû. Rojek ji rojan li mala wî civateka pir mezin gerîyabû. Ji wan ê ku çîrok digot, ê ku serpêhatîyên xwe digot, ê ku leqemokan digot, werhasil heryekê ku dora wî dihata, miheqeq wî

tiştek bigotana.

Carekê civat bêdeng bû, tu his û pis ji kesekî nedihat, hema ji nişka ve dengê tirekê tê. Civat kenî, tev ziloq bûn û li xweyîyê malê mêzekirin. Mêrik pir ji xwe fedî kir. Di dilê xwe de digote: «Erdê biqelîşe û ez di te re herime xwar!».

Wê gavî, mêrik bi bihana destavê çû derve û lêda ji xwe re terkeserî dinyayê bû. Mêrik çû û çû û çû, heta pîyên wî ax û av girtin. çû.

Wî li welatên dereke, tam heft salên xwe qedand. Rojekê welatî wî ket bîra wî. Sebr û tebata wî, kir û nekir êdî nehat. Pêşîya jî gotine: «Şam şekir e, welat şêrintir e». Ser dilê wî kizkirî, kezeba wî dişewitî, rabû û xwe bi xwe got:« Bese êdî, a niha ezê herim welatî xwe».

Mêrik kete rê û berê xwe da ber bi welatê xwe ve. Di peyrêveçûna gelek qonaxan de, şavek derengîya şevê ew gihaş gundê xwe. Li kêleka gund, maleke tenha hebû. Mêrik jixwe re got: «Ka ca ez herim ser banêvê malikê, di kulekê de li wan guhdarî bikim, ka ca li gund çi deng û bahs hene!».

Mêrik gava ku guhê xwe bi ser kulekê ve tapêl kir, ji hundurû bihîst ku, waye behsa wî dikin. Ew dengê ku ji hundurû tê weha dibêje:

-Berî heft salan, zilamek li gundê me hebû, şevekê civat li mala wî bû, wî di civatê de tirek kir, feqîro ji fedîya tira xwe, çû terkeserî dinyayê bû, tu kesek nizane, ka sax e, ka mirî ye!

Ewî çewa wî dengî bihîst, pêre pêre, berepaşkî fitilî û got: «Dêmek hêjî behsa tira min li gund heye, heh! Ev xelk çi ecêbe, tiştan tu car ji bîr nakin, ev heft sal in hê jî tira min ji bîr nekirine!»Ew dîsa vegerîya cîyê ku ew jê hatibû!

# SOFIYÊ BÊ AQIL

Hebû tunebû sofîyekî pir bê aqil hebû, navê wî Şemo bû. Lê jê re digotin, Sofî Şemo. Ew sofî di nav sofîyên hevalên xwe de, timî digot:

-Çîyê meriv hebe, pêwîst e ku meriv bide şêxê xwe! Çimkî şêx layîqê her tiştî ye, dinya bereday e û qirêja dest ye!

Sofî Şemo bi şev û roj , hertim li mala şêxê xwe dima û kar û barên wî dikir. Ji mala şêx re diçû êzingan, ji pangê rêxa heywên dicivand, dixiste selikê dida milên xwe û dibir diavête ser sergo, xwarina mêvanan dibir dianîya, bi qewraşan re diçû tendûrê nan dipaht û ardûkên ji tendûrê berev dikir, merkolana rez û baxçeyên mala şêx dikir, heywên berî nav garanê dida û êvaran jî dianîya dixiste pangê!

Jina sofî û digel pênc heb zarokan ve li gundekî mayî rûdiniştin. Bi

heftîyan, bi mehan wext derbas dibû, Sofî biser wan ve jî qet ne diçû û hay ji wan nedima!

Feqîyan li cem şêx dixwendin. Rojek ji rojan çend heb feqî bangê Sofî dikin û jê re dibêjin:

-Sofîyê delal! çima tu bi ser jin û zarûkên xwe ve naçî?

Sofî bersiv da û got:

-Ez benî, welê ez kar û barên Şêx dikim, da ku ji xwe re cinnetê kar bikim. Ma jin û zarûk wê min ji agirê dojeyê xilas bikin?

Feqîyan ji Sofî re got ku:

-Tu li ba Xwedê gunehkar dibî, wê Xwedê te têxe agirê doje! Ma tu nizanî ku guneyên jin û zarûkan di sitûyê meriv de ye? Ji ber vî guneyî be jî tu rûwê cinetê nabînî!

Sofî bersîva feqîyan da û got:

-Ez benî hûn welê ji min re nerastîyan dibêjin! Nexwe ku ev peyvên we welê rast bûna, ma çima Şêx ji me re rojekê van tişt nedigot?

Feqîna têgihîştin ku Sofî bi gotinên wana têrnabe. Tev rabûn çûne cem Şêx û gilîyê Sofî Şemo kirin:

-Ev çend meh in ku Sofî Şemo bi ser mala xwe ve neçûye! Li gor ku me bihîstîye rewşa mala wî pir xirab e, em hêvî dikin ku tu destûra wî bidî, da ku ew bi ser zarûkên xwe ve here!...

Gava Şêx bala xwe dayê, ku feqîyên wî, bi vê rewşa Sofî Şemo agahdar bûne, pêre pêre gazî wî kir û jê re got:

-Sofî Şemseddîn, milyaketê Xwedê,bi ser mala xwe ve here, ne webalên wana jî distûwê te de heye, wê Xwedê te ji ber vî webalî ve bide ezabdan! Çima tu naçî malika xwe?

Çewa ku Şêx vê peyvê ji Sofî re got, hema rabû nigên Şêx maç kirin û berê xwe ber bi rîya mala xwe ve da û çû.

Lê, Sofî çewa bi rê ve diçe! Bi teleb, bi xaranî mîna hespan diçe. Bi rê ve yek carna lotikan dide, yek carna xwe qulopanî dike, û xwe bixwe ji xwe re dibêje û dilorîne:

*«Ellah û heyy û nûranî*
*Qelbê Şêxêm behr û kanî*
*Mirîdan av jê deranî*
*Kirin û nekrin dawî nanî.»*

Gava ku Sofî gihaşte mala xwe, çi mêzeke, zarûkên wî tev birçi ne, tazî bûne, jina wî jî, nexweşe û neynûk nemaye ku xwe pê bixrînin. Gedê wî yê herî piçûk çewa ku çav pê ket, ji nişka ve qêrînî kir, xwe avête himêza dîya xwe û dest bi girînê kir. Çimkî rû û simbêlê wî were li nava hev û din ketibûn eynî ketibû rengê dahbeyekî bi hêbet û jitirsa wîlêwik digirîya, xwe bisinga dîyaxe ve dişidanda.

Sofî di dilê xwe de digot:

-Herdu dinya li cem Şêxê min yek in! Rewşa mala min jê şêx ve eyan bûbû, loma bû ku ji min re got, here malê!

Jinikê gelek gilî û gazinan ji wî kir. Lê bersîva jina xwe qet ne dida.

Pa Sofî yekî çewa ye! Fîq sipî kinanik e. Rûyê wî digehîje berzika wî û li herdu aliyan jî defa singê wî girtîye. Berî ku şorba nîskan jî xwarîye û pê ve daweri bîye, ji lêva wî ya jêr heta serê çiqilkê rûyê wî, xerteke zer ketîyê! Meriv dibê ku, qê belî ji qestan ziravîya rûyê xwe hine kirîye.

Wext, destpika biharê bû, hêj bihar nûqul bûbû. Sofî Şemo karê kolana baxçe kir. Baxçe kola, tê da mişaran çêkir. Bacan, îsot, xiyar, pivaz, sîr, binerdk û silqan, di wan de çand. Herçî ortikên xiyara, serê wan bi naylonan vegirt. Her çiqas bi hindikayî jî ku tav bidayê, lemik çê dibûn û ro bi ro, li xwe dixistin û hildikişîyan.

Lê Sofî çi sofî bû, pirîya ku di kar û barên mala Şêx de, hînî sazmendîya tiştan bûbû, bi şev û roj, gav û seet, ji nav bexçeyê xwe dernediket, ber lemikên xwe dixepart, avdanîyê dikir, çîrta kevokan dixiste ber wan û qet nedihişt ku avşihitî jî bibin.

Ji tirsa Sofî Şemo, yek zarûkek, ne yên wî ne jî yên gundîyan ne diwêrîya ku bi ser baxçe ve xwar bibin.

Gava ku Sofî diçû nava baxçe, zarûkên wî, li hawîdorên baxçe, çerexîya didan, diçûn dihatin û digotinê:

-Bavo, tu bi xatirê Şêxê xwe yê ezîz kî, ka xîyar bide me!

Ê dinê wisa digotê, ê dinê wisa digotê, ê dinê, ê dinê!...

Werhasil zarûkan dikir û ne dikir Sofî xîyarek jî ne dida yekî ji wan û Sofî digot:

-Pêwîst e ku xîyarê pêşî Şêxê min bixwe!

Kurmik avêtibûne lemikên xiyaran. Sofî sertûrkên wana li vî yalî li wî yalî diqeliband, lêbelê xiyar hêj piçûk bûn. Destê wî ne dihate berê ku xiyarên piçûk ji leman biqurmiçîne.

Ji nişka ve Sofî dî ku, wa xiyarek bi tenî, qandî pêçîyekê dirêj e, wê bi lemekê ve ye, pêre pêre ji lemê qurmiçand, xist berîka xwe û bi bezê hat malê. Ewî Kincên xwe yên nû li xwe kir, şaşika xwe ya teze da serê xwe û got:

-Hirmet, siftaha pêşî min xîyarekî ji lemekê kir, ezê ji Şêxê xwe re bibim, da bu bereket têkeve nav malên me!

Piştî ku wê xeberdanê ji Sofî bihîst, jina wî çavên xwe girt û devê xwe vekir:

-Hey kezebreşo, vê gavê dê tu xîyar nedî zaûrkên xwe û hewqas çavê wanakan li destên te bel bûne, lê belê tu yê ji Şêxê xwe re bibî ne! Hey min xêrê ji te nedîto!

Bi van çêr û pêçarî û nifir û afirên jinikê re sofî bi bezegurkî xwe li derî xist û berê xwe ber bi gundê Şêx ve kir.

Lê Sofî çewa bi rê ve diçe! Wek tajîyê ku berî ser pişta kêvrûşkê dide, gavên xwe di helqevêze. Gavno ha gavno gundê Şêx tu li ku yî! Heta birî tê de hebû dibezîya!

Werhasil ez çi serê we biêşînim, piştî rêveçûna danekî, Sofî gihaşte gundê şêxê xwe. Lê Sofî ji kefteleft ketîye, qirika wî ziwa bûye û ji tîna lewaz ketîye, êdî qudûmên wî erd jî nedigirtin.

Bi zor û elfeketî, Sofî xwe avêt derîyê Dîwana Şêx. Gava derê Dîwanê wisa nîvco vekir, çi bala xwe bidê, ku wanê Şêx li quncik rûniştîye, li hawîdorê wî tevê mirîdan, li ser çokan rûniştine, serên xwe berjêr kirine û li gotinên Şêx, guhên xwe tapêl kirine.

Ji nişka ve Sofî Şemo serê xwe di çiraneka derî de cîq kir û got:

-Qurba, qurba! xîyarên teze ketibûne baxçeyê min, ji bo xêrdîna wan, ê ewil min ji te re anîye! Yekî piçûçike, eynî wek cûcikê lawê min e, ma tu naxwî?

# SOFIYÊ ÇILEK

Hebû tunebû carekî sofîyekî pir çilek hebû. Gundîyan navê wî danîbûne çilo Sofî bi qelenê keça xwe çûbû mala Xwedê û tewaf kiribû. Încar piştre xelkê jê re digot: Hecî çilo! Lê piranîya xelkê, dîsa digotin: Sofî çilo.

Sofî, ji civata pîrekan pir hez dikir, hertim di nava wan de bû, li wanaka waz û nesihetan dikir û digot:

-Pêywîs te ku pîrek pir nandar, camêr û merd bin! Kî tasek av,yan gepek nan, yan qirûşek pere, bide yekî geda, wê Xwedê, jî di roja qîyametê de, ewêzîya wê xêrê vegerîne, û i dinê jî, li dora serê zarûk û kesên wan wê bigerîne! û pêywîst e ku meriv di rojê de,yan di hefteyê de, yan di mehê de,yan jî di salê de, miheqeq carek du car serîyan li pismanı û dostên xwe bixe, pirsa hal û rewşa wan bike!

Xûyekî werê wî hebû, ku di her mehê de, hefteyek yan jî dehrojan, ne li mala xwe bû, hertim li gund û bajarna ji xwe re digerîya. Lê gera wî ya li bajaran pir hindik bû, çimkî xelkên li gunda, bêtir ku mêvanperwer in, ew li gundan timî digerîya.

Rojek ji rojan, rîya sofî bi mala xwarzîyekî wî dikeve. Ne xwarzîye wî li mal bûye û ne jî jina wî. Pêçek zarûkên wî yên hûrik û keçeke wî ya neh-deh salî bi tenê li mal bûne, keçik hêj nefamî bû, tevgera li hember

mîvanan re pêşkêş dikir. Keçikê, beroşek şîr danî ser kuçik û nîv pakêt qehwe berî nêv da. Piştî ku beroşa şîr kelîya, danî erdê, hinek sar bû û bire ber xalê bavê xwe beroş danî. Şûşeyeke mezin, şekir, kevçîyê şorbê, danî ser tebsîyê, ji xalo ra anî gotê:

-Xalo, fermo qehwê vexwe

Sofîyê çilek, çûşe li ser şûşê, qehwa şîr tije dikir û hella didayê. Yek, didu, sisê, çar, pênc, şeş, heft, heşt û neh şûşe vexwarin. Lê şûşê yeka çewa ye! Ji wan şûşeyên avê yên herî mezin e, ku nîv kîlo av rihet digire!

Di pey vexwarina neh şûşeyên qehwê de Sofî bangê xwarzîka xwe ya piçûk kir û gotê:

-Xwarzîka minî delal, ha van firaqan hilîne, hêla bi min qehwa şîrî ji ya avê xweştir e! Ne wisa ye lawo?

# ÇI JI KÊ RE LAZIM BE, WÎ JI XWEDÊ DIXWAZE

Rojekê Miftîyê Farqînê diçe welatê tirkan. Ew li bajarê Qonyayê dihere mizgeftê. Li pey melê limêj dike. Di pey kutabûna limêjê de cimet tesbîhan dike û her kes ji xwe re destên xwe bilind dike û Xwedê ve zarzarîyan dike.

Sofîyekî tirk li tenişta Miftî rûniştî ye û bi dengekî bilind ji Xwedê hêvî û xwestinê dike:

-Ya Xwedê! Quran û îman bide min! Bihişt û horîyan bide min! Tu bi qencî û xweşîya xwe bi me re kerem bike! Tu me rûreş û riswa nekî li dinê!...

Ji dengê diayên sofîyê tirk, guhên Miftî ditingijin. Ew jî re dibêje:

-Hemşerî! Diaxwestin pêwîste ku bidizî be! Xwedê ne ker e, dibihîze!

Sofîyê tirk dîsa dengê xwe qut nake, wek berê bi dengê bilid ji Xwedê hêvîyan dike. Miftî jî hema dengê xwe bilid dike û ji Xwedê weha hêvîyan dike:

-Ya reb! Tu mal û serwet bidî min! Tu koşk û serayan bidî min! Tu jin û zarûkan bidî min! Tu zêr û peran bidî min! Tu xweşî û serbestîyê bidî me!...

Sofîyê tirk ji wan xwestinên Miftî pir hêrs dibe, hema bi destê wî digre berjêr dike û dibêjê:

-Olan! tu ji Xwedê çi dixwazî?

Miftî enîşkek li sofîyê tirk dixe û dibêjê:

-Olan! De wê ve biqete. Çi ji kê re lazim be, wî ji Xwedê dixwaze! Yê

we îman û axret tuneye, hûn wan dixwaizn! Yê me jî mal û serwet tuneye, em jî wana ji Xwedê dixwazin! Ma qey ne were ye?

# NESEQIRÎ

Carek ji cara, mêrikek;ê çavlider hebû. Hertim ew zilam diçû li pey jinên xelkê digerîya. Êdî wisa bûbû ku, jina kê xweşik bûyana, ji tirsa wî zilamî, ew kes ne diwêrîya ku ewle razana!

Biraxweyên wî zilamî, rojek çûne cem û gotinê:

-Gereke tu dev ji vî xwîyê xwe berdî! Eger hinek te bikujin, wê bela me û xelkê têkeve nav hev û dinê, û mêrikujî ne tiştekî rind e!

Mêrik xwîyê xwe naterikîne. Ew li pey jinikeka koçer çû hat. Koçer jî bi wê yeka wî hisîn Çend xortên koçeran, tivingên xwe girtin û li devê riya wî kemîn girtin Ewan bala xwe dayê ku waye ew zilam ji wir ve tê, tu paxavan jî nake û piste piste bi alê konên wan ve li rê dikudîne.

Notirvanan ewî dane ber tivingan. Ji navikê û berjêr, bi derba nemirînê, ewan wînakê kirine xirxîytek. Lê belê ewan nedixwest ku wî bikujin. Bira û pismamên wî zilamî bi ser termê wî ve hatin, wî hildan û vegerîyane gundê xwe. Pismamên wî jê re gotin:

-Ma me ji te re negotibû, dev ji vî xwîyê xwe berde?

Mêrik di nava livîna xwe de dirêjikirîye û bizorê deng ji wî dertê:

-Min tobe, hew pêştir ez wiha nakim.

Jina wî li ber serê wî rûnişt û gotê:

-Ev toba te ne wek toba pisîkê be, tine e!

Mêro, mêro ne pêşîyan gotine, Meriv ji dehnê xwe têrnan û ji livîna xwe têrgan ne be, xêr tune».

# GURÊ BÊ BIZAV

Di nav heywanên kovî tevan de, gur pir çeleng e, lê belê ew heywanekî pir bê bizav e, xayîn e û zikreş e! Çi gava ku gur dikeve nav kerîyekî de, bi dehan, bi bîstan pez dikuje, cendekên wan li erdê dihêle, lê dide direve û terman li wir dihêle. Heçîka hirça feqîra reben, xwîyê wê ne were ye, Gava ew têkeve nav kerîyekî de, ji xwe re, hebeka qelew diniqîne, dikuje û dide ser milên xwe û dibe dixe qula xwe dixwo!

Bê bizavbûna gur, li ser zimanan heta ku bûye destan. Li ser wê yekê ye ku pêşîyên me wiha gotine, der heq gur, de:

«Xwedê kirîye ku gur bi qeweta xwe nizane
Ekene, her şev wê kelekê neqeb kirana«.

# HOVO

Xulamekî Mîrê Botan hebû, navê wî Hovo bû. Çi cara ku mîr gazî wî bikirana, bigota: Hovo, wî digota: Ho. Tu kesek newêrin bû ku bersîva Mîr ji bilî «Libê şêrîn weke şekir» bidana.

Mîr ji Hovo re got:

-Ez mîr im, dê serê te jê bikim! Çima tu were bersîva min didî?

Xelkê gelek şîretan li Hovo dikir. Jê re digotin:

-Çi gava ku mîr gazî te kir, gereke tu bêjî: Libê şêrîn weke şekir!

Hovo digota, bila be. Dîsa jî çiqas ku mîr gazî wî dikira, Hovo digota, Ho.

Rojekê mîr li Hovo xist. Ew revî. Çewa ku ji destê mîr filitî, Hovo bi nav kuçan ve bezîya. Xelk hatine pêşîya wî û jê pirsîn:

-Hovo te xêre, çima tu were direvî?

Hovo got:

-Aqilê vî mîrê me tune ye! «Aqilê mîrê min û kîrê min û jina min wek hev in».

# GIRÊ DIMSÊ

Jinikeke Torî hebû diya pênc sêwîyan bû. Di mala wê de kedkirê wê kesek tunebû, hew ew û ew bû. Jinika Torî rojekê du meşkan tije dims (divs) dike û bi tayê tenê diçe deşştê, ku bi genim re biguhêre û qûtê sêwîyên xwe yê zivistanê bîne.

Jinikê du meşkan tije dims kirîye, xistîye têrê de û avêtîye ser pişta kerê çû û giha deşta Sînanê. Ew gihaşte tangava girekî (Girmê Dimsê) sofîyek laqî wê bû. Ewî pirsa barê jinikê kir. Wê got ku, barê min dims e. Sofî ji wê re got:

-Ji xwe ez têcirê dimsê me, ka ezê dimsa te tam bikim, eger xweş be, ezê herdu meşkên te jî bikirim!

Jinikê got:

-Eger tu tiştekî were bikî, pir qenc e! Ezê jî bi ser sêwîyên xwe ve zû bizivirim û ew bi tenê li mal mane!

Çewa ku sofî fêm kir ew jinebî ye, bêtir wî xwe bi jinikê şor kir, û ewî

barê dimsê danî erdê. Sofî herdu meşkan ji têrê anî der. Jinikê çoçika dimsê ji tûrikê xwe deranî û da sofî. Ewî devê meşkekê vekir, çoçik tije dims kir û bi ser devê xwe ve berda. Sofî jê re got:

-Ka ca tu bi devê vê meşkê bigire da ku nerije, ezê dimsa meşka din jî tam bikim, ka ew çewa ye!

Jinik bi devê meşka devvekirî girt. Sofî devê meşka din vekir, ji wê jî çoçik tije dims kir û bi ser devê xwe ve berda. Sofî gote jinikê: « Ka ca destekî xwe bavêje devê vê meşkê jî». Jinikê destekî xwe avête devê wê meşkê jî û hişk girt. Her destekî jinikê bi devê meşkekê ve girtî ma û sofîyê gewr rabû li dora jinilkê çû û hat. Hey eman hey zeman, jinik diqêre, digirî, pa sofî qey guhdarî dike! Jinik meşkan berde wê dims birîje û zarûkên wê, wê birçi bimînin. Eger bernede, sofî nasekine. Sofî ji paşve derpîyê jinikê şiqitand û lê daket. Jinkê bi herdu destên xwe hişk bi devên meşkan girtîye û sofî jî, ji paş ve û li pîyan îşê wê qedand.

Werhasil ji bo qûtê zarûkên xwe jinik devên meşkan berneda û sofî jî li dorê bû wek conega.

# FERHO AXE Û GIRMEQES

Fehoyê Izêr Axa, qesra xwe li ser pozê Qêre yê Kanîgulanê çêkiribû. Ji deşta Xerza bigir, çîyayên Hezo û Sasûn û heta desta Silîva tevek ji kela Axê ve dixwîyan. Ferho, dûrebîna wî bi deştê wî bû û her tim li dora herêmê dinihêrî, ka li alîkî karwanina nabîne ku here wan bişêlîne. Karwanek ji kîjan alîyê ve biderketana, Axe diçû pêşîyê û wanakan dişêland.

Rojekê Ferho Axe li serê poz dîsa bi dûrebînê dinihêre, dibîne ku waye li deşta Silîva, ji Diyarbekrê ve karwanek tê. Axê gazî peyayên xwe dike, li hespên xwe siwar dibin û diçine pêşîya wî karwanî. Ew, li bindest bajarê Farqînê, li tangava «Girmeqes» karwan zevt dikin. Ew karwan ê bazirganane û ji Dîyarbekrê mal dibine welatê Serhedê. Axê û peyayên xwe wana dişêlînin û tevê malê wan ji wan disitînin. Heçika malê pirtî (etarî), Axê bi rima di destê xwe de dipîve. Qumaş, qumaşê meqesok qedîfê kemal, qedîfê dûz, gurnişê dûz, gurnişê bi gul, çaristo, îzalix, etles, toplîn, şitto, temezî, egalên himêdî, qeremedno, tirîko, qilete, werhasil tevê cûrên pirtî ji wan disitîne û bi rima xwe ew dipîve. Axê ji ser karwan dipirse: «Gaza min çewa ye?»

Serkarwan ji Axê re dibêje: «Eger Qirmeqes sûk be, gaz hê piçûk e».

# AXAYÊN ÇÊLIK

Çêlik gundek e, li rohilatê herêma Torê. Ew gund bi navê «Çêlikê Elîyê Remo» navdar e. Gund li ser hindefê çemê Dîcle ye, li cîyê ku ava Dîcle, ava Botan ku digîjine hev û dinê.

Evdilkerim axe kurê Elîyê Remo bû. Ew bi zalmî û xwînrêjî û guman kiryarên Axê ji yên bav û kalên wî ne kêmtir bûne! Ji hinek kiryarên Evdilkerîm axa yên bi sosret ku li xelqê dikir, weha digotin:

**A- Gêla dirîyan!!!**

Axê dirîyên hişk li bênderê pehn dikir! Zilaman wek gayan sitûyên wan bi werîs, bi hev û dinê ve girê dida! Li ser miştaxa dirîyan, wan pêxwas dikir û di kelekela havînê de bi wan gêle dikir! Di rêzkirina gêlê de, çi zilamê ku ji rêzê li paş dima jî, ji para zextê di qûna wî radikir!

B- Axe çi tivingeka nû bikirîyana, di zilaman de diceriband û paşê ya dikirî yan ne dikirî! Ewî zilaman berepaş didane pey hev û dinê, ji paş ve pêçî li tivingê dikişand, gula wî ku heft zilaman bi hev re derbas bikira, ewî wê tivingê dikirî! Ekene,ewî ne dikirî! Ew ceribandina tivinga wî di zilaman de, pir kesan bi çavên xwe dîtine û niha jî gelek ji wanakan sax hene!

c- Qesra Axê li ser hindefê Golê bû. Ewî zilaman berî Golê dida û li ser banê Qesrê, yan jî, di pencera wê de, guleyan berî wanên di Golê de dida! Di çaxê gulebaranê de, pêwîst bû ku zilam xwe noqî binê avê bikin, ka çi qeder di kûrayîya avê de gula wî hikim dike û ka ca di binê avê de dimire yan namire!

D- Pîrekên gund bi dorê, her şevê yek di paşila Axê de radiket! Yekî ku jina wî qewî xweşik ne bûna jî, ewî di Gund de qûnçûçik ne dikir! Li wî Gundî havînê qîzantîyê bi keçan re ne dima! Qîzên ji neh-deh salan hevraztir, tev jinebîyên destê Axê bûn!

# ŞÊXÊ QUZGÊJ

Şêxek pir quzgêj hebû!Li dor çar-pênceka gund di dest de bûn. Şêx

xwedî sêzde jin bû! Bes ev jî, yên ku merkirî bûn li nik wî! Ji bil wanakan jî, milêbayên wî tev kesê xwedî jinên rind û sipehî bûn!

Di gund de, her jinek wek dora kanîyê, dora xwe ya razana li nik Şêx dizanîya jû lê miqat bû, da ku ji dorê nemîne! Dora çi jinê bihata, wê û mêrê we, bixwestana, nexwestana ew mecbûr bûn ku bi ser doara xwe ve biçûna. Lê belê, li nik Şêx radiket, ranediket ew tiştekî din bû! Her jinek yan wê biçûna dora xwe, yan jî wê ji Gund bar bikira!

Mêrikê Torî dibe gavanê gundê Şêx. Jina wî kal e û qewî, rind nî ne! Lê belê keça wî ciwan e û nazenînek e! Haya mala gavên serê pêşî ji dora pîrekan tune bû. Lê belê tevên pîrekê, ji boku bar li wan sivik bibe, bê xeber keça gavên jî dixine dorê. Şeva dora keçikê tê û yek tê dibêjê. Keçik wê dorê navê û bi dorbêj re dixeyîde! Şêx, çewa neketina dorê ji mala gavan dibihîze, di ufufe, dikufkufe û moçkên dînanîyê tênê û diçe ser mala wan pertal û mertalên mala gavan davêje derva û wan ji Gund diqewirîne. Bavê keçikê dibêje:

-Hakk! Ma ev çî ye ku Şêx bi serê me de têne! Ez gavan im! Ma ew ji navê xwe fihêt nakê! Ew doza bênamîsîyê li min dika! Ma ezê keça xwe dimê?

Û di wê şevê de gavan malê bar dike û ji gundê Şêx diçe!

Carek Şêx namzatê xwe datîne ku bibe milet wekîlî, da ku here Enqerê û li dor malên sipî yên tirkan biçerixe! Sed heyf û mixabin ew di hilbijartinê dekar nake û kes raya xwe nadê. Bê guman Şêx di hilbijartinê de gelek pere jî xerc didê û feyde nake. Di pey hilbijartinê de li civatekê Şêx li xwe mikur tê:

-Di herêma min de, ew pîrekên ku min ewkên wan dîtine wan tenê jî, eger rayên xwe bidana min, dê min di hilbijartinê de miheqeq kar bikira! Lê belê wan jî nedane min!

Rojek li civatekê Şêx dîsa li xwe mikur tê û dibêje:

-Eger vêga heya tevê pîrekên herêmê deynin cîyek û ez li wan binêrim, ezê bizanibim, ku kîjan ya kijanê ye!

# AVA HEYATÊ Û SÊVA XELATÊ

Mêrikekî şerpeze û stûxwar hebû. Ewî dikir û nedikir, lêva jina xwe rast ne dikir. Rojekê ew tê mal, dibîne ku jina wî nexweş e û bê hal e, di nav livîna de xwe vezelandîye ew ji dipirse:

-Hirmet, çi hewalê te ye?

Hema jimik dinale û:

-Ayaya ayayay ayayay! ez nexweş im hema parsûyên min tev dişikên! Tu nabêjî, wê nanê sêlê yê şikeva xistîye her herdu kêlekên xwe! Nan jî hişk e. Ew xwe li kîjan alî diqelêbe, dengê qirçînîya nên derdikeve û mêrik jî wî dengî seh dike! Mêrik dibêjê:

-Ma tu neçûbûyî tixtor?

Jinik dibê:

-Tixtor dermankeî were gotîye min, ku peydakirina wî pir zor e! Dibê: «gerek tu sêva xelatê bixwî û ava heyatê vexwî! Ekene saxbûna te tune ye!«»

Mêr dibêjê:

-Ez rebenê Xwedê ji ku dê ava heyatê û sêva xelatê peyda bikim! Ka ca ezê herim nik xwa xwe, belkî ew hisa wan hilîne û ezê herim ji te re werînim!

Mêrik hinek nan û pêxwarin dixe tûrikê xwe û dide rê, diçe bi alê welatê ku xwişka wî lê bi mêr e. Ew diçe, diçe diçe!... heta ku digîje gundê ku mala xwişka wî lê ye. Ji dûr ve xwa wî, wî dibîne û tê pêşîyê:

-Birayê min tu bi ser çavên min re hatî! Ev insa te anî, cina te anî, ev tu çewa hatî heta vira!

Lê bel êrik pirî ku ew di miraqa jina xwe de ye, bevilê nxwedaye û mirûzdayî ye! Xwa wî dibêjê:

-Birayê min çima tu were bêmad î! Xwedê nek qey tiştek qewimîye?

Dibêje:

-Heko! Ma ezê çewa ne mirûzdayî bim! Ev serê çend mehan e ku jinika min nexweş e! Tixtor gotîyê:«Dermanê te ava heyatê û sêva xelatê ye» Li gor salixdanan ew jî peyde nabin! Ez ji wê bonê hatime nik te, min got, belkî tu salixdana wan bikî, da ku ez herim werînim!

Xwişka wî dibêje:

-Huuuu! Birayê min. Jina te bi yar e! Çimkî ne ava heyatê heye û ne jî sêva xelatê heye! Ew herdu jî, wek teyrê Enqa ne, nav hene lê ew bi xwe tune ne!

Mêrik dibêje:

-Xwa min ev çi gotin e ku tu ji min re dibêjî? Çewa jina min bi yar e, hewqas ku ji min hez dike! Û ew timî bi ava şîr desmêj digire hewqas ku teqwa ye! Na xêr, ev tiştê ku tu dibêjî ne were ye!

Xwişk dibêje:

-Birayê min rabe ez û te emê xwe bi rewşek xerîb wergirin û herine mala te, eke ku yar ne di paşilê de be, tu bizanibî ku xwa te derewan dike! Ava heyatê û sêva xelatê, weke mesela ku dibêjin : Şûrê şûr,şîrê şêr, eyarê şêr, şêr bîne û şêr bibe! Ma ev tişt qabil e ku çara wî hebe! Ha ihah!

Jinik û birayê xwe xwe xerîb werdigirin û diçine mala wî. Ew digîjin ber derî û lê dixin. Dikin û nakin jinik derî li wan venake! Xwa mêrik gazî jinbira xwe dike:

-Malê malê hetanî ku hûn baca me nedin, em ji ber derê we naçin!

Jinika nexweş tê li wan derî vedike! Pa jinikê xwe çêkirîye, boyax kirîye, ewê xwe kirîye wek«Şorba nexweşan» û di dermande hiştîye! Ew ji gerokan re dibêje:

-Heyra hûn doza çi li min dikin? Ma hûn nahêlin ku ez û zilamkê xwe di mala xwe de bisitirin?

Herdu gerok xwe li derî dixin û diçine hundurû! Xweha mêrik xwe li erdê dixe û bi meqamê dawetê ji birayê xwe re dibêje:

-Birako mi-d go jinka te-b yar e lo!

Te-d go jinka-m ne-b yar e, lê!...

Xwişk û bira di hundurû de jinikê û yarê wê dikujin . Li axurê di afir de, çal dikolin û cendekên wan tê de vedişêrin! Çîroka min çû nav devîya, rehme li dê û bavê we hemîya !

# ARVANÊ GENIM DIBE NANÊ GARIS

Jinikeka bi yar hebû. Ewê li mêrê xwe dek û dolaban çêdikir, da ku bimire û ew bigîje yarê xwe!

Çi car ku jinikê hevîr dikir, ji mêrê xwe re digot:

-Ez arvanê genim hevîr dikim, gava li tendûrê dixim, dibe nanê garis!

Mêrê wê dipirse:

-Sedem çi ye ku were dibe?

Jinik dibêje:

-Sedem xwa te ye! Xwa te li qurmiz dike tir û fis, nanê me li vir dibe ce û garis!

-Lê ez çewa bikim?

-Ji bil çara ku tu herî wê bikujî, tuneye!

-Heyra ez nikarim xweha xwe bikujim!

-Çara kuştina wê pir rihet û hêsa ye!

-Çewa?

-Hinek dûbişk û mar têxe tûrik û here nik wê! Gava ku ew destê xwe têxê, wê pêvedin û bimire!

Ev şîret dikeve serê mêrik û dieyişîne. Mêrik hebana xwe tije dûbişk û mar dike û berê xwe dide rîya gundê mala xwa xwe, diçe! Ew nêzîkayî

li gundê xwişka xwe dike, zarûk mizgînî didine xwa wî û ew tê pêşîyê:

-Weyla Xwedê min biqurbana vî birayî bike! Ev birayê min î delal ji kur ve derket!

Û jinik xwe davêje ser birayê xwe, pê ve digirî û wî hemêz dike. Jinik birayê xwe dibe mal, li ser dewşekê dadinişîne û pirsa hal û rewşa wî û jin û zarokên wî dike. Ew bi kêf hebana birayê xwe vedike û dibêjê:

-Heyla ez bi qurbano! Ev çi ye ku te ji xwa xwe re anîye?

Jinik destê xwe dixe hebanî û çengek derdixe, ku va tev zêr in! Dibêjê:

-Birayê min, ez bi gorî! Tu çiqas zengîn bûyî? Mala Xwedê ava, mala Xwedê ava! Ev hewqas te ji mi re anîye, vêga li malê çiqas mane! Birayê min!...

Gava mêrik di lepê xwişka xwe de zêran dibîne, şaqiz dibe, heyirî û mat dimîne! Rengê bira diqelibe, rihê wî tê serê bêvila wî û zoq dibe li xwa xwe dinihêre! Ev çîroka ne min diye û ne jî hûn bawer bikin!

Jinik, di mirûzê birayê xwe de derdixe ku meseleyek di wê meselê de heye û dibêjê:

-Birayê min! Te xêr e, çi li te qewimîye, ka vê meselê ji xwa xwe re bêje!

Mêrik dibêjê:

-Xwa min, ez çi ji te veşêrim jî, ji Xwedê nayê veşartin! Hal û mesela min û jina min ev e... Min hebana xwe tije mar û dûbişk kiribû! Ji bo ku tu destê xwe têxîyê, bi te vedin û tu bimirî Încar ku ew tev bûne zêr, rihê min hate serê pozê min!

Jinik ji birayê xwe re dibêje:

-Birayê min! Ev ger û fehlên jina te, dixwîyê ku ew bi yar e! Ekene, arvanê genimî ticarî dibe nanê ce û garis? Ma kesî vî tiştî li dinê bihîstîye?

Bi gotina xwişkê, bawerî jê re çêdibe ku jina wî, wê bi yar be.

Mêrik dibê:

-Sola ku ji nigê meriv re nebe, meriv dide hevalê xwe! Û ez «Ne gur dibînim, ne jî Quluwela dixwînim!»

Mêrik radibe tê mala xwe û sê kevirên jinikê didê:

-Tu bi xêr û ez bi selamet!...

# DAXWAZA HÊWIYAN

Mêrikek hebû wî dibirin ku idam bikin. Du jinên wî hebûn, yek dotmama wî bû û yek jî xerîb bû. Gava wî dibin ew ji pîrekên xwe re dibêje:

-Va ye min dibin ku bişeniqînin! Ka çi qewîtîya we li min he ye?
Jina wî ya nû dibêjê:
-Eger tu bi xêr zivirî, ji min re eynikekê û hinek kil bîne!
Jina wî ya kevin jî dibêje:
-Eger tu bi xêr zivirî, ji min re sewîlekî sebrê bîne!
Zevtîya wî hiltinin û dibin. Gelek îşkenceyên giran lê dikin û wî davêjine hepsê. Di pey sê çar mehan de, Xwedê lê tê rehmê û wî berdidin. Ew zilam diçe sûkê û li sewilê sebrê digere. Ew digere nagere sewîlê sebrê peyda nake. Yekî dipirse:
-Tu yê çi bikî ji sewîlê sebrê?
Ew mesela xwe dibêjê û qewîtîya jina xwe ku gotibûyê «eger tu bi xêr hatî ji min re sewîlekî sebrê bîne»!
Jê re dibêjin:
-Herhalde tu, wê jina xwe pir didî ezyetê! Lewma ku wê gotîye «Ji min re sewîlê sebrê bîne"!
Û ew ji wana re dibêje:
-Wele jina min î nû jî gotibû: «Eger tu bi xêr hatî ji min re kil û neynik bîne»!
Jê re dibêjin:
-Ecêb te dibirin li qazoxê dixistin, jina te kil û neynik dixwest! hebe tunebe ew jina te bi yar e!
Ew zilam dixwîya ku mîrek e. Hema ew ji xwe re dibêje:
-Hey gidî hey! Wele aqilê min û kîrê min wek hev e!
Ew zilam tê mala xwe, ji jina xwe ya kevin re sewîlek tîne û ji ya nû re tiştek nayîne. Ew li malê ji xwe re difikire» gelo ezê çi bikim ji vê jinê?»
Ew zilam hespek têr dike û yek jî birçi dike. Wê jina xwe ya nû, lingekî wê bi hespekî ve, lingê din jî bi yê din ve girê dide û hespan ber dide. Hespê têr diçe avê û yê birçî diçe çayirê. Bi wê rewşê jinik dibe du tîştan û ji tor û bela kil û neynik wê difitile!

# MELÊ MEMELAN Û ŞERÊ GUNDIYAN

Mele Ado melê gundêkî bû. Ew yekî tirtire û qirase bû. Şêla mêrantîyê gelek li wî diket.
Gundê Memelan du bavik tê de hebûn. Bavikek li ber bavikê din qels bû û kîmqewet bû. Çi cara ku herdu bavikan şer bikira, yan jî dusêkên gundî şer bikirana, Mele têkilî navbeyna wan dibû û terefê alîyekî

digirt. Lê belê Melê serê ewil bala xwe didayê, kîjan bi hêz bûna ewî jî alîyê wan dikir. Ewê çoyê xwe digirt û ji şer dûr disekinî. Gava alîyek zora alîyê din dibira, ewî hêja li xwe diqewimand û dikete nav şerde.

Zilamek ji wî gundî weha got:

-Me û bavikê din şer kir. Bera min şeş mal bûnû bera din 24 mal bûn. Li nava gund şer dest pê kir û şer şimitî şûna bênderan. Ew der, û meydana şer. Alava şer bilid bû û em li hev germ bûn. Mele Ado hate wir û ji şer hinek dûr sekinî û lê temaşe dikir. Bera dinê zora me bir. Ji bera me ez û bavê xwe bi tenî li pîyan mabûn. Wekî di tev ketibûne erdê û bûbûne leş. Ez û bavê xwe revîn. Ji nîveka şer em filitîn. Çoyê Melê di destan de bû û bezî hat pêşîya me. Me dizanîya ku hinek li pey me tên, Mele jî hatîye ku nehêle da ew li me bixin. tu nabêjî nîyeta wî xirab bû. Melê çewa ku giha bavê min, çoyê xwe bilind kir û gotê:

«Hey min di dadika te nîyaho! Ma tu bi kur ve xilas bî?» Û ço li nîvê patika serê bavê min da! Çewa bavê min li erdê pîj bû, ewî li erdê bi çoyan lê da. Bera din jî dane pey me û tên . Min xwe di ser benda rez re avêt û revîm. Ez bi vê rewşê ji destê Mele û bera mayîn filitîm!

# KÊFÊ MIN JÎ TÊ LI SER KÊFÊ TE!

Carek ji cara, zilamekî kurd û yekî Sêrtî dibin dostên hev. Yê kurd rojek radibe û diçe seredana dostê xwe yê Sêrtî. Wextê xwarinê tê, yê Sêrtî sifre sererast dike, ew û dostê xwe dikevin serê.

Belam edetekî Sêrtîyan derheq sifra xwarinê de heye, ku li tu welatek û li nav tu milletek dî tune ye. Li malekê çiqas mêvan hebin bila bibin, xwarina liser sifrê di yek fîreqekê bi tenê de datînin. Lê belê çiqas ji firaqê xwarin biqede, dîsa berdidinê û tije dikin. Hinek malbatên sêrtî beroşa xwarinê jî datînine ber sifra mêvanan, da ku ew fedî nekin û bi dilê xwe bixwin. Hinek jî, wusa nakin, lê belê xwarin di firaqê de diqede, di firaqeke din de tînin û berî ser wê jdidin. Nemaze ew xelk, di nav welêt de gelek bi çikûzî, jî hatine naskirinê!

Mêrikê kurd û xwedîyê malê dikevine ser xwarinê û dixwin. Xwarina ku heye, hew ew e ku li ber wan e. Ji bil wê çi xwarinên dî tune ne. Xwedîyê malê çend kevçîyan dixwe û xwe dide paş, da ku mêvan jî, fihêt bike û ew jî xwe ji ser sifrê bide paş! Lê belê mêvan xwe nade paş û lê didomîne. Mêrikê Sêrtî gava ku xwe jê vedikişîne, dev û destên xwe paqij dike û dibêje:

-Elhemdila! Pirîya ku min xwar, ez bûme ga!

Mêvan dibêjê:
-Wele hê ez bixwe nebûme golik jî!
Û ew berî dide xwarinê. Mêrikê Sêrtî bala xwe didê, ku wê mêvan xwarinê biqedîne û jê re namîne. Încar ew weha dibêje:
-Eh amê! Pirîya ku tu bi rewşek xweşik xwarin dixwî, kêfêî min jî tê li ser kêfe te!
Û dîsan ew radihêje kevçî û dest bi xwarinê dike!

# QEPIK Û MELÊ BI ŞAŞIK

Meleyek hebû. Pirîya ku teqwa û alê tesewifê bû, ji tirsa wî ne feqîyên wî û ne jî gundîyên wî, newêrîyan li nik wî peyvên bêhizir bikin û ji xwe re henekek bikin.
Rojekê mele û bi birek feqîyên xwe ve, diçin ku herine gundekî. Belam rîya pê ve diherin jî gelek dûr e. Şaşeke qirase li serê mele ye, rûyekê dirêj û fîp-sipî lê ye û di pêşîya feqîyên xwe de ye û li rê dimeşin.
Mele û feqîyên xwe laqê gundekî tên. Rîya wan bi taybetî di nêv gund re dibuhure. Ew di nav gund de dighijin tangava derê melekê, jinikek gazî wan dike:
-Mele mele! Ka ca hinek li wir bisekine!
Û jinik baz dide hundur. Mele û feqîyan li wir şipya dimînin. Ew dimînin, dimînin ku jinik bê, tune ye! Mele ji feqîyan re dibêje:
-Hebe tunebe, jinik ji me re xwarinek hazir dike! Loma ku hewqas ew dereng ma!
Ew hê jî li ser rê dipên. Jinik derkete derva û gote wan:
-De înca herin!
Mele û feqîyên xwe tevek şaqiz û şemirî man. Ew ji xwe re dikeribin «ka çima vê jinikê li me were kir!». Mele jê pirsî:
-Hermet! Eva sietek e te çima me li vira da sekinandin û niha tu dibêjî «de herin!»?
Jinikê got:
-Melê delal! Ev hefteyek e ku tûtika (mirîşk) min qep (qurp) ketîye! El li pawukê bûm ku hinekî bi şaşik bibînim, da ku hêkan têxime binî de! Ji bo ku çîçikên min weka wer, tev bi kumik û tarik werin! a niha min we dît, ez çûm hunduru û qurpê danîm!
Mele ji vê peyva jinikê gelek tengijî û gotê:
-Hey min wiha wihayê te kirê!...
Feqîyên wî gotin:

-Na Seyda we mebêj, gidî tu gunehkar dibî!
Mele got:
-Ne heyran! hinek kes hene ew li xwe sixêfan heq dikin ha! DIAYÊN

# JINIKA KOÇER

Carekê sê-çar pîrekên koçeran penîrên xwe dibin deştê ku bi zad û savar biguhêrin û vegerin. Bi rê ve li wan dibe firtone, bager, berf û baran; ji serma ew dikin ku biqefilin û ji devgerê ketin. Ewan bi çi kul û halî ve, xwe digijînine, gundêekî Li perê gund ew digîjin malekê û hema ji hewlerihan xwe davêjinê.

Mala ku wan xwe avêtîyê, mala melê gund bûye. Gava mele rewşa wan ya xirab dibîne, camêrî lê dikeve û di tifikê de ji wan re agir dadide. Pirîya ku ew cemidîne hema xwe dikudînine nav êgir de. Mirikek xwe dixe nav bixêrîyê de, pîyekî xwe datîne alîyekî kuçik, yê din jî datîne alîyê din û dibêje:

-Agiro! Tu li vê dinê li wê dinê para melê bî!

Agiro! Tu li vê dinê li wê dinê para melê bî.

# SERWETA BÊ SERMIYAN

Xulamekî pir feqîr hebûye. Ji bil dîzikeka wî pêve tiştekê wî tune bûye. Zilam rojekê bi dîzika xwe digire û diçe bajêr ku bifroşe. Ew, dîzikê datîne ser serê xwe û bi rê ve diçe. Di rê de zilam ji xwe re dikeve xem û xiyalan. Û di dilê xwe de, bi firotina dîzikê, ew ji xwe re hazirîya avakirina jîyaneka pur xweş saz dike. Zilam weha difikire:

-Ezê dîzika xwe bifroşim! Bi wan pereyan ezê pirteqalan bikirm! Ezê wan bibime gundan û her hebekê, bi hebek hêk biguhêrim! Ezê li wê kirîn û firotinê didomînin, bidomînim heta bibim xwedîyê serweteka pir mezin! Paşê ezê li bajêr ji xwe re qesrek ava bikim û jineka pir xweşik bînim! Wê ji min re kurek çê bibe! Lê belê ezê li wî heydar bim da ku di kulekar re terayê jêr nebe! De meriv çi zane, zarûkên nefamî dibe ku xwe tera bikin! Gava kurê min bi layê kulekan ve here,ezê xwe bavêjime pêşîyê û nahêlim ku tera bibe!

Zilam bi avêtina xwe ya xiyalî, li pêşîya kurê xwe di qesrê de, bê hemdî xwe ew xwar dibe û dîzik ji ser serê wî tera dibe. Mifta wê serweta mezin û giranbiha li erdê piçik û parî dibe!

# DIZÊ NAZÊ EW DI ZANE

Şêxê Nexşebend (Nexşê Benda) rojekê li kerê xwe siwar dibe û bi rîyeka dûr ve diçe. Lê belê di rê de ew jî pur birçî dibe û kerê wî jî. Ew wisa birçî bûye ku ruhnî di çavan de nemaye. Kerê wî jî ji birçîyan çokên wî nema êdî erd digirin û ji rêveçûnê dadikeve. Ew laqî gundekî tê, rast diçe ber derê malekê û peya dibe. Ew rewşa birçînbûna xwe û ya kerê xwe ji wan re dibêje.

Malik, ji têwergirtina wî fam dike ku ew meleyek e û pir kêfa wan tê. Çimkî jina xwedîyê malê, ew çend roj e ku di ber zarûkan de ye û zarûk jê re çênabin. Xwedîyê malê dihere nik wî û reşa jina xwe jê re dibêje û daxwaz dike ku ew ji jinikê re nivîş tekçê bike. Ji xwe ji birçîna hiş û aqil di serê şêx de nemane. Ew qelemê digire bi destê xwe û li ser kaxizekî dinivîse:

«Mira raşid, xerim ranis, çay şed, zanî dehqanî, bizanit yan nizanit!»

(Ji min re nan, ji kerê min re êm, jina nazûrvanê min dizê nazê ew dizane!)

# TERQÎNA MIRÎ

Carek ji cara. Seyîd Hiseyn û hevalekî xwe itarîyê dibin welatê Serhedê. Ew li kerên xwe siwar in û bar jî di bin wan de ne, digihîjine perê gundekî, xelkê gund tev li ser mezela ne, mirîyek binax kirine û li pawuka meleyekî ne ku terqînê bixwîne û mele jî tune ye! Cimaet çewa çav bi Seyîd dikeve, şaşik û rûyê wî jî bê qisûr in, kêfa wan tê û dibêjin:

-Ev mirîyê me yekî alê Xwedê ye! Wa Xwedê jê re meleyek şand!

Ew tev bi hev re diçin pêşîyê, destên wî maç dikin û daxwaza xwendina terqînê lê dikin!.

Seyîd Hiseyîn daxwaza gundîyan qebûl dike. Bes meletîya wî tune ye, lê belê ew sofîyek qenc e û di nav Sêrtê de maye, peyvandina erebî ew hîn bûye!

Belam yek ji wan gundîyan ji bi peyvên erebî nizane! Seyîd jî, bi zarê Sêrtikî (erebî), li ser tirbê disekine û dest pê dike:

-Ya kolê kurê kolê Xwedê! Eger tu perestineka çak û rind ji Xwedayê xwe re kiribe, ji xwe wê Xwedê te bêxe bihişta xwe! Eger te tiştek ji Xwedayê xwe re nekiribe, wê Xwedê serê te têxe dîya te, wê jê derxe, têxe pîra te, wê jê derxe, têxe pîrika pîrika te, wê ji wê jî derxe, wê têxe qûna bavê te, wê ji wî jî derxe, wê têxe qûna bapîrê te, wê ji wî jî derxe, wê têxe xatî û metikên te! Lillah-il Fatihe.

# BÊ TIFAQ

Xoce Nisredîn carekê çêleka xwe dibe bajêr ku bifroşe. Ewî qetikek xistîye serê çêlekê li duv xwe dikşîne. Rîya Xocê di ber bostanekî re dibuhure. Li nav bostên hinek karker dixebitin û ba Melê dikin:

-Xoce, Xoce! Tu çêleka xwe bi kur ve dibî?

Mele Nisredin dibêje:

-Ez dibim firotanê!

Ew dibêjinê

-Qanim bêje, Bê tifaq!

Melê dibêje:

-Ma ezê çi bêjim «Bê tifaq», ji xwe va ye ez wê dibim!

Û Xoce li riya xwe didomîne. Ew ji bostan nepenî dibe , di ser çayakê de kir ku derbas be, çêlekê xwe hilavêt. Çına pîyê çêlekê neşikest! Melê çêleka pîşikestî bibe jî, nayête firotan. Ji bêgavîya xwe, ew zivirî ku here mal. Xoce giha tangava bostan, wan karkeran dîsa gazî kirinê:

-Xoce, Xoce! Çima tu neçûyê û dizivirî?

Melê dibêje:

-Bê tifaq! Pîyê çêleka min şikest!

Ew roj hetanî ku Xoce gihaye mala xwe, kî ku pê re bi peyîvîye wî digot «Bê tifaq, bê tifaq, bê tifaq!..»

# LI FIROTANÊ POŞMAN BÛ

Çêlekeka Xoce Nisredîn ya zişt û sitewr hebû. Çi cara ku ew diza jî, pizdan ji ser golikê ranedikir, danedilaste û golik dimira. Ewî biryara xwe da ku wê çêlekê bifiroşe.

Xoce çêleka xwe girt û bire bajêr, da ku xwe jê xilas bike. Delêlî çêlekê girt û di nav bajêr de gerand. Ew dike gazî:

-Ha werin, ha werin! Ev çêlek salê du golik tîne! Her zayîneka wê jî zo (Cot) ye! Rojê ew sê gadoş şîr dide! Bihayê wê jî pur erzan e!...

Xoce gava wî dengî ji delêlî dibihîze, hema baz dide nik wî û dibêjê:

-Heyran! Ez li firotina çêleka xwe poşman bûm! Min nedizanîya ku çêleka min hewqas qenc e!

## KIRÎVATIYA HESEN Û HISEYN

Hesen û Hiseyn herdu cîranê hev û dinê bûn. Ew bûbûn kirîvê hev jî, hem ji alê cîrantîyê ve hem jî ji alê kirîvatîyê ve, di nav wan de canê canê bû û bi hev û dinê re pir kêfxweş û dilşad bûn.

Hiseyîn nexweş dikeve. Gava ku ew dikeve ber nez-a mirinê de, gazî kurê xwe dike û lê wesyetên xwe dike:

-Kurê min! Xuyaye ku încar ezê bimirim! Lê belê wesyeta min li te ev e, ku tu ne kera xwe bidî mala kirîvê xwe yê Hesen û ne jî tu jina xwe bişînî dawetan!...

Hiseyîn diçe dilovanîya xwe. Mala wî şîna wî rast dikin. Tevê gundîyan têne serxweşîya wan û dilê mala wî xweş dikin. Di vê navekê de qederek derbas dibe. rojekê kirîvê wan Hesen tê kerê dixwaze, da ku barê xwe lê ke û bibe êş! Kera wan jî avis e û li ser guhana ye. Kurê Hiseyîn dibêjê:

-Kirîvê Hesen! Rihmetîyê bavê min wesîyet kiribû ku ez kera xwe nedime we! Lê belê em kirîvê hev û dinê ne û ez di çavên te de heyirî mame! Hey ku tu hatîyî pa tu dê kerê bibî. Bes ker avis e, tu lê haydar bî!

Hesen barê xwe li kerê dike û berê xwe dide rîya êş. Kurê Hesyn jî, dide pey û li rê wî taqîb dike. Lawik dibîne ku di rê de kera wî teliqî û kirîvê wî yê Hesen bi çîloqê dehşikê girt û heliqande nav kema dirîyê! Lawik hema yek û dido nake, termê dahşikê hiltîne û tîne malê, li ser kewarê term vedişêre!

Kirîvê wanî Hesen ji êş tê. Kerê tîne dide wan. Lawik dinihêre ku kera wî noqdayê ye û bi xwîn e?

Kirîv dibêje:

-Ez nizanim! Pa ker bi rê ve neteliqîye û min wê bê êm jî ne hiştîye!

Lawik deng nake hema radibe û diçe termê dahşikê ji ser kewarê tîne û rayê kirîvê xwe yê Hesen dide! Û dibêjê:

-Min vesîyeta bavê xwe pêk nanî û kerê da te! Ha ji te termê dahşikê!

Gava bi rê ve ker teliqî û te bi çîloqên wê girt û avête nav dirîyê, ne ew çax ez li pey te bûm! Ev tişt ji min re bû dersek! çimkî min wesîyeta bavê xwe şikand!

Di pey bûyera kerê de, çendeyek dibuhure! Mala xezûrê kurê Hisy-

nîn, kurê xwe yê piçûk zewicandine û têne pey jina wî da ku wê bibine daweta birayê wê. Ew ji mala xezûrê xwe re wesyeta bavê xwe dibêje:
-Bavê min gotîye ku tu jina xwe, neşîne dawetan!
Ew bi lêwik ve dikevin û dibêjinê:
-Birayê wê yê piçûk e! Ji bo xatirê wî hema bila bête dawetê! Lê belê Em nahêlin ku ew têkeve govendê!...
Mêrik destûra jina xwe dide, ku here daweta birayê xwe. Kurekî jinikê yê dergûşê jî heye. Ew, jinikê digirin û diçin.
Lê belê lawik têra xwe bi aqil e. Ew bi der û doran dikeve û pot û pelatan dicivîne. Du xirar tije cil dike û du-sê topên nû jî datîne ser devê wan, li kera xwe bar dike, wergirtina xwe diguhêre û berê xwe dide gundê mala xezûrê xwe. Barê xwe dibe li ber derê mala xezûrê xwe datîne li nav koma dawetê û dike gazî:
-Ha werin itarîyê! Ha werin itarîyê! Ha werin itarîyê!
Qora dawetê jî li dar ketîye, dibîne ku jina wî di serê govendê de ye û helahela wê ye! Bes tu kesek wî nas nake ku ew itarok zavê wan e. Mêrik ji xwesîya xwe re dibêje:
-Pîrê, Xwedê hebîna ev pîreka di serê govendê de çina hewqas xwe li ba dike?
Xesû dibêjê:
-Lawê min! Daweta birakokê wê yê piçûk e, lewma ew were bi kêf sergovendîyê dike!
Itarok dibêje:
-Hema dawet daweta birayê wê pîçûk be jî! Ma hewqas merî xwe sosret dike di nav vê ilaletê de?
Itarok ew şev li mala zavê dibe mêvan. Dibe derengîya şevê û dawetvanî belavdibin! Cîyê wî jî li odekê datînin û her kes karê razana xwe dike. Itarok gazî diya zavê (xesûwa xwe) dike û dibêjê:
-Da pîr! Ku hûn destûra wê qîza xwe ya reqas bidin, ku îşev li nik min rakeve, ezê vî barê itarîyê bidim we!
Xesûwa wî dibêje:
-Lawo ka ca ezê jê re bêjim, ku qîma xwe anî, pa ez li çi digerim!
Pîrê diçe ji qîza xwe re, wê pêşniyara itarok dibêje û dibêjê:
-Keça min lawo! Şevek e û tiştek ji te kêm nabe! Wê barê itarîyê tev bide me!
Jinik qîma xwe tîne. Dibe derengîya şevê ew diçe dikeve paşila itarok. Di nav livîna de ewan hewqas henekan kir jî, wê nenasî ku, ew (itarok) mêrê wê ye. Jinikê dergûşa kurê xwe jî li ber serê livîna xwe danîye. Pirîya ku jinik bi roj de govendê de westîyaye, ew zû di xew ve diçe.

Dibe derngî ya şevê itarok hema radibe û kurê xwe yê di dergûşê de hiltine û berê xwe dide mala xwe. Jinik hetanî sibê ji xew şîyar nabe!

Serê sibê mala dawetê ji xew radibin, çi binêrin ku kurê qîza wan, ne di dergûşê de ye! Li hevdû diçin, tên pa wê çi bikin! Ew ji fedîkirina xwe radibin şonikekî di nav kefen de dipêçin û dibêjin«îşev kurê qîza me mirî» û şonik dibin nav mezelana binax dikin!

Dîya jinikê sê-çar kurên wê, wê hiltînin û têne mala mêrik:

Mesela mirina kurê wî jêre dibêjin. Xesuwa wî jina wî digrin û perên xwe jê dikin. Û:

-Serê te sax be! Kurê te mir tu xweş! Em zahf ber dilê te ketin! Ev yeka di rûwê daweta kurê me yê piçûk de çêbû! Tu li me biborî!

Kurê Hiseyîn dibêje malxezûranê xwe:

-Serê we xweştir! Hema kurek bû û bi qurbana daweta xalê xwe yê piçûk bû! Ku Xwedê bide, ma tunene kur di xizma wî de!...

Mêrik û malxezûranê xwe qederekî xweşbêj dikin. Wextê xwarinê tê û birçî dibin. Ew ji jina xwe re dibêje:

-Hito! Ka ca here kîlerê ji mere xwarinekê çêke, ne em tev birçî ne!

Jinik radibe ku here nav malê xwarin çêke. Derê kîlerê vedike, çima kurê xwe li wir di dergûşêde nabîne! Hema ew rûdine û nema êdî ji fehêta xwe vegere! Ew nayê, nayê û wê dipên! Lê belê mêrê wê dizane ku ew çima nayê! Încar xesûwa xwe re dibêje:

-Yadê! Niha keça te li namalê çav bi pot û pelatên lêwik ketîye û zor daye girîyan! Ka qenim tu here ji me re xwarinek çêke!

Xesûwa wî radibe û diçe nik qîza xwe! Gava ku li wir ew lawik dibîne hema tevzûnek bi laşê pîrê ve tên, çavên wê tarî dibin û ji şerma xwe hema rudinê û bezmê wê xira dibe! Qederek diçe ew jî nayê! Talî mêrik ji bûrayê xwe yê zava re dibêje:

-Birayê min! Çika tu here! Ma qey were dibe, qet kurê tu kesî ne mirine ji yê me pêştir! Vêga diya te jî zor daye girînê! Qeman tu here wan aş bike!

Zava radibe û diçe nik diya xwe û xwa xwe. Gava ew jî çav bi lêwik dikeve, hema li wir rûdinê û nema êdî ji fedîyan, jî para were nik wan! Ew li ciyê xwe dipên, dipên zava jî êdî ku nayê, mêrik ji bûrayê xwe yê mezin re dibêje:

-Keko! Ka ca tu here, ev çi bû ji wan tevan! Em tev ji birçina mirin! Ma qey bi girînê îş safî dibe ku vê gav tevan li wê zor daye girînê!

Ew jî radibe diçe. Ew jî dibine ku wanê kurik li wir e! Încar wê çapke! Û diya wî, birayê wî û xwa wî rûniştine û destên xwe dane ber rûwên xwe. Ew jî li kêleka wan rûdine û nema êdî vegere!

Mêrê jinikê ew du-sê kesên ku li nik wî mane, wan radike û diçine

navmalê.

Mêrik berê xwe dide wan û ji wan re dibêje:

-Min vesîyeta bavê xwe pêk nanî! Min kerê da mala kirîvê xwe yê Hesen, wî bire êş, bi rê ve ker teliqî û dahşikê avête nav kema dirîyê! Min jina xwe siparte we û we wê bire dawetê, ez hatime wir, bi barê itarîyê ve we destûra wê da ku di paşila min de rakeve! Min bi şev kurê xwe ji wê dizî û ez hatim, we kurik mirand û ji dêlê ve şonik we bi nax kir û niha hûn tev hatine serxweşîya min! Ev tiştên ku têne serê min tev ji min re dibine ders! Pêşîyên me gotine: Her qisûmatek ji hezar amûjgarîyan (nesîhet) çêtir e!...

# QURA FEQIYAN

Şevek ji şevan, Mîrê Cizîrê û Wezîrê xwe kincên xwe diguhêrin û derdikevin li nav bajêr digerin. Ew saxtîyê dikin ka li bajarê wan çi heye, çi tune ye! Ka xelk ketîye hemberê wan, yan di layê wan de ye! Gelek kes dibêjin ku ew Mîr, Xanşeref bû ye!

Malûm e ev tiştê han, edetê tevekên mîrekan bû ye, ku dikirin. Mîr û Wezîrê xwe li nava Cizîrê tev digerin, tiştek nabînin. Ew vedigerin ku êdî herine mal, di ber medreseyekê re dibuhurin. Gava ku têne tîra wê, Mîr dibêje wezîrê xwe:

-Ka bisekine! Em li feqîyan binêrin, ka vê şevê ew çi dikin!

Ew bala xwe didine wan, ku di hundurû de şemateyek tê, şemateyek tê, ji berê, dê weledê xwe davêje! Pirîya ku feqîyan hella danê û qîre wîrê dikin!

Hinek dibêjin ku ew Medresa sor bûye û dersdarê wê Melayê Cizîrî bixwe bûye! Mîr û Wezîr li ber kulekan dinitirin û guhdarî dikin. Mîr dibihîze ku ji hundurû ve dengê navê wî û jina wî û bûka wî û qîzên wî tên. Hema ew xwe qenc bêhis dike û ba Wezîr dike:

-Ka ca were! Ka ca were! Feqî behsa mala min dikin! Ka ca were!...

Wezîr jî tê nik wî, belê rast e ku feqî behsa wan dikin!

Mîr dibêjê:

-Feqî, weke qura xwe min û jin û zarûyên min li hev û dinê parve dikin! Ka tu qelema xwe derxe û binivîsîne!

Wezîr qelem û kaxez ji berîka xwe dertîne û ji hundurûyê hicra feqîyan çi deng ku tê, ew dinivisîne. Feqî wiha dibêjin:

-Li ser bûka Mîr, hate te çiqas?

-Hate men deh!

-Heta min jî pazde!

-Pazde û pazde,sî! Û deh jî bû çil! Yek, dido, sisê, çar... çil!

-Filan bûka wî para te ket!

Li ser qîza Mîr jî were ewan qure kişand. Li ser jina wî jî were qure kişandin! Feqîyan were li ser bûk û jin û qîzên Mîr qure kişandin heta ku her yekê para feqîyekî ket. Dor hate ser Mîr bixwe. Feqîyan li ser Mîr jî qure kişandin! Ew jî di qurê de para feqîyekî ket. Mîr wan denga bi guhên xwe ji devên feqîyan di bihîst. Kî ku çi dibêje jî wezîr dinivîsîne. Mîr aciz dibe, çavên wî sor dibin û lê dide ew û Wezîrê xwe vedigerin Burca Belek!

Serê sibê zû Mîr du sê heb meriv dişîne nik seydayê wan û wî tînine Burcê. Mîr dibêjê:

-Seyda! Ev tu feqîan xweyî dikî, yan rafizîyan!...

Seyda bi wê peyva Mîr gelek dinepixe û bi hêrs, berê xwe didê:

-Çewa tu ji feqîyên min re wisan dibêjî?

Malûme ew çax qedr û qîmetek pir ji mele û feqîyan re hebû. Mîr, axe, beg û eşrafên welêt tev ji wana re, hirmetê dikirin û rûmetê didane wan!

Mîr dibêje:

-Îşev êvarê, ez û wezîrê xwe li nava bajêr gerîyan! Em di ber medreseya te de buhurîn, ku wanê feqîyên te li ser jina min û qîz û eyalên min qure dikin! Ewan tevekan li hev û dinê parve kirin! Ji mala min, ez bitenê mam! Di dawîyê de li ser min jî ewan qure kişand! Ez jî, para feqîyekî ketim! Me gotinê wan tev nivîsîye! Încar ne hewceye ku ez jî te re dirêj kim, ha kaxez û bixwîne!

Mîr kaxezê dirêjî seydayê wan kir û ewî xwend! Seyda kaxez dixwîne, ku tiştekî xirab tê de tune ye! Dibêjê:

-Mîrê min tiştekî xirab di vî kaxezî de tune! tevek selewat in û dia ne!

Gava ku Mîr jî lê dinêre, dixwîne, ew ji xwe re şaş dibe û ba wezîrê xwe dike.

-Wezîr, Wezîr ev te vanakan were nivîsîye?

-Na Mîrê min! Çi ji devên feqîyan ku derdiket, min were dinivîsîye?

-Na Mîrê min! Çi ji devên feqîyan kuj derdiket, min were dinivîsî!

# SÊ TAS DIMS

Carek ji cara xêr û xweşî bibare li dost û hevala ji bilî cahşik û neyara.

Li gundekî birek feqî hebûn. Gund hindik bû di nîvrokîyan de ewan tayîn ji nava gund nedianîyana. Bo wê yekê nîvê rojan de wan firavîna xwe yan nanê ziwa dixwarana, yan jî bê firavîn dimana.

Carek çaxê firavînê bû, tev rûniştin ku firavînê bixwin, lê belê nanê tisî û sar bû, pêxwarin tiştek tune bû, ku bi nanê xwe re bixwin. Suxteyek li nik wana dixwend, emrê wî neh-deh salî bû. Ew bala xwe dide wan ku nan bi tenê ye dixwin, ji wan re got:

-Li malê dimsa me pir e! Hûn dixwazin ku jez herim ji we re bînim?

Feqî dibêjin:

-Ma ji dimsê û çêtir! Ku tu herî ji me re dims bînî, ma emê qencîya te ji bîr kin!

Û lêwik cizûka xwe datîne erdê, radibe û bi bayê bezê diçe malê. Ewî ji wan re taseka qirase tije dims kir û anî hat.

Feqîyan nan û dimsê xwarin. Lê belê qey dims xwe li ber wana diqedîne! Pêre pêre kuta kirin û nanê wan dîsa ma. Lawik dîsa got:

-Ez herim tasek dimsa dî jî bînim?

Ma feqî li çi digerin! Ji xwe ew li Xwedê û li tiştekî were digerin, ku dimsê bixwin.

Lawikê suxte diçe taseka dî jî, ji wan re dims tîne û tê. Feqîyan wê tasê jî li hewa kuta kirin. Lawik dibîne ku ew ji dimsê têr nabin, dîsa ji wan re dibêje:

-Ez herim taseka dîtir jî werînim?

Feqîyan gotê:

-Ma jê çêtir?

Dîsa lawik radibe bi bezê diçe mal ku dimsê werîne. Di vê navê de feqî ji hev û du re dibêjin:

-Ev dibe tasa sisîyan ku lawik wê dims bîne! Hebe tunebe diya wî ne li mal e! Lewra ku ew hewqa tîne! Ekene, tu pîrek di vê axlêfa dimsê de sê tas dims nade kesî!

Lawik tasa sisîyan jî anî. Feqîyek jê prisî:

-Kurik! Ma diya te dengê xwe nake ku tu hewqa ji mere dimsê tînî?

Lawik bişirî û bersîv da:

-Ne, zivistanê mişk di kûpê dimsa me de hişk bûbû! Em vê dimsê naxwin! Diya min hilanîye ji bo ku hinekan xwest, emê jî bidine wan! Ev, ew dimsê ku ji we re tînim!

# NAN Û MAST NEDIGÎŞTIN SER HEV

Rojekê çend heb feqî bi riyek ve diçin, û di rê de birçi dibin, ji birçîna ji hal de dikevinl Ew li ser devê riya xwe laqî mala pîrekê tên û dibêjinê:

-Dapîr! Em feqe ne! Di rê de em birçî bûne, ji hal de ketine! Xêra xwe tu hinek nanê ji me re werîn, em bixwin da ku bi riya xwe ve herin!

Pîra gewre hembêzek nan tîne datîne ber wan û vedigere da mast ji wana re mastbîne. Heta ku pîrê vedigere, dibîne ku nanê kuta kirine. Pîrê încar mast datîne ber wan, vedigere da ku hinek nanê dî ji wan re werîne. Heta ku ew diçe nan tîne tê, dibîne ku mastê jî kuta kirine. Pîrê wî nanê di destên xwe de datîne ber wan û vedigere da ku hinek mastê dî ji wan re werine. Heta ku pîrê tê dibîne ku ewan wî nanî jî kuta kirine. Ew mastê di destê xwe de datîne ber wan û vedigere da ku hinek nanê dîtir ji wana re bîne. Hema yek li devê derî gazî pîrê dike:

-Dapîr, Dapîr! Wanê saka mala ewko ketîye nav zadê te tevî xwar! Zû bi ser ve here!

Pîrê pirîya ku nan anîye, mast anîye, feqîyan kuta kirîye nehiştine ku yek bigîje ser yekî de û westîyaye, hema pîrê berê xwe dide wî yê ku bangî wê dike û dibêjê:

-Lawo! Pa ez nizanim ku ji xwedîyê sakê re çi bêjim! Hema min hewara Xwedê ku çar-pênc heb feqyên têr têkevine mala xwedîyê sakê! Nifira min jî, ji wan re ev bese!

# CONEGAYÊ XIŞÎM

Conegayê zilamekî yê şimûz û tor hebû; fehl bû, tor bû, çavsorî bû û kesek ne diwêrîya ku nêzîkê wî bibe. Emero conegayê xwe yê xişîm, nû hînî gêlê dikir û meremozîyan dikir, direvî û xwedî dikir û ne dikir, ewî ne dikarîya ku wî di gêlê de girêde da ku wî hîn bike. Conega her carê çîrtkekê li xwe dida bi nava gund ve direvî, ewî dida ser û linav gund, di kuçe û zaboqan de li pey diçû û dihat. Pirîîya ku ew li pey çûbû-hatibû Emero ji kas ketibû. Carekê ew dibîne ku wanê jina wî ji wê ve tê, hema bangi wê dike:

-Lê Rebîayêêê! Ka ca were alî min! Ez dikim û nakim, ku ev conega têkeve gêlê, nakevê!

Jinik bersîv didê, dibêje:

-Êla Emeroooo! Ma tu ne mêrî! Hema darekî li serê pozê wî bixe û wî têxe gêlê!

# XWEDÊ VÎ ZILAMÎ KIRIYE KER

Rojekê qemçûrçî diçin gundekî, da ku qemçûra heywên ji xelkê wî gundî bistînin. Lê belê berî ku ew bigîjine gund, gundê ku jê hatibûn xeberê dabûne wî gundî tevê heywanên xwe biribûn çiyê di şikeft û zaxan de veçarti bûn. Ew li nava gund digerin nagerin heywanekî bi tenê jî nabînin ku qemçûra wî ji xwedî bistînin.

Li gund zilamek hebû, yek kerekî wî bi tenê hebû. Ew jî pêre nagîje ku bibe veşêre, hema li hundurû her çar nigên kerê xwe girêdide û dixe nava livîna vedişêre. Qemçûrçî têne mala wî axwur û pangê seh dikin tu heywanekî nabînin. Înca ji mêrik re dibêjin:

-Em pir westîya ne! Emê qasekî li mala te rûnin!

Mêrik dibêje wan:

-Hûn li min biborin! Yek odaka min tenê heye, ew jî bavê min nexweş e û li wir di nava cîya de ye.

Qemçûrçî pirîya ku li çol û pesaran li du heywanan gerîya bûn, gelek westîyane, ji kas ketine û dixwazin ku hinek rûnin bihna xwe derbixin. Bi mana nexweşîya bavê mêrik ji wan re bihane çêbû û gotinê:

-Pirskirina li nexweşan xêreke pir mezin e! Hey ku em hatine virê, emê pirsa bavê te jî bikin, hêj emê bi riya xwe ve herin!

Încar mêrik li hember wan mat ma û kete xidûkê. Qemûrçî çûne hundurê. Erê waye nexweşek di nav livîna de ye û yek ji wan diçe ber serî, gazî dikê:

-Apo, Apo! Gelo tu çewa yî?

Deng ji nexweşî nayê! Car din bang dikê, dîsa deng jê nayê! Careka dî jî bangî dikê, încar jî ku deng jê nayê, ew lihêfêji ser serê nexweş hiltîne; ew dibîne ku kerek e di nava cîya de; Qemçûrçî dike qêrînî û bi derî ve dibeze:

-Xwedê vî zilamî kirîye ker! Gidîno ka ca werin lê bihîrin! Ev merivekî gunehkar e! Şeytanqûnî bûye! Wey li vê sosrretê!...

# DEVVEKIRINA GÊ

Carek ji cara zilamekî gundî gayekî wî yê pîr û qels hebû. Nema êdî cot jî bi gê dibû, ewî biryara xwe da, ku wê gayê xwe bifiroşe. Rojek jewî

gayê xwe hilda û bire mazatê da ku bifiroşe. Mêrik li wir heta êvarkî dimîne, tu kiroxek ji gê re dernakeve. Kî ku tê devê wî vedike, haylo dibîne ku di dev de imê diranan tune ne, hema xwe jê dide paş. Bi vî aweyî rojek, dido, sisê, çar, pênc, na emê bêjin heftîyeke sax,ji sibeyan heta êvaran mêrik gayê xwe li wir dihêle, yekî ku wî bikire, kirox jê re dernakevin. Kî ku li devê wî dinêre, jê dilsar dibe û xwe dide paş.

Li mazatê pirîya ku kiroxan li devê ga mêzekirine, lêvên wî ji ser hev rakirine, êdî ga hîn bûye; çi gava ku yek bi alê wî ve diçe, hema ew devê xwe vedike û serê xwe bi bal ve dirêj dike; çimkî êdî ga fêrî devvekirinê bûye, ku kirameta wî cihî di vekirina devê wî de ye.

# MELE DOXÎN VEKIR

Carek ji cara du heb jin hebûn herdu jî dilketîyê mele bûn. Lê belê wanaka ji tirsa hevûdu nediwêrîyan ku evînîya xwe ji bo melê de beyan bikin. Rojekê ew herdu digîyine nîk hev û li hev û du li dek û fenan dikin.. Xeberdanek ji vir ve, yek ji wir ve, û mele jî li wir hazir e, ewan pêşnîyara gulaşê (qeb) li hev kirin. Û gotin: « Pişta kî bikeve erdê, wê mele carek lê dakeve».

Ev biryardayin dida xwuyakirin ku her du jî, ji bo xwe avêtina erdê, her yek bi daxwazîya xwe, berî ya dî wê xwe bavêje erdê, da ku bi mele re dilê germ hênik bike.

Herdu jinikan bi hev girtin û raperikîne hev. Ji mele re firset ew firset bû ku qewimî bû. Hema ewî doxîn vekir û kete hazirîyê. Yekî gote melê:

Mele, mele! Ma tu dikî çi bikî?

Mele got:

-Hey ji herdukan yek a erdê ye! Û ez jî xwdîyê doxînê me! Încar ezê ji niha ve xwe hazir bikim!

# EVA EZ YEK

Malek hebû pir maldar û gelek nefsên wê ji hebûn û xulamekî wan jî hebû. Rojekê rihistên dibêje «çirp» dadikeve wê malê û ji wan re dibêje:

-Ez hatime ku rihê heft kesan ji vê malê bistînim! Încar hûn xwe bi xwe xwe kifş bikin ka wê kî bin!

Xelkê di malê de tevan bi her li çavên xulam nihêrtin û kesekî ji wan bersîva Rihistên neda, man sekinî. Bala xulam kişîya ku tevek li wî dinêrin, weke ku wan bi hev re biryar dabin, ku rihistên bila rihê xulamê malê bistîne, hema ewî berê xwe da wan û got:

-Erê! Yê pêşî eva ez yek! Ka ji weşeşên dî kî ne xwe kifş bikin?

# SÊ HEVRÎ

Carek ji cara sê heb hevrî bi hevdu re bi rîyekê ve diçin. Yek ji wan kor bû, yek ker bû û yek jî tazî bû. Ew hersê qederek bi rê ve çûn, rê kete navbeyna şax û çîyan, gelî û newalên kûr de, hawîdorên wana dehl û devî bûn, daristan bûn, sawê wanakan girt bêhempa tirsîyan. Ji dormedarên wana çîvçîva çivîka û tirûdîyan, waq-qaqa teba û rawilan, gujeguja bavyê ku li daran dixe fîrînî jê tê û behitîn. Her yek serê xwe xistîye ber xwe û bê his û pis li rê dikudîne, di serê xwe de tiştan disêwirîne û derketina talûkeka nagîhanêyî li pêşîya xwe dibîne. Yê ker serê xwe rakir û berê xwe da herdukên dî, got:

-Heyran!Bi min mîna ku pêjna hinekan tê!

Bi gotina wî re, devên herdukên dî jî vebûn û yê kor got:

-Bi min jî, wek qeretûyên hinek meriva pêşberî me dixwîyên!

Di pey gotina yê kor de, tirsê li tevan têsîr kir û yê tazî berê xwe da wan û got:

-A hah! Lê încar emê çewa bikin! Hebe tunebe ew rêbir in û wê werin me bişêlînin! De haydê em birevin û xwe xilas bikin! Hadê...Haydê...

# KER Û KÛÇIK

Rojekê ker û kûçik gihane hevdu û pirsa hal û rewşa hev kirin. Wî got, xwedîyê te ji te re çewa ye, yê dî got xwedîyê te ji te re çewa ye piştre Kerê gotê:

-Min bi vê milahîmtîya xwe mala xwe xirav kir, heta ku navê m in danîne ker û êdî ez ji vî navî jî nafilitim.

Kûçik gotê:

-Tew! Derdê min hê ji yê te girantir e! Însanê serreş pîr navono ne! Pa lê navê min! Berê navê min seg bû. «G» yê jê avêtin, navê min se tenê ma. Bi vê bîntengîya xwe ez hewqa reyîyaın jî, tu feyde nekir. Û gotin min: Hêj tu bi vê navî ne qayîl î? Încar tew hê xirabitir kirin û navê

min danîne: Kûçik! tu dibînî ez bi vê kûçiktîya xwe jî hê ji heq însên dernakevim.

# BÊ KESÊN BI KES

Carek ji car li berîstanê heft heb zilam gihane hev da ku barek hirî li hêsitirê bikin. Mixabin ewana kirin, nekirin nikarîbûn wî barê hirî bar bikin. Ne ku hêstir şemûz bû, wan ne dikarîya ku bar bavêjine ser pişta wê û li hev rast bikin. Ewan çavên xwe virde-wê de li hinekî dinê gerandin da ku wan bînine alî xwe û bar, bar bikin. Belam wana tu kesek dî nedîtin ku bangî bikinê û were alîyê wan bike. Ji wê perîşanî û bêçabûna xwe, hema yek ji wana rûnişt, serê xwe xiste navbeyna herdu lepên xwe de û got:

-Ax bavo li me û vê bêkesîyê!

Ev bûyera han bûye derbumesele û tişteki ku wek wê diqewime li serê weha tête gotin:

*«Heft zilamên berîyê rahîştîn têra hirîyê*
*Hê eykî got: Ax bavo li me û vê bêkesîyê»*

# KURDISTANA ÛGANDA

Carekê çar heb kurdên penahend li bajarê Stockholmê ji bo fêrbûna zimanê swêdî dest bi dibistanê dikin. Ew her çar jî, her yek ji beşeka Kurdistanê ya dabeşkirî hatibûne Swêdê. Yek ji Kurdistan Tirkîyê bû ye, yek Kurdistana Îraqê bûye, yek ji Kurdistana Îranê bûye û yek jî ji Kurdistana Sûrîyê bûye. Lî herçar jî bi rêzê li kêleka hevdu rûniştine.

Roja pêşîn mamostê swêdî dikeve sinifê û bi rêzê ji kesên li wir nav û welat û nijada wan dipirse. Û her çarên kurd li rex hevdu rûniştîbûne. Dora bersîva mamoste tê ser wana û her çar jî li pey hev weha bersîv didinê:

-Jag kommer från Kurdîstan i Turkiet
(Ez ji Kurdistana Turkîyê me)

-Jag kommer från Kurdîstan i Iraq
(Ez ji Kurdistana Iraqê me)

-Jag kommer från Kurdîstan i Îran
(Ez ji Kurdistana Îranê me)

-Jag kommer från Kurdîstan i Syrien
(Ez ji Kurdistana Sûrîyê me)

Belam kesên li wir tevek bîyanî bûne, kesek kesî nasnedikir, tev jî nû hatibûn Swêdê û dest bi qursa zimên dikirin. Bersivdayîna her çar kurdan bi navê Kurdistan û binavê wê dewleta dagirker, kesên dî ku seh dikin, ew wusa têdigihîjin ku pêwîst e her kes binavê welatê xwe re navê Kurdistanê jî, ji manıoste re bibêje. Û li rex kurdê ku dawî bersivê daye, hevwelatîyekî Ûganda rûniştî bûye , ew jî weha bersîv didê:

-Jag kommer från Kurdîstan i Ûganda
(Ez ji Kurdistana Ûgandayê me)

# REVANDINA DÊ BI PÊNC ZARÛKAN VE

Carekê jinikek hebû pênc zarûkên wê hebûn. Jinik dil dikeve zilamekî û tevî her pênc zarûkên xwe ve li pey wî diçe, direvin. Mêrê jinikê tê mal, bala xwe didê ku ne jin û ne jî zarûk hene. Ew virde-wirde dipirse, hinek dibêjinê: «Jina te digel zarûkan ve li pey filankeso revîye». Mêrik hema bi lepan bi çolên xwe dikeve û dibêje:

-Hak ma yabo! Êla Xwedê mala te xirav kiro! Vî malmîratî bi carekê xwe kire xwedî jin û pênc zarûk!...

# MALA BAVÊ TEV QELIYA BÛN

Carekêî jinikek hebû ji gundê mala bavê xwe dûr li gundekî din mêr kiri bû. Sal û zeman bi ser ve diçûn ewê tu salixdanekê ji wan nedigirt, ka mala bavê wê di çi hal û rewşê de ne.

Rojekê çerçîyek tê gundê ku jinik lê ye. Ew û wî li hev dipirsin, çima

yekî naskirîyê jinikê dernakeve! Û ji wî pirsa mala bavê xwe dike. Çerçî tevê rewşa wan dibêjê û dibêje:

-Çavên te rohnî bin! Birayê te jî bûye muxtarê gund!

Jinikê çewa peyva Muxtarîyê ji çerçî seh kir, rûnişt û girî, girî, girî, kir hewar hewar, bi tepan li xwe xist ,porê xwe kişand û qêrînî kir:

-Weyla li min bê xwedîyê! Heyla li min bêkesê! Wey limin kezîkurê! Ax li min evdalê!

Bi girîn û qêrînîya jinikê re tevekên gundîya hatine dorê û wê aş kirin, ber dilê wî dan, semax danê, wê debirandin û yekî jê pirsî:

-Vêca birayê te bûye muxtêr, geleke kêfa te bê, anoka încar hê tu digirî?

Jinikê stêrên çavên xwe paqij kirin, zuwa kirin û got:

-Ne! Ez dizanim ku mala bavê min tev qelyane, mêr di nava wan de nemane! Lewra ku birayê min bûye muxtar, ekene ew nedibû!...

# XWARINA SERUPIYÊN XAV

Carek ji cara zilamekî gundî ji kar tê malê, pirî ku westîya ye ji kefteleft ketiye û ji birçîna jî bêhal bûye. Ew digîje mal bidengekî bilind bangî jina xwe dike û dibêjê:

-Hito, Hito! Ez ji birçîna ketim! Xweş bo min xwarinê werîn!

Lê belê jinik jî destên wê di hevîr de ne, ne vala ye û bangî keça xwe ya heft-heştsalî dike û dibêje:

-Keça min, bavê te birçî ye Here xwarinekê bidê!

Ew çax li Kurdistanê di şûna dolabên qeşemê de seklikşîran bikar dianîn, tevekên xwarinan di binî de diparastin. Qîzik diçe selikşîrê bilind dike, erê waye serûpê di binî de ne. Hema datîne ser bergeşê, ji denikê du nana jî datîne rex, digel pîvazeka spî ve, û dibe datîne ber bavê xwe.

Tu nabêjî jinikê serûpiyan di tendûrê de kizirandîye, bi kêrê xirtikandîye şûştîye û fîq-spî bûne, xwê kirîye û xistîye bin selikşîrê de, da ku ji şîva êvarê re bipijîne. Keçik jî hay jê tune ku ew hêj xav in.

Gava ku mêrik çav bi serûpiyan dikeve, bi zikê xwe yê birçî hella dide serûpîyên xav, binan û pîvazê re dixwo. Ji ber ku ew hatine kizirandi piçek nîvpijandî bûne. Lê xavêxav in. Heta ku jinik hevîrê xwe kuta dike, mêrik jî ji wan têr dixwe. Û bangî jinikê dike:

-Hito, Hito! Ev serûpê gelekî xweş bûn! Lê ma te nikarî bû keleka zêda bida binê beroşê Hêj xav in!

# YEK BAN E DU ZOZAN E

Carek ji cara rihme li hazir û guhdara, ji bilî mirdar û xwînxwara. Pîrek hebû qîzek û kurekî wê hebûn. Pîrê qîza xwe da mêr û kurê xwe jî zewicand, bûkek anî.

Qederek çax bi ser qîza Pîrê ve dibuhure, zavê wê jina xwe hiltîne û rojekê tên mêvanîya Pîrê. Pîrê gelek qedr û qîmetê dide wan, ji wana re berx serjê dike û perwerî û camêrîyê pêşkêş dike. Dem havîn e û xelk li ser banan radikeve. Li ser ban Pîrê livînan radixe, zavê wê û jina xwe di livînek de, kurê wê û jina xwe di livînek de û pîrê jî di livîna xwe de, her yek ji wan xir dikiken xewê û radikevin. Lê belê ji kêfa qîza xwe, xew nakeve çavên Pîrê û li ser livîna xwe tund daye û Şîyar e, Pîrê her carê qasek radibe li cîyan dinihêre, ka lehêf ji ser kesî çûye yan na, çimkî hinek serma bû û bayê kur dihat.

Pîrê dibîne ku qîza wê û mêrê xwe, di nav livîna de piştê dane hevdu ji hev dûr ketine, her yek berê xwe daye alîyekî, lehêf jî ji ser wan şiqitîye û razayî ne-belkîji fedîyan be jî Pîrê zavê xwe û qîza xwe digîjîne hev, berê wan dide hevdu, destên wan davêje ser stûyên hev, lehêfê bi wan dadike û wusan hêdîka di ber xwe de dibêje:

-Lawo, serma ye, hûnê biqefilin, aaaa were xwe nêzî hevdu bikin! De încar ji xwe re razin!

Încar ku Pîrê bi bal cîyê kurê xwe ve diçe, dibîne ku kurê wê û jina xwe dest bi ser stûyên hevdu re birine, hev hemêz kirine, lehêfê li xwe pêçane û di xew de ne. Hema Pîrê bi destê bûka xwe digire, ji ser sûtêuyê kurê xwe hiltîne, wana ji hevdu dûr dixe, berê her yekî ji wan bi aliyek ve ji hev diguhêre û di ber xwe de ji bûkê re dibêje:

-Weyla serbavkura qiştika heram! Xwedê hebîna tu dibînî çewa lêwik hemêz kirîye! A niha ez ku nehatama, wê lawikê min bifetisanda!

Tu nabêjî bûk şîyar e û lê dihise. Û gava ku ew çûye ser cîyê qîzê û zava li wir çi gotîye, çewa kirîye û li wê û mêrê wê çi dike û çi dibêje... Bûk di ber xwe de dibêje:

«Yek ban e, du zozan e»

# NAVEROK

## BEŞ-1

(Ji tîpa A heta bi tîpa Z)

Gotinên pêşiya .................................. 9
Xweşbêj .................................. 28
Şiret û Nesîhet .................................. 30

## BEŞ-II KILAM

1- Canê .................................. 31
2- Kundiro .................................. 32
3- Nayê ha nayê .................................. 34
4- Ka bid me bûka me .................................. 35
5-- Lê gidyê .................................. 36
6- Ez helîyam .................................. 37
7- Kejê tu kej î .................................. 38
8- Lê dinê .................................. 38
9- Zeynebê .................................. 39
10- Were govendê .................................. 39
11- Mala bar kir .................................. 41
12- Bimeş dîlanê .................................. 42
13- A wiha hat a wiha çû .................................. 43
14- Govend ranabe .................................. 44
15- Diz hat .................................. 45
16- Lo lo xopano .................................. 45
17 - Xezalê hêlîca .................................. 46
18- Ziravê-I .................................. 46
19- Ziravê-II .................................. 47
20- Ziravê-III .................................. 49
21- Çavxezal .................................. 50
22- Esmera min .................................. 51
23- Kalo .................................. 53
24- Dawet .................................. 54
25- Eyşê .................................. 55
26- Weylê .................................. 55
27- Ew jî jin e? .................................. 57

28- Ez tobedar im .............................. 59
29-Lê Nazo .............................. 59
30- Evîna min ev e .............................. 60
31- Ev dil birîndarê te ye .............................. 60
32- Kes nabê çima .............................. 61
33- Zerîya min .............................. 62
34- Heyhê .............................. 63
35- Şêrîna av û şewat .............................. 64
36- Lê Ayselê .............................. 65
37- Te ez kuştim bi gazina .............................. 65
38- Kalê xort .............................. 68
39- Sêva min were ba min .............................. 68
40- Ez ji gundîya newêrim .............................. 69
41- Keçkokê bimeş .............................. 70
42- Xweşika çavxezal .............................. 71
43- Keçika awurdayî .............................. 73
44- Eman xanim .............................. 74
45- Nazika nazenîn .............................. 74
46- Li van gotina bihis .............................. 76
47- Te nadim min .............................. 79
48- Êmîşê Êmo .............................. 80
49- Dîlana Bota .............................. 81
50- Ax lê Nûrê .............................. 83
51- Kirîvê lê .............................. 85
52- Gewra kinik .............................. 87
53- Gewrê nayê .............................. 89
54- Wer govend û dîlanê .............................. 91
55- Qaydê xirpanî .............................. 92
56- Derdê qîza zinara .............................. 96
57- Giresîra bi sîr e .............................. 99
58- Mele ye mele .............................. 100
59- Dîlokên li ser legê .............................. 102
60- Pêkenoka evîndarîyê .............................. 102
61- Dîlokên sersalê .............................. 103
62- Despêka leyztika zarûkan .............................. 103
63- Bêxeberdan .............................. 103
64- Tişteki min heye esil çi ye? .............................. 103
65- Hejmar 24 e? .............................. 104
66 Radan di Leyztikê de .............................. 104

67- Herackirin û Qurûç ........ 104

BEŞ-III ÇÎROK

1- Warê bav û kala ........ 105
2- Xanî bi mişka ve şewitî ........ 105
3- Pa min çi zanibû ........ 106
4- Top-Pot ........ 108
5- Hingiv û Kuncî ........ 109
6- Jina gavan û jina paşê ........ 109
7- Lewnê Jina ........ 112
8- Babakurdî ........ 115
9- Asaxtir-Qedexye ye ........ 115
10- Gulê û Çûko ........ 116
11- Elfoya Delal ........ 120
12- Çiryaye û Diriyaye ........ 120
13- Nav Pirsî ........ 121
14- Ha bavê mi no xortno ........ 121
15- Çûn û hatina bi şîranî ........ 122
16- Vira feqî û rastbêja mele ........ 122
17- Pîzpîzka melê ........ 123
18- Bersîva yeksale ........ 124
19- Ez dizanim ........ 125
20- Milyakê wî lê xin ........ 126
21- Hema mast sedubîst carî mast ........ 127
22- Feqe Îsam û Feqe Evdilwehab ........ 127
23- Paşayê bê aqil ........ 128
24- Birayê viker û yê rastgo ........ 130
25- Zirna zer ........ 131
26- Çermê gamêşê ........ 132
27- Bageranê axeyan ........ 132
28- Hecîyê Şerefîkê ........ 133
29- Dirûtina Ewran ........ 134
30- Efîyê xemxwir ........ 135
31- Qaşo dibû bajarî ........ 136
32- Mîrxo-Rêxo ........ 136
33- Binefşa Narcîn ........ 137
34- Sê kurdên Tirîzan ........ 140
35- Şîret ........ 141
36- "Çile tê qê bihar nayê?" ........ 141

37- Peyva bi tecwîdî ........................ 142
38- Xoşav û Ezexane ........................ 143
39- Dost bila dost bin ........................ 143
40- Televîzyona Muxtar ........................ 145
41- Çil siwarên bê serî ........................ 146
42- Serekkomar û tuwaleta ele mûzîk ........................ 148
43- Li pawuka Xwedê bihêle ........................ 149
44- Qolçîyê gûvedayî ........................ 150
45- Qolçî û guhê kerê ........................ 150
46- Hecî malê sipart ê dîn ........................ 151
47- Bûka şêmehî ........................ 153
48- Nawê Mangekanê Kurdî ........................ 155
49- Şertê misilmanîyê bûne şeş ........................ 156
50- Girîna mêrikê koçer ........................ 157
51- Mehrbirîna xortê torî ........................ 157
52- Kenê Balûl ........................ 158
53- Banga Melê ........................ 159
54- Melê serî vegerandibû ........................ 160
55- Mele, mîro, mişk û koçer ........................ 161
56- Nedirêj ........................ 162
57- Berû û bizîn ........................ 162
58- Tamsarî ........................ 162
59- Darû kulav ........................ 163
60- Birîna xedar ........................ 163
61- Mêrê li ber tifikê ........................ 164
62- Rehme li kefendiz ........................ 164
63- Têrxwarin ........................ 165
64- Topek e û li wê dera ha ye ........................ 165
65- Xirabajar ........................ 167
66- Temenê rovî û kêsû ........................ 168
67- Zirarê mîyan ........................ 169
68- Dirîya tûj ........................ 169
69- Xêrxwazî û kulzikî ........................ 170
70- Azbata Îbrahîm Pêxember ........................ 171
71- Melê Bîne Qeysa Berê ........................ 174
72- Govenda Pîrê ........................ 174
73- Şerê Sofîyan ........................ 175
74- Morika şîn ........................ 177
75- Xeyda Zavê ........................ 178
76- Qey cehşik jî lê ne? ........................ 178

77- Qîza pîrê bê mêr mabû ........................ 179
78- Tiştîra Îsa û Nêrîya Mihemed ..................... 180
79- Hicra tije aprax ........................ 181
80- Diziya Gûzan ........................ 181
81- Rovîyê kedî ........................ 183
82- Ziyafeta quling û rovî ........................ 183
83- Çaroxa kurê mele ........................ 184
84- Jinika şermoke û mêrikê dîn ..................... 185
85- Hêka mihînê ........................ 186
86- Sola Sêrtikî ........................ 187
87- Homa û Xelle ........................ 188
88- Şîna Îskender ........................ 189
89- Hivde, hijde, nozde ........................ 190
90- Melê koçera ........................ 191
91- Hema tev ez û ez ........................ 192
92- Tunebûna Qadro ........................ 193
93- Sotin nayê gotin ........................ 194
94- Dinya çerx û dewran e ........................ 195
95- Destebiratîya hirç û rovî ........................ 197
96- Şahidê dadgehê ........................ 198
97- Qazîyê bertîlxwir ........................ 199
98- Ji heft feqîyan yek fetisî ........................ 200
99- Kûçikê li kûçik pirsî ........................ 201
100- Sofî û mişkê mirî ........................ 202
101- Melê sosretgerandî ........................ 204
102- Mesela ker tê de ........................ 206
103- Ataturk û Îsmet Paşa ........................ 207
104- Para feqîyê kor ........................ 207
105- Xerzikê Zoqê ........................ 208
106- Avakirina xanîyan ........................ 208
107- Ma helhel bi te mabû ........................ 209
108- Mirina mêrikê nemêr ........................ 210
109- Ciyê bê Sşrtî ........................ 211
110- Mêrgmeqes ........................ 211
111- Goştê bê xwê ........................ 212
112- Şerê kurbavkujî ........................ 213
113- Bavê Heft kuran bû lê kurdûnde bû ................. 214
114- Tirkîya şevê ........................ 214
115- Hêjîran dixwe û viran dike ..................... 215
116- Şêx çûbû herba Qibrisê ........................ 215

117- Destebiratîya mar û hecî ............................ 217
118- Sergindor ............................ 218
119- Bila lê xwe ............................ 219
120- "Çi firqa guyê min û yê şêx heye ............................ 220
121- Mela û feqîyên wî ............................ 221
122- Kurtekiras lê tê ............................ 222
123 - Tiştê hê bê tu guh bidê ............................ 222
124- Xezeba dêlegurê ............................ 223
125- Manîya nedanê ............................ 224
126- Ê cara sisîyan mele bû ............................ 224
127- Gavanê Mozgelanê ............................ 226
128- Mêvanê bê tebat ............................ 227
129- Kirîvatî ............................ 227
130- Jinebîya qîz ............................ 228
131- Sîtila wendabûyî ............................ 229
132- Mele û kadîn ............................ 229
133- Xeyda kerê ............................ 230
134- Deve hat pûlekê pûl tune bû ............................ 230
135- Kerê Axê Diçû sûkê ............................ 232
136- Jinika xeyidî ............................ 233
137- Gaz û gazûnîv ............................ 234
138- Lingê wî şimitî bû ............................ 235
139- Mele jî tarekê ji jpîrê re bir ............................ 235
140- Sofîyê zinaker ............................ 236
141- Kuro ew axe ye, xwe jêre bavêj erdê ............................ 237
142- Tira heftsale ............................ 237
143- Sofîyê bê aqil ............................ 238
144- Sofîyê çilek ............................ 241
145- Çi ji kê re lazim be, wî ji Xwedê dixwaze ............................ 242
146- Neseqirî ............................ 243
147- Gurê bê bizav ............................ 243
148- Hovo ............................ 244
149- Girê dimsê ............................ 244
150- Ferho axe û Girmeqes ............................ 245
151- Axayên Çêlik ............................ 246
152- Şêxê quzgê ............................ 246
153- Ava heyatê û sevê xelatê ............................ 247
154- Arvanê genim dibe nanê garis ............................ 249
155- Daxwaza hêwîyan ............................ 250
156- Melê Memelan û şerê gundîyan ............................ 251

157- Kêfê min jî tê li ser kêfê te .......................... 252
158- Qepik û melê bi şaşik .............................. 253
159- Jinika koçer .................................... 254
161- Serweta bê sermîyan .............................. 254
162- Dizê nazê ew dizane .............................. 255
163- Terqîna mirî .................................... 155
164- Bêtifaq ........................................ 256
165- Li firotanê poşman bû ............................ 256
166- Kirîvatîya Hesen û Hiseyn ........................ 257
167- Qura feqîyan .................................... 260
168- Sê tas dims ..................................... 261
169- Nan û mast nedigîştin ser hev ...................... 263
170- Conegayê xişîm .................................. 263
171- Xwedê vî zilamî kirîye ker ........................ 264
172- Devvekirina gê .................................. 264
173- Mele doxîn vekir ................................ 265
174- Eva ez yek ...................................... 265
175- Sê hevrî ........................................ 266
176- Ker û kûçik ..................................... 266
177- Bê kesên bi kes .................................. 267
178- Kurdistan Uganda ................................ 267
179- Revandina dê bi pênc zarûkan ve .................... 268
180- Mala bavê tev qelîya bûn .......................... 268
181- Xwarina serûpîyên xav ............................ 269
182- Yek ban e, du zozan e ............................ 270